CON BÎVÊR

Xudanê kitêba eyan ya “Tela Şeytan”

# QENCÎ, *YAN* XWEDÊ?

BO ÇI QENCÎ BÊYÎ XWEDÊ BES NÎNE?

Hevalê giranbiha,

Dema ku em tevî Xwedê dikevine nava eleqeta, ew her govekeke jîyana me diguhêre. Jîyana me bi biletbûnê va tijî dibe, dema ku em teslîmî serwêrtiya Îsa Mesîh dibin û her roj bi kerema wî va dijîn.

"Qencî, yan Xwedê?"  kitêbeke sade nîne. Ew berbirîbûn e, ya ku  dikare mirova usa bike, ku ew bighîjine heja pîrozayê ya li temamîya cîhanê belabûyî. Hûn dikarin li ber serwêra, olên civîna, malbetên xwe, heval û mirovên dora xwe bi gilîkirina derheqa vê berbirîbûna pîrozayê de bighîjine vê hejê. Pawlosê şandî ew bû, yê ku komeke şagirta li mektebeke biçûk hîn dikir û ew yek bes bû ku Kitêba Pîroz nava du sala de bighîşta wana, yên ku li Asîyayê diman.Ew bûne şedên hazirîya Xwedê (binihêre Karên Şandîya 19:1-1O). Gelo wî çaxî Xwedê bi destî me çi dikare bike, eger em hindava Wî  bi cedandinên xwe bibine yek?

Xudan dilê min de daniye, ku ez vê berbirîbûnê derbasî li cem we û serwêrên ruhanî yên li temamîya cîhanê bikim.Ez dixwezim we bidime sîlihkirinê, bona ku hûn vê eyantiyê derbasî li cem wana bikin, kîjana hûn nas dikin. Ez  hîvî dikim, ku hûn bi hizkirin û piştgirîya min qebûl bikin. Minê bi dil bixwesta bizanibûya, ku evê berbirîbûnê hukumekî çawa nava jîyana we û jîyana wan meriva de hişt, derheqa kîjana de hûn difikirin.

Bi dil:



Con  Bîvêr

JohnBevere@ymail.com

MESSENGER INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

# QENCÎ,
*YAN*
# XWEDÊ?

## Rêberên mesîhî derheqa kitêba "Qencî, yan Xwedê?"-da

Kitêba "Qencî, yan Xwedê?" wê ji nûva Kitêba Pîroz bona we bide eşkerekirinê û wê rê nîşanî we bide ku fikirên we yên derheqa jîyana başda hebin û wê fikirdarîya we bi temamî bide guhartinê.

— Mark Bêtêrson, "Xudanê kitêba "Çêkirçiyê dorana", ya ku dikeve nava navnîşa kitêbên rojnama eyan "Nyû York Tayms"-ê

Kitêba "Qencî, yan Xwedê?" wê we hîn bike, ku hûn ji hev cuda bikin û wê rê nîşanî we bide, ku hûn bi cûrê rast Xudan bigerin, bona ku hûn xwestina Wî, ya bona jîyana xwe, bizanibin.

— Coys Mayêr, dersdarê mesîhî û xudanê kitêbên eyan

Con Bîvêr dersdarekî qedirbilind, rêber û xudanê gelek xebata ye, usa jî hevalekî baş e û hevalkar e nava çêkirina padişatîya Xwedêda. Ew dixweze ku meriv ne tenê baş bijîn, lê jîyan ya xwedêtîyê be. Cedandina Wî wê bawerîya me bide bilindkirinê û wê bang bike ku em li ser xwe guman nava wî hemû tiştîda bişuxulin, çi ku Îsa bona we çê kirîye. Xebatên Con û eyantîyên wî yen şexsî wê bona we xwestina Xwedê û bernamên Wî bona pêşeroja we bidine eşkerekirinê.

— Brayan Hyûston, serwêrê civîna "Hîlsong"-ê

Wextê ku ez derheqa merivada dixwînim, yên ku rûyê hizkirina Xwedêda karên baş kirine, ez dixwezim bibime yekî ji wana. Kitêba "Qencî, yan Xwedê?" derheqa wê yekêda gilî dike ku nava jîyana wan merivada çi diqewime, yê ku bi rastî xwe li Xwedê girtine, lê ne ku bi feşkirinava bi rîya hêsa gihîştine meremên xwe. Eger hûn jî dixwezin ji kokêva Xwedê nas bikin û qulixî Wî bikin, ez berbirî we dibim, ku hûn vê kitêbê bixwînin".

— Con K. Maksvêl, xudanê xebatên eyan û terîfkir

Li cem Xwedê bona we tiştê herî baş heye û kitêba Con Bîvêr ya "Qencî, yan Xwedê?" wê rê nîşanî we bide ku hûn wan hemû tiştara qayîl nebin, çi ku ji wê yekê kêmtirin. Con bi cûrê herî baş bîr tîne, wekî wextê ku em Xwedê digerin, em Wî dibînin.

— Cêntêzên Franklîn, serwêrê civîna "Frî Çêypêl"-ê û xudanê kitêba "Rojî", ya ku dikeve nava navnîşa kitêbên rojnama "Nyû York Tayms"-ê

Kitêba “Qencî, yan Xwedê?” wê ji bingehêva we cîda bihejîne. Eger hûn berbi guhartina nacedînin, wî çaxî ev kitêba bona we nîne. Çi jî hebe, eger hûn dixwezin ku fikirên we bên guhartinê, wî çaxî evê berbir’îbûnê qebûl bikin. Ewê jîyana we bide guhartinê.

— Kirîstîn Kêyn, hîmdara qulixdarîya “A21 Kimpêyn”-ê û xudana kitêba eyan ya “Bêyî şikberî”

Piştgir. Zelal. Lazim (pêwîst). Kitêba “Qencî, yan Xwedê?” tiştekî gelekî girîng bîr tîne, dide kivşê wekî meremê meyî dawî tenê qencî nîne. Ev kitêb dide kivşê, wekî meriv dikarin ji jîyana niha ya bi cûrekî derbazî wê jîyanê bibin, kîjanê meriv dikare ji Îsa bistîne.

— Lûyî Gîglîyo, serwêrê civîna “Pêşin Sîtî Çrç”-ê, ya ku li ştata Corcyayê, li bajarê Atlantayê ye û usa jî hîmdarê hemcivînên “Pêşin Konfrênsîs”-ê

Çawa agir dişuxule û tarîstanê bela dike, usa jî Con Bîvêr rîya berbi eyantîya Xwedê ronahî dike û bi wê yekêva tevayî dilê xwendevanada xwestinê dişuxulîne, ya ku wê tenê nava hazirîya Wî da tîbûna xwe bişkêne.

— Serwêr Tî Dî Cêyks, serokê hevaltîya “Tî DîCêy Êntêrpraysîs”-ê û xudanê xebatên eyane anegorî rojnama “Nyû York Tayms”-ê

Qencîya Xwedê dora me digre, lê gelo em bi rastî wê yekê fem dikin? Nava kitêba “Qencî, yan Xwedê?”-da Con Bîvêr dide kivşê, ku qencî çi ye û tevgirêdana wêye tevî Xwedê kîjan e. Evê kitêba girîng bixwînin, ewê we pêşda bibe, rê nîşanî we bide, ku hûn tiştê Xwedêyî herî baş bigerin û wê yekê tevî meriva nîvî bikin.

— Krêyg Groşêl, serwêrê “Layv Çrç TîVî”-ê û usa jî xudanê kitêbên eyan yên “Piştî roja îroyîn” û “Pênc borcdarîyên bona ku zewaca we neyê teribndinê”

Con Bîvêr careke mayîn banga bona guhartina jîyanê berbi bedena Mesîh şandîye. Kitêba xwe ya nûda, ya ku tê navkirinê “Qencî, yan Xwedê?” Con nîşanî xwendevana dike, ku çawa meriv dikare ji eleqetên tevî Xwedê tiştên herî baş bistîne û çapnîşa here bilind bona hemû govekên jîyanê îzbat bike.

— Mêtyû Barnêt, serwêrê civîna “Ancêlûs Têmpl”-ê, ya li bajarê Kalîfornîayêyî Los Ancêlosê û hîmdarê civîna “Drîm Sêntr”-ê

Nava kitêba “Qencî, yan Xwedê?”-da Con Bîvêr bang dike, ku em fikirên xweye derheqa qencîya Xwedê da careke mayîn lê binhêrin û wan goveka nas bikin, nava kîjanada em bi çapnîşên xweva, lê ne ku çapnîşên Wî va razî bûne. Bi raberkirina fikirên xwedêtîyê yên kûr û gilîkirina serhatîyên emirê xwe, Con xwendevana ruhdar dike, ku ew qencîya vê dinîayêye qelp înkar bikin û careke mayîn xwe pêşkêşî pîroziya Bavê Ezmîn bikin. Kitêba “Qencî, yan Xwedê?” gerekê ji alîyê her peyîhatîkî Îsa da bê xwendinê, yê ku naxweze bi hemû tiştîva razî be, çi ku ji tiştê Xwedêyî herî baş kêmtire.

— Krîs Hocîs, serwêrê sereke, yê civîna “Çrç of Haylênds”-ê, usa jî xudanê kitêbên “Hewa paqij” û “Çar fîncan”

CON BÎVÊR

# QENCÎ, *YAN* XWEDÊ?

BO ÇI QENCÎ BÊYÎ XWEDÊ BES NÎNE?

*Vê kitêbê ez pêşkêşî kurê me*
*Ardên Krîstofêr Bîvêr*
*dikim*

*Tu yekî xebathiz, qewat, nazik û serewaxtî.*
*Ez zendegirtî dimînim, wextê ku tu awqasî hindava*
*wan meriva da nazikî, yên ku diêşin.*
*Kurê min, ez gelekî bi teva firnax dibim û*
*heta-hetayê te hiz dikim.*

Good or God? by John Bevere, Kurmanji Latin
© 2017 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Originally published in English as Good or God?
Additional resources in Kurmanji Latin by John Bevere are available
for free download at: www.CloudLibrary.org
To contact the author: JohnBevere@ymail.com

Qencî, yan Xwedê?, Con Bîvêr, bi kurmancî (latînî)
© 2017 Messenger International
www. MessengerInternational.org
Pêşda bi zimanê înglîzî hatîye çapkirinê, bi sernavê «Good or God?»
Xebatên Con Bîvêre mayîn hûn dikarin
belaş vê malperêda dest bînin: www.CloudLibrary.org
Bona îzbatkirina pêwandiyên tevî xudanê kitêbê: JohnBevere@ymail.com

# NAVEROK


Xeberên razîbûnê ........ 13

Derheqa vê kitêbêda ........ 15

Pêşgotin ........ 17

Beşa 1. Qencî çi ye? ........ 19

Beşa 2. Ew yek çawa qewimî? ........ 29

Beşa 3. Norma qencîyêye tomerî ........ 43

Beşa 4. Bingeh ........ 57

Beşa 5. Gelo tenê xwestin bese? ........ 73

Beşa 6. Sîstêma meye hundur, ya ku cîh qirar dike ........ 89

Beşa 7. Kumreşî bona me ........ 105

Beşa 8. Hevaltî ........ 119

Beşa 9. Rastîya hesabhilnedayî ........ 137

Beşa 10. Ardû ........ 153

Beşa 11. Qenc, yan kardar? ........ 173

Beşa 12. Hînbûna jîyana pîroz ........ 187

Beşa 13. Menîya me ........ 201

Beşa 14. Normên me ........ 219

Beşa 15. Jihevderxistin ........ 237

Beşa 16. Şikilê tomerî ........ 255

Matêrîyalên bona hînikirinê û pirsên gotûbêjkirinê ........ 261

# XEBERÊN RAZÎBÛNÊ


Bona jin, zarok û nebîyên min: ji we her yek pêşkêşa ji Xwedê ye. Hûn jîyana min didine dewlemendkirinê. Ez we heta-hetayê hiz dikim.

Ez spasîyê elamî koma qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê, endamên şêwirê û hevalkara dikim, wekî hûn li rex min û Lîzayê ne. Çetin me ji Xwedê hîvî bikira, ku hevalên diha amin û rast hebûna, tevî kîjana me bixwesta Mizgînîya Îsa Mesîh bona hemû mileta terîf bikira.

Spasî bo Bryûs, Cêylîn, Wînsênt, Êlîson, Êdîson û Lorên, wekî we bi kel û ced li ser vê berbirîbûnê xebat kir û merîfeta xweye rêdaktorîyê da xebatê.

Spasî bo Alan bona dîzaynêrîya rûyê vê kitêbê. Cûrê wê gelekî bedewe.

Razalixî bo Êdîson, Kolîn, Êstêr, Tom, Mêt Ardên, Alan, Cêynîn û Dêyvîd, wekî wextê dîzaynkirina vê berbirîbûnê we xwend û emekê xweyî aqilmend kire nava beşên dijwar.

Razîbûn bo Tom, Êstêr, Êdîson. Ostîn û Con: bona emekê aqilmend, ku ev kitêb hate çapkirinê.

Razalixî bo Rob û Vanêsayê ku ev berbirîbûn gihîşte mileta.

Bo Bavê me, Xudan Îsa Mesîh û Ruhê Pîroz: em ji Te razîne, wekî Te em ji guna xilaz kirin, em kirine lawên Xwe û Te ev berbirîbûna Xwe bona cimeta Xweye hizkirî da. Bira temamîya rûmetê bo Te be.

# DERHEQA VÊ KITÊBÊDA

Hûn vê kitêbê mînanî hemû kitêbên mayîn dikarin ji destpêkê hetanî dawîyê (xilazîyê) bixwînin. Çawa jî hebe, dawîya kitêbê jî matêrîyalên zêde bona wan meriva hene, ên ku wê bixwezin kitêba "*Qencî, yan Xwedê?*" çawa matêrîyala bona hînbûna întêraktîv bidine xebatê. Hûn vê kitêbê dikarin bi xwe, yan jî nava doranên komêda lêkolîn bikin. Ew bona hînbûna şeş hevtîya têra hatîye dîtinê, lê hûn dikarin aza, anegorî mecalên xwe bidine xebatê.

Nava matêrîyalên her hevtêda ev tişt hene:

- Pirsên bona gotûbêjkirina tevî komê, yan jî bona fikirmîşbûna bi xwe.
- Matêrîyalên her hevtêye bona hînbûnê, kîjana hûn dikarin wextê eleqetên tevî Xwedê bidine xebatê.
- *Bifikirin:* xebera xwedêtîyê, dora kîjanê hûn gerekê nava temamîya hevtêda bifikirin.
- *Bidine xebatê:* mecaleke zelal, ya herroje, ku hûn bikaribin çi hîn bûne bidine xebatê.

Her beşeke hevtane pêşîya pirsên wê hevtêye bona gotûbejkirinê hatine kivşkirinê.

Eger hûn vê kitêbê nava doranên dersên "Qencî, yan Xwedê?"-êda dixwînin, wî çaxî em pêşnîyarî we dikin, ku hûn vîdêoya hînbûnêye her hevtê temaşe bikin, yan jî guhdar bikin û bersiva pirsên dawîya kitêbê bidin. Peyî wê yekêra hîvî ji endamên koma xwe bikin, ku ew parên kitêbêye anegor û matêrîyalên lêkolînkirinê hetanî berevbûna mayîn bixwînin. Bona her hevtêkê vîdêoke bona hînbûnê têra hatîye dîtinê.

Ev hemû tişt bo weye.

# PÊŞGOTIN

Van axirîya min tevî rêberekî mesîhîyî qedirbilind bi têlefonê xeberda. Me îdî xatirê xwe ji hev dixwest, wextê ku ewî nişkêva gote min: “Con deqekê bisekine. Ez gerekê tiştekî bêjime te. Nava van 20 salên axirîyêda te gelek kitêb nivîsîne, feqet kitêbek heye, kîjanê tu *gerekê* binivîsî. Eva bona civînê hema nava vî wedeyîda berbirîbûneke pêxembertîyê ye, eva teslîmkirina ji Ezmîne bona te”.

Wextê ku ewî xebera xwe ser hevda anî, ez îdî ji hazirîya Xwedê tirsyayî, li ser çoka bûm. Piştî vê xeberdana bi têlefonê, nava çend hevtîyada li cem min xwestineke mezin bona nivîsara vê kitêbê pêşda hat.

Ev kitêb li ser pirseke zelal hatîye hîmdanînê: “Gelo tenê qencî bese?”.

Nava rojên meda xeberên “qencî” û “Xwedê” tê bêjî bûne sînonîm. Em bawer dikin, wekî ew çi ku bi tomerî hildayî çawa qencî tê hesabê, gerekê anegorî xwestina Xwedê be. Merdanî, şikestîbûn, heqîtî qencîye.

Xwehizî, quretî, bêîsafî nebaşin. Tê texmînkirinê, wekî ev himberîhevkirin gelekî sadeye. Feqet gelo ev hemû tişt awqas zelal e? Eger *qencî* hetanî wê derecê kivşe, dêmek bo çi Îbranî nava 5:14-da me hîn dikin, wekî bona naskirinê pir’cûretî lazim e.

Pawlosê şandî dinivîse: “Û nekevine kirasê bendê vê dinîyayê, lê ser hişê xweda werin, nêt-fikirên we bira nû bin, wekî bizanibin çîye qirara Xwedê, ku qencî xweşî û kamilîye” (Romayî 12:2). Em nikarin ji hev cuda bikin ku bi rastî bona me, bêyî fikirdarî, qencî kîjane. Bêyî guhartin, ya ku bi fikirdarîya me tê, em ew tiştên ecêb tê berdidin-jîyîna bi Xwedêva tijî, kîjanê em dikarin nava Mesîh da bivînin.

Hetanî efrandina vê dinîyayê, bernama Xwedê bona jîyîna me hebû, kîjanêda meremên mîyaserkirî, şabûna bêsînor û razîbûna tam hene. Qirar û bernama Wî bona jîyana we qencî ye. Feqet qencîya feşkirî heye, ya ku dikare îzinê nede ku hûn tiştê Xwedêyî herî baş qebûl bikin.

Mixabin, ji me gelek meriv bi wê feşkirinêva razî bûne. Me, bi nezanî (carna jî bi zanebûn), *Xwedê* înkar kirîye û eşkere berbi meremên *qenc* – hewl daye.

Rêberên civîna ewlin her dem eşaretî derheqa vê xapandinêda didane me (dema ku meriv tê xapandinê, wî çaxî tê kivşê, wekî jîyana me anegorî rastîyêye, lê bi rastî usa nîne). Hema xût Îsa eşaretî dida, wekî nava rojên meda xapandin wê usa bi hostatî veşartî be, wekî rêberên meriva jî dikarin bibine qurbanîyên wê yekê. Gelo em dikarin bi sivikayî nêzîkî van eşaretîya bibin? Gelo em dikarin wan eşaretîya hesab hilnedin û hesab bikin, ku em ji xapandinê jortirin û dikarin qencîyê û xirabîyê ji hev cuda bikin?

Mizgînîya min bona we heye: Xwedê nacêribîne tiştê herî baş veşêre, yê ku Ewî bona we hazir kirîye. Ew perdê navêje li ser çavên me. Ew soz dide, wekî ewên ku digerin, wê bivînin. Eger em xwe pêşkêşî gera rastîyê bikin, emê bi feşkirinê neyêne xapandinê. Pirs eve: gelo emê berê xwe bidine Kanîya rastîyê, yan emê bi zanebûnên hindik, yên derheqa Xwedê û qirara Wî da, razî bin. Ez gumanim, wekî bi xwendina vê kitêbê, hûnê qirarê qebûl bikin, wekî hûnê bi wê yekêva razî nîbin, çi ku ne anegorî tiştê Xwedêyî herî başe.

Werin hetanî destpêkirinê em dua bikin:

*Bavo, bi navê Îsa, çavên min, guh û dilê min veke bona ku ez qirara Te, ya bona jîyana min, bivînim, bibhêm û fem bikim. Ruhê Pîroz, dema xwendina vê berbirîbûnê, min hînî kûrayên rêyên* Îsa Mesîh bike. Ez ji Te, ji Dersdarê Xwe, hîvîyême. Wextê xwendina her cumleke vê kitêbê, min ra xeberde. Bila jîyana min heta-h*etayê bê guhartinê. Amîn.*

1

# QENCÎ ÇI YE?

"Tu kes qenc nîne, Tenê Xwedê qence".
— Marqos 10:8

Li ezmîn hemû tişt bi wê astê qence,
bi kîjanê ew anegorî tebyeta Xwedê ye
û xirabe bi wê astê, bi kîjanê ew naqewime.
— Ê. Û. Tozêr

Qenc û xirab: em hemû jî firqîya van herdua zanin, ne usa ye? Ne axir her merivek bi zanebûna derheqa qencîyê û xirabîyêda tê dinyayê?

Min gelek cara bihîstîye, wekî meriv ji dayîkbûna xweda destpêkirî qence, lê gelo ew yek raste? Fîlmên ku dilên me germ dikin, fîlmên dokûmêntal û progiramên têlêvîzîonê yên mayîn derheqa qencîya mêrivda didine kivşê. Ez hela hê derheqa tu serpêhatîkê, romanekê yan fîlmeke eyanda nizanim, kîjanêda xirabî ser dikeve.

Em hemû jî bi temaşekirina fîlmava mezin bûne, kîjanada merivên baş dijwarîyên mezin alt dikin. Ew meriv nava qewilên neheqda bûn û ew gerekê binketana, hetanî dawîya serpêhatîyê jî. Feqet ew meriv ser dikevin û heqîtî îzbat dibe. Me wî çaxî zanibû, wekî fîlm gerekê wî cûreyî xilaz bibe û me destên xwe li hev dixistin. Me dixwest, ku alîyê qenc her dem serkeve, çimkî Xwedê alîyê qencîyêye.

Nava salên dawîda prodyûsêrên têlêvîzyonê û hevaltîyên têlêvîzîonê destpê kirin fikirên nû pêşda bikişînin. Wana şoûên rêal raberî civakê kirin, kîjanada jîyan tê guhartinê.

Hemû tişt wî çaxî destpê bû, wextê ku destpê kirin malên malbetên feqîr çê bikin. Em ji têlêvîzyonê dûr nediketin. Û em bi kirinên

xêrkira, bi merdanîya hindava feqîra û kesîba hijmekar diman. Em hîvîyê bûn, ku emê ecêbmayîna tevbûyên projeyê bivînin û kela me tijî dibû, wextê ku didane kivşê, ku ew “feqîrana” cara ewlin mala xweye çêkirî didîtin.

Tevbûyên proêktên wî cûreyî alî wan meriva dikirin, ku ew kaşa xwe, giranîya xweye fîzîkî kêm bikin. Peyî wê yekêra progiramên cûre-cûre derketine holê.

Zûtirekê merivên eyan jî gihîştine vê fikirê. Artîstên eyan mecal dane wana, yên ku nikaribûn stiran yan reqasa xwe raber bikirana. Me bi şabûn dinihêrî ku çawa tevbûyekî neeyan nava şevekêda mecala bûyîna merivê eyan distend.

Her progirameke ku dida kivşê ku meriv çawa xêrkirinêva mijûl dibûn, piştgirîya meriva dikirin, ku ew bibine merivên eyan.

Nava cêrga van progiramada usa jî ya derheqa xebatkarên polîsîyaêda hebû, kîjana xirabkar digirtin. Ev program jî kete nava navnîşa wan progirama.

Çawa tomerîkirin, ez bêjim, me we’dê xwe li ser qencîya mêriv dida merkezkirinê.

Kitêba bi sernavê “101 mesele derheqa kir’înê û bazarkirinêda” meriva hîn dike, wekî her eşîyayek gerekê şikilê baş bihêle, rengê wî başbe û dengê baş hebe, yan jî bîna wî xweşbe, bona ku bazarêda bela bibe. Ew gerekê hukumî li ser bikirçîya bike. Em zanin, wekî eşîyayên baş tên frotanê. Bi rastî, kê wê bixweze eşîyayê xirab bikir’e? Ez nizanim, ku ewê merivên çi cûreyîbin.

Em gotinên vî cûreyî dibihên: “Ew merivekî başe”, yan jî: “Ew kulfeteke başe”, û gelek cara em bawerîya xwe wê yekê tînin. Gelek meriv hişyarbûna xwe carekêra didine sistkirinê û her gotinekê qebûl dikin, ya ku derheqa wê yekêdane ku çi cûreyî merivekî çawa merivê “qenc” hesab dikin. Feqet gelo ew qîmetkirin her dem rastin?

Gelo dikare usa bibe, wekî em bikevine nava xapandinê û wê yekê “şaş” hesab bikin, çi ku raste û şaşîyê jî çawa tiştê “rast” hesab bikin? Kî dikare zelal evê firqîyê bide kivşê? Bêyî şikberî emê bi xwe tu cara neyêne xapandinê û usa bikin, ku qencîyê çawa xirabî, lê xirabîyê jî çawa qencî nav bikin, ne usaye?

Derheqa vê yekêda bifikirin: çend sedsal pêşda dewlemendekî cahilî dewletî nêzîkî Îsa Mesîh bû. Ew merivekî bêqelp û bi moralî paqij bû. Ewî tu cara zinêkarî nekiribû, nekuştibû, derew nekiribûn, dizî nekiribû û nava karên xweda jî tu kes nexapandibû. Ew her dem bi qedir nêzîkî dê û bavê xwe bibû. Ew welatîkî berbiçav bû û bona geleka çawa hijmekarî bû. Ew bi rûmet nêzîkî Îsa bû, çawa "Serwêrê Qencîyê", û silav da Wî.

Rêberek tevî rêberekî mayîn xeber dida: merivekî qenc berbirî merivekî mayînî qenc dibû: bi vî cûreyî xortê dewletî tevî Dersdarê kivş tomerîbûn digerîyan, ew bi xwe Ew nas nedikir. Diqewime ew dilê xweda difikirî: "*Eger ez vî Pêxemberîra lefekîya bikim, derheqa qencîya Wîda xeberdim, ew yekê* Wî bîne li ser wê fikirê, ku *ew cabeke qenc bide pirsa min*". Lê belê, pêşîya pirsa wî Îsa gotina wîra qayîl nebû: "Bona çi tu Minra qenc dibêjî? Tu kes qenc nîne, lê tenê Xwedê qence" (Marqos 10:18).

Bona çi Îsa gotina vî merivî rast kir, yê ku Ew çawa Yê qenc nav kir? Gelo Îsa qenc nîne? Raste, Ew qence. Eger usaye, bona çi ewî usa got? Diqewime, ku cahilê dewletî derheqa wê "qencîyêda" xeber dida, ya ku li ser normên şaş hatibû hîmdanînê? Bi gilîkî mayîn gotî, diqewime norma vî merivîye derheqa qencîyêda ji ya Xwedê cuda dibû?

Eger hûn, yan jî ez, dewsa wî merivî bûna, meyê cabeke çawa bistenda, wextê ku me Îsa çawa "Serwêrê qenc" nav bikira? Ez dikarim bêjim ku Îsayê çi bigota min. Çawa merivê ku bi sala lawê Xwedêye, yê ku K'itêba Pîroz gelek cara xwendîye, bi seheta Kitêba Pîroz lêkolîn kirîye, her roj dua kirîye û nava qulixêda bûye û çend kitêbên mesîhîtîyêye eyan nivîsîne, minê jî cabeke wî cûreyî bistenda, çawa ku ewî dewlemendê cahil stend. Hema wî cûreyî jî Îsayê bigota: "Con, bona çi tu Min qenc nav dikî?". Ez çawa vê yekê zanim? Gilî derheqa wê yekêdane, wekî Ruhê Xwedê hema ew ders daye min, çi ku Îsa da wî merivî.

## Behsên sênsasîyon

Îzinê bidin şirove bikim ku fikira min çiye. Dawîya salên 1990-î, bona terîfkirina li civînekê, ez çûme Swêdê. Firîna min temamîya şevê kişand û teyare şebeqê zû gihîşte Stokholmê. Wextê ku ez ji teyarê

peya bûm, min bagaja xwe hilda û ez derbazî li cihê kontrola gumirkê bûm û li wir kê ku ez teglîf kiribûm, bi slaveke germva nêzîkî min bû. Hetanî derketina ji firegehê ewî qewimandinek minra gilî kir, ya ku wê bibûya behsa hema wê salê, yan jî temamîya dehsalîyêye sereke.

– Con, şeva derbazbûyî, wextê ku tu dihatî vira, tiştek qewimîye,– ewî got,– diqewime tu derheqa wê yekêda haj pê tuneyî. Ezê tera gilî bikim.

– Çi qewimîye?,– min bi cûrê xemgînbûyî jê pirsî.

Ewî gilî kir, wekî çend sehet pêşda avtomobîl li hev qelibîne û rûyê wê yekêda meriv hatine kuştinê, ji kîjan meriva yek jî li dinyayê gelekî naskirî û hizkirî bû. Ew çi ku ewê jinê dikir, dikete nava merkeza guhdarîya prêssayê. Jina min-Lîza û ez, em bi hijmekarî nêzîkî şuxulkarîya wêye hûmanîtarî dibûn û me bi hewaskarî miqalên derheqa wêda nava kovar û rojnamada dixwendin. Eger diha zelal bêjim, ezê bêjim, wekî min tenê miqale nedixwendin, lê min şikilên derheqa jîyana wêda hiz dikir binihêrîya. Meriv dikare bêje, wekî min dîna xwe dida hemû gavên wê. Her car, wextê ku bi têlêvîzyonê derheqa wêda diaxivîn, min hemû îşên xwe dihiştin û guhdarî dikir.

Ez ketime nava şokê, wextê ku min behsa derheqa mirina ewê jinêda bihîst. Ew dayîka zarokên biçûk bû. Bi wê yekêva tevayî, ew usa jî şuxulkara dewletêye aktîv bû. Ew him aqil bû û him jî bedew bû. Ewê hukumê xweye li hemdinyayê dida xebatê, ku bernamên hûmanîtarî (merivhizîyê) li wan welata, li kîderê şer bûn, mîyaser bike, alî binelîyên zyanêketî û zarokên sêwî bike. Hema tenê ew yek jî bes bû ku dilê min bona wê yekê bişewite, feqet alîyê wêye baş diha zêde bûn. Ewê piştgirên xwe hiz dikirin û her dem ew silav dikirin.

Behsa mirina wê ez tevîhev kirim. Ew yek tiştê bawerkirinê nîbû. Gelo ew çawa dikaribû nişêkva wefat bûya? Gelo ew yek çawa dikaribû biqewimîya?

Merivê kö ez bi mêvandarî qebûl kiribûm, min gîhande hotêlê (mêvanxanê). Tiştê herî ewlin ku min kir, wextê ku ez ketime oda xwe, şuxulandina têlêvîzyonê bû. Bi hemû kanalên têlêvîzyonê derheqa wê qewimandinêda xeber didan. Min piranîya wê behsê fem nedikir, çimkî ew bi zimanê swêdî bû û min destpê kir kanalên têlêvîzîonê li ser hev biguhêrim. Min kanalên “Sî- Ên -Ên” û “Bî-Bî-Sî”

dîtin. Min qet çentên xwe jî venekirin, ez rûniştime li ser nivînên xwe û min temaşe dikir. Ew yek tiştê bawerkirinê nîbû, çi ku qewimîbû.

Weşana têlêvîzîonêda didane kivşê, wekî bi hezara meriv li ber mala wê jinê şîna wê dikirin. Kamêrayên têlêvîzîona didane kivşê ku çawa mervên çûk û mezin digirîyan, li ber dergê mala wê kulîlk diatanîn. Ew meriv digirîyan, yan jî kombûyî dua dikirin. Temamîya dinyayê (cîhanê) navhev ketibû.

Nava çar rojên mayînda hemû rojnamên dinîyayê derheqa vê tragêdyayêda dinivîsîn. Temamîya prêssayê derheqa wê qewimandinê, lêpirsîna wê tragêdîyayê, malbeta wê jinê û definkirina wêda xeber dida. Serokên welata, rêberên hemdinyayê, usa jî bi seda artîstên dinêeyan û dengbêj tevî wê definkirinê bûn, ya ku nava dîroka têlêvîzîonêda bû qewimandineke eyan.

Ewê roja ewlin ez li Stokholmê li oda xweye li hotêlê ber xwe diketim, wekî min nikaribû hazirîya xweye bona berevbûna êvarê bivînim. Fikira min bi pirsava mijûl bû. Min dicêriband wê hêrsê alt bikim, ya ku wî çaxî pêşda dihat, wextê ku ez derheqa menîyên wê qewimandinêda difikirîm. Bi wê yekêva tevayî min texmîn dikir, wekî fikireke mayîn jî dicêriband guhdarîya min bikişîne ser xwe.

Min dicêriband kö ez ji wê fikirê azabim, lê cedandinên min badîhewa bûn. Dawîyê, piştî çend seh'eta min li rex nivînên xwe çok da û dua kir: "Bavo, ez rûyê mirina wê jinêda xemgînim, feqet dilê minda tiştekî usa heye ku tê bêjî tiştek şaşe. Gelo ev çi diqewime?".

Min kûraya dilê xweda nişkêva bihîst: "Para 18-a, ya kitêba Eyantî bixwîne". Nedihate bîra min, ku para kitêba Eyantî ya 18-ada çi nivîsîbû, çimkî telebextra, wî çaxî min ew kitêb bi kûrayî lêk'olîn nekiribû. Min Kitêba Pîroz vekir û destpêkir bixwînim. Dilê min lez lêdixist, wextê ku ez gihîştime gotina hevta: "Çiqwas rûmeta xwe bilind kirîye û bi kêfa dilê xwe derbaz kirîye, awqasî cefa-şînê serda bînin, çimkî dilê xweda wa dibêje:

> "Ez çawa padişa rûniştîme û ne jinebîme, tu car ezê şînê nebînim". Lema jî nava rojekêda wê belayên wê ser wêda bên: nexwaşîya hal, şîn û xelayî û wê bibe xurê êgir. Çimkî ew Xudan, Xwedêyê qewate ye, yê ku dîwana wê dike. Padişên dinyayê, yên ku pêra qavî û kêf kirine, gava dûyê şewata wê bibînin, wê bigrîn û ser wê şînê bikin" (Eyantî 18:7-9).

Piştî xwendina van gotina, ez tevîhev bûm. Derheqa evê jina ku van gotinada hatîye nivîsarê û usa jî ev jina ku hatibû kuştinê, tê bêjî nava behsên têlêvîzîonêda himberîhevkirin hebûn. Tê bêjî aveke sar ser serê minda kirin. Ez tevîhev bibûm. Gelo van gotina meriv çawa dikare derheqa vê jinêda bêje, ya ku xêrkireke eyan bû?

Ew yek girînge, ku bidine kivşê, wekî nava van gotinada Yûhennayê şandî derheqa merivekîda nenivîsîbû. Ev para (beşa) gotina derheqa merivekîda dibêje, yê ku evê dinîya undabûyîda belabûyîye. Çi jî hebe, lê nava van gotinada dîsa hinek tişt hene, yên ku mînanî vê qewimandinê bûn û Ruhê Xwedê ew yek da xebatê bona ku nava fikirdarîya minda werguhastin çêbe. Gelo tevî we tiştekî usa qewimîye, wekî Xwedê wera xeberde û bi pareke gotinên kitêba Pîroz mesela bîne û bi wê yekê qewimandinên emirê weva bide girêdanê? Nava emirê minda ew yek qewimî.

Ruhê Xwedê ew yek da kivşê, ku min *qencî* wî cûreyî çawa fem dikir, çawa ku Îsa hindava ewî rêberê cahilî dewletîda kir. Bi femkirina wê yekê, ku Xwedê bona min çi eyan dikir, min bi dengê bilind li oda xweye li hotêlê got:

– Xudan, gelo ev gotin wê jinêva girêdayîye? Ew gelek bernamên hûmanîtarî, merivhizîyê li wan welata mîyaser dike, alî zyankêşa û zarokên sêwî dike, û...

“Ewê eşkere qedirnegirtina hindava serwêrtîya malbeta xwe û usa jî qavîya xweye hindava temamîya dinîyayê dida kivşê,– Xudan got.– Ew gura Minda nîbû”.

Min bawerîya xwe wê yekê neanî, çi ku min bihîst û ez careke mayîn dijî (miqabilî) wan gotina derketim:

– Feqet ewê gelek xêr bona temamîya merivatîyê kirine.

Min guhdarîya Ruhê Xwedê kir: “Kurê min, li Hêwayê jî alîyê ulmê dara qencî û xirabyêye xirab xweş nehat, lê alîyê qenc...”.

Ez cîyê xweda qerimîm, wextê ew gotin min dilê xweda bihîstin. Piştî çend deqîqa min para sisîya, ya kitêba “Destpêbûn”-ê vekir, ku ez wê yekê îzbat bikim, çi ku min bihîst. Min ew xwend:

> “Û kulfetê dîna xwe dayê, wekî berê darê baş bû bona xwerinê, berbiçave, hewaskar û dilhavijî bû bona zanebûnê, dest avîte berê wê, qetand û xwer” (Destpêbûn 3:6).

Wextê ku min xeberên “baş”, “hewaskar” û “dilhavêj” dîtin, ez zendegirtî mam. Min dengê Ruhê Xwedê bihîst: “Heye qencî, ya ku ji Min nîne. Ew gura Minda nîne”.

Ez rûniştim û derheqa wê yekêda fikirîm, çi ku min bihîst û xwend. Gotina Xwedê şaşîya min eşkere kir û ez dame rastkirinê. Tiştekî eyan bû, wekî norma mine qencîyê ji norma qencîya xwedêtîyê cuda dibû.

Xwedê dîsa xeberdana xwe, ya dilê minra, berdewam kir. Ewî da kivşê, wekî piranîya merivên “qenc” û bi taybetî mesîhî bi organên başqe, bi stirana hewaskar nînin, xeberên kîjanaye başqe hene, lê bi wan tiştava hewaskarin, kîjan cinparastîyê bela dikin, bi kuştinên meriva, dizîyê û talanêva û tiştên mayîne xirabva. Ji wana gelek hatine xapandinê, bi wan tiştava hijmekarin, yên ku ber çavê meriva rastyê, qencyê û aqilmendîyê didine kivşê. Feqet ew tişt dijî (miqabilî) aqilmendîya Wîne. Nivîsare:

> “Heye rê, ya ku li ber mêriv raste, lê dawîya wê, rêyên mirinêne (yan jî rîya mirinêye)” (Gotinên Silêman 14:12).

Werin em pêşda derbazî para gotinêye duda bibin: “lê dawîya wê rîya mirinêye”. Gelek mesîhî guhdarîyê nadine ser vê yekê, çimkî ew difikirin: “Ez xilazbûyîme, ez diçime Ezmîn û ezê mirinê nevînim”. Bi fikira wan ev gotin bona bêbaweraye. Çi jî hebe, werin em ji nûva binihêrin ku fikira Xwedêye nava vê gotinêda çiye.

Dîna xwe bidine gotina “rîya mirinê”. Kitêba Pîroz tenê carek nîne ku derheqa rîya emir û rîya mirinêda dibêje. Xwedê elamî yên Xwe dike: “Xudan wa dibêje: “Awa Ez rîya emir û ya mirinê didime pêşîya we”” (Yêrêmîya 21:8).

Xebera “rê” nava vê gotinêda wê aqilmendîyê dide kivşê, bi kîjanê em dijîn. Evê xeberê em gelek cara kitêba Pîrozda dibînin. Îsa vê yekê vî cûreyî şirove dike:” Derê tengra bikevine hundur, çimkî firehye ew derî û bere ew rîya ku dibe berbi undabûnê û gelekin ewên ku wêda diçin. Lê gelekî tenge ew derî û zehmete ew rîya ku dibe berbi jîyînê û hindikin ewên ku wê rêyê dibînin” (Metta 7:13,14). Lê gelo nava vê parêda Îsa tenê derheqa heta-hetayêda xeber dide?

Xwedê dara jîyînê li merkeza baxçê Êdênda danî. Ew sembola rîya jîyîna Xwedê bû, aqilmendîya Wî bû. Li merkeza baxçe dara mayîn

çawa dara ulmê qencîyê û xirabîyê dihate navkirinê. Ev dar sîmvola rîya mirinê, yan jî aqilmendîya merivatîyê bû, lê bêyî Xwedê. Xwerina berê vê darê tenê hukumî li ser jîyîna Adem û Hêwayê nekir. Wana carekêra ew hukum dîtin. Pêşîya wê gavavîtina bêfikir, ew nava hemû îşada açix bûn, çi ku dilê wanda hebû. Lê çi jî hebe, wextê ku wana berê dara qedexekirî xwerin, jîyan cetin (dijwar) bû. Nexweşî, kêmasî, xebata giran dijwarîyên usa pêşda hatin, derheqa kîjanada wana nizanibû. Wana pêyî li ser rîya mirinê kiribûn.

Çi jî hebe, Xwedê Xilazkire. Ewî îdî program kiribû, ku wê hemû tiştên ku mêriv unda kiribûn, wê paşda vegeranda. Ewî qirar kir, ku rîya jîyînê bide dasekinandinê. Aqilmendîya wî wê careke mayîn xweşbextî, jîyîna xweş, aşîtî, bereket û tiştên mayîne baş bida meriva:

> “Xwezîya min wî merivî, yê ku aqilmendî dîtîye... tiştên ku te xwestine, ne layîqî wîne. Destê wîyî rastêda dirêjaya roja heye, lê destê çepêda hebûn û rûmete. Rêyên wî başin û edilin. Ew dara jîyînêye bona wana, yên ku ketine wê rê û ewên ku wê hişk bigrin, wê bextewarbin” (Gotinên Silêman 3:13-18).

Kitêba Pîroz dide kivşê, wekî bi xebitandina aqilmendîya Xwedê, emê gelek tiştên baş-bereketê, kardarîyê, açixîyê, emirê dirêj, edilaya hundur û qedir bistînin. Dar tiştekî usaye, ji çi meriv tam dikin. Anegorî vê gotinê, eger em bi rîya jîyîna (aqilmendîyê) herin, emê bibine dara jîyînê, kanîya têrkirina wan meriva, yên ku tama feydayên me dikin. Wekî mayîn jî raste. Eger em bi aqilmendîya merivatîyê bijîn, emê bibine dara xirabkirinê û ewên ku tama feydayên we bikin, wê berbi xebata giran, bêkardarîyê, nexweşîyê, xwehizîyê û mirina ruhanî herin.

Em niha paşda vegerine li ser gotina Gotinên Silêman 14:12. Em dixwînin: “Heye rê, ku li ber mêriv raste (yan jî li ber çavê mêriv raste), lê dawîya wê, rêyên mirinêne. Femdarîye, wekî para vê gotinêye ewlin dikare derheqa her merivekî mesîhî, yan jî bêbaweradabe. Heye rê ku li ber çavê mêriv rast tê kivşê. Ew rê tê bêjî ya rehmê, aqilmendîyê, kardarîyê, stratêgîyê, qebûlkirinê û tiştên mayîne başe. Lê çawa jî hebe, me eşaretîya zelal stendîye. Ew tiştê ku dikare li ber çavê mêriv çawa yê qenc bê kivşê, dikare rîya xirabkirinê, zyandayînê û bêfeydabe, dikare bibe rîya mirinê.

Xudanê kaxeza îbranîya xebera xweye bona bawermenda dinivîse:

> "...bona vê yekê gelek tiştên meye gotinê hene, lê şirovekirina van zehmete, çimkî guhada hûn giran bûne. Rastîyê keve heta niha gerekê hûn dersdar bûna, lê hûn hê hewcene, ku ji gotinên Xwedê dersên pêşine sade hînbin. Hûn hela hê hewcê şîrin, lê ne ku xwerina girannin. Lê xwerina giran bona merivên gihîştîye, yên ku *sewdayê* xweda *ketî- rabûyîne*, *qencî û xirabîyê ji hev derdixin*" (Îbranî 5:11,12,14).

Tiştekî ber çavaye, wekî jihevderxistin faktora serekeye, bi kîjanê gerekê qirar bikin, ku bi rastî kîjane qencî û kîjane xirabî. Bi gilîkî mayîn gotî, çi ku bi rastî qence, her dem nîne ku bona fikira me zelale.

Hûn dikarin bipirsin: "Gelo xudanê keg'eza îbranîya negot, ku sewdayên me dikarin bona jihevderxistinê bên hînkirinê?". Belê, ewî usa jî got, wekî ew derheqa kîjan sewdayada xeber dide. Hûn dikarin bivînin, wekî destpêka vê parêda xudanê nivîsarê dibêje, wekî ew vê nivîsarê bona wan mesîhîya dinivîse, yên ku guhada giran bûne. Feqet gilî derheqa kîjanadane? Gelo hemû bawermendên îbranî hewcê guhdarkirinê bûn, çimkî guhada giran bibûn? Çetin. Ewî derheqa karebûna guhdarkirina bi dilda xeber dida. Îsa her dem hîn dikir: "Guhê kê bona guhdarkirinê heye, bila guhdar bike" (Metta 11:15). Em dikarin bêjin, wekî merivên ku wextê vê dersê hazir bûn, guhên hemûya jî hebûn, lê ne hemû meriv bûn, ku dilê wanî jihevderxistinê hebû, ku gotina Xwedê guhdar bikirana, kîjan bona wana tiştên herî baş bû.

Hinekî dereng emê bi kûrayî jihevderxistina ruhanî gotûbêj bikin. Çi jî hebe, em dikarin niha bên ser fikira girîng. Berê ewlin jihevderxistina qencîyê û xirabîyê nikarin rast bikin. Hetanî wê rasthatina tevî Xwedê, ya li hotêla Stokholmê, min bawer dikir, wekî qencî û xirabî bona me hemûya zelale. Feqet, çawa jî hebe, ezê meselekê jî bîr bînim. Endamekî sereke, yê koma Îsa-Petrûs derheqa parastin û jîyîna Îsaye dirêjda xeberda. Çi ku ewî digot, tê bêjî şêwireke baş bû. Feqet Îsa berk dijî wê yekê derket û got, wekî berjewandîyên wî ne yên Xwedê bûn (binihêre Metta 16:21-23). Xêncî vê yekê kitêba Pîrozda gelek mesele hene, bi kîjana ez dikarim bidime kivşê, wekî qencî û xirabî zelal û kivş nînin.

Silêman dua kir: bide min dilê bi îman, ku ez bikaribim bizanibim, ku firqîya rastîyê û şaşîyê kîjane" (Padişatî 3:9, NLT). Dilê mêriv gerekê ronahîkirî û hînkirîbe, ku wî hemû tiştî ji hev derxe, çi ku Xwedê çawa *qencî*, yan *xirabî* nav dike. Hêwa bi hemû tiştîva baş bû. Li wî baxçeyî, li kîderê ew dima, hazirîya Xwedêye mezin û hukumdar hebû. Feqet ew tiştê ku li ber çavê wê çawa tiştê baş û dilhavêjî hate kivşê, bi rastî bona wê xirab bûn. Ew hate xapandinê û layîqî feydayên xirab bû.

Meremê vê kitêbê ewe, ku bi rîya Gotina Xwedê û alîkarîya Ruhê Pîroz bidine ronahîkirinê, dêmek firqîya di navbera xêrkir û xirabkarda bidine kivşê. Eger Hêwa nava cîhekî bêkêmasîda dima û dikaribû bihata xapandinê, bi awqasî hêsa nava vê dinîya heramkirîda em jî dikarin ji rastîyê dûrkevin, wan tişta hesab bikin çawa qencî, kîjan dikarin bona me yên xirab bin.

2

# EW YEK ÇAWA QEWIMÎ?

“Nexapin, xwîşk û birayên mine delal.
Ew her tiştên ku qenc û kamile, pêşkêşe,
ya ku ji jor, ji Xwedê-ji Bav tê...”
— Aqûb 1:16,17, NLT

(Mesîhî) nafikire, wekî Xwedê me hiz dike,
çimkî em qencin,
lê wekî Xwedê wê me bike qenc,
çimkî Ew me hiz dike...
— K. S. Lyûîs

Ewê rojê ez li Şvêdyayê, li oda xweye li hotêlê, navhevketî bûm. Xwedê caba ewê berxweketina min da, menîya kîjanê mirina ewê jina eyan bû. Ez tirsyayî bûm, lê bi wê yekêva tevayî xemgîn bûm. Ez tevîhev bibûm û gelek pirsên min hebûn. Bi sala ser hev ez nava qulixêda bûm, min kitêb nivîsîbûn û xêncî Antarktîkayê li hemû parçên dinîyaê min bawermend hîn kiribûn. Lê hinekî pêşda nezanebûna mine derheqa wê yekêda eşkere bû, ku bi rastî qencî kîjane.

Pirsên sereke, ku fikira minda navhev ketibûn, ev bûn: “*Gelo min dîsa çi tişt çawa yên qenc hesab kirine, k*îjan bona Xwedê qenc nînin?” û dîsa pirseke serekeye mayîn: “*Gelo feydayên wana bona min çawa bûne*?”.

Hetanî xeberdana derheqa van pirsada hêjaye paşda vegerine li wir, ji kîderê ev hemû tişt destpê bûn- li bag’çê Êdênê. Eva tiştekî

nêzîkî aqilaye, çimkî Ruhê Pîroz ev mesele da xebatê, ku ez oda xweye li hotêlê guhdarîyê bidime ser wê yekê. Pirseke derheqa qewimandina li baxçe heye, ya ku bi sala ser hev rihetî nedaye min û dîsa gelek meriva. Gilî derheqa wê yekêdane, ku çawa mer karibû Hêwayê dijî (miqabilî) Xwedê bibe.

Werin em vê pirsê bi hûrgilî lê binihêrin. Hêwa nava dor û berên kamilda dima. Tu kesî ew bêhurmet nekiribû. Ew nava edilayêda dima. Bereketa wêye nava hemû tiştîda hebû, nava jîyîna wêda ne nexweşî ne jî kêmasî hebû. Tiştê herî sereke ew bû, wekî jîyîna wê anegorî xwestina Efrandarê wê bû. Hazirîya Xwedê nava atmosifêra dinîyayêda bela dibû. Ew gelek cara nava baxçeda tevî Adem û Hêwayê digerîya. Dêmek mer çawa karibû jin û mêr dijî (miqabilî) Xwedê bibe.

Eger em caba vê pirsê bivînin, emê fem bikin, ku roja îroyîn dijmin çawa dikare wê yekê bike. Eger em stratêgîya wî bizanibin, wî çaxî emê usa hêsa nebine qurbanîyên wê xapandinê û emê gura Efrandar da bin.

## Baxçê bedew

Berî her tiştî Xwedê dinîya çêkir. Wî çaxî ew gelekî bedew û bêyî kêmasîya bû, bi tijîbûna hemû tiştî. Xwedê tenê çend cûre heywan, dar û tebyet çênekirin. Wî nêzîkî mîlîonek cûre heywan, nêzîkî 250-î hezar cûre şînayî, ji sed hezarî zêdetir cûrên dara û gelek cûre kevir, ax û rêsûrsên tebyetê çêkirin. Dinîya gelekî baş bû. Îdî bi hezara sal derbaz bûne, lê ulmdar hela hê wê yekê lêkolîn dikin. Ew hela hê derheqa dinîya meda tam nizanin û diqewime tu cara jî nizanibin.

Xwedê ev hemû tişt tenê bona tiştê Xweyî hizkirî- mêriv çê kir. Nenihêrî wê yekê, wekî li ser dinîyayê hemû tişt wî cûreyî bû, Efrandar bi wê yekêva nehate sînorkirinê û hê pêşda çû. Ewî bi Xwe li ser dinîyaê nikand, lê ne ku baxçê bedew çêkir.

Ez şikilên tebyetê û baxça hiz dikim. Bi zelal, bêqelp gotî, ez li ser wana hiz nakim bixebitim. Derheqa wê yekêda hûn dikarin ji kevanîya min- Lîzayê bipirsin. Wî çaxî ewê çavên xwe fireh bike, wextê ku gilîke, ku ez çi cûreyî nêzîkî şuxulê nava baxçeda dibim. Ez tenê hiz

dikim nava baxçeda rûnîm, yan jî bigerim. Ez bi rengên cûre- cûre, bi bîna dor û bera û dar û şînayên cûre-cûreva hijmekar dibim.

Van axirîya, min li bajarê Almanîyaêyî Konstansê terîf dikir, navê kîjanî navê gola nêzîkî wî bajarî bû. Gola Konstansê li Almanîyayê ya here mezine. Berfa çîyayên Alpê dihele û dikeve wê golê. Ez û Lîza çûbûne li cem hevalên xweye nêzîk-serwêr Frêymût û jina wî-Yoannayê.

Nava wî wedeyîda çend rojên meye aza hebûn û bo wê yekê jî hevalên me pêşniyar kirin, ku çend tiştên hizkirîva mijûl bibin, bona ku wedê me unda nebe. Em pê hesîyan, wekî li Konstansê gelek tiştên mijûlbûnê hene, lê çi ku wana pêşniyar kir, nava wanda ew tişt tunebû, çi ku min dixwest.

Li ser gola Konstansê cîyek heye, kîjanî çawa ada Kulîlka nav dikin. Navê wê adê bi rastî Maynaûye, lê navê ada Kulîlka diha baş tîne ber çava, çimkî temamîya adê çawa baxçekî mezine. Min dixwest, ku li wir bigerîyama, lê wî çaxî gerekê em ji şebeqê hetanî êvarê wir bûna, bona ku me bikaribûya hemû tişt bidîta.

Pêşda Lîza, Yoana û Frêymût difikirîn ku ez heneka dikim, wextê ku min hîvî ji wan kir, ku em herine wê adê. Bi kutasî, kî wê bianîya ber çava, wekî merivê ku sportê hiz dike, dikaribû tiştekî wî cûreyî bigota? Wextê ku min çend cara derheqa wê yekêda got, hevalên min bersiva (caba) min wa dan:

– Em difikirîn, wekî te bi dilê xwe derheqa wê yekêda nedigot. Tu bi rastî dixwezî herî wir?

– Belê,– min got.

– Bi vî cûreyî me bernama (progirama) êkskûrsîya xwe çêkir, nenihêrî wê yekê, wekî xêncî min tu kes bi wê yekêva usa şa nedibû.

Ew rojeke gelekî kivş bû. Em bi avtomaşînê çûne adê. Pira li ser çêmr’a derbaz dibû. Me bilêt li ber dergê adê kirîn û me êkskûrsîya xwe destpê kir. Êkskûrsyayê carekêra ez hijmekar hiştim. Ez bi bedewîya ewî baxçê mezin û pircûretîya wî hijmekar mabûm. Tiştê herî baş ew bû, ku ez tenê nîbûm û henekên hersê merivên tevî min, usa jî kenê wan sekinî, wextê ku me destpê kir wan dor-berên bedew binihêrin.

Li wî baxçê mezinda hemû tişt lezet dida çavên mêriv. Hemû tişt, cêrgên kulîlkaye raste-rast usa bûn, wekî her şînayîk dihate kivşê. Li

wir xerîtên ji kulîlka çêkirî hebûn, ji dara, şînayê û kulîlka heykelên heywana, zaroka û usa jî mala çêkirîbûn. Tevî van tiştên bedew, usa jî gelek hewzên avê hebûn.

Me hemûya jî ew cîhê bedew begem kirin, bona dîtina kîjanî ji nîv rojî zêdetir lazime. Me tenê nîvê wî dît. Wê rojê ez gelek cara difikirîm: "*Eger merivên sade karibûne baxçekî usa bedew çêkin, binikînin, yê ku bona çava cejina bedewîya rastîye û bi bînên cûre-cûreva tijîye, wî çaxî gelo baxçê Xwedê wê çi cûreyî bûya*?". Baxçê Êdênê ji alîyê pêşekzanada nehatibû çêkirinê, lê hema xût ji alîyê Xudan Efrandarda hatibû çêkirinê.

Xwedê bi rengên dewlemend û bînên cûre- cûreva baxçê Êdênê nikand, Adem anî li wir û hemû heywan anîne li cem wî. Xudan dixwest bidîta, ku Ademê mîlîonek 250-î hezar cûre heywanên li ser dinîyayê wê çawa nav bikirana. Ew meriv gerekê çiqwas aqil bûya? Feqet Adem bêyî tu tiştî karibû nava dayne li ser hemû heywana û navê her yekî bîr bîne. Fikira Adem gelekî baş bû.

Lê çawa jî hebe, Xwedê heywan bona wê yekê neanîbûn cem Adem ku tenê nava dayne ser wan. Wî usa jî dixwest bivîne ku Ademê kîjan heywanî bona xwe çawa heval bibijêre.

Mêriv hemû teyrede û heywan nav kirin, lê ji wana tu yek çawa heval û alîkar nedibû. Wî çaxî Xudan Xwedê xeweke kûr anî ser mêriv û wextê ku ew razayî bû, hestûkî wî derxist û goşt careke mayîn da ser. Ji wî hestûyê kêlekê ewî jin çêkir û anî li cem wî. Bi dîtina wê Adem got:

> "Niha eva hestûyê ji hestûyê mine û goştê ji goştê mine. Navê wê "jine", çimkî ew ji mêr hate hildanê" (Destpêbûn 2:23, TEV).

Jin hevala mêre. Ew hev didine temamkirinê. Wana tevayî xebat stend, ku topa dinîyayê xweyî bikin û biparêzin, bi taybetî baxçe.

Hetanî wî çaxî, wextê ku Hêwa ji Adem hate derxistinê, Xwedê temî dabû wî: "Ji her darên baxçeda dilê te dikişîne kîjanê bixwe, lê ji dara naskirina qencîyê û xirabîyê nexwe, çimkî wê roja gava tu ji wê bixwî, tê hema wê rojê jî bimirî (Destpêbûn 2:16,17, TEV).

Em nizanin ku serpêhahatî beşa (para) mayînda kengê qewimî. Ew yek dikaribû piştî çend hevtîya, yan jî sala, yan jî dehsalîya

biqewimîya. Feqet ew roj hat, wextê ku heywanê herî fêlbaz- mer, Hêwa kire nîşangeh û dijî (miqabilî) temîya Xwedê derket.

(Mer çawa dikaribû xeber bida? Ez bi xwe bawer dikim, wekî hetanî ketina mêriv, heywan dikaribûn mêrivra xeberdana. Ev e menî, ku bona çi Hêwa fesal nîbû, yan jî xemgîn nîbû, wextê ku mer nêzîkî wê bû. Ulmê derheqa wê yekêda, wekî heywan dikarin xeberdin, gerekê ji nisiletekê derbazî nisileteke mayîn bûya, çimkî wextê ku kerê Bilam nava Jimar 22:21-35-da xeberda, Bilam jî zendegirtî nema. Ewî xeberdana tevî heywanê xweyî barber, bêyî ecêbmaînê, berdewam kir).

## Ewî ew yek çawa kir?

Îzinê bidin, ku ez careke mayîn biwekilîm, ku bona çi em qewimandina li Baxçê Êdênê lêkolîn dikin. Meremê me ewe, ku em fem bikin, wekî çawa merê bin kontrola cinda karibû Hêwayê bîne li ser wê rê, ku ew dijî (miqabilî) Xwedê derkeve. Werin em binihêrin, ku ew çawa nêzîkî Hêwayê bû:

> "Ewî gote jinê: "Bi rastî Xwedê gotîye, wekî ji hemû darên baxçe gerekê nexun?"" (Destpêbûn 3:1).

Bi vê pirsê mer gava xweye stratêgîye ewlin avît. Meremê wî ew bû, ku Hêwayê ji aqilmendîya xwedêtîyê dûrxe. Pirsa wîye bi fêlbazî jin xapand û nava demeke kurtda ji ber çavê wê darên mêwaye mayîn da dûrxistinê, ji kîjana ewê dikaribû bixwera û guhdarîya wê da ser dara qedexekirîye tek-tenê.

Xwedê gotibû Adem û Hêwayê: "Hûn dikarin ji her dareke baxçe bixun, xêncî...". Merdanîya wî hema ev yek dida kivşê: "Hûn dikarin ji her darekê bixun". Li dinîyaê bi hezara darên mêwaye eyan hene û ez difikirim, wekî li baxçe jî ji wan dara hebûn. Feqet mer fêlbaz bû. Hêwayê dikaribû ji hezara dara bixwera, lê piştî pirsa mîrêcine navhevxistî ewê nikaribû dîna xwe neda wê dara tek-tenê, ya ku qedexekirîbû.

Ew yek hema roja îroyîn jî diqewime. Xwedê gelek pêşkêş dane me her yekî, hemû duayên Ezmîn (binihêre Efesî 1:3). Lazime, ku

kitêbeke tam binivîsin, ku wana hesabkin. Gotina Xwedê jî dibêje me, wekî hemû tiştên nava Îsa Mesîhda yên mene (A Korintî 3:21-23). Gelo stratêgîya dijminê me kîjane. Ew hema eynî ewe, çi ku li baxçe bû. Ew dicedîne merdanîya Xwedê veşêre bona ku em tenê wê yekê bivînin, çi ku "veşartîye". Feqet bona çi gerekê Xwedê tiştekî ji me veşêre. Emê piştî çend rûpela derheqa wê yekêda xeberdin, lê bi zelal gotî, Ew wê yekê bona kara me dike. Ew ji me baştir zane ku bona me çi kardare.

Hêwayê caba mer da û gumana xwe da ser wê rastîyê, ya ku ewê zanibû:

> "Ji berên darên baxçe em dikarin bixun, lê ji berê wê dara ku nava baxçedaye, Xwedê got nexun û dest nedinê, wekî hûn nemirin" (Destpêbûn 3:2,3).

Ew yek tiştekî hewaskare bidine kivşê, ku bi çiqwasîva caba Hêwayê îzbatkirî nîbû. Xwedê derheqa destnedayîna berê wê darêda tu tişt negotibû. Diqewime ev tişt gelekî girîng (ferz) neyê kivşê, lê ew yek şirove dike, ku bona çi mer hema nêzîkî jinê bû, lê ne ku nêzîkî Adem bû.

Wextê ku ev temî hate dayînê, Hêwa hela hê tunebû. Dêmek ewê derheqa wê yekêda hema xût ji devê Xwedê nebihîstibû, çawa ku Adem bihîstibû. Ez bi xwe bawer dikim, wekî carekê pêşîya wê qewimandinê, wextê ku Hêwa û Adem nava baxçê berfirehda digerîyan, ew nêzîkî dara naskirina qencîyê û xirabîyê bûn. Adem ew dar nîşan da û Hêwayêra gilî kir, ku Xwedê çi temî derheqa wê darêda dabû. Ez evê gotinê nav dikim çawa zanebûna *derbazkirî*. Bona Adem ev temî çawa zanebûna *eyanbûyî* bû. Firqî kîjane? Zanebûna eyanbûyî ewe, wextê ku Xwedê bi xwe tiştekî nîşanî mêriv dike.

## Zanebûna eyanbûyî û derbazkirî

Carekê Îsa ji şagirtên Xwe pirsî: "Bi texmîna mêriv Kurê însan kîye?" (Metta 16:13). Şagirta yeko-yeko ew hemû tişt, çi ku ji dorbera bihîstibûn nav kirin: Yûhennayê Nixumdar, Elyas, Yêremîya, yan jî yek ji pêxembera, çawa ku wana ji "T'wîttêr"-ê, "Fêysbûk"-ê, "Înstagram"-ê û blogên rojên xweye mayîn bihîstibûn. Çawa ku Îsa

dora wan zanebûnên wanra derbaz bû, çi ku wana bi zanebûna derbazkirî zanibûn, Ewî pirsî: “Lê hûn çi dibêjin? Bi texmîna we Ez kîme?” (Gotin 15). Şagirta xwe ker kir: bersiva (caba) wan tunebû. Eger Îsa pirsa ewlin neda, diqewime wana hukumê fikirên merivên başqe xweyî bikirana û bersivên wan wê anegorî zanebûna derbazkirî bûna. Îsa bi zanebûn ev herdu pirs dan bona ku zanebûna duda ji wana dûrbiketa û bizanibûya, ku Xwedê bona wan çi eyan kirîye. Petrûs yê tek-tenê bû, bersiva kîjanî hebû. Ewî carekêra got: “Tu Mesîhî, kurê Xwedêyê sax” (Gotin 16).

Ez dikarim bînime ber çava, wekî Îsa, ken li ber dêv, destê xwe danî li ser sergirka milê Petrûs, bona îzbatkirina gotinên wî, û e’lam kir: “Çimkî xwînê û goşt ev yek eyanî te nekirin, lê Bavê Minî Ezmana ew yek kir” (Gotin 17). Petrûs tu behsek nediwekiland, ya ku ewî ji yekî mayîn bihîstibû. Ewî ew rastî gilî dikir, çi ku Xwedê eyanî wî kiribû.

Peyî wê yekêra Îsa elam kir, wekî civînê hema li ser *zanebûna eyantîyê* bê çêkirinê û qewatên dojê nikarin wana bidine sekinandinê, li cem kê ev zanebûn heye. Ji vê yekê jî tê kivşê, ku dikarin wana diha hêsa bixapînin, li cem kîjana tenê *zanebûna derbazkirî* heye.

Gelek mecal hene ku meriv zanebûnên eyankirî bistîne. Ew yek wî çaxî dikare biqewime, wextê ku em kitêba Pîroz dixwînin, yan jî kitêbeke ruhdarkirî, wextê ku em nava duakirinêda xwe ker dikin, wextê ku em terîfên serwêr guhdar dikin, çawa ku Petrûs li ser banê avayî (binihêre Karên Şandîya 10:9-16), yan jî wextê ku Ruhê Pîroz Gotina Xwedê dilên meda eyan dike. Çetine wê yekê bidine tomerîkirinê, ku çawa ew yek diqewime. Carna hûn dikarin dengekî nerm, zirav dilên xweda bibhên. Wî çaxî hûn *zanin,* çimkî eyantî ruhê weda hatîye danînê. Carna dilê we destpê dike bi lez lêxe û hûn hazirîya Xwedê texmîn dikin, wextê ku hûn Gotina Xwedê dixwînin. Çi cûreyî jî ew bê, tiştê sereke ewe, ku hûn zanin, wekî ew yek we ji Xwedê bihîstîye û tu kes nikare wê zanebûna eyankirî ji we bistîne.

Zanebûna derbazkirî jî ewe, wextê ku hûn ji vî yan ji wî merivî dibihên, yan jî dixwînin, ku merivên başqe ji Xwedê çi bihîstine. Ev zanebûn dikare rastbe, lê eger Ruh wê yekê eyanî dilê we nake, ew dikare hêsa bê lihevxistinê.

Mesele, min bihîstîye ku çawa hinek meriv li ser xwe guman zanebûnên xweye xwedêtîyê nîşan didin: "Con tu zanî, wekî pere koka hemû xirabkarîyane". Merivên vî cûreyî xwendine, yan jî ji qulixçîkî bihîstine, yê ku gotina A Tîmotêyo 6:10 wek'ilandine: "Çimkî perehizî koka hemû xirabkarîyaye" (NLT).

Pere tenê hacete û xilaz. Hûn dikarin pera yan rast yan jî şaş bidine xebatê. Sîlih dîsa hacete. Destê dizda ewê bona dizîyê şaş bê xebitandinê. Feqet sîlihê destê xebatkarê polîsyayêda wê îzinê nede ku xirabkar jinekê yan biuhurîne, yan jî bikuje. Herdu cîya jî sîlih tê xebitandinê, nava kîjanêda ne tiştekî qenc ne jî tiştekî xirab heye. Pere jî hema wî cûreyîye, pere hacete û ne koka hemû xirabkaraye. *Hizkirina hindava pera* koka hemû xirabkaryaye.

Şirovekirinêng wî cûreyîye şaş li cem meriva yên derbazkirîne, lê ne ku ên eyankirîne. Ji cêribandina xwe ez dikarim bêjim, wekî zanebûna derbazkirî dikare diha bi qezîyabe, ne ku tunebûna zanebûnê.

Ew yek, ku Hêwayê çawa temîya Xwedê şirovekir, ya derheqa dara qedexekirîda, wextê ku ewê got, ku îzin tune dest lêkeve, dide kivşê, wekî ew tenê zanebûna derbazkirî bû. Hazirîya Xwedê li baxçe bû. Xwedê tevî Adem û Hêwayê her roj digerîya (binihêre Destpêbûn 3:8). Ew yek tiştekî başe, wekî Adem kulfeta xwera gilî kiribû, ku Xwedê temîya çawa dabû, lê diqewime ewê bi xwe Efrandar negeryabû, ku gotina Wî fem bike.

Cudatîke wan meriva, yên ku Xwedê digerin, gerekê bibe cedandina naskirin û femkirina Xwedê.

Binihêrin, ku merivên li Beroyayê çi kirin, wextê ku Pawlos ev berbirîbûna wanra anî, ya ku ewî ji Ezmîn stendibû:

> "Merivên Beroyayê ji yên Têsalonîkê serwaxttir bûn û wana bi hazirî berbirîbûna Pawlos guhdar kirin. Ewana roj bi roj kitêba Pîroz gotûbêj dikirin, ku bivînin, ku gelo Pawlos û Sîlas rastî hîn dikirin, yan na" (Karên Şandîya 17:11, NLT).

Merivên Beroyayê fem dikirin, ku gerekê çi bikin. Wana bi guhdarî xeberên Pawlos guhdar kirin û paşê destpê kirin bi xwe kitêba Pîroz gotûbêj bikin. Gotina "heyîna fikira vekirî" gelekî li min xweş tê. Fikira

wana vekirîbû, ku ew guhdarîya dengê Ruhê Pîroz bikin. Tevgirêdana di navbera ruhê wan û fikira wanda aza bû û hazir bû, ku zanebûna eyankirî qebûl bikin.

Himberî gelek bawarmendên roja îroyîn fikirên merivên Beroyayê ne ji malperên întêrnêtê, yan jî ji blogêd cûre- cûre bûn. Hema bi wî cûreyî wextê ku Îsa şagirtên xwera derheqa heyîna Xweda xeber dida, Ew bi wan fikirava hewask'ar nîbû, ku li dor –bera dihatine belakirinê. Ewî dipirsî: "Lawikno, Xwedê çi eyanî *we* kirîye?".

Diqewime carekê Petrûs tevî Îsa û şagirta gotinên yekî mayîn bihîst: "Îsa gerekê Mesîhbe". Feqet wî çaxî bi hazirîya Ruh'ê Pîroz ew xeber nava fikira wî û dilê wîda pêşda hatin: "*Belê. Ew kurê Xwedêye. Ew Mesîh e. Raste. Min hetanî niha fem nedikir, lê niha zanim, wekî Ew Mesîh e*". Gelek cara Xwedê hema vî cûreyî rastîya Xwe eyanî dilên me dike.

Diqewime tevî Petrûs ev yek cûrekî mayîn qewimî. Ev eyantî dikaribû şev biçûya dilê wî, wextê ku ew îdî razayîbû, yan jî roj, wextê ku ji bajarekî diçû bajarekî mayîn. Diqewime ew yek hema wî çaxî qewimî, wextê ku ewî guhdarîya xeberdana Îsa dikir. Diqewime jî, wekî bêyî femkirina Petrûs, Xwedê ji peymana Kevin xebereke derheqa hatina Mesîhda bîr anî, mesele Îşaya 9:6,7.

Hema wî cûreyî jî dikaribû wî çaxî biqewimîya, wextê ku Îsa merivek qenc dikir. Nişkêva zarotîya vî şagirtî hate bîrê, wextê ku yekî derheqa hatina Mesîhda ji peymana Kevin dixwend: "Ewî nexweşîyên me hildan û êşên me birin" (Metta 8:17, wê yekê usa jî Îşaya 53:4 îzbat dike).

Eyantîya derheqa heyîna Îsada dikaribû bi gelek cûra bihata cem Petrûs, lê çi jî hebe, tiştê sereke ewe, wekî *Xwedê bi xwe derheqa wê yekêda* eyanî wî kir. Ez difikirim ku ez dikarim bêjim, wekî tevî Hêwayê tiştê usa neqewimîbû. *Zanebûna* wêye eyankirî tunebû. Ew bi zanebûna *derbazkirîva* razî bibû. Diqewime Adem name bi "T'wîttêr"-ê jêra şandibû: "Hizkirîya min, min dît, ku te dîna xwe dida dara naskirina qencîyê û xirabîyê, dest nedî wê darê. Xwedê got, ku eger em berê wê bixun, emê bimirin".

## Êtapa duda

Niha wextê ku mer guhdarîya Hêwayê li ser dara tek-tenêye qedexekirî dabû merkezkirinê, ew dikaribû derbazî gava duda bûya. Ev gava nû îdî dijî (miqabilî) wê gotina Xwedê bû. Nenihêrî wê yekê, ew gotin bi fêlbazî hatibû sêwirandinê û nêzîkî aqila bû, ew usa jî sozê karêdayînê dide. Awa bi wî cûreyî mîrêcin dijî Xebera Xwedê derket:

> "Û mer gote kulfetê: "Na hûn tucar namirin, lê Xwedê zane, wê roja gava hûn ji wê bixun, çavên weyê vebin û hûnê mînanî Xwedê qencî û xirabiyê ji hev derxin"" (Destpêbûn 3:4,5).

Guhdarîyê bidine ser gotinên mer: "...lê Xwedê zane...". Ev dide kivşê, wekî ji Adem û Hêwayê tiştek hatibû veşartinê. Ew yek ne tiştekî sade bû, lê tiştekî usa bû, çi ku dikaribû jîyana Adem û Hêwayê diha baştir bikira. Nava wê darêda *qencî* hebû. Lê mer bi hûrgilî gavên xweye nêzîkî aqila hesab kirin, ku ew rast bihatana kivşê û hemû tişt hate stendinê.

> "Û kulfetê dîna xwe dayê, wekî berê darê bona xwerinê baş bû, berbiçave, hewaskar û dilhavijî bû bona zanebûnê, dest avîte berê wê, xwer" (Destpêbûn 3:6).

Hêwayê dît, wekî dar baş bû û ewê serwextî bida wê. Hêwayê darê dinihêrî û fikirên wê berbi alîkî nû çûn: "*Deqekê: zelal dibe, wekî nava vê darêda tiştekî qenc û kardar heye û Xwedê ew yek qedexe kirîye. Jîyana mêrê min û min dikare diha başbe. Em dikarin diha serwext û bextewarbin, lê ew yek ji me hatîye veşartinê. Ez difikirîm, wekî Efrandarê me hizkirî û merîfet bû, lê usa dertê, ku Ew me dixapîne. Ew tiştkî ji me vediş*êre".

Ew fikir kete nava femdarîya wê û her deqe xwestina xwerina berê wê darê diha zêde dibû. Ewê xwestina xwe afû dikir, çimkî ewê bawer dikir, ku nava wê darêda tiştekî qenc bona wê hebû.

Meremê merî dawî ew bû, ku fikirdarîya Hêwayêye nava xeysetê Xwedêda navhev bixe. Eger ew bighîşta açixîyê, ewê usa bikira, ku Hêwa dijî Xwedê derketa. Bona çi? Çimkî serwêrtîya Xwedê îzbatbûyî ye û bi xeysetê Wî tê xweykirinê.

Dawidê padişa nivîsî: "Îzbatîya kursîya (yan jî textê) Te heqîtî û extîyarîne" (Zebûr 89:14). Dawid bi xwe padişa bû û ew ha ji xeysetê rêber hebû. Eger padişa rast, heq û serwaxte, padişatîya wî wê xilaz nebe. Lê eger ew derewîn û neheqe, padişatîya wî wê dirêj nekişîne.

Xeysetê Xwedê raste, lê meremê mer ew bû, ku Hêwa wekî mayîn bifikirîya. Mer dicedand tiştên rast navhev bixe. Dara qedexekirî gelekî baş û berbiçav bû. Dihate texmînkirinê, wekî ewê serwaxtî bida, lê gelek cara cûrê ji derva meriva dixapîne. Bona wê yekê jî hatîye nivîsarê: "Em guhdarîya xwe didine ne li ser wan tişta, yê ku tên kivşê, lê li ser wan tişta, kîjan nayêne kivşê" (B Korintî 4:18, TEV). Tiştê ku nayê kivşê Xebera Xwedêye. Xebera Wî ya heq û raste.

## Nexapin

Dijminra li hev hat ku Hêwayê defde, ku ew derkeve dijî Efrandarê xwe û bi wê yekê xeysetê Xwedê nava fikirên wêda navhev bixe. Ez gelek cara mecbûr bûme dijî fikirên wî cûreyî şer bikim, wextê ku duayên min awqas lez nedihatine cabdayînê, çawa ku gumana minda bû. Nava h'alên wî cûreyîda min derheqa dilsozîya Xwedêda dianî bîra xwe. Min bi vî cûreyî xwe hîn dikir: "*Pirs ne Xwedêye. Ew tu tiştî ji min venaşêre. Ew Bavê qenc û rehme"*.

Mer Hêwa def da, ku ew bawer bike, wekî Xwedê tiştekî usa ji wê vedişart û ew tişt dikaribû bona wê qenc bûya. Eger ev gava, ku mer avît bi aiçxî gihîşte meremê xwe û ew jî tevî jineke usa, ya ku tu cara êş nedîtibû, ew bêhurmet nekiribûn, lê îro dinîya undabûyîda karê dijmin diha hêsa dibe, ya ku bi bêhurmetkirinê, bi heramkirinê, bi zinêkarîyê û xapandinêva tijîye. Awa bona çi Aqûbê şandî berk eşaretîyê dide me.

"Nexapin, birayên mine hizkirî" (Aqûb 1:16).

Ez hiz dikim bêjim, wekî pirsa xapandinêye tek-tenê heye û ew mêriv dixapîne. Bawermendê xapyayî bawer dike, wekî ew raste û bi temamî h'emû tiştî fem dike û usa jî piştgirê rastîyêye. Feqet bi rastî ew şaşe, fem nake çi dike û piştgirê rastîyê nîne. Weyê, ev çiye!

Hêwa hate xapandinê û usa dertê, ku ewê neheqî kir. Aqûb naxweze, ku em jî bikevine tela wî cûreyî. Em evê parê bi temamî bixwînin:

> "Nexapin, birayên mine delal! Her dayîna qenc û her pêşkêşa kamil ji jorê, ji Bavê ronahiyê tê xwarê, yê ku ne xwexwe tê guhastinê, ne jî sî ber wî dadigere" (Aqûb 1:16,17).

Aqûb navêje, wekî pir'anîya pêşkêşên qenc ji Xwedê tên. Gelek hema usa difikirin. Na, ew bi wê yekêva dibêje, wekî *her* pêşkêşeke qenc û kamil ji Xwedê tê. Em dikarin sînonîma vê gotinê binivîsin: "Bona we tu tiştekî qenc, bêyî xwestina Xwedê, tune". Hûnê bi sivikayî nêzîkî gotina bi sirê nebin, çimkî nava wêda kûrayîke mezin heye:

*Eger tiştek dijî serwaxtîya Xwedêye, ew yek girîng nîne ku ew yek bi çiqwasîva ji derva bedewe, bi çiqwasîva ew we bextewar dike, bi çiqwasîva we şa dike û bi saya wê yekê bi çiqwasîva hûn dikarin dewletî û açixbin, çiqwas ew ruhanîye li ber çava û çiqwas eyan û qebûlkirîye. Eger tiştek dijî serwaxtîya (yan jî Xebera) Xwedêye, ew paşê we unda dike, yan jî telayê tîne nava emirê we.*

Hêwayê bi temamîya dilê xwe bawer dikir, wekî ewê qirareke serwaxt qebûl dikir, wekî bijartina wê ya baş bû û ewê jîyana wê û mêrê wê bida başkirinê. Eger roja îroyîn, piştî bi hezara sala, hûn difikirin, wekî serwaxtîya weye derheqa wê yekêda ku qencî bona we kîjane û ew ji serwextîya Xwedê zêdetire, usaye hûn awqas xapîyayîne, çiqwas Hêwa û rûyê qirarên weda hûnê rastî telayê bên.

Diqewime hûn bifikirin, wekî ez merivekî bi fikirên xirabim, lê ez bêjim, wekî fikira min tiştekî mayîne. Ez awqasî eşaretîyê didime we. Nava vê kitêbêda gelek tişt hene, kîjanê alî we bikin bizanibin, ku bi rastî qencî bona jîyîna we, qulix, kar, heleqetîyên we û govekên jîyanêye mayîn kîjanin. Çi jî hebe, bona ku bi temamî ez berbirîbûna Îsa Mesîh raberî we bikim, ez gerekê him eşaretîyê bidim û him jî hîn bikim. Pawlos vê rastîyê îzbat dike, dinivîse:

> "Em wî dannasîn dikin, her kesî şîret dikin, her kesî bi hemû serwaxtîyê hîn dikin, wekî her kesî yekîtîya Mesîhda gihîştî bidine sekinandinê" (Kolosî 1:28).

Him hûn, him jî ez nikarin gihîştîbin, eger nava jîyana meda ne eşaretî ne jî hînbûn hebin. Ezê vê prînsîpê bi vê meselêva şirove bikim. Her car, wextê ku hûn tiştekî êlêktronî dikir'in, nava kitêba bona xebitandina wê li ser rûpelê ewlin yan jî duda nivîsare: "Eşaretî: pêşîya xebitandinê bixwînin". Peyî wê yekêra, ewê ku ew tişt çê kirîye, çend eşaretîya dide, ku gerekê çi bikin, yan jî nekin. Meremê wan eşaretîya ewe, wekî hûn bêfesal zyanê nedine xwe, yan jî wî tiştî, yê ku we kirîye. Ev tiştê êlêktronî wê bi sala bona we qulix bike, eger hûn wan eşaretîya neteribînin. Feqet, eger hevaltîya ku ew yek çê kirîye derheqa wan eşaretîyada nenivîsîya, we dikaribû zîyan bigîhanda wî tiştî, yan jî bi temamî ew unda bikira. Wî çaxî hûnê hêrsketana û weyê name ser navê hevaltîyê binivîsîya û weyê bigota, ku bona çi we eşaretî nedaye.

Pawlos dibêje me, wekî em gerekê guhdarîyê bidine ser eşaretîyên Peymana Nû. Eger em usa bikin, wî çaxî bi salên dirêj jîyana me wê açixbe û heleqetîyên tevî Efrandarê me wê dualîbin. Eger em van eşaretîya biteribînin, yan jî hesab hilnedin, wî çaxî emê mînanî Adem û Hêwayê bizêrin. Wî çaxî em dikarin miqalên blogada, yan jî namada derheqa wê yekêda belakin, ku jîyan rûyê tengasîya û zêrandinada bi çiqwasîva neheqe. Feqet Xwedê zelal dibêje:

> "Her dem evê kitêba Hînbûna lêkolîn bike. Dora wê şev û roj bifikire, wekî tu li ser wê fikirêbî, ku tu gura wî hemû tiştîdanî, çi ku têda nivîsîye. Tenê wî çaxî tê *pêşkevî* û *bighîjî açixîyê* nava wî hemû tiştîda, çi ku tu dikî" (Hêşû 1:8, NLT).

Xwedê garantîya jîyana açix û gulvedayî dide, eger em fesal gura wî hemû tiştîdabin, çi ku kitêba Wîda nivîsare. Vê kitêbêda tenê hînkirinên piştgirîyê û berdilhatinêda nînin. Nava Xebera Xwedêda usa jî eşaretî hene.

Mixabin, nava rojên meda qulixçî û dersdar gelek cara dora van eşaretîyên girîngra derbaz dibin. Ev parên kitêba Pîroz dikarin merivara çawa tiştê kêmasî bên texmînkirinê, lê emê nexwezin ji dikê berbirîbûnên bêguman raberî we bikin, çimkî ewê ku difikirin, wê çûyîn-hatina merivaye li civînê bidne kêmkirinê. Nava feydayên

nêzîkbûna vî cûreyîda, nava jîyanên bawermendada gelek problêm pêşda hatine, ji kîjana meriv dikare dûr bimîne, eger wededa meriva hîn bikin, yan jî eşaretîyê bidinê.

Ez berbirî we dibim, ku wê rastîyê her dem qebûl bikin. Bona we bêyî serwaxtî û Xebera Xwedê tu tiştekî qenc tune. Eger hûn bawerîya xwe li vê prînsîpê tînin, wî çaxî gera firqîya di navbera qencîyê û Xwedêda berdewam bikin.

3

# NORMA QENCÎYÊYE TOMERÎ

“Her xebereke Xwedê raste”
— Gotinên Silêman 30:5, NLT

Em dijî şaşîyê derdikevin, wextê ku zanebûnên
hîmdar derheqa xebera rastîyêda bela dikin...
— Mêtyû Hênrî

Vê kitêbêda ezê derheqa sê alîyên femdarîya “*qencîyê*”-da xeberdim. Ya ewlin derheqa heleqetîyên meye tevî Xwedêdaye, ya duda derheqa xeyset û terbê meda, lê ya sisîya derheqa medaye. Ev hersê alî hevva girêdayîne, çimkî alîyê ewlin hîmê meye, yê duda ewe çi ku emirê me bîr tîne, lê alîyê sisîya jî sîmvola çêkirina jîyîna meye. Eger herdu alîyên ewlin qewatbin, wî çaxî îşê jîyana me wê kardar û qewînbe. Feqet eger ji van hersê alîya yek jî bi kêmasîyabe, wî çaxî îşê jîyana me wê tam mîyaser nebe û feydayên wê wê zû derbazbin.

Ez çêkirina mala meye ewlin bîr tînim û tê bêjî ew duh bû. Ez û Lîza tevayî ketine nava çêkirinê, ji destpêkê hetanî dawîyê. Hema ji roja ewlinda em her roj diçûne li cîhê çêkirina malê, ku dîna xwe bidine şuxulkarîyê.

Çêkirina hîm awqas jî hewaskar nîbû û me hindik wedê xwe li ser lêkolînkirina wê derbaz kir. Feqet hevalên me hene, yên ku dîsa nava wî wedeyîda maleke hê bedew çê kirin û ew jî mala wane ewlin bû. Wextê

ku ew cîguhastî bûn û çend sal derbaz bûn, li ser dîwarên mala wan ji erdê hetanî banê wê terkên kûr pêşda hatin. Carekê wana em teglîfî şîvê kirin. Bi dîtina wan problêma me pirsî ku menî çi bû. Wana bi beşera nexweş mera gilî kirin, ku hîmê mala wan rast nehatîye çêkirinê. Merivê ku mala wan çêkiribû, xebat bi êkonomîyayêva kiribû. Paşê zelal bibû, wekî bona rastkirina wê problêmê gelek wede û usa jî pere lazimin. Cêribandina wana da kivşê, ku çiqwas tiştekî girînge wextê ku hîm başe. Nenihêrî wê yekê, wekî danîna hîmê mala me awqasî jî hewaskar nîbû, lê hîm tiştê herî sereke bû ku mal qewînbe.

Piştî danîna hîmê mala me gava bi sirê çêkirina perçê avayîyî sereke bû. Wextê ku ev perçê avayî çê dikirin, em bi hewaskarî diçûne li wir. Em diha gelekî dirêj li wir diman, çimkî me îdî dikaribû nava malêda bigerin. Me bi hewaskarî dîna xwe dida xebatê ku odên mala me çawa çê dikirin û me dianî ber çava, ku mala me wê çi cûreyî bûya.

Etapa çêkirinêye xilazîyê bi rastî lezet bû. Me îdî gelek wede bona dîtin û lêkolînkirina mala xwe derbaz dikir, lê ne ku nava herdu êtapên mayînda. Piştî çêkirina dîwara me dîna xwe didayê ku xebatên hundurê malêda çi cûreyî tên kirinê, eşîyayên malê çawa tên cîwarkirinê û tiştên mayîn. Ew mala meye ewlin bû û mecala me hebû, ku me çawa bixwesta usa bida çêkirinê. Wî çaxî her rojeke me bi rastî cejin bû. Bi kutasî hemû tişt tê bîranînê.

Ez dixwezim vê yekê bidime kivşê. Eger herdu êtapên ewlin, yên çêkirina mala me, hîm û dîwarên hîmlî baş çêkirî nîbûna, wî çaxî hemû tişt wê yan carekêra xirab bûya, yan jî çawa mala hevalên me nava wededa.

Bi wî cûreyî beşa xilazîyê, ya berbirîbûna vê kitêbê, progiramên jîyîna meye bona gotûbêjkirinê tiştê herî hewaskare. Ew derheqa xebat, qulix, yan jî pirsên jîyîna meye mayîndane.

Nava van hemû êtapada bijartin hene, yên ku çawa qencî tên texmînkirinê. Feqet ew gelek cara tiştên herî baş nînin, yên ku Xwedê bona me çêkirine. Eger em qirar bikin, ku wê rêyêra derbaz bibin, wî çaxî emê bi qewata xweye here mezin nejîn. Ev gotin rastîye û nayê guhartinê: “Ew tu qencîkê nahêvşîne bona wana, yên ku bi paqijayê diçin” (Zebûr 84:11). Ew bona qencîyê dixweze û qencîya Wî her dem başe.

Derheqa wê yekêda emê hinekî şûnda xeberdin. Lê niha, mînanî wî merivî, yê ku mala me çêkir, yê ku bi guhdarîke mezin li ser çêkirina

êtapa ewlin sekinî, emê bêjin. Vê kitêbêda, berê ewlin, em gerekê hîm daynin û paşê dîwara bilind bikin.

## Şirovekirina xebera “qenc”

Werin em xebera “*qenc*” lêkolîn bikin. Nava zimanê îbranîda xebera “qenc” xebera “*tov*”-e. Çend şirovekirinêd vê xeberê nava “*Ferhenga lêkolînkirina xeberên Kitêba Pîroz*”-da evin: “bextewar, tiştên qebûlkirinê, baş û rastbin”. “Ênsîklopêdîya kitêba *Pîroz, ya navnetewîye nû*” diha bi kûrayî vê xeberê lêkolîn dike:

> “Fikira vê xeberê “baş” yan jî “rehm”-e. Nava vê fikirêda tiştên baş, kardar, tiştên xwestinê hene û bi moralî jî ew raste.
>
> Ew fikira, ku van hemû şirovekirinên xebera “qenc” hevva dide girêdanê, hema qîmetkirine. Bona ji hevderxistina qencîyê lazime tişta û kirina himberî hev bikin...
>
> Dîroka efrandarîyê xebera “tov”-ê bi fikira kitêba Pîroz raber dike, wextê ku Xwedê dîna xwe dide xebata Xweye herroje û eyan dike, wekî ew qence, û Xwedê jî wê yekê qîmet dike. Bi rastî karebûna merivaye qîmetkirinê rûyê wê yekêda heye, wekî Xwedê şikil û mînanîhevbûna Xwe daye merivatîyê. Piştî wê yekê, wextê ku nava mêrivda guneh femdarîya rastîyê nava hev xist, wî çaxî tenê Xwedê dikare hemû tiştî rast qîmet bike. Xudanên peymana Kevin li ser wê fikirê bûne, wekî Xwedê ne tenê qencîyê dide û norma qencîyêye, lê Ew usa jî zane ku bi rastî çi bona me kardare û bi moralî raste. Norma xweye derheqa qencîyêda Xwedê nava Xebera Xweda eyan kirîye û eve hîmê tek-tenê, bi kîjanê em hindava Wî da gumanin û em dikarin li ser xwe guman bêjin, wekî tiştek yan kirinek kardare”.

Xebera kilît *qîmetkirine*. Adem û Hêwayê qirar kirin, bi xwe, bêyî şêwira Xwedê, qîmetkin, ku çi qence û tiştê qebûlkirinêye. Wana sîstêma qîmetaye başqe dane xebatê, ya ku ji alîyê wanda hatibû pêşdakişandinê. Awa, ji vir jî dijminatîya mêrive hindava Efrandarê wîda destpê bûye. Ew yek bi kirinên cûre-cûre hatîye qebûlkirinê, lê menîya hîmlî dîsa ew maye: “Ez zanim, ku bona jîyana min kîjan *raste* û ez naxwezim ji merivekî mayîn tu tiştî bibhêm”. Feqet Xwedê dibêje: “Heye rê, ya ku li ber meriva raste, lê xilazbûna wê, rêyên mirinêne” (Gotinên Silêman 16:25).

Nava serê kitêbêyî ewlinda min ev beşa anî ber çava, ya ku Gotinên Silêman 14:12-da nivîsar bû. Ev xeber badîhewa nayê wekilandinê.

Her car, wextê ku kitêba Pîrozda tiştek diwekile, merem ewe ku wê xeberê bînine ber çava. Em gerekê her dem bîr bînin, wekî tişt hene, yên ku bona Xwedê gelekî giranin (binihêre Metta 23:23). Wextê ku kitêba Pîrozda xeber diwekile, em gerekê diha gelekî guhdarîyê bidine ser. Wî çaxî eva eşaretîya berke.

Xwedê zane, ku çiqwas hêsa sînorê qencîyê û xirabîyê dikare navhevkeve. Eger ew yek li baxçê Êdênê qewimî, wî çaxî ew yek dikare roja îroyîn jî hêsa biqewime. Xwedê eşaretîyê dide, wekî wê hebin rê-cûrên kirina, fikirdarî, tradîsîya û tiştên başqe, kîjan dikarin bona me çawa tiştên qebûlkirinê bên texmînkirinê, lê eger em bixwezin jîyana xwe li ser wana çêkin, paşê wê zelalbe, wekî kêmasî hene, ew bi kêmasîya bûn. Ew kêmasî jî wê wedê me bidizin û wê zyanê bidine me. Diqewime ev kêmasî piştî çend meha, yan jî sala bên kivşê, lê diqewime ew hetanî roja Dîwanê veşartî bimînin. Pawlos dinivîse: "Hinek hene, ku gunehên wan kivşin û rast wan dibine ber dîwanê, lê gunêhên hineka jî paşê wê kivşbin" (A Tîmotêyo 5:24, NLT). Ez nizanim hûn çawa difikirin, lê para vê xeberêye duda nava minda sawê pêşda tîne. Ew usa nake ku ez ji Xwedê bitirsim. Diha rast ez ditirsim, wekî dikarim ji Wî dûrkevim.

Bi vî cûreyî, ez bi rastî bawer dikim, wekî serwaxtîya Xwedê ya raste û ez gumana xwe didime li ser Wî ku bona jîyana min tiştê herî baş kîjane. Dilê her merivekîda bersiva vê pirsê gerekê hebe. Gumana hîmdar nikare tenê derheqa hinek pirsadabe û derheqa pirsên mayînda nîbe. Yan jî serwaxtîya Xwedê nava hemû pirsada raste, yan jî kême û diha başe ku em bi xwe bêyî Wî qebûlkin.

Bi kutasî norma qencîyê kîjane? Çi rêberîyê li me dike, berbi rîya jîyanê? Pawlosê şandî dibêje me:

> "Temamîya nivîsarê ji behna ber Xwedêye û kêrhatîye bona hînkirina me, ku rastî çiye û me şîret dike, ku nava jîyanên meda çi şaşe. Ew me rast dike, wextê em şaşin û rastîyê hîn dike" (B Tîmotêyo 3:16, NLT).

Em çend tiştên girîng ji xeberên Pawlos lê binihêrin:

"*Temamîya kitêba pîroz*", lê ne ku beşeke wê, ne ku ew beş kîjanara em qayîlin. Ne ku ew xeber, yên ku anegorî fikirdarîya mene, lê temamîya kitêba Pîroz. Tevî xwe bêqelpbin: gelo hûn serwaxtîya Xwedê nava hinek govekada çawa ya rast hesab dikin, lê govekên mayînda hûn çawa titên kevinbûyî hesab dikin?

Hêwayê zanibû, wekî Xwedê Efrandar e. Ewê duayên Xwedêye bi merdanî û hazirîya Wî li ser xwe didît. Dor-brên bedew, edilayî, gulvedan, usa jî xwerina xweşe geleke ji darên bêhesab bona wê hatibûne dayînê. Feqet wextê ku ewê destpê kir bifikire, wekî govekeke serwaxtîya Xwedê rast nîbû, ew ket û derkete li ser rîya mirinê. Eger Hêwayê dikaribû nava van dor-berên bêkêmasîda biketa bin hukum, wî çaxî nava evê dinîya heramkirîda çi dikare me biparêze? Em bêjin, wekî tenê Xebera Xwedê dikare wê yekê bike. "*Kitêba Pîroz bona hînkirina me kêrhatîye, ku em bizanibin çi raste û heqe*": hene tişt kîjan ji derva çawa yên qenc tên kivşê. Lê bi rastî ew usa nîne. Hene femdarî, fikirên cûre-cûre, yên ku çawa yên rast û heq tên texmînkirinê, nenihêrî wê yekê ku ew usa nînin. Bi hesabhildana van qezîyayên veşartî, Xwedê nivîsara jîyanê daye me, bona ku em bi *nezanî* ji rastîyê dûrnekevin û nekevine li ser rêyên mirinê. Ev nivîsar hema ya kitêba Pîroze.

Him hûn, him jî ez, gerekê em ji xwe bipirsin û bi bêqelpî bersivê bidin: "Gelo ezê wededa, bi cûrê rast kitêba xweye Pîroz bixwînim? Gelo ez ewê lêkolîn dikim? Gelo ez wedê xwe didime xebatê, ku serwaxtîya Xwedê bona jîyana xwe bigerim? Yan ez hesab dikim, wekî ez Xebera Xwedê baş zanim, çawa Hêwayê zanibû? Gelo ez bi jîyana li vê dinîya heramkirî û bi şerkarîya dijî wî, yê ku me dicêribîne, nava halekî diha başdanim yan Hêwa? Gelo ez rastîyê diha baş fem dikim û diha qewîn li ser rîya rastîyê sekinîme?

"*Temamîya kitêba Pîroz behna ber Xwedêye":* ev gotin cûrekî mayîn nabe, ew gerekê tam bê qebûlkirinê, yan jî înkarkirinê. Eger temamîya kitêba Pîroz usa nîne, usaye ev nivîsar ne tame.

## Rastîya kitêba Pîroz

Em hinek melûmetîya derheqa kitêba Pîrozda lê binihêrin. Ew ji 66 kitêbaye, yên ku bi zimanên cûre- cûre hatine nivîsarê, ew jî nava 1500 salada, ji alîyê ji 40-î zêdetir xudanada û li sê parçên dinîyayêye cuda-cuda (li Afrîkayê, Asîyayê û Avropayê). Kitêbên kitêba Pîroz merivên cûre- cûre nivîsîne. Nava wanda hebûne mesîgir, berxvan, leşker, padişa, doxtir û merivên başqeye mayîn. Çend meriva hebsada nivîsîne, lê yên mayîn li sera xeberên xwe teslîmî kaxwez kirine.

Nenihêrî wê yekê, wekî kitêbên wan meriva gelek têma raber dikin, nava van hemû kitêbada tiştên mînanî hev hene û ber çavaye, wekî ew badîhewa nîne. Têma wane sereke halê gunehê merivayî çetine, nava feydayên çida ew ji Efrandar dûr dikevin û merem ewe ku heleqetîyên tevî Wî bên dasekinandinê û caba Xwedê jî bi saya Xudan Mesîh Îsaye. Ev çi ku me dane cêrgê, nava temamîya kitêba Pîrozda ji Derketinê hetanî Eyantîyê, meriv dikare bivîne.

Nivîskarên kitêba Pîroz li cem hev berev nebûne, ku xebatên xwe bidine progiramkirinê û ew yek sawê pêşda tîne. Tu kesî nivîsara van kitêba kontrol nekirîye. Xwedê bi Xwe ew yek dikir. Em bêjin, wekî çawa ku ev kitêbên Pîroz nava awqas wedê dirêjda hatine nivîsarê û pir'anîya xudanên wê hev nas nekirine û pêra jî nava wedê cûre-cûreda jîyane. Kitêbên nivîsar zêde dibûn û dihatine berevkirinê. Ew jî ew berevokaye, ya ku destê medaye, ya ku nava 1500 salada hatîye nivîsarê. (Qasekê bisekinin û bifikirin ku 1500 sal pêşda çi diqewimî. Wî çaxî qet împêratorîya Brîtanyayê jî tunebû. Bi gilîkî, ev tiştê ecêbmayînêye).

Niha, wextê ku awqas nifş derbaz bûne, meriv nikare bîne ber çavê xwe, wekî kitêba Pîroz, kîjanê em dixwînin, yek kitêbe, ya ku bi destê merivên cûr'e-cûre hatîye nivîsarê û ew jî haj wê yekê tunebûn ku ewê paşê bibine yek. Rolên wana meriv dikare himberî merivên nifşên cuda-cuda bike, yên ku parên romanê dinivîsin û ji wana tu kes derheqa serhatîya tomerîda, yan jî syûjêyêda nizane. Tevgirêdana vê kitêbê hema şedetîya heyîna xwedêtîyêye. Wa gotî, mînanî sîmfonîya sazbendîyê, her pareke kitêba Pîroz emekê xwe kirîye nava jîyana tomerî û ew ji alîyê Xwedêda tê serkarîkirinê.

Hema ev yek jî derheqa şedetîya behna xwedêtîya kitêba Pîrozda dide. Feqet em gavekê pêşda herin û derheqa rastnivîsara wan xudanada xeberdin.

Pêxemberîyên derheqa hatina Mesîhda nava kitêbên Peymana Kevine cûre-cûreda, nava sedsalada hatine nivîsarê. Piranîya wana ji hezar sala zêdetir, pêşîya bûyîna Îsa, hatine nivîsarê. Piranîya xwedêzana li ser wê fikirêne, wekî nava peymana Kevinda ji 300-î zêdetir pêxemberî derheqa Mesîhda hene. Bi hatina li vê dinîyayê, Îsa Mesîh berbirî Bavê Xwe bû: "Awa, Ez hatim, ku emirê Te bînime sêrî, çawa ku derheqa Minda kitêbên Pîrozda hatîye nivîsarê" (Îbranî 10:7, NLT). Feqet Îsa vî cûreyî elamî

meriva kir: “Kitêbên Pîroz derheqa Minda xeber didin” (Yûhenna 5:39, TEV). Ev xeberên Îsa şedetîya wê yekê didin, yên ku derheqa behna xwedêtîya kitêba Pîrozdanin. Gelek cara meriv vê yekê înkar dikin û dibêjin, wekî diqewime merivên dîrokîye mayîn bivînin, yên ku dikarin anegorî pêxemberîyên derheqa Mesîhdabin. Eva raste: hinek meriv dikaribûn yek yan du, yan jî çend pêxemberî bikirana. Feqet bi praktîkî nikarin merivekî usa bivînin, yê ku nava jîyanêda ew hemû pêxemberî mîyaser kirine.

Îzinê bidin wê yekê şirove bikim. Çend rûpelên kitêbêye bi sirê bi rengên têknîkî û ulmîne, lê ez we didime bawerkirinê, wekî ev înformasîya girînge û hûn dikarin bi hewaskarîya mezin derheqa wê yekêda bifikirin.

## Tambûna kitêba Pîroz

Nîveka sedsala 20-î, ulmdar û profêsorekî bi navê Pîtêr Stoûnêr bi sernavê “Ulm xeber dide” çap kir. Nava wê xebatêda ewî pêxemberîyên derheqa Mesîhda kivş dikirin. Doktorê ulma H. Harold Haslêr nava pêşgotina kitêba Stoûnda nivîsî:

> “Têksta kitêba “Ulm xeber dide” bi cûrê hûr-gilî ji alîyê endamên yektîya Amêrîkaêye Ulmîda hatîye lênihêrandinê. Şêwira wê teşkîletê hesab kirîye, wekî matêrîyalê ulmîye nava wê xebatêda raberkirî bi temamî, bi guman û raste. Şirovekirina matêmatîkîye navda li ser prînsîpên hîmdanî hatîye bingehkirinê. Profêsor Stoûnêr ev prînsîp dane xebatê”.

Stoûnêr ev lêkolîn tenê ne kirîye, lê fikirên xwe li ser hîmê cêrge hesabkirina pêşda kişandine, yên ku usa jî ji alîyê 600 xwendikarên fakûltêtêyên bîologîye cuda-cuda hatine kirinê. Ewî hesabkirinên wana lêkolîn kirine û himberî hev kirine, lê paşê jî bona tamkirina wana par-par li ser xebitîye. Qîmetkirina wane pêşin derheqa Îsa Mesîhdaye û ew yek li ser hîmê van heyşt pêxemberîya hatîye kirinê:

1. Mesîh gerekê li Beytlehemê bihata dinyayê (pêxembertî – Mîxîya 5:2, mîaserkirin – Metta 2:1-7, Yûhennna 7:42, Lûqa 2:4-7)
2. Pêşîya Mesîh gerekê Mizgînî hebûya (pêxembertî – Îşaya 40:3, Malaxî 3:1, mîyaserkirin – 3:1-3; 11:10, Yûhenna 1:23, Lûqa 1:13-17).

3. Mesîh gerekê li ser kerê rûniştî bihata Orşelîmê (pêxembertî – Zakarîya 9:9, mîaserkirin – Lûqa 19:28-37, Metta 21:1-11).
4. Mesîh gerekê ji alîyê hevalê xweda bihata frotanê (pêxembertî Zebûr 41:9; 55:12-14, mîyaserkirin – Metta 10:4; 26:47-50-î, Yûhenna 13:21-27).
5. Mesîh gerekê bi 30-î zêrî bifrotana (pêxembertî – Zakarîya 11:12, mîyaserkirin – Metta 26:15; 27:3).
6. Ew perê ku bi wana Mesîh frotibûn gerekê li mala Xwedê "biavîtana cem axînker" (pêxembertî Zakarîya 11:13, mîyaserkirin – Metta 27:5-7).
7. Mesîh gerekê li ber wana, ewên ku Wî gunekar dikirin, xwe ker bikira (pêxembertî – Îşaya 53:7, mîyaserkirin – Metta 27:12, Marqos 14:60,61; 15:3-5).
8. Mesîh gerekê mînanî diza bi xaçkirinê bihata cezakirinê (pêxembertî – Zebûr 22:16, Zakarîya 12:10, Îşaya 53:5, mîaserkirin – Lûqa 23:33, Yûhenna 20:25, Metta 27:38, Marqos 15:24-27).

Hetanî berdewamkirinê, îzinê bidin ez meseleke zelal bînim ber çava, bona şirovekirina vê yekê. Bînine ber çavê xwe, wekî hûn neh topên tênîsêye zer û topeke sipî hildidin û diatînine nava derdaneke mezin û ewê derdanê dihejînin. Paşê hûn çavên merivekî girê didin û hîvî ji wî dikin, ku ew topekê ji wê derdanê hilde. Hildana topa sipî wê ji deha yekbe. Eva meseleke zelale.

Bi mîyaserkirina lêkolîna xwe Pîtêr Stoûnêr derheqa van heyşt pêxembertîyên jorê navkirîda nivîsîye:

> "...Me da zelalkirinê, wekî merivekî ku hetanî r'oja îoryîn jîyaye dikare van heyşt pêxembertîya ji 1-ê 100.000.000.000.000.000.000".

Mîyaser bike". Ev hesab mêriv zendegirtî dihêlin, lê eger hûn matêmatîk yan jî ulmdar nînin, hûnê çetin vê yekê fem bikin. Kitêbêda Stoûnêr meseleke aqil tîne ber çava, kîjanê ezê diha zelal raber bikim. Eger me bikaribûya 100.000.000.000.000.000.000 heb dolarên zîv dest bixista, wî çaxî emê li ber problêmê bisekinîyana, çimkî meyê nizanibûya kö çawa wana xweyî bikin. Li temamîya dinyayê imbar yan jî avayîkî usa mezin tune. Cîhê bona wan perên hesin wê gelekî mezin bûya, wekî wê temamîya ştata Têxasê bikira bin xwe. Eva tiştekî gelekî mezine.

Em bînin ber çava, wekî me karibû awqas perên hesin destbixista. Eger me perekî hesin nîşan bikira û paşê jî lihev bixista, paşê çavên yekî girêda, bikira helîkoptêrê û li ser ştata Têxasêra bigeranda, hetanî ku ewî bigota helîkoptêrê li wî cihî peîyakin, li kîderê ew bêje. Çawa ku helîkoptêr peîya bibe û ew dikare derkeve û bêyî vekirina çavên xwe, perekî hesin hilde destê xwe. Himberîhevkirina vê yekê û usa jî ew yek, wekî merivekî hetanî roja îroyîn ev heyşt pêxembertî mîaser kirine, yeke.

Stoûnêr dinivîse:

> "Ev yek dide kivşê, wekî tenê mîyaserkirina van heyşt pêxembertîya şedetîyê dide, wekî Xwedê bi rastîya usa behn dabû ber van pêxembertîya, wekî ew ji rastîya here bilind tenê bi bûyînekê dûre ji 100.000.000.000.000.000–ê".

Dora van tişta meriv nikare bifikire. Feqet Stoûnêr li ser van heyşt pêxembertîya nasekine. Ew xebata xwe dûmayî dike û dîsa heyşt pêxembertîyên derheqa jîyîna Îsada ji peymana Kevin hildide (bi tomerî hildayî dibe 16). Ew dibêje:

> "Ew yek, wekî merivek dikare van 16 pêxembertîya mîaser bike, ji 1-ê $10^{45}$-e".

Gelo eva çi jimare? Bona nivîsara vê reqemê lazime 45 sifira peyî 1-ra daynin:

> 1.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000.000

Stoûnêr dinivîse ku ew yek çi dide kivşê û careke mayîn ez wê meselê bidime zelalkirinê. Eger awqas perên meye hesin hebûna, topa Dinyayê wê bona xweykirina wana gelekî biçûk bûya. Emê mecbûr bûna ku wana berev bikin û bikine topeke mezin. Wî çaxî ev topa wê ji 60 cara ji topa dinyayê mezintir bûya.

Îzina we hebe ez alî we bikim, ku hûn fem bikin, ku ew top wê çiqwas mezin bûya. Ez gelek cara diçime welatên başqe-başqe, ku Xebera Xwedê bidime hînkirinê. Tiştekî ecêbmayînêye, wekî roja îroyîn em dikarin bi teyarê nava 24 sehetada dora dinyayê bizvirin. Bona Şandîya rojên me wê xweş bûna. Çi jî hebe, eger me bixwesta bi teyarê dora topa perên hesin bizvirîyana, ewê mera li hev nehata, çimkî tu merivek sedsala meda awqas dirêj jîyan nekirîye. Çimkî wê lazim bûya bêyî sekinandin 400 salî dora wê topa perên hesin zivirek lêxista.

Em gerekê bîr bînin, wekî ev mesele mînanî ya pêşin nîne, çimkî ya pêşinda perên hesin ştata Têxasê dipêçan, bi qalimaya 60 santîmêtra. Vê carê perên hesin temamîya topa dinyaûê dipêçin.

Bînin ber çava, wekî hûn nîşanekî daynin li ser perekî hesin û evê topa mezin lihevxin û paşê çavê yekî girêdin û jêra bêjin, ku ji van pera yekî hilde. Gelo hûnê hîvîyêbin, wekî perê nîşankirî wê destê wîdabe. Niha we texmîn kir, ku nava jîyana merivekîda, pêşîya bûyîna Îsa 16 pêxembertî wê çi cûreyî bihatana mîyaserkirinê. Eva hela hê bes nîne. Stoûnêr careke mayîn li ser 16 pêxembertîya nesekinî û bi berdewamkirina xebata xwe hesab li ser 48 pêxembertîya kirin. Eva îdî ji fikira mêriv dere, lê em bicêribînin fem bikin, ku ew derheqa çida dinivîse:

> "Tiştê gotûbêjkirina me, yê bona derketina ji sînorêe fikira mêriv, em 48 pêxembertîya hildin û hesabkin, ku nava jîyîna merivekîda çiqwas pêxembertî dikarin bên mîyaserkirinê. Bi xebitandina dîsa wê prînsîpê, ya ku me pêşda dabû xebatê, em didine zelalkirinê, wekî nava jîyana merivekîda mîyaserkirina 48 pêxembertîya ji 1-ê $10^{157}$-e".

Dêmek li vir jî 157 sifirin. Minê badîhewa wedê xwe unda bikira, bona ku min bicêribanda ev reqem binivîsîya. Stoûnêr careke mayîn alî me kir, ku em wê yekê bînin ber çava. Bona şirovekirina vê reqemê perê hesin mezine, em gerekê tiştekî diha biçûk hildin.

Êlêktron tiştê herî biçûke, derheqa kîjanîda em zanin. Êlêkitron awqas biçûkin, wekî bixwezin wana bi dirêjaya 2 santîmêtr û nîv li rex hev daynin, wê ew şuxul 19 mîlîon sal bikişanda, bona ku reqema wan hesab bikirana. Ew gelekî biçûkin. Bîr nekin, wekî gilî derheqa xeta 2 santîmêtr û nîvda nîne. Bi bîrnekirina vê yekê werin em pirsê bidin, ku topa ji 10157 êlêktrona çêkirî, wê çiqwas mezinbe. Bi gilîkî gotî, dîamêtra vê topê wê diha mezin bûya, ne ku ew xala li ezmîn, ya ku 13 mîlyard sala ji me dûrtire.

Eger çavên yekî bigirtana û bigotana, ku dora van êlêktrona bigere û yekî bibijêre, wî çaxî gumana dîtinê wê mîna wê yekê bûya, çawa tu bêjî merivekî, ku ew nava dîroka temamîya dinîyayêda ji pêxembertîyên derheqa Îsada 48 heba mîyaser bike.

Gelo weyê bixwesta, wekî min ev gotûbêjkirin berdewam bikira û bighîştama hetanî 300 pêxembertîya. Ez bawrim ku hûn difikirin: "Ez hîvî dikim ku nelazime". Ez gumanim, wekî hûn jî usa difikirin, çimkî

eva bi têorî nikare ji alîyê mêrivda bê şirovekirinê, çimkî fikira me sînorkirîye.

Îzina we hebe, ku ez bidime tomerîkirinê. Peymana Kevinda ji 300-î zêdetir pêxembertî hene, yên ku ji alîyê merivên cuda-cudada hatine nivîsarê, yên ku li welatên cuda-cuda diman û bi zimanên başqe-başqe xeber didan. Ew nava sedsalada hatine nivîsarê û nava jîyana mêrivda mîyaser bûne. Çawa kesek dikare wê yekê înkar bike, wekî xudanê kitêba Pîroze rast Xwedê bi Xweye? Gelo fikira vê gotina ji devê Wî diha kûr nîne bona we?

> “Her xebereke Xwedê raste” (Gotinên Silêman 30:5, NLT).

Ew bi Xwe dibêje: “Ez kontrol dikim û dişuxulim, dîna xwe didime xebera Xwe bona ku wê yekê bikim” (Yêrêmya 1:12, AMP). Hema bo vê yekêye, wekî “tu tişt ji wan hemû tiştên qenc kêm nebûye, çi ku “Xudan... xeberdaye” (G Padişatî 8:56).

Xebera Xwedê diha qîmetlû û ya bawerkirinêye, ne ku roj, ya ku her roj derdikeve. Îsa wê yekê îzbat dike û dibêje: “Ezman û dinya wê derbazbin, lê gotinên Min wê derbaz nebin” (Metta 24:35). Efrandarê me dewsa pêçîyên Xwe hiştine bona ku em bizanibin, ku Ew Xwedêye, xwestina Wî nava kitêba Pîrozdane.

## Bi guhdarî guhê xwe bidine ser

Ezê careke mayîn wê yekê biwekilînim, ku Pawlosê şandî Tîmotêyo 3:16-da çi got: “Temamîya nivîsarê ji behna ber Xwedêye... û me hîn dike em wê yekê bikin, çi ku raste (yan jî qence)”. Ev fikira çetin nîne, ew gelekî zelale. Kitêba Pîroz Xebera Xwedê ye û em dikarin gumana xwe bidine ser wê, çawa qîmetkirina qencîyêye rast û qirarkirina norma hemtomerî. Eger hûn difikirin, wekî serwaxtîya we, ya hevalê we, yan jî ya yekî mayîn diha kêrhatîye, ne ku serwaxtîya Xwedê, ez hîvî dikim, careke mayîn fikira xwe lê binihêrin, çimkî kitêba Pîroz eyan dike:

> “Xwedê ji Ezmîn dîna xwe dide temamîya merivtayê. Ew digere ku bivîne, ku gelo kesek bi rastî serwaxte, yan na, yan gelo kesek Xwedê digere? Feqet usa nîne. Hemûya berê xwe vegerandine, hemû heram bûne. Tu kes *qenc*îyê nake, qet yek jî tune” (Zebûr 53:2,3, NLT).

Nava evî serê kitêbêda me dît, wekî Xwedê derheqa rastîya kitêba Pîrozda şedetîya neînkarkirinê daye. Nava van xeberên Zebûrda tê dîyarkirinê, wekî her serwaxtîk, ya ku dijî Xebera Xwed ye, diqewime ew baş bê kivşê, lê bi rastî ew heramkirîye û usa jî bona me tiştê xirabkirinêye.

Niha em xeberên Pawlose bona Tîmotêyo bi têksta diha berfireh bixwînin:

> "Lê tu nava wan tiştada bimîne, çi ku hîn bûyî û wê bawerîyêda jî guman bûyî. Tu zanî, wekî ew *rastin*... Kitêbên Pîroz te ji zarotîyêda hîn kirine... Temamîya kitêba Pîroz ji behna ber Xwedêye û bona hînkirinê kêrhatî ye, ku rastî çi ye û me hîn dike, ku em fem bikin, ku nava jîyanên meda şaşî kîjane. Ew me dide rastkirinê, wextê ku em şaşin û me hîn dike, ku em diha rastbin. Xwedê wî hemû tiştî dide xebatê, ku cimeta Xwe hazir bike û bide sîlihkirinê..." (B Tîmotêyo 3:14-17, NLT).

Em gerekê hindava wan hemû tiştada helal bimînin, kîjana em hîn kirine. Pawlos derheqa fikirê, pisîxolocîyê, yan jî sîstêma dinîyayêye serwaxtîyêda xeber nade. Fikira wî derheqa kitêba Pîrozdane. Ew ber dilê lawê xweyî ruhanîda tê, ku hindava Xebera Xwedêda helal bimîne. Çi ku ew dide kivşê, gelekî girînge û ew her dem gerekê dilê xweda hişyar xweyî bike. Gelo emê dinîyake çawada bûna, eger Adem û Hêwayê jî usa bikirana.

Niha halekî wî cûreyî bînin ber çavê xwe. Hûn gerekê deşteke usara derbazbin, li kîderê mîn (bomb) cîwarkirîne. Xêncî wê yekê, wekî ew bomb veşartîne, li wir usa jî qûm heye, telên mirinê hene, şînayên bi jehrê û çelên gelekî kûr hene.

Hetanî rêkevtinê xerîtê didine we, kîjanêda hemû bomb hatine kivşkirinê û wera şirove dikin ku ji wan tela çawa dûr bimînin. Gelo hûnê çawa nêzîkî wê xerîtê bibûna. Gelo weyê ew xerîte bikira çentê xwe, tevî xurek û ava xwe û wextê li ser rê rastî problêma bihatana, weyê tenê wî çaxî li xerîtê binihêrîya? Gelo weyê hesab bikira, wekî tenê kengê lazim bûya, weyê wî çaxî lê binihêrîya? Yan weyê bigota ku hûn dikarin hemû tiştî bîr bînin, çi ku li wir nivîsare? Weyê usa bikira? Wî çaxî yan hûnê ji deştê birîndarbûyî derketana, yan jî wê we îdî mirîtî derxistana.

Îzinê bidin ez wê yekê bêjim, çi ku eyane. Merivê serwaxt wê bi guhdarî xerîte bixwenda, lêkolîn bikira û wê dora wê înformasîyayê

bifikirîya, lê paşê wê ew xerîte danîya cîhekî usa, ku bikaribûya hêsa hilda. Ewê her dem li xerîtê binihêrîya û wê rêyên xwe fesal bibijarta. Eger hûn bi mecbûrî rêke usara derbaz bûna, weyê usa nekira?

Bi rastî em her roj rîya usara derbaz dibin û xerîta me jî kitêba Pîroze. Ezê çend xeberên kilît nav bikim. Hîvî dikim ku hema serra ber çavê xwera derbaz nekin, lê her xeberekê bi hûr-gilî bixwînin. Ew me şîret dikin û eşaretîyê didin, ku em çawa nêzîkî "xerîta kitêba Pîroz bibin", wextê ku em evê deşta dinîayêye mirinêra derbaz dibin. Wextê xwendinê guhdarîyê bidine ser xebera "*fesal*".

> "Hûn gerekê fesalbin, bona ku jîyana Xudan Xwedêyê xwe mîyaser bikin û bi hûrgilî dîna xwe bidine gotinên Wî" (Qanûna Ducarî 5:32, NLT).

Ne ku çend temîyên Wî, lê hemû temîyên Wî, em gerekê bi hûr-gilî guhdar bikin û peyî gotinên Wî herin. Ew bi kûrayî me hiz dike û naxweze, ku em zyanên mezin bikevin, yan jî li ser rê bimirin. Careke mayîn:

> "Bi guhdarî guhdar bike... û *fesalbe* ku gurêdabî, wî çaxî hemû tiştê bona te başbin..." (Qanûna Ducarî 6:3, NLT).

Wextê ku em guhdar dikin û fesal gurêda dibin, hemû tişt bona me baş dibe. Xwedê bi Xwe garantîya vê yekê bi sozê Xwe dide. Em van gotina nava xeberên Qanûna Ducarî 8:1; 12:28,32 û 28:13-da divînin. Bi xwendina van xebera hûnê bivînin, ku eger em temîyên Xwedê guhdar bikin, emê layîqî jîyaneke başbin, xebata me wê diha kardarbe, nava civakêda emê her dem li ser bilindayê bin û emê tu cara li jêr, yan jî li piştê nîbin. Gelo hûn fem dikin, ku fesal xwendina kitêba Pîroz çiqwasî girînge û pêra jî guhdarkin û gura xeberên Wî da bin? Diqewime hûn qayîl nebin û bêjin: "Feqet, Con, ev temî bin qanûnada hatibûne dayînê û ewana dewên Peymana Kevinin. Em niha bin ya nûdanin. Gelo Îsa em ji vî barî aza nekirin?". Îsa bi rastî em ji qanûnê aza kirin, lê ji guhdarkirina Xebera Xwedê aza nekirin, yên ku kitêba Pîrozda nivîsarin. Ev temî heta roja îroyîn jî gelekî girînge. Van parên Peymana nûda bixwînin:

> "Mûsa got: "Xudan Xwdêyê we wê bona we pêxemberekî mînanî Min (Îsa) wera ji cimeta we derxe. *Fesal* wî hemû tiştî guhdar bikin, çi ku wera Ew bêje"" (Karên Şandîya 3:22, NLT).

Em careke mayîn wê temîyê distînin, ku hemû gotinên Îsa fesal guhdar bikin (ne ku pareke wana), yên ku bona mene. Niha guhdarîya Aqûbê şandî bikin:

> "Lê eger hûn *fesal* dîna xwe bidine ewê qanûna kamil, ya ku me aza dike û eger hûn navda dimînin, çi ku ew qanûn dibêje û wê yekê bîr nekin, çi ku we bihîst, Xwedê wê we dua bike bona kirina we" (Aqûb 1:25, NLT).

Xêncî wê yekê Xebera Xwedê me hîn dike:

> "Bi saya qewata Ruhê Pîrozî ku nava meda dijî, *fesal* ewê rastîya biha xweyî bike, ya ku li me hatîye spartinê" (B Tîmotêyo 1:14, NLT).

> "Dêmek em gerekê bi fesalbûna mezin guh bidine vê rastîyê, ya ku me bihîst, ku em ji wê nexalifin" (Îbranî 2:1, NLT).

R'oja îroyîn xalifandina ji rê, çawa qanûn bi zanebûn naqewime. Wextê ku ez hela hê xort bûm û min çemda masî digirtin, carna min awqas dixwest zû destpê bikira, wekî min bîr dikir pêşîya girtina masîya qeyîkê girêdim. Ez usa mijûl dibûm, wekî piştî nîv sehetî, wextê ku min dîna xwe dida dor- bera, min îdî nas nedikir ku ez li kîderême. Ez bi nezanî dixalifîm, yan jî ji cîhê xwe dûrdiketim.

Wextê ku em guhdarîya mexsûs nadine ser rastîyê, wî çaxî em ji rastîyê dixalifin. Ew yek wî çaxî diqewime, wextê ku em êpêce wede Xebera Xwedê naxwînin û guhdar nakin, dora wê nafikirin û gura wêda nînin. Ew çi ku em li ser wê yekê tên merkezkirinê, bi temamî dimire. Wî çaxî jî em bi hêsanî ji rê dixalifin û Xebera Xwedê cîhê xwe dide hukumê merivên li dor-bera. Em destpê dikin wê yekê qebûlkin, çi ku bona me qenc tê kivşê, ew jî bi qîmetkirina meye navhevxistî.

Serê kitêbêyî pêşinda me rastîke girîng îzbat kir, wekî bêyî Xebera Xwedê tu tiştekî qenc bona me tune. Hûn qayîlin, wekî Xebera Xwedê kitêba Pîrozda eyankirîye? Eger hûn wê yekêra qayîlin, usaye gerekê em hîmê (bingeha) xwe çê bikin.

4

# BİNGEH

“Merivên xwedêparast xweyê bingeha qewînin”
— Gotinên Silêman 10:25, NLT

Eger hûn kitêba Pîrozda bawerîya xwe li wan
tişta tînin, kîjana hûn begem dikin û wana
înkar dikin, kîjana hûn begem nakin,
usaye hûn bawerîya xwe ne
ku li kitêba Pîroz, lê xwe tînin.
— Ogostînosê Pîroz Xwezilî

Îzina we hebe ez derheqa sê alîyên vê kitêbêda bîr bînim. Alîyê ewlin bingehe, yê duda çi jîyana me tîne bîr û alîyê sisîya jî sembola çêkirina jîyana me ye. Emê derheqa van her sê alîyada hetanî xilazbûna kitêbê xeberdin.

Bingeh bona heleqetîyên raste tevî Xwedê tiştekî gelekî girînge. Eger hûn bawermendekî wedê dirêjin, ez hîvî ji we dikim, ese van xebera bixwînin. Ewê ne tenê bingeha we bide qewînkirinê, lê wê usa jî wan meriva û hukumê weye ku nava jîyana wanda heye bide qewînkirinê, rêberîya kîjana hûn dikin û wê usa jî alî bike ku heleqetîyên tevî Efrandarê me çê bikin.

Nivîsare:

> “Kitêba Pîroz dibêje: “Yekî rast tune, tu kes tune. Tu kes bi rastî serwaxt nîne... hemûya berê xwe guhartine: hemû bêkêr bûne. *Yekî qencîyê bike tune, tu kes tune* (Romayî 3:10-12, NLT)

*Yekî qencîyê bike tune, tu kes tune*. Xêncî Îsa Mesîh tu merivek tune, yê ku li vî welatî jîyaye yan jî wê bijî, yê ku anegorî normên

Xwedê qencî kirîye, yan jî qencîyê dike. Menî ewe, wekî her merivek çawa xulam hatîye dinîyayê. Belê, him hûn, him jî ez, em çawa xulam hatine vê dinyayê. Hûn dikarin bipirsin: “Bona çi xulam?”. Bona guneh. Pawlos bona wan meriva dinivîse, yên ku ji wê yekê aza bûne: “Wextekê hûn xulamên gune bûn” (Romayî 6:17, NLT).

Adem û Hêwa wî çaxî mirin, wextê ku ji gura Xwedê derketin. Xwedê derheqa ewê yazîya talda eşaretî dabû, hela hê pêşîya xwerina berê wê darê. Çi jî hebe, gelek sal derbaz bûn û her du jî bi mirina tebyetî mirin.

Bi vî cûreyî pirs pêşda tê: gelo Adem û Hêwa çawa wê rojê mirin, wextê ku berê wê darê xwerin? Mirin hema merkeza heyîna wanda qewimî, nava ruhê wanda. Ew ji Xwedê qetîyan, ji Ewê ku jîyanê dide. Zarokên wan jî wî cûreyî hatine dinyayê û ew yek ji nisiletekê derbazî nisileta mayîn bû, hetanî rojên me. Destpêbûn 5:3 vê yekê îzbat dike: “Wextê ku Adem 130 salîbû, kurek jêra bû, yê ku r’ast mînanî wî bû, anegorî ruhê wî û şikilê wî” (MSG). Ewî îdî nikarbû merivatîyê bi rastî nas bike, yan jî qencîyê bike. Kêmasî ketibû nava moralên wan. Dêmek li vir jî tenê hukumê Xwedê wê bikaribûya li ser dinyayê meriv bibirana berbi qencîyê û heqîtîya rast, çimkî meriv îdî bi gunehê xwe tê rêberkirinê. Bêyî rêberîya xwedêtîyê qencî û xirabî bona wî navhevketibûn. Niha xweyê merivatîyêyî nû û hukumdarê nava jîyana wanda ew bû, mîrêcin bû, padişê ji gurêderketinê, yê ku li baxçê Êdênê ketibû dilqê mar.

Xwedê topa dinyayê dabû meriva. Ewî usa jî serwêrtîya li ser dinyayê dabû wana, lê wana jî ew yek teslîmî mîrêcin kir. Piştî bi hezara sala, mîrêcin Îsa bire ser çihekî bilind, temamîya dinyayê nîşanî wî kir û gotê: “Ezê temamîya serwêrtîyê û rûmeta wana bidime Te, ya ku dane min û ez çawa dixwezim, usa jî didime yekî mayîn” (Lûqa 4:6). Cin dikaribû wî cûreyî xeberda, çimkî ew serwêrtî li baxçê Êdênê dane wî.

Xwedê nikaribû bi cûrê xwedêtîyê bihata dinyayê û me xilaz bikira, çimkî dinya bona meriva hatibû dayînê. Meriva bi xwe serwêrtîya xwe daye û usa dertê, wekî tenê meriv dikaribûn serwêrtî paşda hildana. Progirama Xwedê hela hê pêşîya Adem hebû, çimkî Wî bijartina Adem hetanî destpêka wî wedeyî têra dît. Wî qirar kir ku çawa Meriv bê

dinyayê û azaya merivatîyê paşda bikir'e û wana ji xulamtîyê aza bike. Xwedê Kurê Xwe, Îsa Msîh, şand. Ew ji jinekê hate dinyayê, bi saya kê Ew bi sed selefî meriv bû, lê ji Ruhê Xwedêyî Pîroz çêbû, bi saya çi Ew Xwedêyê sed selefî bû. Bo vê yekê jî Îsa ji nifira wê xulamtîyê aza bû, bin kîjanêda em hatine dinyayê.

Jîyîna Îsa, ya li ser dinyayê, bi kamilî bû. Ew tu cara ji gura Xwedê derneket. Çawa Merivê tek-tenêyî bêsûc, Yê ku li vê dinîyayê jîyabû, Ewî emirê Xwe bona azaya merivatîyê da. Li ser xaç Îsa dîwana her merivekî hilda ser Xwe. Ewî bi xwîna Xweye padişatîyêye rijîyayî bahê azakirina me da.

Ew mir û hate definkirinê. Çawa ku jîyana Wî li ber Xwedê kamil bû, piştî sê roja Ruhê Xwedê Ew ji nava mirîya rakir. Ew niha li alîyê Xwedêyî rastê rûniştîye, Yê ku jîyaneke wa daye:

> "Eger tu bi devê xwe îqrar bikî, ku Îsa Xudan e û dilê xweda bawer bikî, ku Xwedê Ew ji nava mirîya r'akirîye, tê xilazbî, çimkî bi dil yek bawer dike, rast tê hesabê û bi dev îqrar dike, xilaz dibe" (Romayî 10:9,10).

Wî çaxî, wextê ku em Îsa Mesîh çawa Xudanê xwe qebûl dikin, ecêbek diqewime. Tebyeta gunehê me û mirina me carekêra dûr dikevin û merivekî nû tê dinyayê, bi şikilê Îsa çêkirî. Ev bûyîna nû derheqa ruhê medane, lê ne ku derheqa bedena meda. Bedena me hela hê paqij nîne û wê rojekê bimire. Ev jîyana nû tenê li ser bingeha pêşkêşa kerema Xwedê tê dayînê û ew kirinên meye qencva girêdayî nîne û bona wê yekê nayê dayînê, ku em xebatên layîq dikin. Ev rastî nayê guhartinê.

Girînge bidine kivşê, wekî para ji kaxweza Romaya hildayî dibêje, wekî hûn gerekê Îsa çawa *Xudan* bihebînin, lê ne ku çawa *Xilazkir*. Eva şaşîke hîmlîye, ya ku li Civînên welatên Rojavayê heye. Xebera "*Xudan*" zimanê yûnanîda xebera "Kyûrîos"-e, fikira kîjanê eve- "xudan", "xudanê hebûnê", "xudanê serwêrtîya here bilind".

Hebandina Îsaye tenê çawa Xilazkir, azayê û jîyana nû nayne. Ez fem dikim, wekî eva gotineke berke, ya ku dijî wî cûrê qebûlkirîye, bi kîjanê em berbirî merivên undabûyî dibin, lê ew gotin anegorî kitêba Pîroze.

Nava kitêba Pîrozda xebera "*xilazkir*" 36 cara hatîye nivîsarê, lê xebera "*xudan*" 7800 cara em divînin. Bi fikira we meremê Xwedêyî

sereke kîjane? Navê "*Xudan*" wê *tabîyê* dide kivşê, ya ku nava jîyana meda ya Wîye, lê navê "*Xilazkir*" wê *xebatê* dide kivşê, ya ku Wî bona me kirîye. Em nikarin tevî *xebata* Wî bibin, çimkî em hela hê neketine nava wê *tabîyê*, ya ku ya Wî ye çawa Xudan û Padişa.

Em çawa xulam hatine dinîyayê. Bi cûrê zelal gotî, em hebûna gunehê xwe bûn. Feqet, em bi xwestina xweye aza hatine çêkirinê û lema jî em gerekê qirarê qebûl bikin û elam bikin, ku em xudanê xwe diguhêrin. Xilazbûn bona her merivekî hatîye dayînê, feqet ji me her yek gerekê qirarê bi qewilên Xwedê qebûl bike.

## Hebs li ser adê

Ezê serhatîkê wera glîkim ku vê rastîyê şirove bikim.

Bînine ber çavê xwe, wekî temamîya malbeta we hebsêdane û ew hebs jî li ser adêye: xudanê kîjanê merivekî xirabe. Gelek wede pêşda padişakî ji welatekî dûr ew ada pêşkêşî bapîrê we kiribû. Feqet bapîrê we şaşî tê berdabû û ew ade xweyî nekiribû. Ev merivê xirab, bi koma xweye xirabkarava, hatîye û bi qaçaxî ew ade dager kirîye, bapîrê we û peyîhatîyên wîye mayîn kirine xulam. Wextê ku ade kete destê wan meriva, wana li wir hebs çê kirin û temamîya malbeta we girtin.

Jîyana li ser wê adê bere-bere bû anegorî tebyeta wî merivê xirab û koma wîye xirabkara gihîşte heramîyê û zinêkarîyê. Bo wê yekê jî padişê qenc ew ade xirab kir. Feqet padişa malbeta we gelekî hiz dikir û pêşîya xirabkirina adê, Ew hat û dijî ewî eskerê merivê xirab şer kir û alt kir.

Peyî wê yekêra padişê qenc dergehên hemû hebsa vekirin û elam kir: "Niha hemû girtî azane. Ji we her yek dikare ji hebsê derkeve, eger serwêrtîya merivê xirab înkar bike û sonda helalîyê bide min". Bi saya rehmbûna wî, malbeta we azadî stend. Çawa jî hebe, padişê qenc wê we mecbûr neke ku li peyî wî herin. Her girtîk bi xwe gerekê gava xwe biavêje. Eger padişê qenc mecala hilbijartinê neda, lê dew bikira ku bikevne bin kontrola wî, wî çaxî li wê adê wê careke mayîn dîktatorî îzbat bûya. Eger hûn qirara derheqa azadyêda qebûl bikin, wî çaxî hûn gerekê ji hebsê derkevin, peyî padişê nû herin, bikevine gemîya wî, bin serwêrtîya wîda bin û bi qanûnên padişatîya xweş bijîn. Ev mecal bona we hatîye dayînê, lê hûn gerekê qewilên padişê qenc qebûl bikin.

Padişê qenc tê hesabê çawa *xilazkirê* malbeta we. Bona ku hûn karê ji vê xebata xilazkirinê bistînin, her endamekî malbeta we gerekê qayîl bibe ku bi dil gura wîda be. Dêmek anegorî qanûnên padiþatîya wî bijîn. *Her endamekî malbeta we, yê ku girtîbû, nikare tenê xilazkirina ji alîyê padişê*da qebûl *bike û bêyî qebûlkirina serwêrtîya wî ji adê dûrkeve.*

Eger hûn qirarkin, ku hûnê li peyî wî padişayî neçin, hûnê cîhê xweda bimînin. Feqet gemîyên padişêye leşkerî nêzîkî adê sekinîne û hazirin adê bidine ber bomba û wêran bikin, wextê ku ew dûrkeve. Endamên malbeta we, yên ku naxwezin *serwêrtîya* padişê ya qenc qebûl bikin, wê layîqî wê yazîyêbin, çawa ku ew merivê xirab bû, nenihêrî wê yekê, wekî padişa bona azakirina we şerkarî kiribû û dergêhên hebsê vekiribûn.

Xwendevanê hizkirî, guhdarîya min bikin. Xwedê doje bona merivekî çê nekirîye. Ewî ew bona mîrêcin û leşkerên wî çê kirîye. Roja dîwanê Îsayê bêje wan, yên ku serwêrtîya padişatîya Wî qebûl nekirine:

> “Nifir lê bûyîno! dûrî min herin, nava agirê heta-hetayê, ku *bona mîrêcin û milyaketên* wî hazir bûye” (Metta 25:41).

Doje cîhekî gelekî raste. Îsa derheqa wê yekêda diha gelekî dibêje, ne ku derheqa Ezmînda. Ewî derheqa dojêda çawa kêmasîya dilrehmîyêda şirove nedikir. Doje bona wan mirîya mala heta-hetayêye, ewên ku serwêrtîya Wîye hizkirinê înkar dikin.

Anegorî gotinên Îsa ev cîhê cezakirinê û xirab bona meriva nehatîye hazirkirinê, feqet mixabin Adem rûyê kirina xweda em jî kirine ew meriv, yên ku dikarin ber dîwanê bisekinin. Niha yazîya mîrêcin usa jî hîvîya meye, eger em xudanê xwe neguhêrin. Nenihêrî wê yekê, wekî Îsa temamîya merivatîyê ji hêrsa Xwedê xilaz kirîye, gelek meriv wê tevî mîrêcin li ber dîwanê bisekinin, çimkî ew hela hê bin tebyeta mîrêcindanin. Diqewime wana qirar kir ku li ser adê bimînin.

Diqewime hûn bipirsin: “Bona çi Xwedê nikare qencîyê bide kivşê û îzinê bide miriva, ku ew çi cûreyîne, usa jî bikevine padişatîya Wî?” Menî eve: ew merivên ku naxwezin bibine yên Îsa, ew hela hê paqij nînin û tebyeta wane ruhanî jî xirabe. Hema ew ji dinîyayê dûrkevin, ew dinîya wê heta-hetayê bibe ya wan. Eger îzinê bidine wan ku

bikevine nava padişatîya Xwedêye heta-hetayê, ewê li wir jî zyanê bighînine merivên bêsûc û bêguneh.

Hema ev bû menî, wekî Xwedê Adem û Hêwa ji dara jîyînê dûrxist, ya ku li baxçê Êdênê bû.

> "Û Xudan Xwedê got: "Va ye, meriv û mîna ji me yekî, qencî û xirabîyê ji hev derdixe, lê wê çawabe, ku ew destê xwe dirêjî dara jîyanê bike jî, ji berê darê hilde û bixwe? Peyî wê yekêra Xudan Xwedê ew ji baxçê Êdênê derxistin" (Destpêbûn 3:22,23, NLT).

Hizkirina Xwedê em ji tebyeta mirî xilaz kirin.

## Serwêrtî

Civîna Rojavayê ew xebat daye dîyarkirinê, wekî çi ku Îsa bona me kirîye çawa Xilazkir diha zêdeye, lê ne ku tabîya Wî ya çawa Xudan. Rûyê wê yekêda gurêdabûna meye hindava serwêrtîya Wî kême û ev yek terikê hîmê me dixe. Pawlos dinivîse:

> "Awa, we çawa Xudan Mesîh Îsa qebûl kir, usa jî hûn gerekê li peyî Wî herin. Îzinê bidin, wekî rawên avîtî nava Wîda bighîjin û *jîyanên we li ser Wî b*ên çêkirinê" (Kolosî 2:6,7, NLT).

Pawlos nabêje: "Çawa ku we Mesîh Îsa çawa *Xilazkirê* xwe qebûl kir. Jîyanên me gerekê nava tabîya Wî ya serwêrtîyêda bin û li ser Wî jî bên çêkirinê, lê ne ku li ser wê xebatê, ya ku Wî çawa Xilazkir mîyaser kirîye. Meriv dikare vî cûreyî şirove bike: em gura Wîdanin çawa hindava Padişê tek-tenêyî herî bilind û tenê wî çaxî em xilazkirina Wî divînn. Bona bi pratîkî mîyaserkirina vê yekê, em piştgirîyê didine xebera Wî, serwaxtî, şêwir, gotin, rastkirin û şîretên Wî qebûl dikin, nenihêrî wê yekê, ku em fikirê nava wê yekêda divînin, yan na. Em îdî ji dara xwe tu tiştî nastînin. Dixwezim bêjim, ku em nacêribînin bi xwe qirar bikin, ku çi raste, çi jî şaşe. Em nava Wîda dijîn, jîyîna Wî dibe ya me.

Ezê meselekê bînim ber çava. Eva serê 30-î salîye, ku min Lîza stendîye. Tiştê wêyî herî baş xwerinçêkirina başe. Lîza hosta xwerinçêkirinêye. Çend hevalên min hîvî ji Lîzayê dikirin, ku ew jinên wan hînî çend cûren xwerinên ban bike.

Gelek cara min Lîza çawa “hosta xwerinçêkirinêye biçûk” nav dikir. Min bi deha cara ew usa nav kirîye, feqet diha gelekî, nava van sî salên dawîda min ew çawa jina xwe nav kirîye. Bona çi? Çimkî ev xeber ew *tabîya* wê dide kivşê, kîjanê ew nava emirê xweda dike. Navê mayîn dide kivşê, wekî ew jî *cudatîyeke*, ya ku bona wê yekê min stendîye, wekî ew jina mine.

Ew yek, wekî Lîza xwerina bona min çê dike, hela hê nade kivşê, wekî ez yê wê me. Wextê ku ez azep bûm, roja bûyîna min ewê xwerineke baş çêkir. Feqet menî ew yek nîbû ku heleqetî di navbera meda hatine çêkirinê. Heleqetîyên me bi saya wê yekê îzbat bûn, wekî di navbera meda hevraqayîlbûn hate morkirinê. Min qirar kir, ku hemû keça daynime alîkî û dilê xwe bidime wê, bibime mêrê wê.

Heleqetîyên meye tevî Îsa jî mînanî vê meselêne. Em gerekê gura padişatîya Wî da bin, bona ku xilazbûna Wî bistînin. Em jîyanên xwe pêşkêş dikin, çimkî em bawerîya xwe li serwêrtîya Wî ya kamil, xeyset û hizkirina Wî tînin. Û ew zane ku tiştê herî baş bona me kîjane. Nenihêrî wê yekê, wekî Ew bi dil dixweze nêzîkî mebe û me hiz dike, Ew Padişê padişaye û Xudanê xudanaye û wê nava jîyîanên meda neşuxule, eger Ew bibe yê duda, yan jî piştî merivekî.

Li civînên Amêrîka Bakûr û welatên Rojavayê ez gelek cara bûme şedê wê yekê, wekî qulixçî xilazbûnê bona wan merivên ku Xwedê digerin pêşnîyar dikin, lê bêyî bîranîna serwêrîya Îsa. Qulixçî dibêjin: “Hûn gerekê Îsa çawa Xilazkir qebûl bikin û hûnê bibine kurê Xwedê”, yan jî- “Hûn bona çi Îsa çawa Xilazkirê xwe qebûl nakin?”, yan jî mînak- “Werin em hemû kes dua bikin: “Îsa, were nava dilê min û îro min xilaz bike. Spas bona wê yekê, ku Te ez kirime kurê Xwedê. Amîn””. Hemû bangên wan, yên bona gihîştina malbeta Xwedê bêyî wê yekê tên kirinê, ku meriv gerekê vê sîstêma dinyayê bihêlin û li peyî Îsa herin.

Ev bang çawa ya baş û qenc tê texmînkirinê û ji têkstê cuda, çend tiştava, çend beşên kitêba Pîrozva tên girêdanê. Feqet, gelo ew bang gorî peymana Nû ye? Gelo ew serwaxtîya Xwedê ye? Yan me banga xilazkirinêye rast kurt kirîye û bangeke usa stendîye, ya ku anegorî xwestinên wan merivaye, yên ku Xwedê digerin? Diqewime ku bi vî cûreyî em ji dara xweye qîmetkirinê tiştekî distînin?

## Şexsê xwe înkar bike

Niha em banga Xdan ya xilazkirinê binihêrin. Îsa gote elaletê:

> "Eger yek dixweze li peyî Min bê, bira xwe înkar bike, xaçê xwe hilde û li peyî Min bê, çimkî ku dixweze jîyana xwe xilaz bike, ewê wî unda bike û kî ku jîyana xwe bona Min û Mizgînîyê unda bike, ewê wî xilazke" (Marqos 8:34,35).

Em gerekê şexsê xwe înkar bikin, eger em dixwezin li peyî Wî herin. Ev yek çi dide kivşê? Diha zelal gotî, hûn nikarin qulixî du axaya bikin, çimkî herdu jî wê jîyan û dewên dijî hev raberî we bikin û hûn dikarin tenê hindava yekî da helal bin, bona wî qulix bikin. Carna halên usa pêşda tên, wextê ku bedena me ya ku hela hê nehatîye kirînê, tiştekî mayîn dixweze, lê Xebera Xwedê cûrekî mayîn rêberîyê li me dike. Eger me hela hê qirar nekirîye ku em li peyî Îsa herin, çawa Xudanê jîyana meyî herî bilind, em dikarin hêsa rîya xwe bibijêrin, feqet Wî hesabkin çawa Xilazkirê me û wê yekê bihebînin. Diqewime em şaş bûne û hema vî cûreyî jî bawer dikin?

Diqewime Îsa hema rûyê vê yekêda got: "Dêmek hûn bona çi min çawa "Xudan, Xudan" nav dikin, eger hûn wê yekê nakin, çi ku Ez dibêjim" (Lûqa 6:46, NLT). Bi gilîkî mayîn gotî wî çaxî xebera "Xudan" dibe xebera bêfikir û vala. Eger em bi rastî wê fikirê navêjin, wextê ku Îsa wî cûreyî nav dikin, wî çaxî ewê diha gelekî bixwesta, ku me Ew çawa "Dersdarê Mezin" nav bikira. Wî çaxî jî meyê dîsa ji hînkirinên Wî kar bistenda û emê nexapîyana û bifkirîyana, wekî em yên Wî ne, lê eger lê binihêrî usa nîne.

Anegorî nivîsara Marqos 8:34,35-a û Gotinên Mizgînîyêye mayîn, înkarkirina xwe ne ew rêye, eger em dixwezin li peyî Wî herin û ji vê dinya gunekar derkevin. Ew yek peymana eseyî ye, ku ji hêrsa ku wê bê em xilazbin. Min daye zelalkirinê, wekî merivên ku li Rojavayê dijîn vê fikirê çetin qebûl dikin. Bi fikira min, menî ewe, wekî bi heyîna *fikirdarîya dêmokratîk,* meriv dicêribînin *prînsîpên padişatîyê* fem bikin. Dêmokratîya li Amêrîkayê û Rojavayê gihîşte açixîyê, lê em bi fikirdarîya wî cûreyî nikarin tevî Xwedê tevgirêdanê îzbat bikin. Ew Padişa ye, Padişayê raste, lê ne ku ji alîyê yekîda hatîye danînê, çawa ku mesele li Înglîtere.

Anegorî dêmokratyayê “serkarîkirin ji alîyê cimetêda tê kirinê, ew cûrê serkarîkirinêye, nava kîjanêda serkarîkirin ya cimetêye û ji alîyê wêda yan jî ji alîyê merivên wêda hilbijartî tê mîyaserkirinê”. Em, cimetên Amêrîkayê û welatên rojavayê ye mayîn hema bi wê fikirdarîyê hatine terbetkirinê. Ev yek nava fikirdarîyên meye hîmdarda hatîye progirmkirinê. Eger tiştek li me xweş nayê, wî çaxî em bawer dikin, ku em dikarin wê yekêra qayîl nebin, yan jî biguhêrin, çimkî qanûn û mafên wî cûreyî, xebera aza hene, bi kîjana em fikira xwe elam dikin.

Îzinê bidin, ku ez careke mayîn vê fikirê biwekilînim. Ev cûrê serkarîkirinê li Amêrîkayê gihîşte açixîyê, çimkî ew bona meriva têra hatîye dîtinê, yên ku nava civaka pirfikirda dijîn. Feqet van fikira nikarin cîguhastî nava padişatîya Xwedê bikin. Diqewime fikira mayîn binelîyên rojavayê ecêbmayî bihêle, lê Xwedê yeke. Bi rastî tiştekî başe, wekî Ew qence û merde, feqet gotina xilazîyê yê bona vê jîyînê nava hemû pirsada ya Wî ye. Eger em fikirdarîya dêmokratîk cîguhastî nava evê şuxulkarîya meye tevî Xwedê bikin, emê bighîjine heleqetîyên lap başqe.

Jîyan bin serwêrtîya Padişayê rast lap başqeye. Xeberên *“xudan” û “padişa*” bi fikira “*ewê ku serwêrtîya here bilinde*” sînonîmên hevin. Eger em bi rastî dixwezin peyî Xwedê herin, em nikarin bi fikirdarîya dêmokratîk caba rêberîya Wî bidin. Wî çaxî emê ji Adem û Hêwayê cuda nebin, mînanî wanbin, yên ku dara jihevderxistina qencîyê û xirabîyê bijartin. Wî çaxî emê hela hê dîsa li ser wê rêyê bin û emê bi xwe qirar bikin, ku çi bona jîyana me tiştê herî başe.

## Xaçê xwe hilde

Paşê Îsa elam kir, wekî em gerekê xaçê xwe hildin. Eva çi dide kivşê? Çetin ev yek bide kivşê, ku “*em şexsê xwe înkar bikin*”, çimkî bona çi Îsa gerekê bêyî menî gotina Xwe biwekilanda? Em kilîta vê gotinê nava nama Pawlose bona Galatîya divînin, kîjanêda ew dibêje:

> “Ez tevî Mesîh xaç bûm. Ji vir şûnda ne ku ez dijîm, lê Mesîh e ku nava minda dijî. Û niha ku ez vî qalibîda dijîm, ku bi Kurê Xwedê bawerkirinê dijîm, Yê ku ez hiz kirim û canîya xwe bona min da der” (Galattî 2:19b,20).

Pawlos derheqa xaçkirina bedenêda nedigot. Eger usa bûya, wî çaxî ewê mirî bûya û wê nikaribûya ev name binivîsîya. Ewî derheqa qirara çûyîna li peyî Xudan digot, ya ku ewî çend sal pêşda qebûl kiribû. Palos xaçê xwe hildabû. Ew yek çi dide kivşê, hema nava xeberên wîda nivîsare: “Ez îdî najîm, lê Mesîh nava minda dijî”. Hema ev yek gerekê bibe elamkirina her kurekî Xwedêyî rast. Em îdî serbest nînin, em îdî ji dara xweye qîmetkirinê tu tiştî nastînin. Dixwezim bêjim, ku em bi xwe îdî qirar nakin ku kîjane qenc, kîjane xirab. Na xêr: em niha nava Wîda dijîn û jîyana xwe em ji wî distînin. Em ji dayîna xaçva girêdayîne. Bi saya xaç me azayî stendîye, ku em bikaribin bi jîyana ji alîyê Xwedêda dayî bijîn.

Xaç jîyaneke nû bona me pêşnîyar dike. Nava nameke mayînda Pawlos dibêje: “...çawa Mesîh bi rûmeta Bavê ji mirinê rabû, usa jî emê bikaribin jîyana nûda bijîn” (Romayî 6:4). Bi saya vê jîyana nû emê bikaribin ji wan tişta paşda bisekinin, ji kîjana berê me nikaribû. Dîktatorîya guneh jîyana meda xirabkirîye, lê emê qirar bikin wê yekê qebûlkin, çi ku me stendîye. Em gerekê qirarkin, ku bi temamî teslîmî Wî bin.

Pawlos dîsa şirove dike, ku bi praktîkî çawa vê yekê bidine xebatê: “Û ewên ku para Mesîh Îsane, binyata xwe bi temên xirab û havijîyava ber xaç kuştine” (Galatî 5:24). Û careke mayîn: “Lê ji min nakeve, ku ez bi tiştekî din bifirim, pêştirî bi xaçê Xudanê me Îsa Mesîh, bi kîjanî dinya bona min xaçbûyî ye, ez jî bona dinyayê” (Galatî 6:14). Xaç qewatê dide me, ku em ji bedena gunekar û ji hukumê evê sîstêma dinyayê aza bijîn.

Xortanîyêda hetanî rasthatina tevî Îsa, çend tişt nava xeysetê minda hebûn, ji kîjana ez nikaribûm azabûma. Ez paşê bona wan gavên ku diwekilîn, poşman dibûm, hîmê kîjana kubarî û temên xirab bûn, lê min çiqwas dicêriband ku ji wana azabim, ez awqasî zêde aciz dibûm. Ez, bêguman, gunehva girêdayî bûm û bin serwêrtîya wîda bûm. Feqet wextê ku ez tevî Mesîh hatime xaçkirinê, îdî min karibû ji guneh aza bijîm.

> “Em vê yekê zanin, ku binyata meye kevin, ya gunekar, tevî Mesîh xaç bûne, bona ku guneh serwêrtîya xweye nava jîyanên meda unda bike. Em îdî xulamên guneh nînin, çimkî wextê ku em tevî Mesîh mirin, em ji serwêrtîya guneh aza bûn” (Romayî 6:6,7, NLT).

Ez gumanim, wekî hûn sera-bera van beşên nivîsarê bin çavên xwera derbaz nakin. Van xebera bi kûrayî dilê xweda qebûl bikin, çimkî ew gelekî rastin û dikarin azadyê bidine we. Bi rastî gotî, rastî mêriv ruhdar dike. Xaç ne t'enê ji guneh me azad dike, lê usa jî karebûnê dide ku gura Wîda bin. Nivîsare: "Hînkirina derheqa xaçda undabûyîyara bêhişîye. Feqet em, nava xilazbûnêdanin, zanin, wekî ew yek qewata Xwedê ya raste" (A Korintî 1:18, NLT). Niha em dikarin wî hemû tiştî bikin, çi ku me berê bi qewata xwe nikaribû bikira. Niha em dikarin bi rêyên Xwedê bigerin. Niha em dikarin mînanî Xwedê bin. Niha em dikarin peyî Îsa herin.

Bi tomerîkirina vê yekê, ez bêjim, wekî bêyî înkarkirina xwe meriv nikare peyî Îsa here û xaçê xwe hilde (bi saya kîjanî em dikarin ji guneh û sîstêma vê dinyayê dûrkevin). Em dijîn û bawer dikin, wekî karebûna Wî nava meda ye û bi saya me dişuxule. Awa, dîna xwe bidinê, ku Xwedê xilazbûneke çiqwas rûmet daye me.

## Eşaretîya bi heyteholî

Îsa eşaretî da, wekî peyî çûyîna Wîra mizgînîke mayîn wê bê. Ewê bi berfirehî bê terîfkirinê û wê ji alîyê merivada bê qebûlkirinê û wê xilazbûnê pêşnîyar bike, bêyî gurêdabûna nava serwêrtîya Wî da. Şagirta ev eşaretî diha dane zelalkirinê û nivîsîn, wekî ewê wî çaxî biqewime, wextê ku hatina Îsa nêzîk bibe, dêmek rojên meda. Ev hînkirina bi berfirehî wê fikira xebera "xudan" unda bike û usa jî ya tabîya Îsa, ya ku nava jîyanên merivadaye, wê werguhêzî navekî sade bibe. Merivê bêjin "xudan", lê wê xwe înkar nekin, wê xaçê xwe hilnedin û wê peyî Wî neçin. Bi guhdarî xeberên Îsa bixwînin:

> "Ne ku ewê ku minra dibêje "Xudan, Xudan" wê bikeve Padişatîya Ezmana, lê ewê bikevê, yê ku jîyana Bavê Minî Ezmana diqedîne" (Metta 7:21).

Îsa derheqa wan merivada digot, yên ku *Wî* çawa Xudan nav dikin, lê ne ku Mehmed, Cozêf Smît, Vûdda, Krîşna, Konfûsîyos, yan jî pêxemberekî mayînî derewîn, yê wedê me. Na: van meriva elam dikirin, wekî Xudanê wan Îsa Mesîh e û ew yek wana bi aktîvî dikir.

Bona çi Îsa xebera “*Xudan*” nava vê gotinêda du cara da xebatê? Em fem dikin, wekî wextê kitêba Pîrozda xeber yan jî gotinek tê wekilandinê, ew badîhewa nîne, çimkî xudanê nivîsarê bi zanebûn dixweze wê yekê bide kivşê. Wî çaxî wekilandin ne tenê fikira gotinê dide kivşê, lê bi êmosyonalî wê yekê dide kivşê. Mesele Peymana Kevinda, wextê ku Dawid pê hesîya, wekî eskerê Hovab kurê wî kuştibû, cabdayîna wî gelekî bi êmosyonalî bû. Û padişê sifetê xwe girt û bi dengê bilind kire qîrîn: “Kurê min, Abîşalom, Abîşalom, kurê min, kurê min (B Padişatî 19:4). Ez nafikirim, wekî Dawid xebera “kurê min” du cara wekiland. Dewsa wê yekê xudanê nivîsarê du cara nivîsîye, bona ku xwendevanara femdarîbe, ku qîrîna Dawide şînê bi çiqwasîva bi êmosyonalî bû.

Em dikarin wê yekê usa jî kitêba Eyantîda bivînin: “Hingê min dîna xwe dayê û milyaketekî, ku nava ezmînra difirî û bi dengê bilind digot: “Wey, wey, wey li serê binelîyên li rû barê dinyayê” (Eyantî 8:13). Awa tercimên başqeda nivîsare, wekî milyaket “bi dengê bilind dikire qîrîn”. Û careke mayîn xudanê nivîsarê xebera “wey” bona nîşandayîna êmosîya diwekilîne.

Hema bi wî cûreyî jî Xudan êmosîyayên qewat derbazî ser meriva dike, yên hindava Wî da. Ew ne tenê vê hînkirinêra qayîlin, wekî Îsa Mesîh Kurê Xwedê ye, lê usa jî ew bi êmosyonalî û bi germayî nava hebandina xwedanin. Gilî derheqa wan merivadane, li kîjana xweş tê ku mesîhî bin, yên ku êmosyayên xwe didine kivşê, wextê ku derheqa hebandina wanda xeber didin.

Ew ne tenê bi kûrayî hînkirina Mesîhra qayîlin, lê usa jî qulixî Wî dikin,

> “Ez dikarim wê yekê bivînim. Wextê dîwana xilazîyê, bi hezara bi kubarî nêzîkî Min dibin û dibêjin: “Xudan, me bi navê te Mizgînî terîf dikir, me cin derdixistin: hemû kes derheqa wan projada xeber didan, yên ku me ji Xwedê stendibûn” (Metta 7:22, MSG).

Ez Încîla “*Mêsîc*”-ê didime xebatê, ku vê gotinê bînime ber çava, çimkî ew gelekî baş dide kivşê, wekî meriv li civînê dîtindar nîbûn. Ew tevî xebatên civînên xwe dibûn, yan jî piştgirî didane wan. Ew jî bi hebandina xweye hindava Încîlê eyan bûn: “Me Mizgînî terîf dikir”. Wana alî meriva dikir, ku jîyanên xwe biguhêrin.

Ev tercima careke mayîn gilîkirî xebera “*bi hezara*” dide xebatê. Feqet tercimên mayîn xebera “*gelek*” didine xebatê. Bi zimanê yûnanî ev xeber “*polyûs*”-e, şirovekirina kîjanê eve, “reqema mezin, gelek û bi çapa mezin”. Her car Îsa derheqa koma merivaye biçûkda nedigot, lê derheqa koma mezin û diqewime derheqa piranîyêda digot.

Dêmek werin em tomerî bikin: Îsa derheqa merivên usada dibêje, kîjan bawerîya xwe li hînkirina “Mizgînîyê” tînin, Wî çawa Xudan nav dikin, bi dil nava cuxulkarîyêdanin, gotina Wî bela dikin û nava mesîhîtîyêda qulix dikin. Meyê bi cûrê hêsa ew çawa mesîhî nav bikirana. Dêmek, ew bi çiva ji bawermendên rast cuda dibin? Îsa dibêje me: “Hingê ezê eşkere wanra bêjim:

“Ji min dûrkevin, neheqno, min hûn tu cara nas nekirine” (Metta 7:23).

Xebera kilîte vê gotinê “*Kirina neheqî*”-ye, ya ku yûnanîda xebera “*anomnîya*”-ye. Ev xeber nava “*Ferhenga yûnanî-înglîzîye nava Mizgînîya Tayêrda*” çawa hal tê şirovekirinê, wextê ku meriv bêqanûne, yan jî derheqa qanûnêda nizane, yan jî rûyê teribandina qanûnêdaye ku usaye. “Ênsîklopêdîya xeberên *Încîlê*” alî me dike, ku em diha kûr xebera “*anomîya*” fem bikin, ya ku dide kivşê “şuxulkarî, yên ku hemû prînsîpên xwedêtîyê, him jî yê moralîyê diter’ibînin”. Bi cûrê zelalkirî, merivên bêqanûn gura serwêrtîya Xebera Xwedêda nînin.

Merivên wî cûreyî *car-carna* naşimitin. Dewsa wê yekê ew her dem Xebera Xwedê hesab hilnadin, yan jî gura wê xeberêda nînin. Eger ew bi rastî xilazbûyî bûna, ewê ne tenê bi hiznekirin nêzîkî fikirên lavakirinê bûna, lê wê usa jî qirar bikirana, ku gunekarîyên xweye ku diwekilin berdana. Ewê bedena xwe xaçkirana û wê bicedandana bighîjin xeysetê xwedêtîyê.

Hewaskare bidine kivşê, wekî rojekê Îsayê bêje wan: “Min tu cara hûn nas nekirine”. Xebera “*naskirin*” bi yûnanî xebera “*gînosko*”-ye, fikira kîjanê ewe, ku ji nêzîkva nas bikin. Ev meriv tu cara tevî Îsa nava tevgirêdanada nîbûne. Nenihêrî wê yekê, wekî ew Îsa çawa Xudan nav dikin, ew tenê dibêjin, lê çi ku Wî digot ew nedikirin. Şedetîya heyîna tevgirêdanên tevî Îsa wê yekê dide kivşê, wekî meriv Gotina Wî xweyî dike:

> "Wextê ku em gura Xwedêdanin, em gumanin, ku Wî nas dikin. Lê eger em dibêjin, ku Wî nas dikin û gura Wî da nînin, em derewa dikin û rastî dilên meda nîne" (Yûhenna 2:3,4, CEV).

Aqûb jî derheqa wê yekêda xeber dide, wextê ku dibêje: "Merivekî usa nîşanî min bidin, ku çawa ew dikare bêyî şuxul bihebîne. Ezê hebandina xwe bi şuxulê xwe bidime kivşê" (Aqûb 2:18, TEV). Û ev parên nivîsarê tevî wan gotina nava hevraqayîlbûnêdanin, bi kîjanê Îsa ev têma destpê kir: "Hûn ji şuxulên meriva dikarin qirar bikin, ku ew çi cûreyîne" (Metta 7:20, NLT). Ew şuxul, derheqa kîjanada Îsa digot, ne derheqa qulixa Mesîhîtîyê, terîfkirina Mizgînîyê, yan jî çûyîna li civînadanin, çimkî ew meriv, yên ku li Ezmîn nehatine qebûlkirinê, ev hemû tişt dikirin. Tîm Kêllêr derheqa van gotinên Îsada dinivîse:

> "Ev gotin gelekî berke. Bawerîya wan meriva usaye, ya ku alî fikirê dike, razîbûna êmosyonal dibe û wana def dide, ku ew hukumî li ser civaka dor- bera bike. Em hemû jî vê yekê dixwezin. Em dixwezin, wekî fikira me bê piştgirtinê, em dixwezin bi êmosyonalî tevî vê yekêbin û em dixwezin bi sosyalî bibin alîkar. Diqewime xwestina piştgirîya fikirê bibe, razîbûna êmosyonal hebe, kardarîya sosyalî jî hebe, lê nexwezin Xwedê... çimkî eger Xwedê bi rastî nava jîyana wedane, hûn gerekê xwestina xwe berdin. Hema ev yek dide kivşê, ku gelo meriv bi rastî dicêribînin Xwedê bidine xebatê, yan dicêribînin qulixî wî bikin?".

Xebitandina Xwedê dide kivşê, ku Wî bona wan tişta bigerin, kîjana em dikarin ji Wî bistînin. Qulixa bona Xwedê dide kivşê ku bi hizkirina hindava Wî da bê rêberkirinê, lê eger em Wî hiz dikin, usaye gerekê em gotinên Wî xweykin.

Roja îroyîn gelek meriv wê wî merivî hesabkin çawa kurê Xwedê, yê ku Îsa çawa Xudan nav dike, bawerîya xwe li hînkirinên Wî tine, bi êmosyonalî tevî şuxlkarîyê dibe û bi praktîkî qulixî civînê dike. Feqet ji gotinên Îsa me zelal dît, wekî ev cudatî faktorên qirarkirinê nînin, ku bawermendên rast nas bikin.

Îzinê bidin, ku ez vî cûreyî bêjim: bêşik, hûnê van cudatîya nava jîyana her bawermendekî rastda bivînin. Bi rastî, meriv nikare bawermendê rastbe, eger ev cudatî li cem wî tunebin. Feqet ev yek jî

nade kivşê, wekî ew meriv bi rastî kurê Xwedêye. Faktora qirarkire nava vê pirsêda eve: gelo evî merivî xwe înkar kirîye, xaçê xwe hildaye û li peyî Wî diçe? Bi kurtayî gotî, *gelo ev meriv gura gotinên Xwedêdaye*?

Ev têma dawî ya terîfkirina Îsaye eyane li Çîyê bû. Bona serhevdaanîna xebera Xwe, ya nişkêva, Wî serda zêde kir:

> "Awa, kî ku van gotinên Min dibihê û wana diqedîne, ew mîna merivekî serwaxte, yê ku mala xwe ser kêvir çêkir. Baran barî, ba û lêyî rabûn, wê malê xistin, lê ew mal hilneşîya, çimkî hîmê wê ser kêvir bû. Lê kî ku van gotinên min dibhê û naqedîne, ew mîna merivekî bêfeme, yê ku mala xwe ser qûmê çêkir. Baran barî, ba û lêyî rabûn, wê malê xistin û ew mal hilweşîya, lap wêran bû, çû û wêranbûna wê mezin bû" (Metta 7:24-27).

Ev gotin derheqa eşaretîya Wî da ye, ya ku ewî da geleka, îzina kîjana wê nedana, ku ew herine Ezmîn, çimkî Ew vê parê û parên pêşin bi xebera "awa" (yan jî "çimkî") hevva dide girêdanê.

Eger em van herdu cûrên meriva lêkolîn bikin, derhqa kîjdanada ev gotina gilî dike, firqîya nava wanda gelekî kême, nayê kivşê. Herdu jî gotinên Wî guhdar dikin, lê koma e'wlin "wana mîyaser dike", lê ya duda "wana mîyaser nake". Herdu mal jî ji matêrîyalekê hatine çêkirinê, ji hînkirinekêne. Herdu jî wextê hebandinê û qulixê mînanî hevin. Firqîya rast hîme. Malek li ser serwêrtîya Îsa Mesîh hatibû hîmdanînê, mala mayîn li ser qîmetkirina merivatîyê hatibû çêkirinê, qîmetkirina jihevderxistina qencîyê û xirabîyê, dîsa ew "dara" fîlosofîyê, yên ku Adem û Hêwa bûn.

Ew fikir, wekî hema ew xêfiktî hema usa diwekile, ji baxçê Êdênê destpêkirî hetanî rojên me, gerekê me bîne ser hişê me. Ew cûrên xwe diguhêre, lê koka wê yeke. Careke mayîn meriv dikare vê pirsê bide tomerîkirinê: "*Gelo em difikirin, wekî em diha baş zanin çawa bijî? Yan em bawar dikin, wekî Xwedê zane, ku tiştê herî baş k*îjane?".

5

# GELO TENÊ XWESTIN BESE?

“Dêmek vê kirina xwe bînine sêrî, wekî hazirîya weye nava xwestina vê yekêda awqasbe, çiqwas qewata weye...”
— B Korintî 8:11, AMP

Qanûna zêrîn, ya femkirina jîyana ruhanî ne ku fikire, lê gurêdabûne.
— Osvald Çêmbêrs

Serpêhatîke wa bînine ber çavê xwe: xortek rastî keçeke genc tê. Ew keç gelekî bedew, saxlem û teşkîlbûyî ye: ew xwerinçêkireke başe, zaroka hiz dike û tiştê herî sereke ewe, wekî meriveke pir başe. Ew xort bengî dibe û qirar dike, wekî ew keç hema ewe, tevî kê gerekê ew jîyana xweye mayî derbaz bike. Ew wedekî mexsûs teşkîl dike, peyayî li ser çoka dibe, qutîke biçûk vedike û gustîlka bi kevirê dur nîşanî wê dike û pêşnîyara xwe elam dike. Ew keç, ken ber devê wê dikeve, bi şabûn dike gazî, kelogirî dibe û paşê dibêje:

– Belê. Belê. Belê. Ez nikarim bawer jî bikim. Ez zendegirtî mame û kelogirî bûme. Nava jîyana minda eva roja here bexteware. Ez awqas gelekî te hiz dikim!Belê, ezê te bistînim.

Ew nava xwezilîyêda hev hembêz dikin. Bi şabûneke mezin ewê keçê çavên xort dinihêrî û ew bi dil û can soz dide:

– Jîyana me wê gelekî başbe. Ezê bibime kevanîya here baş, ezê guhdarîya usa bidime li ser mala me, wekî ew her dem bedew û

bêkêmasîbe, ezê xwerinên xweş bona te û zarokên me çêkim, ezê saxlem bimînim, kincên modêrn li xwe bikim û ezê ya tebim, kengê tu bixwezî.

Xort difikire: "*Gelekî başe!Diqewime ez xortê dinyayêyî herî bextewarim*".

Nişkêva ew keçik tiştekî balkêş dibêje:

– Bêguman, xortên başqe hene, kîjana ez hela hê hiz dikim, ezê car- carna rastî wana bêm.

Xortê ecêbmayî xeber dêvda dimîne û dibêje:

– Usa wê nebe.

– Bona çi, delalê min?

Xort ecêbmayî dimîne. Ew rasthatina ku ewî teşkîl kiribû, hate teribandinê. Xortê navhevketî difikire: "*Diqewime ew laqirdîya dike? Feqet gelo hêja* bû derheqa tiştên u*sada jî laqirdîya bike, xwezima piştî pêşnîyara min*?"

Piştî bêdengbûna bêfesal, ya ku tê bêjî xilaz nedibû, keçik dicêribîne beşera pêşda bide dasekinandinê û cûrê berdaxustinêyî başqe pêşnîyar dike:

– Baş, tê çi bêjî, eger nava salêda, rojekê ez tevî hevalên xweye mayîn derbaz bikim? Nava salêda 364 roja ezê ya tebim. Tenê rojekê bide min, ku ez tevî wan bim.

Xort li guhên xwe bawer nake. Niha kivşe, wekî ev keçê teslîm nebe, ew bi dilê xwe xeber dide. Xort dibêje:

– Na, usa nikare bibe.

Keçik dikeve nava mitala, lê ew gelekî wî xortî hiz dike û cûrekî mayîn pêşnîyar dike.

– Baş, lê derheqa çar sehetada tê çi bêjî? Tenê çar seheta nava salêda bide min, ku ez wan seheta tevî hevalên xwe derbazkim.

– Na,– vê carê xortê cahil diha bi îzbatî dibêje.

Keçik careke mayîn ber xwe dide:

– Lê salê 20 deqeyî? Tenê carekê tevî xortekî mayîn.

– Na.

Bi gumana wê yekê, wekî ewê li hev bên, keçik ber dilê xortda tê:

– Delalê min, ez bi rastî te hiz dikim, ez bona te dîn dibim. Ez te diha zêde hiz dikim, ne ku xortekî mayîn. Feqet xwestina mine vî

cûreyî heye. Ez gerekê tevî wan xortên mayînbim. Ez nikarim tenê ya mêrekîbim. Ez bêqelp *dixwezim* himberî te helalbim û ez zanim, wekî tiştê rast ewe, ku tevgirêdanên xweye mayîn berdim, lê were em rastîyê bêjin. Li vê dinyayê awqas xortên baş hene û ez hiz dikim ji wana guhdarîyê bistînim. Bona çi ez gerekê wana înkar bikim? Bona çi herdu jî nikarin ên min bin?

Xort awqas aciz dibe, wekî vê carê ew naxweze tu tiştî bêje. Ew tenê serê xwe dike ber xwe. Piştî hinek wede keçik bi dengê nerm dibêje:

– Ez gerekê bêqelpbim. Ez nafikirim, wekî ez ji te gelek tiştî hîvî dikim. Ez dixewezim bi temamî vê jîyanê baş derbazkim.

Eva îdî bona xort bes bû.

– Eva îdî tiştê nêzîkî aqila nîne. Emê nezewicin û ezê tu cara îdî rastî te neyêm.

Bi vî cûreyî rêyên wan ji hev cuda dibin.

Werin em vê serhatîyê şirove bikin. Hevala vî xortî gelekî bedewe û usa jî meriveke başe. Ev keça bona jîyana malbetê gelekî başe, wî xortî hiz dike, dixweze qulixke û dixweze tiştê xweyî herî baş pêşkêşî wî bike. Ew gelekî dixweze wî xortî bistîne. Ev hemû tişt gelekî başe. Ev xort gerekê nava salêda 20 deqeyî bide wê keçê, ku ew rastî xortekî mayîn bê. Gelo bona çi ew xort van qewilara qayîl nabe?

Bersiv ber çavaye: ew keça dil û jîyana xwe bi temamî nade wî. Ew zane, gerekê wî cûreyî bike û ji alîkîva wê yekê dixweze, lê bi rastî ew bi xortên başqeva gelekî hijmekare. *Xwestin* tiştekî başqeye, lê *kirin* jî lap tiştekî başqeye.

Tu mêrekî li ser hişê xwe wê keça wî cûreyî nestîne. Wî çaxî hûn bo çi difikirin, wekî Îsayê paşda vegere, bê peyî bûka wî cûreyî:

> “Eger yek dixweze li peyî Min bê, bira xwe înkar bike, xaçê xwe hilde û peyî Min bê. Çimkî kî ku dixweze jîyana xwe xilazke, ewê wî unda bike. Û kî ku jîyana xwe bona Min û Mizgînîyê unda bike, ewê wî xilazke” (Marqos 8:34,35).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî eger em *bixwezin* jîyana xwe xilazkin, emê hemû tiştî unda bikin. Îsa negot: “Kî ku *bixweze* emirê xwe bona min undake, wê emirê xwe xilazke”. Ew ku hûn tenê

*dixwezin* emirê xwe undakin, ew tenê bes nîne. Nêzîkbûna wî cûreyî ji fikirdarîya keça nava serhatîyêda cuda nabe.

Bona ku hûn tevî Şexsekî herî başî li ezmîn bibin yek, hûn gerekê bi temamî xwe teslîmî Wî bikin. Ew yek dide kivşê, wekî hûn gerekê bi temamî peyî rêberîya Wî herin. Tiştekî hewaskare, wekî kitêba Pîroz heleqetîyên meye tevî Xwedê mînanî heleqetîyên mêr û jin dike. Pawlos dinivîse:

> "Çawa ku kitêba Pîroz dibêje: "Mêr bav û dayîka xwe bona zewacê dihêle û ew û jina wî tevayî dibin merivek". Eva şêwireke mezine, feqet ez fem dikim, wekî gilî derheqa Mesîh û civîna Wî da ne" (Efesî 5:31,32, CEV).

Nenihêrî wê yekê, wekî Pawlos ev beşa bona wê yekê da xebatê, ku jin û mêrê zewicî şîret bike, lê ewî jî zelal got, wekî bi rastî ew derheqa heleqetîyên meye tevî Îsa şirove dike. Tu mêrek wê nexweze jineke usa bistîne, ya ku *dixweze* xwe bi temamî bide wî, lê wê yekê nake. Bi fikira we, hûn dikarin hindava Îsa vî cûreyî bikin. Diqewime Aqûb hema bo vê yekê jî dinivîse:

> "Bêesilno! Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinyayê we dike dijminê Xwedê? Diwekilînim, eger hûn dixwezin bibine hevalê vê dinyayê, hûn dibine dijminê Xwedê" (Aqûb 4:4, NLT).

Hûn çawa divînin, ew guhdarîyê dide li ser vê xalê, çimkî ew wê yekê diwekilîne. Eva pirseke biçûk nîne, lê alîkî hîmlîye, yê heleqetîyên tevî Xwedê.

Yê bêesil ew merive, yê ku tevî yekî mayîn nava heleqetîyadane, lê bi teribandina wê peymanê, heleqetîya tevî yekî mayîn digere. Wî merivî xwe pêşkêşî qewilên wê peymanê nekirîye.

Qewilên wê peymanê, kîjana em dikin ku peyî Îsa herin evin. Em gerekê xwe înkar bikin û ji sîstêma dinîya dora me dûrkevin. Em gerekê bi temamî xwe pêşkêş bikin, û gura Wî da bin. Em nikarin ji vê kêmtir pêşnîyarî Wî bikin. Ev yek dide kivşê, wekî em qirara Wî û xwestinên Wî qebûl dikin, lê ne ku yên me. Bi dayîna emirê xwe, em dewsê emirê Wî distînin. Ev peyman mînanî zewaca saxlem, ya di navbera mêr û jinêdane.

## Ez hela hê dixwexzim jîyana xwe xweykim

Gelek meriv hene, yên ku wê bi şabûn zêdayên xilazbûnê qebûl bikirana, eger tenê bi wê yekêva tevayî bikaribûna emirê xwe xweyî bikirana. Tiştekî hewaskare, wekî pir'anîya meriva fem dike, wekî gerekê gelek tiştî berdin bona ku peyî Xwedê herin, lê ew hazir nînin wî bihayî bidin. Ev meriv li ber Xwedê û li ber xwe bêqelpin.

Wextekê cînarekî min hebû (Ezê wî çawa Kêvîn nav bikim), yê ku ji wan meriva bû. Ew gulaşgirê fêdêrasyona gulaşêye hemdinyayê bû, yekî bi nav û deng bû. Ew bi malbeta xweva nêzîkî me, sê mal wêda dima. Wextê ew cîguhastî mehela me bû, jina wî merivî eşaretî da wî, ku ji me dûr bimîne: "Ew bawermendên dînbûyîne",– ewê gotibû.

Piştî çend meha li cem wê jinê nopayên navhevketinê û nerihetîyêye mezin destpê bûn û carekê ewê xwe avîte hembêza Lîzayê û girîya. Evê qewimandinê mecal saz kir ku Lîza tevî wê derheqa Mizgînîyêda xeberde û ew bi cûrê rûmet xilaz bû. Piştî wedekî kurt herdu kurên wana jî emirê xwe teslîmî Îsa kirin.

Malbetên me diha nêzîkî hev dibûn û ez û Kêvîn bûne hevalên baş. Me gelek wede tevî hev derbaz dikir. Gelek cara em rastî hevdu dihatin û me baskêtbol, hokêy û golf tevî lawikên me dilîst.

Êvarekê Xwedê nîşanî min da, wekî zûtirekê nava emirê Kêvînda wê çend tişt biqewimin. Îdî dereng bû, sehet nêzîkî 22:00 bû, lê min texmîn kir, wekî ez gerekê tevî wî xeberdim. Wextê ku ewî derî vekir, min wîra derheqa wan hersê tiştada gilî kir, kîjan gerekê nava emirê wîda, nava neh mehên pêşinda biqewimîyana.

Piştî hinek wede hersê qewimandinên ku min dabûne kivşê, qewimîn. Ez difikirîm: "*Niha Kêvînê ese emirê xwe pêşkêşî* Îsa Mesîh bike". Feqet usa nebû.

Piştî çend meha Xwedê dîsa nîşanî min da, ku nava emirê Kêvînda wê dîsa qewimandinekê biqewime. Min careke mayîn wîra derheqa wê yekêda xeberda. Vê carê ez gavekê pêşda çûm:

– Kêvîn, tu dikarî bi xwe îzbatkî, wekî Xwedê nava emirê teda sê tişt dane kivşê, yê ku îdî qewimîne. Tu navînî, wekî Ew berbi te gava davêje? Bona çi tu emirê xwe nadî Îsa?

Bejina Kêvîn mêtrek û 92 santîmêtr bû, lê giranîya wî 108 kîlogram bû, ji kîjanî para bez tenê çar selef bû. Meriv ji wî ditirsîya. Ewî serê xwe peya kir bona ku min binihêre û got:

– Çikmî ez zanim, wekî bona wê yekê ez gerekê bihakî bidim. Ez zanim, wekî gerekê emirê xwe pêşkêşî Îsa bikim û gura Wî da bim, lê ez naxwezim cûrê jîyana xwe bihêlim.

Ewî xeberdana xwe berdewam kir (dûmayî kir):

– Con, li fêdêrasyona me gulaşgirekî gelekî eyan heye. Ew dibêje, wekî ew çawa mesîhî hatîye dinyayê. Ewî derheqa Xwedêda hema nava wê progirama têlêvîzyonêda xeberdaye, li kîderê tu jî hatibûyî teglîfkirinê. Nenihêrî wê yekê, ez zanim, wekî ew narkotîka dide xebatê û peyî jinên başqe jî diçe. Niha bêje min, ew bi çiva ji min cuda dibe? Ez naxwezim mînanî wî qelp bim. Diha başe ez jîyana xwe derbazkim, merkeza guhdarîya hemûyada bim û hemû tiştî bikim, çi ku nava vî emirîda îzina min heye, lê ne ku maskekî daynim ser sifetê xwe.

Xeberên Kêvîn hukumekî mezin li ser min hiştin, lê min zanibû, wekî derheqa çida ewî xeber dida, tiştekî nû nîbû, çimkî merivên wî cûreyî gelekin. Gelek meriv hene, yên ku diçin civînê, Îsa çawa Xilazkir nav dikin û elam dikin, wekî ew kurên Xwedêne, lê wana emirên xwe pêşkêşî Xudan nekirine. Gelo ew bi rastî xilazbûyîne?

Nava doranên mesîhîtîya meda gelo dikarin jîyanê bidine wan meriva, yên ku paşda vegerîyane, yên ku kurên Xwedê nînin? Îsa gote rêberên rojên Xwe: “Hûn behrê û bejê li hev didin, ku yekî nebawar bînin li ser rê, lê paşê hûn wî merivî du cara zêdetir dikine para cehnemê, lê ne ku hûnin” (Metta 23:15, NLT). Ez navêjim, wekî rêberên civîna Rojavayê, rêberên cehnemêne. Çi jî hebe, pirsa min eve: em bûyînê didine yên çawa, yên ku paşda vegerîyane?

Wextê ku em bangî wana dikin, yên ku Xwedê digerin, ku ew jîyanên xwe înkar bikin, em wana distînin, yên ku paşda vegeryane, yên ku jîyana xwe dane başkirinê û bi wê yekêva tevayî sozê jîyana axretê stendine. Piştî gotina “duayê gunekar” wijdana ewê ku paşda vegeryaye edil dibe. Bi têorî ew meriv îdî ji Xwedê dûr nîne. Merivên wî cûreyî destpê dikin bibine yên ola bawarmenda, yên ku li wir tevgirêdana û borcdarîya dest tînin.

Niha jî ew eşkere xwe didine alîyê *qenc*îyê, derheqa nerastîyêd sosîalî, jîyanên feqîra û kesîbada difikirin, lê carna jî dighîjine wan meriva, yên ku destê alîkarîyê dirêj dikin. Niha ser vê yekêda hînkirina û sozê ezmana zêde bikin û hûnê statûseke gelekî baş bistînin, ya ku wê geleka xweş bihata.

Gelo ewê ku paşda vegeryane, xilazbûyîne yan xapyayîne, rûyê çida ewê bi çetinayî guhdarîya rastîyê bikin? Diqewime, wekî hema ev banga wan bawermendên şaşbûyî çê dike, derheqa kîjdanada nava beşa Mizgînîya Metta ya 7-ada nivîsare, yên ku wê gotina Îsa guhdar bikin: "Ji Min dûrkevin, Min tu cara hûn nas nekirine".

## Gelo banga meye eynî ewe, çi ku ya Wî ye?

Gelo Îsa vî cûreyî dighîşte merivên undabûyî? Em niha paşda vegerine li ser serhatîya mîrê cahilî dewletî.

Çend sal pêşda min civînekêda terîf dikir, li kîderê 200 serwêr hazir bûn, civînên kîjana diketine nava navnîşa civînên Amêrîkayêye here mezin. Min pirs da wê komê:

– Bînine ber çavê xwe, ku mîrê cahilî dewletî çawa nêzîkî Îsa dibe. Hûn dikarin ber çavê xwe bivînin, wekî ew bi seheta royêye "Rolêk's"-ê, bi kincê "Armanî"-ye biha, ji "Rols Roys"-a xwe derdikeve? Çend alîkar peyî wî diçin, hetanî ku ew nêzîkî Îsa dibe. Ew gelekî sar, xwegirtî û hinekî bi dengê pozbilind dibêje: "Dersdarê qenc, ez bona xilazbûnê çi bikim?". Bi fikira we roja îroyîn ewê hema usa biqewimîya?,– min pirs da serwêra.

Mixabin, piranîya wana destê xwe bilind kirin.

– Kitêba Pîroz usa navêje,– min got û xwend, ku bi rastî çi nivîsare:

> "Gava Îsa rîya xweda diçû, yek berbi Wî bezî, çû li ber Wî çok da û jê pirsî: "Dersdarê qenc, ez çi bikim, wekî jîyana heta-hetayê warbim?"" (Marqos 10:17).

Ev meriv peyî Îsa *revî*, bi hazirîya cimetê, *li ber Wî* çok da û lava Jê kir, wekî ew şirove bike çi lazime bike bona ku ew xilazbe. Ew qet pozbilind jî nîbû.

Ez fikirîm, wekî diha baş bû min wanra bida kivşê ku çi qewimî. Min hîvî ji serwêrekî kir, ku ew li alîkî dika serayê bisekine û ez jî

alîyê mayîn sekinîm. Ez lez berbi wî revîm û wextê di navbera meda mêtrek mabû, ez ketime ser çoka, min xwe ji kincê wîva girt û bi dengê bilind lava jê kir: “Ez gerekê çi bikim ku xilazbim? Ez gerekê çi bikim, wekî jîyana heta-hetayê warbim?”.

Hetanî roja îro ne nava jîyana minda, ne jî nava qulixa minda tu merivekî, yan dewletîk, yan jî feqîrekî, li peyî min nerevîye, çok nedaye erdê û lava ji min nekirîye: “Ez gerekê çi bikim, ku careke mayîn bixuliqim”. Bêyî şikberî ev mîrê cahil him bêqelp bû û him jî bi germayî nêzîk dibû.

Îsa ji wî pirsî: “Bona çi tu Minra qenc dibêjî? Tu kes qenc nîne, lê tenê yek-Xwedê qence” (Marqos 10:18).

Çawa ku min îdî da kivşê, ewî merivî qedirê Îsa bi navê “Dersdarê Qenc” girt, çimkî gumana wî hebû wekî ewê ji Wî cabeke baş bistenda. Feqet, Îsa îzin neda, wekî ew tişt pircûretîya Wî bida domkirinê. Ewî xilazbûn “neda zelalkirinê” û ew cahilê dewletî gîhande dereca qîmetkirina qencîyê û xirabîyê.

Ji alîkî mayînva jî ev meriv bi rastî bêqelp bû. Ewî Îsa çawa Xudan yan jî Padişa nav nekir. Ewî zanibû, wekî eger ew Îsa çawa Xudan nav bike, gerekê wî cûreyî bikira, çawa ku Wî hîvî dikir. Roja îroyîn gelek xeysetên wî cûreyî hene. Ew Îsa çawa Xudan nav dikin û hebandina xweye hindava Încîlê didine kivşê. Ew bijartina nava emirda dikin, anegorî fikira xweye hindava qencîyê û xirabîyê, dewsa wê yekê, wekî ew gerekê fesal dîna xwe bidine wî hemû tiştî, çi ku Xudan kitêba Pîrozda hîvî ji wan dike ku ew bikin. Ken li ber devê wan, ew hînkirinên Încîlêra dibêjin “amîn”, lê ew yek ne anegorî meremên wane, ew bona wê fikirê xwe digrin, tê bêjî ew ne derheqa wandane. Ew dibihên, lê nava jîyanêda wê yekê nadine xebatê, çi ku Ruh dibêje. Gelek cara ew texmîn dikin, wekî ew bang derheqa wan merivadane, kîjana ew çawa yên “ji xwe xirabtir” hesab dikin.

Niha guhdarkin, ku Îsa çawa berbirî wî merivî bû, yê ku dixwest, ku emirê heta-hetayê bistîne:

> “Tu temîya zanî, nekuje, zinêkarîyê neke, nedize, şedetîya derew nede, xwîdana xelqê nexwe, qedirê dê û bavê xwe bigre”. Ewî got: “Dersdar, ev hemû tişt jî min ji cahiltîya xweda xweyî kirine”” (Marqos 10:19,20).

Îsa ji Deh temîyên xilazîyê şeş temî çawa mînak anîn, yên ku derheqa heleqetîyên merivadanin. Cahilê dewletî bi hazirî caba xwe da, wekî ewî ew temî nava temamîya emirê xweda xweyî kiribû. Ez bawerim, wekî ewî derew nedigot. Anegorî van norma em dikarin bivînin, wekî ew merivekî qenc, rastgo û heq bû. Li ser hîmê vî xeysetî, gumana wî hebû, wekî tenê bi wê yekê wê bes be ku hizkirina Xwedê bistîne.

Çi jî hebe, Îsa bi zanebûn çar temî negotin. Ev temî derheqa heleqetîyên mêriv û Xwedêdanin û beşa ewlin derheqa wê yekêdane, wekî li ber Xwedê gerekê xwedêyên mêriv tunebin. Bi gilîkî mayîn gotî, nava emirê meda gerekê tu tişt ji hizkirina meye hindava Wî da û xwepêşkêşkirina me, usa jî gurêdabûnê zêdetir nîbe. Evî cahilî ew temî neqedandibûn û wî çaxî ewî nedixwest wana mîyaser bike. Îsa hazir dibû nava emirê wîda tiştekî usa eşkere bike, çi ku wê îzin neda ku ew şuxulkarîya xwe açix ser hevda bîne. “Îsa lê nihêrî, ew hiz kir û gotê: “Hê kêmasîke te heye. Here, çî te heye bifroşe, belayî feqîra bike, hingê xizna te li Ezmîn wê hebe. Û xaçhildayî peyî Min were”” (Marqos 10:21).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Îsa ew hiz dikir. Feqet Wî çawa hizkirina Xweye hindava wî xortê dewletî da kivşê? Wî eşaretî da wî merivê ku Xwedê digerîya. Îsa zanibû, wekî rojekê perê wî wê ew ji gurêdabûna serwêrtîya Wî bida dûrxistinê. Îsa diha gelekî derheqa karê wî xortîda difkirî, lê ne ku bona destpêka baş.

Çetinaya vî merivî perên wî bûn. Bona yên mayîn çetinayî yan hevalên jinin, yan jî hevalên mêrin, yan hizkirina sportê, yan jî kirîna tişta, xebat, fîlosofî, xwendin û tiştên mayînin. Bi rastî bona şimitandinê hemû tişt dikare bibe menî, wextê ku em hizkirin û qewatên xwe zêdetir didine wê yekê, lê ne ku didine Îsa.

Gelo Îsa ew cahil bi firehkirina sînorên banga Xwe hiz kir, bona ku tiştê hizkirina Wî nava wê yekêda cîwar bûya? Gelo Wî rastî da sivikkirinê ku wî bêhurmet neke? Bona çi Wî pêşnîyarî wî nekir, ku duayê yê gunekar bike, bi wê gumanê, wekî hê dereng ewê hizkirina hindava pera bihişta? Bi kutasî, ew bona xilazbûnê kandîdatekî baş bû û hewaskarîya wî ya hindava xilazbûnê mezin bû. Îsa gerekê tenê tora xwe bikişanda û wê mesîhîkî dewlemend, qulixçîkî aktîv û baş

bistenda.

Feqet Îsa bi rastî ew meriv hiz dikir. Ewî rastî, rastîya gelekî berk gote wî cahilî. Ew berbi rîskê çû, bi femkirina wê yekê, wekî dikaribû wî merivî unda bike, yê ku bi dil û can hatibû cem Wî. Îsa raste-rast çavên wî nihêrîn û gotê, wekî kêmasîke wî heye. Kêmasîya aktîvîyê li cem wî cahilî tunbû, lê dil û fikira wî hazir nîbûn, ku ew teslîmî serwêrtîya Padişê padişa bibe, nenihêrî wê yekê, wekî ewê bihakî çawa bona wê yekê bida.

Ez li ser wê fikirême, wekî ewî merivî Îsa tenê çawa Xilazkir hesab dikir, lê bi wê fikirê jî usa dertê, wekî gurêdabûna hindava Wî da eseyî nîbû. Eger wî şêwira Îsa çawa ya *qenc* hesab bikira ewê peyî wê yekê biçûya. Feqet eger ewî qirar kir, ku şêwira Îsa *qenc nîbû*, wî dikaribû ew yek nekira.

Hûn texmîn dikin, eger merivê ku Xwedê digere, wîra bêjin, wekî kêmasîya wî heye û ew yek wê îzinê nede wî ku ew emirê heta-hetayê bistîne? Eger hûn bi rastî yekî hiz dikin, hûn gerekê rastîyê bêjin, lê bi femkirina wê yekê, wekî hûn dikarin caba înkarkirinê jî bistînin.

Gelek mesîhî û qulixçî li ber guhdarvanên xwe lefekîya dikin, çimkî ew ditirsin ku wê bên înkarkirinê. Meremê wanî tek-tenê ewe, ku ew bên qebûlkirinê. Ezê tevî we bêqelp bim. Ez bi xwe jî usa bûme. Ewên ku nêzîkî min dibûn, ez hiz dikirim, çimkî min her dem derheqa wê yekêda digote wan, çi ku wana dixwest guhdar bikira. Min hemû tişt dikir, ku ez rastî konflîktên tevî meriva neyêm û ji alîyê wanda neyême înkarkirinê. Feqet ew wede hat, wextê ku Xwedê ew yek da eşkerekirinê. Wî eyan kir ku tiştê minî hizkirinê kîjan bû. Tiştê minî hizkirinê ez bi xwe bûm, lê ne ku ew meriv bûn, kîjanara min xeber dida.

Diha başe rastîyê bêjin, lê ne ku berbi berdaxustinê herin û usa bikin, wekî meriv bawerîya xwe li derewa bînin. Diha başe, wekî îro meriv rastîyê guhdar bike, ne ku bawar bike ku nava jîyanêda çi dikare biqewime û rojekê nişkêva, wextê ku derengbe, ji Xudan bibhê: "Dûrkeve: min tu cara tu nas nekirî, tu xapyayî bûyî".

Lê niha, binihêrin, ku ev cahilê ku Xwedê digerîya bersiva çawa da gotinên Îsa:

> “Li ser vê gotinê wî reng avît, medekirî çû, çimkî gelek hebûka wî hebû. Îsa li dora xwe nihêrî û şagirtên xwera got: “Dewletîyara çiqwas zehmete ku bikevine Padişatîya Xwedê?” (Marqos 10:22,23).

Ev cahil, yê ku gelekî aktîv bû, medekirî dûr ket. “Îsa, te çawa dikaribû usa bikira? Wextê ku ew meriv bi şabûn hat, lê peyî guhdarkirina Te ra medekirî çû. Gelo Tu gerekê şêwira baş nedî wan meriva, yên ku Xwedê digerin? Gotinên Te gerekê meriva ruhdar bikin û beşera baş pêşkêşî wan bikin, lê ne ku ew medê xwe bikin. Îsayê Serwêr, li civîna Te merivê kêmbin, eger tu wî cûreyî hindava wan meriva pêşda bêyî, xwezima tevî merivên dewletî û hukumdar. Peyî wî here û banga Xwe bide milahîmkirinê û piştî hinek wede ewê ese temamîya rastîya te qebûl bike”. Roja îroyîn Îsayê ji koma serwêrên Xwe yên li civîna rojavayê gotineke usa bibihîsta. Ewê li ber Îsa ber xwe bidana û wê hîvî jê bikirana, ku ew ji qulixa Xwe dûr keta. Gelo Wî çawa karibû merivekî usa mezin bêhurmet bikira, yê ku bi nivîsarekê çêka bankê dikaribû îmze bikira û hemû xercê civînêye salê bida wan? Diqewime hema ewî jî temamîya deynê avayê civînê dada, yê ku dighîje çend mîlîon dolara. Îsayê Serwêr awqasî fem nake, ku çawa gerekê qulixa kardar û mezin çêkin. Diqewime Wî bîr kirîye, ku çawa bi başî ewî hukumî ser meriva kirîye. Ew gerekê destpêkeda diha nerm xeberde û dersên piştgirîyê bide, bangên usa belake, kîjan xweqîmetkirina meriva çê dikin û bilind dikin.

Ev yek dikaribû li civîna rojavayê biqewimîya, usa nîne? Em ketine nava teleke mezin. Em hemû tiştî dikin, ku ewên ku paşda vegeryane qebûlkin û peyîhatîya dest bînin. Em usa dikin, wekî reqema merivên ku tên civînê zêdebin. Em peyîhatîya “Twîttêrê”-da berev dikin, reqema ewên ku malpera meye “Fêysbûk”-ê da nin zêde dikin, yan jî hîvî ji meriva dikin ku ew blogên me bixwînin. Bi vî cûreyî em dibêjine Xwedê, wekî serwaxtîya me diha kardare, lê ne ku ya Wî. Ev yek careke mayîn dide kivşê, ku *qenc*îyê ji *Xwedê* zêdetir hesab dikin.

Bê şik, em gerekê bangên bona çûyîna li peyî Mesîh belakin, lê bangên me gerekê li ser rastîyê bên hîmdanînê. Em gerekê fem bikin, wekî Xwedê tu cara gazî me nekirîye, ku em sînorên banga Peymana Nû bidine berfirehkirinê, rîya xilazbûnê bidine hêsakirinê bona wan

meriva, yên ku hela hê naxwezin rêyên Wî va bên girêdanê. Meriv nikare xilazbûnê bistîne, wextê ku bi xwe qirar dikî, ku kîjane qencî û kîjane xirabî. Xilazbûnê meriv dikare tenê ji dara jîyanê bivîne, anegorî Qirara Wî. Her merivek gerekê hizkirîyên xwe bihêle, çawa ku her keçeke cahil, ya ku qayîl dibe ku pêşnîyara zewacê bikin û gerekê xatirê xwe ji heleqetîyên tevî mêrên başqe bixweze. Her yek gerekê Îsa qebûl bike çawa Xudan, lê ne ku tenê çawa Xilazkir. A hema eve dara jîyanê.

Lê niha binihêrin, ku peyî wê yekêra Îsa çi kir, wextê ku cahilê dewletî dûr ket:

> "Îsa li dora xwe nihêrî û şagirtên xwera got: "Dewletîyara çiqwas zehmete, ku bikevine Padişatîya Xwedê!". Şagirt ser van gotinên Wî ecêbmayî man, lê Îsa dîsa dûmayî kir û got: "Lawino! Wanra çiqwas zehmete, bikevine padişatîya Xwedê, yên ku gumana xwe datînine ser dewleta xwe!"" (Marqos 10:23,24)

Carekê ez derheqa vê yekêda difkirîm, wextê ku Ruhê Pîroz guhdarîya min kişande ser tiştekî gelekî girîng. Min anî ber çavê xwe, ku çawa ew merivê dewletî, yê ku li wir xweyê qedirekî mezin bû, hêdî- hêdî ji Îsa dûr diket, serê xwe kiribû ber xwe û diçû. Min fem kir, wekî Xudan peyî wî nerevî, ew hembêz nekir û negot:

– Deqekê, hevalê min. Îzinê bide ez serwaxtîya Silêman bînime bîra te. Gotinên Silêman 19:17-da ewî nivîsî: "Eger tu alî feqîrekî dikî, tu deyn didî Xudan û ewê dewsê bide te" (NLT). Min tera got, ku temamîya hebûna xwe bifroşe û bide feqîra, lê bîra xweda xweyke, wekî anegorî kitêba "Gotinên Silêman" Xudanê wî hemû tiştî bide te, çi ku tu didî feqîra. Ewê ne tenê dewsa wî deynî bide, lê wê ji sed carî zêdetir wî hemû tiştî paşda vegerîne.

Ev cahilê dewletî gerekê bîznêsmênekî baş bûya. Eger Îsa nêzîkbûna wî cûreyî bida kivşê, ku ew paşda vegeranda, diqewime ew careke mayîn şa bûya û bipirsîya:

– Bi rastî?

Wî çaxî Îsa dikaribû bigota:

Belê. Tu navînî, wekî Ez dicêribînim alî te bikim, bona ku tu duayê Min bistînî, wekî berevkirina teye fînansî hebe. Bi vî cûreyî

tê li welatê xweda bibî merivê herî dewletî, lê ne ku tenê cîyê jîyana xweda.

Wî çaxî ewê bi hazirî elam bikira ku peyî Îsa here.

R'aste, wekî anegorî Qirara Xwedê wextê em didin, emê usa jî bistînin, çawa ku toximê çandî diha zêde paşda dizvire cem mêriv. Ev rastî peyî wê yekêra îzbat bû, wextê ku ew cahilê dewletî dûr ket. Petrûs hinekî bi şikyatkirin û hinekî jî bi pirskirin ji devê xwe pekand:

> "Me hemû tişt hiştîye û em peyî Te hatine,– ewî got. –Belê,– Îsa got,– Ez rast wera dibêjim, wekî her yek, kî ku mal, yan bira, yan xwîşk, yan dê, yan bav, yan zarok, yan hebûna xwe boy Min û boy Mizgînîyê hiştine, wê niha sed cara zêdetir mala, bira, xwîşka, dayîka, zaroka û hebûnê tevî zêrandina bistîne. Û li dinîya dinda ew merivê emirê heta-hetayê bistîne" (Marqos 10:28-30, NLT).

Wî çaxî Îsa li wana nihêrî, ewê ku îdî hemû tiştên xwe hiştibûn ku peyî Wî herin û got: "Hûnê ji sedî zêdetir cara zêde bistînin, çi ku we tevî mal û hebûna xwe tevî zêrandina hiştîye. Hûnê niha wî hemû tiştî nava vî emirîda bistînin, lê nava emirê mayînda hûnê jîyana heta-hetayê bistînin".

Bona çi Îsa ev xeber, yan jî gotinên Silêman negote wî cahilê dewletî, yê ku gelekî dixwest ku jîyana heta-hetayê bistîne? Bona çi usa tê ber çava, wekî Wî ev tişt vedişartin? Bersiva vê pirsê zelale: Îsa tu cara dua, zêdayî û miaşên Padişatîya Xwedê ne didane xebatê, bona ku meriv boy wê yekê peyî Wî biçûna. Wextê ku Wî bangî Petrûs, Aqûb, Yûhenna û yên mayîn kir, Wî tenê got: "Peyî Min werin". Ewî negot: "Peyî Min werin û Ezê dua, edilayê, gulvedanê, emirê xweş û tiştên hê zêde bidime we". Ewî negot: "Peyî Min werin bona wan tişta, kîjana Ez dikarim bona we bikim", lê got: "Peyî Min werin bona wê yekê ku Kî me Ez". Ez Îsa Mesîh im, Efrandarê we, Xudan û Padişê Ezmînim".

Eger menîya çûyîna Petrûs, Aqûb, Yûhenna û Andrêas pere bûna, wana wê tu cara karê xwe nehişta. Wê rojê, wextê ku wana karê xwe hişt, ew roj, roja karîyêra wanaye here kardar bû. Bi saya Îsa wana du gemî tijî masî girtibûn. Wî çaxî wana derheqa sozê derheqa "dayîna ji sed carî zêdetir" nizanibûn û cara ewlin derheqa wê yekêda bihîstin,

wextê ku cahilê dewletî ji Îsa dûr ket. Wana tenê zanibû, wekî li cem Îsa gotinên jîyanê hebûn û bo wê yekê jî wana hemû tişt hiştin. Pere faktora wane qirarkir nîbû.

Xwedê tu cara dewê nake, wekî meriv bona çûyîna li peyî Îsa kamilbe. Ew tenê hîvî dike, ku nava pirsa gurêkirina Wî da ew razî û hazirbin. Ev cahilê dewletî diha terbe bû, ne ku Petrûs. Feqet Petrûs hazir bû hemû gotinên Îsa bike. Îsa hetanî roja îroyîn jî li ser wê fikirêye, wextê ku bangî me dike, ku em hemû tiştî bihêlin û li peyî Wî herin.

## Bernama min dijî bernama Wî

Wextê ku sala 1979-a min Îsa çawa Xudan qebûl kir, Xwedê carekêra destpêkir minra derheqa ketina nava qulixêda xeberde. Ez wî çaxî li fakûltêta maşîneçêkirinê, ya ûnîvêrsîtêya "Fûrdyû"-ê hîn dibûm û dihatime hesabê çawa xwendikarekî pêşkevtî. Min destpê kiribû nava koma ûnîvêrsîtêye tênîsêye hîmlîda bilîzim. Xêncî wê yekê min têra dîtibû, ku li ûnîvêrsîtêya Harvardê bêm qebûlkirinê, ku dereca magîstirîyê, ya serkarîkirina bîznêsê bistînim. Min têra didît keçeke baş bistînim û nava goveka serkarîkirina bîzênêsêda bixebitim. Min nedixwst qulixkirinêva bêm girêdanê. Hemû qulixçî, rastî kîjana ez hatibûm, merivên usa bûn, yên ku bi fikira min nikaribûn nava emirda bighîştana tiştekî. Ji malên wan her dem behneke xirab dihat, lê zarokên wan jî cûrekî mayîn bûn. Ez li bajarekî usa mezin bibûm, li kîderê sê hezar meriv diman û fikirên min yên derheqa qulixêda vî cûreyî sînorkirî bûn. Ez tu cara rastî qulixçîyê baş nehatibûm, lê nava salada min fem kir, wekî qulixçîyên wî cûreyî gelekin.

Carekê, wextê qulixeke civînê, Ruhê Pîroz hate ser min û got: "Con, min gazî te kirîye ku tu nava qulixa Min da bî. Bersiva te kîjane?".

Ez fikirîm: "*Malbeta min wê ji min paşda bisekine, çimkî ew hemû katolîkin. Ezê jî emirê xwe mînanî qulixçîyên nas ser hevda bînim, yên ku nava feqîrîyê û qir*êjêda d*ijîn*". Çawa jî hebe, tiştê herî sereke bona min kirina gura Xwedêye. Dêmek min bejina xwe tewand û dua kir: "Belê, Xudan. Ezê gura Te da bim û ezê bêyî wî bihayî terîfkim, kîjanî

gerekê bidim. Ezê herim li wir, kîderê Tu bêjî û ezê wê yekê bêjim, çi ku Tu temî bikî".

Nava feydayê vê qirarêda, nava emirê minda ew tişt qewimî, çi ku min ne jî dikaribû bianîya ber çava, feqet Xwedê pêşda ew yek da kivşê. Wî dixwest bizanbûya, ku gelo ezê hemû tiştî bihêlim, ku peyî Wî herim.

Eger em qulixa Petrûs, Pawlos û şagirtên mayîn kitêba Karên Şandîyada û namên wanda lêkolîn bikin, hûnê bên ser wê fikirê, wekî bangên wan bi rastî anegorî wê bangêne, ya ku Îsa bona wî cahilê dewletî terîf kir.

Roja îroyîn em ji vê rê xalifîne û ev yek menîya ketina Amêrîkayêye ruhanîye hîmlîye. Eve menî, wekî îro gelek meriv difikirin ku ew dighîjine Îsa, lê bi rastî usa nîne. Bona heyîna hîmê saxlem em gerekê paşda vegerine serwêrtîya Îsa. Em hemû jî hela hê ji dara şaş dixun. Ew çi ku çawa *qenc* tê hesabê, me ji tiştê herî baş miqûf dihêle, yê ku bona me hazirkirî ye.

Xwedê dixweze duayên mezin bide me, lê em ji wana geleka dihêlin, çimkî dewsa banga kitêba Pîroze rast, banga usa didine xebatê, hewcetîya kîjanê heye. Werin em bêqelp bin. Eger ew cahilê dewletî bihata civînên roja îroyîne pêşkevtî, ewê "xilaz bûya" û nava wedekî kurtda ewê bibûya endamekî civînêyî herî baş. Diqewime hîvî ji wî bikirana, ku ew bighîşta şêwira civînê.

Civîna wedê niha gelek cara banga xilazbûnê pêşnîyar kirîye, bêyî xeberdana derheqa serwêrtya Îsa.

Bona ku meriva nekine nava xapandnê, bona qewata Civînê, bona jîyîna bi duayên Xwedê yên rast û boy wana, yên ku wê rojekê xeberên "ji Min dûrkeve" bibhên, werin evê banga wa gotî "qenc", ya ne tam, bihêlin û paşda vegerine berbi dara jîyanê, banga Încîlêye xilazbûnê.

6

# SÎSTÊMA MEYE HUNDUR, YA KU CÎH QIRAR DIKE

“Çavên min li ser wî meremîne,
wekî Xwedê gazî me dike...”
— Fîlîpî 3:14, MSG

Romana here mezin bengîbûna
li ser Xwedêye, gera Wî serhatîya here mezine,
dîtina Wî destanîna merivatîyêye
here mezine.
— Ogostînosê Pîrozî Xwezilî

Bingeha me serwêrtîya Îsa Mesîh e. Hemû govekên emirê me gerekê li ser vê stûnê bên çêkirinê. Eger em usa bikin, ewê wededirêj bin. Eger usa nekin, ewê bi temamî bimirin.

Êtapa çêkirina malêye bi sirê dîwarê hîmlî ye. Nava vê êtapêda hemû tişt li ser hîm tê çêkirinê. Ev beşa çêkirinê hemû tiştê nav malêda xweyî dike. Hemû tiştên nava malêda, ban, dîwar, ode, pencere û hemû tiştên mayîn hewcê dîwarê hîmlîne, bona ku ew bi wedê dirêj qulix bikin. Bi heyîna hîmê qewîn û usa jî dîwarê qewîn em dikarin maleke bona wedê dirêj û ya açix çê bikin, gilî derheqa *jîyanêdane*.

## Sîstêma weye hundure cîhqirarkirinê

Bona şirovekirina alîyê duda, yê emirê bawermendîyêyî gulvedayî emê mesela avayîçêkirinê daynine alîkî û berbirî meseleke mayîn bin.

Em bi vê pirsêva destpêkin: meremê weyî sereke kîjane? Bi gilîkî mayîn gotî, kîjan xwestina we nava xwestinên mayînda ya here mezine? Hûn dikarin bêqelp bin? Eger hûn bêqelp bin, hûnê li wir nîbin, li kîderê weyê nexwesta.

Mesele, sîstêma têlêfona we, ya bona qirarkirina cîh, bona çûyîna firegehê hatîye sazkirinê, lê hûn dixwezin herine dikanê û hûnê gelekî xemgînbin eger sîstêma têlêfonê bêje: “hûn gihîştine cîh”, û wî çaxî wextê ku hûn nêzîkî firegehê bin, nivîsarên hevaltîyên avîasîyayê li ser wî avayî dewsa nivîsarên dikanê bivînin.

Hûnê bawerîya xwe wê yekê neynin û hûnê şikyat bikin: “Çi qe*wimî? Ez çawa hatime li vir?”. Hemû tişt zelale. Sîstêma weye cîhqirarkirinê we bire wî cîhî, bona li k*îderê ew hatibû sazkirinê.

*Pawlosê Şandî elam dike, ku çawa sîstêma wîye cîhqirarkirinê hatîye sazkirinê*”: “Hewl didim bighîjime meremê xwe, wê lecxelata jorçûyînê, awa gotî gazîya Xwedêye bi saya Mesîh Îsa bistînim” (Fîlîpî 3:14). Ewî zanibû, ku ew berbi çi dicedîne û sîstêma wîye cîhqirarkirinê li ser wî cîhî hatibû sazkirinê. Nenihêrî wê yekê, wekî ew rastî berxudanê, çetinaya dihat, ewî ew hemû tişt diqelaştin, bi rêyên başqeva nediçû, hema berbi wî cîhê kivşkirî diçû.

Bona çi sîstêma weye cîhqirarkirinê hatîye sazkirinê? Bona heyîna gelek hevala? Bona navê eyan? Dereca jîyanêye kivş? Bona ku hûn nava goveka xebatêda yê herî başbin? Diqewime bona saxlemîyê û açixîyê?

Hûn dikarin bêjin: “Ez dixwezim ku ev hemû tiştên min hebin”. Ji me gelek meriv van tişta dixwezin, lê xwestina here mezin nava wanada kîjane? Cudakirina vê xwestinê gelekî girînge, çimkî ewê qirar bike, ku hûn kuda diçin. Rêyên ku dibine berbi meremên cuda, dikarin hinek beşada yekbin, lê paşê hûnê bighîjine cîhekî, li kîderê rê wê paravebin û hûnê mecbûrbin ji wana rêkê bibijêrin.

Bi vî cûreyî, kîjane meremê weyî sereke? Eger meremê weyî dawîyê (xilazîyê) ewe, ku hûn bi moralî paqijbin, qanûnên êtîkayê xweykin, xeysetê we başbe, saxlembin û bi matêrîyalî çareserkirîbin, wî çaxî hûnê pêşdaçûyîna xwe mînanî cahilê dewletî ser hevda bînin. Hemû cudatîyên we wê hebin, lê ji ya here sereke hûnê miqûf bimînin.

Eger meremê weyî dawîyê heyîna gelek hevalaye, wî çaxî hûnê bibine mînanî Aronê birayê Mûsa. Hûnê bivînin, wekî li jêra çîyêne

û bi xebata civakîye pir’cûreva mijûlin, hûn merkeza guhdarîya merivadanin û alîkarîyê didine ola xwe, lê her dem hûnê ji dilê Xwedê dûrkevin. Ewê golika zêrîn, kîjanê hûn bihelînin, dikare li hevalên we û nasên we xweş bê, lê bi kutasî hûnê bidine zelalkirinê, wekî ewê him hûn, him jî ji tiştê wanî herî baş dûr xistîye, yê ku dikaribû nava emirê weda hebûya.

Eger hûn dicedînin, ku “Twîttêrêda” reqema peyîhatîyên we, terîfkirên eyan, dengbêj, rêncberên eyan mezinbe, hûn dikarin statûsa bilind usa jî nava dinya mesîhîtîyêda dest bînin, lê şuxulkarîya xwe mînanî merivê bi navê Vozîya ser hevda bînin, yê ku nava tenêbûnêda mir, nenihêrî wê yekê, wekî welatê xweda ew merivekî bi nav û deng bû (binihêre B Dîrok 26).

Sîstêma we, ya cîhqirarkirina hundur dikare diha paqij û xêrkir be. Diqewime meremê we ew be, ku hûn alîkarîyê bidine feqîra û kesîba. Nava rojên meda ev merem bona geleka berbiçave û gerekê usa be. Çavên meriva ronî dibin, wextê ku em gilî dikin, ku qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê alî feqîra û kesîba, usa jî qurbanîyên nava neheqîya sosîalîda dike. Pawlos civîna korintîyara dinivîse, wekî ewî dikaribû temamîya hebûna xwe bida feqîra, lê yeke ewê tu tişt nestenda (binihêre A Korintî 13:3).

Hûn dikarin bicedînin, ku li civîna xwe bibine xêrkirê herî destvekirî, yê ku layîqî qedire. Feqet em serhatîya merivê bi navê Ananîya û jina wî Sapîraê bîr bînin. Ew endamê civîna Orşelîmê bûn û navê wan jî hebû. Carekê wana erdê xwe firot û pir’anîya pera pêşkêşî civînê kirin. Wana dixwest bida kivşê, wekî wana xwe pêşkêşî çêkirina mala Xwedê kirine. Ew hîvîya pesindayîna bûn, lê dewsa wê yekê ew teslîmî dîwanê bûn (binihêre Karêe Şandîya 5). Axirîya wana tragîk bû.

Hebû wede, wextê ku min xwe çawa merivekî paqij xwedêperest hesab dikir. 18 meha ser hev, her roj, ez şebeqê zû seheta pênca hişyar dibûm û min hetanî seheta hevta dua dikir. Nava piranîya vî wedeyîda min hîvî ji Xwedê dikir: “Xudan, min bide xebatê, ku ez rêberîyê li elaleta bikim, ku ew berbi xilazbûnê herin, Xebera Xwedê bi cûrê qewat terîf bikim, mileta berbi padişatîya Te bînim, nexweşa qenc bikim û meriva aza bikim”. Her şebeq min derheqa vê yekêda hîvî dikir.

Piştî çend meha Xwedê dilê minra xeberda: “Kurê min, duayê te rast nînin”.

Ez lerizîm. Gelo bona Efrandarê min meremên diha qenc, paqij û baş hene, ne ku ew, çi ku min hîvî dikirin? Ez fikirîm, ku diqewime min ew yek şaş fem kir, çi ku min dilê xweda bihîst. Meremên wî cûreyîye baş çawa dikaribûn şaş bûna?

Piştî fikirmîşbûnê min careke mayîn dengê Ruhê Xwedê bihîst: “Cihûda ew hemû tişt, çi hebûna wî hebû hişt, bona ku peyî Min bê. Ew dikete nava wan 12-a. Ewî padişatîya Xwedê terîf dikir, nexwaş qenc dikirin, alî feqîra dikir û meriv aza berdidan, lê Cihûda li dojêye”. Nişkêva ez ji ecêbmayînê lerizîm. Min fem kir, wekî ew hemû tiştên bona kîjana min dikire qare-qar li cem Cihûda jî hebûn, lê ew heta-hetayê undabûyî bû. Diqewime, eger ewî sîstêma xweye cîhqirarkirinêye hundur baş gotûbêj bikira, axirîya wî wê usa tragîk nîbûya.

Min fem kir, wekî ez dikaribûm bi nezanî biketama nava halekî wî cûreyî, nava kîjanîda Cihûda bû û min bi dilê xweyî sax pirsî: “Meremê minî sereke gerekê çi be?”.

## Dîsa cahilekî dewletî

Vê carê Xwedê dîsa cahilekî dewletî nîşanî min da, lê ne ewê ku revî hate cem Îsa, lê ewê ku mînanî kurê padişê li Misirê mezin kiribûn, wî welatî ye ku wî çaxî li dinîyayê dewleta here hukumdar bû. Navê wî xortî Mûsa bû.

Derheqa Mûsada bifikirin. Ew usa mezin bibû, wekî tu cara hewcê pera, xurek, kinca, yan jî xwendinê nîbûye. Geleka dixwestin dewsa wî bûna, çimkî her dem tiştê herî baş yê wî bûn. Li temamîya dinîyayê tiştê usa tunebû, wekî ewî nikaribûya dest bianîya. Mûsa kincê here nû xwe dikirin, dikaribû her car hemû tişt bikirîya û byûcêya wî bêsînor bû. Faytona wîye usa hebû, ya ku roja îroyîn himberî avtomaşînên “Masêratî”, “Lamborcînî”, yan jî “Fêrarî”-yê bûn. Eger ewî nexwesta bi xwe biajota, şofêrê wî her dem hîvîya wî bû.

Mûsa tu cara mecbûr nîbûye oda xwe paqijke, himama xwe bişo, avtomaşîna xwe, derdanên xwe, nivînên xwe bişo û tiştên malêye mayîn bike, çimkî xulamên wî bona wan kirina hebûn.

Xwerinçêkirên wî hebûn, yên ku wê her xwerineke baş jêra çê bikirana. Ewî her dem dikaribû xwerinên here baş bixwerina. Xebata wî derbazkirina wede bû. Eger ewî bixwesta, ewî dikaribû serkarîya eskera bikira, projeyên avaya hazir bikira, yan jî êvarîyên mezin teşkîl bikirana. Eger ewî bixwesta bilîsta, ewî dikaribû temamîya roja xwe bi lehcên cuda-cudava derbaz bikira, lê êvarê jî wedederbazkirinêva mijûl bûya. Ewî dikaribû rojên xwe çawa bixwesta, usa jî program bikira.

Ew jî cahilekî azepî herî xwestî bû. Ewî dikaribû wede tevî keçekê kivş bikira, yan jî her keçek bistenda û dikaribû rastî her jineke li wan welata bihata. Bi rastî eger Mûsa bixwesta, ewî dikaribû ji jina harem çê bikira.

Eger Mûsa bixwesta destvekirî bûya, ewî dikaribû pêşkêşên mezin bida. Ewî dikaribû emirî li ser xebatkarên qulixdarîya xewile yan jî leşkera bikira, ku hevalên wî biparastana. Ewî dikaribû alî feqîra bikira, yan jî ew hesab hilnedana. Ewî dikaribû hukumê xwe li ser kûltûra welatê xwe jî bikira, emir bikira, ku her artîstek li ber wî pêşda bihata. Bona wî tu tişt qedexekirî nîbû, xêncî textê padişê. Bona piranîya meriva emirê wî karibû çawa yê xwezilîyê bihata kivşê, feqet razîbûna wî ya hundur tunebû. Nivîsare:

> "Mûsayê bi bawerîyê, gava mezin bû, ji wan hemû mecalên mala Misirêye padişatîyê paşda sekinî. Ewî tevî cimeta Xwedê jîyana giran bijart û emirê hêsa û nerm berda..." (Îbranî 11:24,25, MSG).

Mûsa qirar qebûl kir, ku wî hemû tiştî berde, çi ku welatê dinyaêyî herî dewletî dikaribû pêşnîyarî wî bikira. Menîya berdana jîyana wî cûreyî çi bû? Gelo ew nikaribû li wir razî bûya û bi qulixkirina bona Xwedê li sera Firewinda bima. Na xêr. Sîstêma Mûsaye cîhqirarkirnêye hundur digote wî, wekî ewî nikaribû xwestina dilê xwe li wir tijî bikira, li kîderê ew dima, çimkî xudanê nama îbranîya derheqa wîda dinivîse:

> "Ew fikirî, wekî diha baş bû boy Mesîh zehmet bikişanda, ne xiznên Misirê yên wî bûna, çimkî ewî berbi pêşerojê dinihêrî û çavvnihêrîya *heqê mezin bû*" (Îbranî 11:26, NLT).

Gelo ew heqê mezin kîjane? Wextê ku ez vê pirsê li aûdîtorîyayên cuda didim, gelek dibêjin, wekî gilî derheqa welatê Sozdayîdaye.

Feqet eger usaye, em gerekê bipirsin: gelo welatê, ku li wir şîr û hingiv dikişe, dikaribû tiştekî usa pêşnîyar bikira, çi ku li welatê Misirê tunebû. Wî çaxî Misir welatekî bi rêsûrsên tebyetêva dewlemend bû û malhebûna wêye gundîtîyê pêşkevtî bû. Gelo welatê Sozdayî ji wî welatî baştir bû? Gelo Mûsa dikaribû maleke diha baştir li wî welatê nû çê bikira, ne ku ew sera li kîderê ew dima. Bi fikira min, femdarîye, wekî bersiva van pirsa wê "na"-be.

Wî çaxî Mûsa hîvîya çi heqî bû? Fikira wîye derheqa xwestina wîda ewê rojê tunebû, wextê ku ew ji sera padişatîyê dûr ket, lê ewî zanibû, wekî tiştê ji wê zêdetir heye. Ew li ser rê bû û tenê paşê ewê ew tişt bidîta, çi ku ew digerîya.

Hûn dikarin bînin ber çavên xwe: hûn cîhên nêzîkî avê û klîma germ hiz dikin, berfê û sermê hiz nakin. Nîvê zivstanêye û hûn li ştateke Amêrîkayêye bakûr- Vêrmontê dijîn. Derva 20 derece sermaye û nava weda xwestin pêşda tê, li wî cîhî bin, kîjanî hûn hiz dikin. Hûn dikevine avtomaşîna xwe, derdikevine li ser wê rê, ya ku dibe berbi başûrê welêt û berbi germayê diçin. Hûn rast nizanin, ku kuda diçin, lê hûn fem dikin, wekî ew diha başe, ne ku sermakirina nava berfêda. Li ser rê, li cîhê dagirtina bênzînê, hûn rêklamekê divînin, li ser kîjanê şikilê cîhê nêzîkî behrê Palm Bîçê divînin, yê ku li ştata Florîdayê ye. Hûn bi xwe dikenin û dibêjin: "Awa eve". Wî çaxî hûn sîstêma xweye qirarkirina cîh saz dikin û bi adrêsa wî cîhî diçin. Niha hûn diçine wî cîhî, kîjan we dixwest.

Eva hema mînanî wî halîye, nava kîjanêda bû Mûsa. Ew ji serayê dûrket, bi zanebûna wê yekê, wekî tiştê diha baş hebû, lê ewî heqê xwe piştî 40 salî dît, nava qûmistanêda, li kîderê rastî Xwedê hat û hazirîya Wî texmîn kir. Hema ev yek qewimî, sîstêma Mûsaye qirarkirina cîh carekêra saz bû. Heqê wî hazirîya Xwedê bû û emê şedetîya wê yekê diha dereng, piştî wê yekê bivînin, wextê ku ewî Îsraêl ji welatê Misirê derxist.

## Înkarkirina pêşnîyara Xwedê

Bona Mûsa eva wedekî gelekî dijwar bû. Ew û cimeta Îsarêlê li qûmistana bêavra diçûn, li kîderê gelek çetinayî hebûn. Ev çetinayî

(dijwarî) dikaribûn bi tevbûna xwedêtîyê bihatana milahîmkirinê, lê tê bêjî ew gelek cara derengî diket. Xêncî wê yekê tabîya Mûsaye li cem cimetê ya here nimiz bû. Nava wî wedeyîda Xwedê wîra xeberda:

> "Dûrkeve ji vî cîhî, tu û temamîya cimetê, ya ku te ji Misirê derxist û here li wî welatî, yê ku Min soz da bidime Abraham, Îshak û Aqûb û nifşên wan. Ezê milyaketekî bişînim, ku rêberîyê li we bike û Ezê kenanîya, emorîya, hîdîya, pirîzîya, hîwîya û yebûsîya raqetînim. Hûnê herine welatekî dewlemend û bi bereket. Lê *Ezê bi xwe tevî we neyêm*..." (Derketin 33:1-3, TEV).

Wan tişta bînin ber çavê xwe, rastî kîjana her roj Mûsa û temamîya cimetê dihatin. Emirê wan, qewilên bona jîyanê nebaş bûn, çem, deşt, mêşe, darên fêkîya, kanîyên ava sar, erdê dewlemend û cîhên çêrandina heywanên wan tunebûn. Îdî wedekî dirêj bû, ku ew neçûbûne bazara yan jî dikana û kincên nû bona xwe nekirîbûn. Xwerina wan jî cûrekî mayîn bû. Nanê ku wana dixwer, dikaribû li ser erdê şeş roja bima. Dewsa goşt wana teyrede dixwerin. Bona şirovekirina vî halî bicêribînin çend meha ser hev nanê cûrekî mayîn bixun û tiştekî mayîn nexun, wî çaxî hûnê van meriva fem bikin.

Jîyan gelekî giran bû. Xulamtîya li Misirê gelekî xirab bû. Lê li qûmistanê jî jîyan nexweş bû. Çawa jî hebe gumana meriva hebû, wekî ewê bighîjine welatê xwe, welatê Sozdayî, yê ku çawa Kenan dihate navkirinê. Bi sala ser hev Xwedê gotibû wan, wekî ew welatekî dewlemend û tijîye. Nava emirê xweda wana hemû qewatên xwe didane xebatê, wekî bajara bona misirîya çê bikin û dewsa xebata xwe wana bermayên misirîya distendin. Zûtirekê mecala wan wê hebûya, ku vê carê jî malên bedew, gund û bajara bona xwe çê bikin. Wanayê kûltûra nû çê bikira, ya ku anegorî wê mîrasê bû, ya ku ya wan bû û ewê karibûna mîraseke layîq bona zarok û nebîyên xwe bihiştana.

Bi kutasî, Xwedê emirî li ser Mûsa, rêberê cimetê kir ku cimetê bibe welatê Sozdayî. Ewî got, wekî bijartin heye: milyaketekî qewat dikare rêberîyê li wana bike û wana biparêze. Ew milyaketa dikaribû hemû cûre dijmin raqetanda. Feqet qewilekî mayîn jî hebû. Xwedê wê tevî wana neçûya.

Bînine ber çavê xwe, ku hûnê çawa bûna, wextê ku we xeberên usa bibhîstana. Xwedê bi Xwe wê yekê pêşnîyar dike, hîvîya çi

bûne bi sedsala ser hev kal û bavên we. Ev pêşnîyar dikaribû jîyana koçerîyêye 130-î sala ser hev bida sekinandinê, dijwarî û emirê giran wê bihatana guhastinê. Bêyî şik, Mûsa gerekê ev gotin qebûl bikira, lez ji çîyê peya bûya û behs bigîhanda mezinê cimetê. Paşê temamîya cimetê wê pesinê wî bida û navê wî wê diha bilind bûya. Ewê şabûna û paşê biketana ser wê rê, berbi welatê Sozdayî.

Hemû tişt wê wî cûreyî bûya, eger qencîya "qebûlkirinê" bona Mûsa bibûya qirara bona gihîştina merem. Feqet, Mûsa vî cûreyî bersiva pêşnîyara Xwedê da:

> "Eger Tu nayêyî, me ji vira dernexe" (Derketin 33:15).

Îzinê bidin ez bîr bînim, ku gotina wîye "*ji vira*" li kîderê bû. Ew nava kêmasya, tengasîya, hukumkirina û dijwaryada bû-li qûmistanê. Caba (bersiva) Mûsa wê merivê sade navhevxista, eger ew gotin bona wî nehata femkirinê. Bi texmîn ewî got: "Eger ez gerekê di navbera hazirîya Te û duayê Teda bijartinê bikim, ezê hazirîya Te bibijêrim. Ezê hesab bikim, ku hazirîya Te diha başe, dixwezî nava kêmasyêda, dixwezî nava tengasyêda, lê duayê Te nava cîhê başda lazime".

Gelo Mûsa dîn bûbû? Diqewime teva qûmistanê zyan gîhandibû fikira wî? Na xêr. Sîstêma wîye qirarkirina cîh, ya hundur, li ser tiştê herî baş hatibû sazkirinê. Ew nîşan dida ku bijartina here baş bike, nenihêrî wê yekê ku Xwedê cûrê *baş* pêşnîyar dikir, kîjan ew gerekê nava şabûnêda qebûl bikira.

Meremê Mûsa heqê wî bû û naskirina Xwedê bû. Hûnê nikaribin kesekî bi rastî nas bikin, eger nava hazirîya wîda wede derbaz nekin. Hûn dikarin derheqa kesekîda bêyî hazirîya wî tişta pê bihesin? Feqet eger hûn wede nava hazirîya wî merivîda derbaz nakin, hûnê nikaribin ji nêzîkva wî merivî nas bikin. Heqê Mûsayî mezin hema ev bû. Bona wî tiştê herî qîmetlû tunebû û tu kes nikaribû Mûsa bianîya ser fikireke mayîn, nenihêrî wê qencîyê jî, wekî Xwedê bi Xwe pêşnîyar kir. Hûn dikarin bînin ber çavê xwe, ku wê yekê razîbûneke çawa pêşkêşî Xwedê kir.

Diqewime hûn bipirsin: "Bona çi gerekê înkarkirina pêşnîyara Xwedê razîbûn bida Wî?". Ezê bersiva vê pirsê bi meseleke jîyana xwe bidim.

Ez û Lîza nava seferêda bûn, wextê kîjanê çend rojên meye aza hebûn. Li nêzîkî hotêla me deşta golfêye baş hebû. Ez hiz dikim golfê bilîzim. Ji hevalên min çend meriva ez teglîfî lîstikê kirim, lê çend rojên meye betal hebûn.

Jina mine ecêb bi bêqelpî got:

– Con here tevî wan golfê bilîze.

– Na, delala min,– min gotê,– diha başe ez wede tevî te derbaz bikim.

Ew çend roj gelekî baş bûn. Şabûna Lîzayê ya ku min ew bijart, lê ne ku golf, bona wan roja bû menî. Ewê zanibû, wekî ez gelekî wê lîstikê hiz dikim û wedê xwe tevî hevalên xwe derbaz dikim. Lîzayê pêşnîyara bêqelp kir û ewê fikira xwe neguharta eger min ew yek qebûl bikira. Feqet ew li kûraya dilê xweda guman bû, wekî ezê wê bibijêrim, lê ne ku lîstikê.

Hema ev prînsîp jî nava halê Mûsada bû. Xwedê pêşnîyarî wî kir û dixwest ew tişt mîyaser bikira. Ewê milyaket bişanda, yê ku wê bêqezîya Mûsa û temamîya cimetê bigîhanda welatê Sozdayî. Çawa jî hebe ew tişt wê bêyî hazirîya Xwedê bibûya. Ez li ser wê fikirême, wekî Xwedê ev pêşnîyara bêqelp kir, lê dilê Xweda dixwest, wekî Mûsa Wî bibijêre, ne ku lez azabûna ji qûmistanê û ew li welatê dewlemend û bedew derbazî emirê hêsa bûya.

Mûsa du tişt elam kirin, wextê ku ewî pêşnîyara Xwedê înkar kir. Berê ewlin ew yek bû, wekî hazirîya Xwedê bona wî diha biha bû, lê ne ku qebûlkirina duayên Xwedê bêyî hazirîya Wî. Ya duda jî ew bû, wekî Mûsa bawerîya xwe li helalîya Xwedê dianî. Nenihêrî wê yekê, wekî çûyîna li welatê Sozdayî dihate paşdaêxzistinê, Mûsa zanibû, wekî Xwedê wê Îsarêl bibira li wir. Ewî zanibû, wekî Xwedê wê gotina Xwe bikira. Eger sîstêma Mûsaye hundure qirarkirina cîh rast quremîşnekirî bûya, wî çaxî bi hesabhildana wê yekê, ewê bêyî şikberî bijartineke başqe bikira.

## Sazkirina sîstêma qirarkirina cîh

Pêşda menî çi bû, wekî Mûsa bi vî cûreyî sîstêma xweye hundure qirarkirina cîh saz kir, wextê ku hemû Îsraêlî bi menîyên cûre-cûre ji wî cuda dibûn. Emê caba vê pirsê bizanibin, eger em derbazî qirar û gavên wîye pêşda bibin.

Wextê hemcivînên xwe, ez gelek cara ji meriva dipirsim: “Mûsa rêberî li îsarêlîya berbi kîderê dikir, piştî derketina ji Misirê?”. Her car piranîya meriva dibêje: “Berbi welatê Sozdayî”.

Hûn difikirin, wekî ev bersiv (cab) raste? Her car wextê ku Mûsa diçû cem Firewin ewî her dem gotinên Xwedê digote padişê Misirê: “Cimeta Min berde ku here li *qûmistanê* û Min bihebîne” (Derketin 7:16, NLT, usa jî Derketin 5:1; 8:1,20; 9:1,13; 10:3). Mûsa hevt cara gote Firewin ku Îsarêlê kuda here û her car derheqa hebandinê û qûmistanêda dida dîyarkirinê. Ewî qet carekî jî derheqa welatê Sozdayîda bîr neanî.

Meremê Mûsa ew bû, ku rêbrîya cimetê bike, bibe berbi qûmistana Sînayê ku rastî Xwedê bê û Wî bihebîne. Bona çi ewî gerekê bixwesta rêberî bikira û cimet ji Misirê carekêra bibira *welatê Sozdayî*, bêyî pêşdabirina li cem *Ewê Ku Soz Daye.* Eger Mûsa usa bikira, wê wî çaxî sozdayînên Xwedê diha girîng hesab bikirana, lê ne ku hazirîya Xwedê û bi wê yekê sîstêma îsarêlyaye hundur, ya qirarkirina cîh, wê şaş bihata sazkirinê.

Mixabin, terîfkir û dersdarên rojên me cûrê sozdayî bijartine. Tê bîra min, wekî salên 1980-yî û 1990-î diha gelekî derheqa wê yekêda terîf dikirin, ku Îsa bona me çi dikare bike, lê ne ku derheqa wê yekêda ku Îsa kî ye. Hînkirina vî cûreyî şagirtên usa pêşda anîne, yên ku sîstêma xweye qirarkirina cîh li ser duayên Xwedê dane sazkirinê, lê ne ku li ser hazirîya Wî. Eva hema ewe, wextê ku jin mêr bona hebûnê distend. Diqewime ew jina wî hiz dike, lê menîyên hizkirinê şaşin. Ez di navbera Îsraêlê û Mûsada miqabilîhevbûnê divînim. Eger hûn derheqa jîyîna Îsraêlêye li Misirê bifikirin, ew bi bêîsafî dihatine xebitandinê. Ew nava qirêjêda, malên hedimîda diman, bi xurekên kevin têr dibûn û kincên kevin xwe dikirin. Temamîya jîyana wan li ser çêkirina mîrasa yên mayîn derbaz dibû. Xebatkarên Firewin piştên îsarêlîya bi deximava eblû kiribûn, lê leşkerên wî jî kurên wan dikuştin.

Îsraêl ji hêsîrîya Misirê xilaz bû, lê ji destpêka sefera qûmistanê hinek wede derbaz bibû, wextê ku cimet îdî nerazî bû û dixwest paşda vegerîya Misirê. Îsarêlya digot: “Gelo mera neqence em vegerine Misirê?” (Jimar 14:3), yan jî “Diha baş bû me misirîyara xulamtî bikira” (Derketin 14:12).

Lê niha derheqa emirê Mûsayî li Misirê, yê başda bifikirin, derheqa kîjanîda min îdî gilî kirîye. Ew jî ji Misirê dûrket û rastî wan qewilên qûmistanêye berk hat, lê ewî tu cara nerazîbûn neda kivşê û derheqa paşdavegerandina li Misirê xeber neda. Menî çi bû? Caba wê zelale: Mûsa carekê rastî hazirîya Xwedê hatibû. Wîra li hev hatibû ku Xebera Xwedê hema ji devê efrandar bibihê. Mecala Îsraêlêye wî cûreyî pêşda hat, lê ew ji wê mecalê paşda sekinî. Niha ezê derheqa wê yekêda gilî bikim.

## "Min... hûn anîne li cem Xwe"

Piştî derketina ji Misirê, Mûsa rêberîya cimetê kir û bire berbi çîyayê Sînayê, hema li wî cîhî li kîderê ew rastî Xwedê hatibû. Wextê ku ew gihîştine cîh, Xwedê emirî li ser Mûsa kir, ku bêje cimetê:

> "We dît min çi anî serê misirîya û hûn çawa hildane li ser perên teyrê sîmir, anîne cem xwe" (Derketin 19:4).

Xeberên Wî bixwînin: "...hûn ...anîne cem Xwe", û dora wê yekê bifikirin. Fikira van xeberaye rast mêriv ecêbmayî dihêle. Xwedê, Efrandarê ezmîn, da zelalkirinê, wekî meremê sereke, yê derxistina Îsarêlêye ji xulamtîya Misirê, anîna li cem Xwe bû.

Em gerekê bîr bînin, wekî Xwedê her dem dikeve nava heleqetîya û dilê wî yê bavêye. Ew her dem usa bûye û wê her dem usabe. Ew hiz dike kurên Xwe nas bike, çawa ku her bavek, yan dayîkek dicedîne heleqetîya tevî zaroka tezebûyî çê bike. Xwedê Xwe li Mûsa eyan kir. Ewî hazirîya Xwe da Mûsa. Hema ewê yekê tenê li cem Mûsa xwstineke mezin çêkir, ya usa, wekî ewî nexwest tu cara vegere Misirê, nenihêrî wê yekê, wekî emirê wî li wir gelekî baş bû. Ewê rasthatinê hukumekî mezin li ser Mûsa hişt û ewî sîstêma xweye hundure qirarkirina cîh rast da sazkirinê.

Mûsa dixwest ku Îsraêl jî wê yekê bivîne, lê tiştê ecêbmayînê ew bû, wekî Xwedê jî usa dixwest. Mûsa îdî rastî Xwedê hatibû û ewî dikaribû Xwedê li ber cimetê raber bikira, lê usa jî dikaribû cimet li ber Xwedê raber bikira. Xwedê temî da Mûsa ku xebera xweye pêşin hazir bike û vê yekê bêje:

> “Hûn buhurtîne: padişatîya kahîna, miletekî pîroz. Evin ew gotin, kîjana Ez dixwezim ku tu cimeta Îsaraêlêra bêjî” (Derketin 19:5,6, MSG).

Temamîya cimetê bona Wî buhurtî bû, û Ewî dixwest ku ji wana her yek bibûya kahîn, ku ew bibûna merivên usa, yên ku dikaribûn nêzîkî Wî bûna, bona wana bi xwe, yan jî bona merivên mayîn. Bi texmîn, Ewî heleqetîyên veşartî pêşnîyarî wana dikir. Peyî wê yekêra Xwedê got:

> “Here cem cimetê û wana îro û sibê bona rasthatina tevî Xwedêyê Pîroz hazir bike. Bêje wana bira kincên xwe *bişon*, ku roja sisîya bi temamî hazirbin, çimkî roja sisîya Xwedê wê peyayî li ser çîyayê Sînayê bibe û wê hazirîya Xwe li ber temamîya cimetê eyan bike” (Derketin 19:10,11, MSG).

Roja sisîya Xwedê çawa soz dabû peyayî li ser çîyê bû, lê bersiva cimetê ya razîkirinê nîbû. Dewsa nêzîkbûnê ew ji Wî paşda vekişîyan. Cimebtê bi dengê bilind gote Mûsa: “Tu mera xeberde û emê guhdar bikin. Lê îzinê nede ku Xwedê mera xeberde, yan na emê bimirin” (Derketin 20:19, NLT).

Cimeta Îsarêlê nikaribû li ber hazirîya Xwedê teyax bikira, çimkî Misir hela hê dilên *wanda* bû. Wana hela hê berjewandîyên xwe diha hiz dikirin, lê ne ku yên Xwedê. Naskirina Xwedê ji nêzîkva nava pirsên wane pêşinda nîbû. Hazirîya Xwedê da eşkerekirinê ku sîstêma qirarkirina wane cîh rast nehatîye sazkirinê û wana jî nedixwest wê sîstêmê rast saz bikin.

Niha dîna xwe bidine emirkirinên Xwedê, nava kîjanada temî hatibû dayînê ku ew kincên xwe bişon. Fikira wê kîjane? Gelo Xwedê dixwest derheqa hîgîyêna (paqijaya) bedenêda bêje? Bona bersiva vê pirsê em gerekê bîr bînin, wekî gelek cara Peymana Kevinda kirên ji der bona eyankirina tiştên ruhanî têra hatibûne dîtinê. Heramîya Misirê hela hê li ser kincên meriva bû. Ew gerekê bihata dûrxistinê, wekî meriv bikaribûna biketana nava hazirîya Xwedê.

Misir sembola sîstêma vê dinyayê ya ketîye. Merivên vê dinyayê bona razîkirina bedenên xwe, razîkirina çava û usa jî navên xwe, yan jî tabîya xwe dijîn (Binihêre A Yûhenna 2:16). Meremê wan naskirina Xwedê nîne: nava jîyanêda ew li hemû tiştî usa dinihêrin, ku difikirin: “Ez çi dikarim ji vê yekê bistînim”.

## Xwedê "nêçîravanên pera" nagere

Wextê ku ez rêwîtîyê dikim, gelek cara ez mêrên dewletîye yaşên xweda mezin tevî jinên usa divînim, yên ku bedewin û ji mêrên xwe 15-20 salî biçûktirin. Gelek cara ew mêr îdî kalbûyîye û meriv dikare bi şaşî hesab bike, wekî ew bavê wê jinêye. Gelo bona çi ew wan mêra distînin, yan jî tevî wan dijîn?

Kêm cara diqewime, wekî ew bengîyî ser hev bûne. Çawa jî hebe, hîmlî menî tiştekî mayîne. Jinên wî cûreyî çawa "nêçîrvanên pera" nav dikin. Ev gotin nava xeberdanêda tê xebitandinê, yan jî tiştekî mînanî wê yekêye ku wî merivî bendî tu tiştî hesab nakî, yê ku ne ku bi wî mêrivî hewaskare, lê wê jîyînêva, çi ku ew dikare pêşnîyar bike. Ev jina dixweze hebûna vî mêrê li rex xwe û hukumê wî bide xebatê. Nêzîkbûna vî cûreyî yekalî nîne, çimkî mêrê ku tevî wê jinê dijî, hewaskarîya wî jî ew jin nîne, lê ewe, ku ew çi dikare bona şexsê wîyî xwehiz bike. Ew dixweze bîne ber çavê xwe, wekî hela hê cahile û pêra jî dikare tevî jinê bikeve nava heleqetîyên bi fîzîkî.

Bi gilîkî, her yek bi êgoîstî dicedîne wî tiştî bistîne, çi ku ewê pêşber dikare bide, lê ne ku ew bi dil derheqa yê pêşberda difikire. Her yek jî zane ku yê mayîn çi dike, çiva mijûl dibe, lê wê yekêra qayîl dibin, ku bikaribin xwestinên xwe mîyaser bikin. Meremê wana çêkirina heleqetîyên wededirêj nîne, lê stendina razîbûna xwehizîye.

Van axirîya ez û jina xwe çûbûne dikana eşîyayên malê. Xêncî me û xebatkara dikanê usa jî mêrekî emirda mezin û jineke cahil li wir bûn. Pêşda ez fikirîm, wekî ew bav û qîzin, lê bi guhdarkirina xeberdana wane tevî xebatkara dikanê, min fem kir, wekî ez şaşim. Ew mêr û jin bûn û bona mala xweye nû eşîya dikirîn.

Em, ew mêr û jin nêzîkî 20 deqeyî li dikanê man û gelek wede hebû ku ez dîna xwe bidime wan. Heleqetîyên wane cûrekî û wa gotî sera-bera bala min kişandine li ser xwe. Li ber çava bû, wekî di navbera wanda hindik tomerîbûn hebûn û hewaskarîyên wan jî tiştên cuda bûn. Tunebûna hizkirinê û şabûnê di navbera wanda dihate kivşê. Ewê jinê bi çetinayî çavên wî dinihêrî. Kincên wê gelekî teng bûn. Mêrê wê jî kincên modêrn xwe kiribûn. Ewî tê bêjî mînanî

lîstikçîyê qumarê xwe xweyî dikir. Ewî gote xebatkara dikanê, wekî pere bona wî problêm nînin.

Bi dîtina vê yekê, min fem kir, ku heleqetîyên min yên tevî Lîzayê bi çiqwasîva cudane. Ez gelekî derheqa wêda difikirim û hemû tiştî bona bedewîya wêye ji derva nakim, nenihêrî wê yekê wekî ew bedewe. Lîza jî hindava minda wî cûreyî ye. Em hevalên başin û hiz dikin tevayî wede derbaz bikin. Gunê min li wana hat, çimkî nava heleqetîyên wanda hizkirin tune bû. Ez nabêjim, wekî emê van meriva gunekar bikin û ez gumanim, wekî ewê nava hizkirinêda bighîjin û heleqetîyên wan wê baş bibin. Feqet çawa qanûn, usa nabe, çimkî heleqetîyên wan li ser hîmên şaşin.

Cimeta Îsarêlê piştgira van heleqetîya bû û eva jî ew qirêja bû, ya ku wana ji Misirê anîbû. Xwedê naxweze heleqetîyên ji derva destpê bike. Ew berbi heleqetîyên rast dicedîne. Ew "nêçîrvanên pera nagere". Menîyên vê dinyayê, yên ku hela hê dilên îsraêlîyada bûn, nikaribûn heleqetîyên bêqelp çê bikirana, çimkî ew yên xwehizîyê bûn. Îsarêl dikaribû Xwedê tenê wî çaxî nas bikira, eger ji wê qirêjê bihata paqijkirinê.

Îsraêl nikaribû mînanî Mûsa ji xwestinên xwe paşda bisekinîya. Mûsa gelekî dicedand ku heleqetîyên bêqelp tevî Xwedê hebin, lê Îsarêlê jî dixwest ji Xwedê feydayê bistîne. Awa bi çiqwasîva ev hemû tişt zelale.

## Roja îroyîn çi diqewime?

Niha em di nava wedê peymana Nûdanin, lê gelo tiştek hatîye guhastinê? Gelo kesek dikare bi qirêja vê dinyayê ye dilê xweda tevî Xwedê bikeve nava heleqetîyên bêqelp? Gelo kerema Îsa Mesîh pêwîstîya paqijbûna ji qirêja vê dinîyayê unda dike? Çend gotinên kitêba Pîroz derheqa wê yekêda dibêjin, derheqa kîjanada hindik cara tê gotinê:

> "Çawa Xwedê got: "Ezê nava wanda bimînim, nava wanda bimeşim. Ezê bibime Xwedêyê wan û ewê jî bibine cimeta Min. Bona wê yekê jî ji nava bêbawera derkevin û ji wana cudabin,– Xudan dibêje. –Li tiştên wane heram nekevin û Ezê we qebûl bikim. Û ezê bibime Bavê we û hûnê jî bibine kur û qîzên Min,– Xudanê Hemû Zorayê dibêje"" (B Korintî 6:16,17, NLT).

> Hevalên hizkirî, çawa ku ev sozdayîn îdî hene, werin em xwe ji vî hemû tiştî paqij bikin, kîjan dikarin beden û ruhê me heram bikin. Em berbi pîrozaya kamil herin, çimkî em ji Xwedê ditirsin (binihêre B Korintî 7:1, NLT).

Ev gotin gelek tiştî dibêjin. Berê ewlin guhdarîyê bidine li ser vê gotinê "Çawa Xwedê got". Xwedê cara ewlin ev tişt gotin û bi çi têkstê Ewî gotin? Pawlos wan gotina tîne ber çava, kîjan Xwedê gotine Mûsa, wextê ku hazirîya Wî li ser çîyayê Sînayê bû:

> "Ezê li nav cimeta Îsarêlêda bimînim û bibime Xwedêyê wan, lê ewê nas bikin, wekî Ez im Xudan, Xwedêyê wan. Ez Ew im, Yê ku ew ji welatê Misirê derxistin, bona ku Ez nava wanda bimînim" (Derketin 29:45,46, NLT).

Xwedê ew yek wekiland, çi ku Derketin 19-da got, derheqa xwestina Xweye bona heleqtîyên bêqelpda. Ewî dicedand ku bighîje vî meremî, lê Îsarêlê wî cûreyî caba Wî neda. Tenê şexsên cuda, mesele Mûsa, Dawid, Danîêl, Îşaya û komeke merivên başqe karibûn tevî Xwedê bikevine nava heleqetîya, çimkî wana qirar kir, ku ji xwehizîyê û menîyên stendina karê azabin. Niha Pawlos hema wan xebera dide xebatê û berbirî me dibe, yên ku bi xwîna Îsa Mesîh paqij bûne û bi kerema Xwedê xilaz bûne.

Careke mayîn nivîsare: "Ezê nava wanda bimînim û nava wanda bimeşim. Li heramîyên wana nekevin û Ezê we qebûl bikim". Eva hema dîsa ewe, çi ku Wî gote Îsraêlê, lê niha Xwedê merivên nûra, *mera* xeber dide. Xwestina Wî, ya bona heleqetîyên nêzîk nehatîye guhastinê, feqet ew yek nikare biqewime, eger qirêja vê dinyayê hela hê li ser kincên meye. Ew me teglîf dike ku em heleqetîyên nêzîk çê bikin, lê ev heleqetî bêqewil nînin. Ew careke mayîn hiznekirina Xweye hindava wan cûrên heleqetîya dide kivşê, kîjana "nêçîrvanên pera" dicedînin çê bikin.

Menîyên di nava meda ji Xwedê veşartî nînin. Ew temîyê dide me, ku em ne tenê ji qirêja bedenê, lê usa jî ya dil û ruh paqijbin. Gelo Ew zane, wekî mînanî Mûsa li ser kincên me qirêja Misirê heye, û em xwestinên Wî zêdetir digerin, lê ne ku yên xwe? Dêmek, çawa ku Mûsa emirî li ser cimeta Îsarêlê kir, ku kincên xwe bişon bona ku rastî Xwedê bên û tevî Wî bikevine nava heleqetîya, usa jî Pawlos roja îroyîn temîyê dide me: "Werin em *xwe* ji wî hemû tiştî *paqij*

*bikin*, çi ku dikare beden û ruhên me heram bike. Werin em berbi pîrozaya kamil herin, çimkî em ji Xwedê ditirsin". Bi paqijkirina xwe ji heramîya sîstêma vê dinyayê, emê gumanbin, wekî sîstêma meye hundur ya qirarkirina cîh wê neteribe û wê tiştên baş nebijêre, bi hesabhilnedana tiştê herî baş.

Sazkirina here kardar, ya sîstêma meye hundure qirarkirina cîh, cedandina berbi heleqetîyên tevî Xwedê ye. Faktora xweyîkirina wêye sereke meriv dikare bi xeberekê bêje-"*pîrozayî*". Nava serên kitêbêye mayînda emê vê yekê bidine eşkerekirnê.

7

# KUMREŞÎ BONA ME

"Hûnê Min himberî Kê bikin?
Kî beramberî Min e? -Yê Pîroz dipirse:–
Li ezmana binihêrin. Kî hemû steyrk
çê kirine? ...bi navkirina her yekî bi navê xwe.
Bi saya qewata Wî û qewata
Nehimberîkirinê, ji wana qet yek jî kêm nabe.
— Îşaya 40:25,26, NLT

Xudanê te bona hizkirina te kumreşe.
Ay bawermend, Ewî tu bijartî?
Ewê qebûl neke, eger tu yekî mayîn bibijêrî.
— Çarlz Spêrcên

Tu tişt awqas gelek razîbûnê nade mêriv û hukumekî baş nahêle li ser mêriv, çiqwas wextê meriv nava hazirîya Xwedê da ne. Hûn dikarin derheqa wê yekêda bifikirin, wekî ev yek nade kivşê, wekî tu ketî nava heleqetîya tevî sportsêmnekî eyan, ulmdarekî eyan, şikilkêşekî naskirî, artîstekî dinêeyan, yan jî rêberekî dinêeyan, lê tu tevî Wî dikevî nava heleqetîya, Yê ku hemû tişt efirandiye, him yê dîtinê, him jî yê nedîtinê. Ewî ezmanekî usa mezin efriandiye û jîyan daye, wekî fikira merivatîyê nikare mezinaya wê bîne ber çava, feqet awqasî hûre-hûr çê kirîye, wekî temamîya qinyatê ezmîn û usa jî hemû tiştên saxe li ser dinyayê ji tomerîbûna atomên biçûk hatîye çêkirinê. Ev atom awqas biçûkin, wekî çawa ku me pêşda dabû kivşê, bi mîlîyarda atom wê lazim bên, ku ji wana xeteke dirêjaya santîmêtrekî bixwezî çê bikî. Piştî gelek lêkolînên mezin jî ulmdar hela hê fem nakin, ku ew çawa hatiye çêkirinê.

Tu serwaxtîke kardar, ulmek yan jî femdarîk bêyî Xwedê tuneye. Tiştê usa tune ku Ew gerekê hîn bibe, çimkî Ew bi rastî hemû tiştî zane. Ew usa jî xilazîyê ji destpêkê zane. Milyaketên qewat her dem li ber Wî disekinin, sifetên xwe vedişêrin û ji eyantiyê tirsyayî derheqa wê yekêda dikine gazî ku Ew kîye. Tiştê ecêbmayînê nîne, wekî mêr û jinên nisiletên derbazbûyîye serwaxt dicedandin hevaltîya Wî texmîn bikin.

Ew yek, wekî her merivek dikare nava hazirîya Wî da bibe, tiştekî bêxiyale. Feqet ew gelekî mêriva ecêbmayî dihêle, wekî Ew bi Xwe hazirîya me hiz dike, serbara serda diha zêde, ne ku em hazirîya Wî. Aqûbê şandî dibêje:

> "Yan texmîna we badîhewa kitêba Pîroz dibêje: "Bi kumreşî Ruh *dixweze*, yê ku ber medaye"" (Aqûb 4:5).

Xebera "*dixweze*" cedandineke qewat hindava tiştekî da dide kivşê. Wextê ku ez derheqa vî Şexsîda difikirim, Yê ku min dixweze, ez bi dil gotinên Dawidra qayîl dibim: "Gelo çiqwas bihane fikirên Teye derheqa minda, Xudan. Ew bêhesabin. Ez nikarim wana hesab bikim: ew ji hebên qûmê zêdetirin" (Zebûr 139:17,18, NLT).

Dawid derheqa fikirên Xwedêda xeber dida, yên ku derheqa we û mindanin, lê ne ku bi tomerî derheqa cimeta Wî da. Fikirên Wî yên derheqa weda diha gelekin, ne ku hemû hebên qûmêye li ser dinya me. Derheqa wê yekêda bifikirin, ku çiqwas hebên qûmê li hemû qûmistana, deştên golfê û cîhên mayîn hene. Gelek qûm heye û usa dertê, wekî fikir ji wê qûmê zêdetirin.

Îzinê bidin, ku ez alî we bikim, ku hûn bînin ber çavê xwe. Ez bi kûrayî bengîyî li ser jina xwe bûme. Ji 30-î salî zêdetire, ku em zewicîne. Gelek fikirên mine baş derheqa wêda hebûne. Feqet, eger min bikaribûya ew hemû fikirên derheqa wêda hesab bikirana, kîjan li cem min hebûne, minê qet qutîke sola jî bi qûmê nikaribûya tijî bikira, çimkî ulmdara daye zelalkirinê, wekî nava deh santîmêtr çargoşe qûma ber behrêda nêzîkî 600 mîlîon hebên qûmê hene. Werin em hinekî zêde derheqa wê yekêda bifikirin. Hûn qet rastî merivêd usa hatine, yên ku gilîya zêde dikin, mesele masîgir? Hûn zanin, ku ew yek çawa diqewime: ew dibêje: "Min masîkî awqas

mezin girtîye”, û bi desta dirêjaya masîyê girtî dide kivşê. Eger hûn bi rastî wî masî bibiînin, ew diha biçûke, ne ku çawa ewî dida kivşê.

Yan jî, mesele, merivekî ku hesabê sosyologî li ber xwe derdixe, bona ku gotina xwe îzbat bike. Ew elam dike: “99 selefê mêra mêlodrama hiz nake”. Ewî tu cara h’esabên sosyologyêye derheqa wê yekêda nexwendine, feqet ew îzinê dide xwe, ku gilîyê xwe zêde bike bona ku hiznekirina xweye hindava mêlodrama bide afûkirinê.

Yan jî, mesele, merivekî mayîn, yê ku dibêje: “Ez bona we dua dikim”, feqet eger ewî rast bigota, diqewime carekê dua kirîye, lê ew jî ne bi temamîya dilê xwe. Bi fikira min meriv car- carna gilîya zêde dikin, lê werin em bêqelpbin, wekî gilîyê zêdekrî derewin. Feqet rastîke nebawerkirinê heye, Xwedê nikare derewa bike (binihêre Jimar 23:19 û Tîto 1:2).

Eger Ewî derew bikira, wî çaxî gerekê gura “bavê derewa” mîrêcinda bûya, lê ew yek wê tu cara nebe.

Eger Xwedê dibêje, wekî fikirên Wî yên derheqa weda diha gelekin, ne ku hemû hebên qûmêye li ser temamîya dinyayê, hûn dikarin nava wê yekêda şikber nîbin.

Hûn dikarin texmîn bikin ku Ew çiqwas derheqa weda difikire? Hûn dikarin bi mesela vê yekê texmîn bikin? Gelo hûnê derheqa kesekîda bifikirn, tevî kîjanî hûn naxwzin nêzîkayê bikin? Ewê jî usa neke. Ruhê Xwedê, Yê ku ber wedaye, *dixweze* nêzîkayê tevî me bike. Bi gilîkî zelal gotî, Xwedê dixweze tevî we, mînanî hevalê herî nêzîk, nêzîkayê bike.

## Kumreşîya Xwedê

Em careke mayîn xeberên Aqûb bixwînin: “Yan texmîna we badîhewa kitêba Pîroz dibêje?: “Bi kumreşî Ruh *dixweze*, yê ku ber meda ye””. Nava vê gotinêda xebera kilît xebera “*kumreşî*”-ye. Fikira vê gotinê kîjane? Îzinê bidin ez şirove bikim. Gelo jina min wê tevî min nêzîkayê bike, surên dilên xwe, xwestinên xwe wê bêje min, eger ez tevî jinên başqe bikevime nava heleqetîya? Ew yek wê tu cara nebe. Eger em vê gotinê bi têkstê binihêrin, emê bivînin ku pêşîya vê gotinê nivîsare:

> “Bêeslino! Hûn nizanin, kê vê dinyayê hiz dike, ew neyartîyê li Xwedê dike?” (Aqûb 4:4).

Bi fikira min ev gotin dide kivşê: "Hûn dixwezin tevî dinyayê hevaltîyê bikin? Wî çaxî hûn bêesilin".

Aqûb tenê mesîhîyara dinivîsî, çimkî nava vê namêda ew 15 cara xebera "birano"dide xebatê. Xebera wî bona wanaye, yên ku tevî Xwedê nava heleqetîyadanin û nava jîyana xweda Îsa Mesîh qebûl kirine. Eve rastî: em dijî (miqabilî) Xwedê bêesiltiyê dikin, wextê ku em tevî vê dinyayê romana lîrîkî dilîzin.

Îzinê bidin ez vê mesela xwe berdewam (dûmayî) bikim: eger ez tevî jineke başqe nava heleqetyada bûma, Lîzayê ne tenê nêzîkayî neda kivşê, lê pêra jî wê hêrs biketa, kumr'eşî bikira û ewê rast bûya. Nenihêrî wê yekê, wekî min soz dabû wê, min sozdayîna xwe teribandibû û xêncî wê yekê min ew xapandibû.

Pêşîya wê yekê Aqûb dinivîse: "Yan bi texmîna we badîhewa kitêba Pîroz dibêje...". Ew çend xeberên peymana Kevin dide xebatê. Xwedê her dem derheqa Xweda dibêje:

> "...çimkî Ez Xudan Xwedêyê te, Xwedêkî kumreşim..." (Derketin 20:5).
>
> ...Xudan, navê Kê Kumreş e, Xwedê ye, Yê ku bona heleqetyên tevî we kumreşe" (Derketin 34:14, NLT).
>
> "Gerekê bi cûrê sivik nêzîkî Xwedê, Xwedyêyê xwe nebî: Ew agirê peritandinêye û Xwedêkî kumreşe" (Q. Ducarî 4:24, MSG).

Nava kitêba Pîrozda gelek beşên başqe jî hene, yên ku derheqa kumreşîya Xwedêda xeber didin. Ev hemû gotin derheqa heleqetîyên Wî û medanin.

Hetanî ku em pêşda bilivin, îzinê bidin bidime zelalkirinê: Xwedê nabêje, wekî Ew *hindava weda* kumreşe, lê *bona we* kumreşe. Di navbera van herdu gotinada firqî heye. Ew dixweze, wekî hûn bighîjine açixîyê. Ew dixweze ku hûn mezinbin. Ew bi şabûnêva tijî dibe, wextê ku emirê weda bereket heye. Ew dixweze, wekî hûn kardarbin (binihêre Hêşû 1:8, Gotinên Silêman 4:8, NLT, Metta 25:29 û Yûhenna 15:8). Kumreşîya Wî tenê derheqa xwestina Wî da ye, ku ew li cem webe. Ew naxweze we tevî hizkirîkî mayîn nîvî bike, yê ku hîmlî ev dinyaye. Aqûb tîne bîra bawarmenda, ku Xwedê çawa nehelalyê dinihêre. Eger em dijî Wî bêesilyê bikin, hêrsa Wî ya kumreşîyê wê zêde bibe û ew yek tiştekî biçûk nîne.

Feqet, hêrsketin tenê ew texmînkirin nîne, wextê ku pêşda tê, wextê ku nehelalî diqewime. Min gelek cara tevî meriva xeberdaye, dilên kîjana rûyê xayîntîyêda şikestine. Ew derheqa acizbûnê, derd û hêrsêda gilî dikin. Ew yan tenê hiştine, yan jî hindava wanda xayîntî kirine. Gilî derheqa wan merivadane, yên ku temamîya jîyana xwe dane wana û kûraya dilê wanda hêrseke mezin radibe. Jineke ku tevî wê min şêwirdarî derbaz dikir, ketibû nava şaşîyê. Ewê bi kelogirî dipirsî: “Bona çi mêrê min wî cûreyî kir? Min bona wî zarok anîne dinyayê û salên emirê xweyî baş min pêşkêşî wî kirin”. Hûn dikarin texmîn bikin ku Xwedê çi texmîn dike? Hûn dikarin bînin ber çava ku texmînkirinên çawa di hundurê Wî da pêşda tên, wextê ku em xayîntîyê dikin. Pawlos dinivîse: “Çimkî ez bona we kumreşim, hema bi kumreşîya Xwedê” (B Korintî 11:2, NLT).

Bi xeberdana ji navê Xwedê, Pawlos texmînkirinên Xwedêye hindava meda dide kivşê, wextê ku em berbi yekî yan jî tiştekî usa dicedînin, çawa ku meyê berbi Wî bicedanda. Yêrêmîya hema wê yekê dike: “Xemgînîya Min diha zêdeye, ne ku doxtirî: dilê Min şikestîye” (Yêrêmîya 8:18, NLT). Em gerekê bîr bînin, wekî em bi şikilê Wî çêbûne. Dêmek Xwedê hema wî cûreyî texmîn dike, çawa ku em wê yekê dikin.

Xwedê kumreşe, çimkî Ewî emirê Xwe bona me daye. Ewî hemû tişt daye ku heleqetîyên meye tevî Wî yên wededirêjbin. Dilê Wî û şexsê Wî hêrs dikevin, wextê ku em hindava Wî da amin nînin. Gotinên Wî guhdar bikin:

> “...Cimeta min Ez bîr kirime. Hûnê xayîntîyên çawa dikin, ku hizkirîyên xwe bikirin. Jinên xwefiroşe cêribandî jî dikarin ji we hînbin. Nenihêrî wê yekê, hûn dibêjin: “Min tu şaşîk nekirîye”” (Yêrêmîya 2:32,33,35, NLT).

Gelek cara em nizanin, wekî em miqabilî (dijî) Wî bêesilîyê dikin, serbara serda, wekî bêaminîya me bona Wî çiqwas girane. Tenê rastî dikare çavên me veke. Dilên me hindava dilê Wîyî şikestî tu tiştî texmîn nake. Xwedê dipirse: “Gelo ew ji karên xweye xirab şerm dikin? Qet jî na, ew qet nizanin sorbin jî” (Yêrêmîya 6:15, NLT). Yêrêmîya û pêxemberên mayîn derheqa bêaminîya Îsraêlêye nava peymana Kevinda didane kivşê. Pawlos û Aqûb jî peymana Nûda dîsa ew yek dikirin.

## Ev dinîya

Ezê xebera Aqûbe girîng dîsa şirove bikim. Xeberên "*heval*" û "*hevaltî*" nava zimanê yûnanîda "*fîlos*" û "*fîlîya*"-ne. Şirovekirina xebera "*fîlos*" xeberên "*bi dil*", "*bi hevaltî*" û "*tevgirêdan"*-in, lê ya xebera "*fîlîya*" "*hevaltî*", yan jî "*heval"*- in. V. Ê. Vayn derheqa xebera "*fîlîya*"-da nava ferhenga xweye berfirehda dinivîse: "Ew fikira hizkirinê û hizkirîbûnêda dide kivşê". Bin ronahîya xeberên Îsada derheqa wê yekêda bifikirin:

> "Eger *dinîya* we mînanî xwe hiz bikira, eger hûn beşeke wê bûna, lê hûn îdî beşeke vê dinyayê nînin. Min hûn bijartin, bona ku hûn ji vê dinyayê derkevin, *bo wê yekê jî ew we hiz nake*" (Yûhenna 15:19, NLT).

Hûn îdî yên vê dinîyayê nînin, nenihêrî wê yekê, wekî pêşda usa bû. Niha hûn yên Xwedêne. Ew merivê berê, yê ku di nava bedena weda dima, wî çaxî mir, wextê ku we xwe teslîmî Îsa kir. Yê tezeçêkirî xuliqî. Hûn careke mayîn hatine dinyayê, çimkî hûn tevî Xwedê ketine nava peymanê.

Îsa got, wekî nîşana raste derheqa wê yekêda ku hûn yên Wî ne, hema ewe, wekî dinîya we hiz nake. Bi bêqelpî pirsê bidine xwe: "Gelo ev dinîya we hiz dike?". Gelo ev dinîya wan mesîhîya hiz nake, kîjana hûn nas dikin? Eger usaye, wî çaxî hûn çawa dikarin li vê dinyayê bijîn, bixebitin û kardarbin? Hûn çawa dikarin bighîjine vê dinyayê?". Gelo weyê bikaribûya hukumekî diha mezin li ser undabûya bihişta, eger ev dinîya we hiz bikira? Ev pirsên dijwar gerekê bêne bersivdayînê û emê derheqa vanada serên kitêbêye mayînda bixwînin.

Yûhennayê şandî alîyê xebera Îsaye wekî mayîn dide kivşê. Ew temîyê dide me: "Dinyayê hiz nekin, ne jî wê yekê, çi ku nava dinyayêdane. Eger kesek dinyayê hiz bike, wî çaxî hizkirina Bavê nava wîda nîne" (A Yûhenna 2:15,16a).

Îsa, Aqûb û Yûhenna derheqa wî merivîda bi cûrê berk xeber didan, yê ku bi heleqetîyên tevî Xwedê, tevî vê dinyayê tevgirêdanê îzbat dike û usa jî wekî mayîn. Wana fikirên derheqa hevaltîya tevî

vê dinyayê, hizkirina vê dinyayê û hizkirîbûna ji alîyê vê dinyayêda çawa bêesilîyê, dijminatîyê û halê usava didane girêdanê, wextê ku hizkirina Xwedê nava meda nîne.

Bi vî cûreyî emê şirovekirina derheqa vê yekêda berdewam bikin û şirove bikin, ku hevaltîya tevî vê dinyayê çiye, lê em berê ewlin gerekê şirove bikin ku dinîya çiye.

Xebera "*dinya*" bi zimanê yûnanî, xebera "*kosmos"*-e. Ev xeber tê şirovekirinê çawa "dinya niha, halê nihayî miqabilî padişatîya Îsa û ew her dem fikira zû derbazbûnê, bêqîmetîyê... xwestinên nebaş" dide kivşê. Em ji van xebera yekê şirove bikin.

Xebera "*zûderbazbûn*" tê şirovekirinê çawa "ne wededirêj, ne tiştê mayînê, yan jî hertimî". Eger me bikaribûya ji rexda civaka me binihêrîya, meyê bidîta, wekî ew her dem tê guhartinê. Çawa qanûn, guhar'tin tiştekî başe û ew pêşketinê, pêşdaçûyînê û zêdayê têra dibîne. Feqet, wextê guhartinên moralî, gelek meriv ji wan norma dûr dikevin, yên ku bi rastî bona Xwedê qencin.

Ew çi ku *roja îroyîn* nava civaka meda *tiştê qebûlkirnê û sadeye, duh tiştê sade nîbû û bi moralî û sosyalî şaş* bû. Çawa mesele em fikireke ber çava bidine kivşê. Mesele fîlmekê hildin, kîjanê nahêlin ku zarokên hetanî 13 salî temaşe bikin. Piranîya cimetê li ber avayên sînêmayê sirê digrin, ku fîlmên nû temaşe bikin. Feqet, gelek cara fîlmên bi açix kişandî bi nebaşîyên eşkereva tijîne. Nava fîlma wî cûreyîda bêesilîyên cûre-cûre hene. Çawa qanûn ewê bikeve nava cêrga kirin yan jî gotinên nebaş, dizîyê, kuştinê û tiştên mayîn. Kirina vî cûreyî anegorî kirinên xirabe. Nava xeberdanada gelek cara kifirî hene û nava wanda tevbûyên fîlmê cîhê vala navê Xwedê didin.

Me ev tişt qebûl kirîye û carna jî em hîvîyêne, wekî nava fîlmada wê tiştên wa bibin. Eger hema ew fîlm salên 1950-î li sînêmayê nîşan bidana, merivên ku çûbûne sînamayê wê bitirsyana. Amêrîkî wê ji wan kifirîya, ji şikilên merivên tazî û bêesilîyê xemgîn bûna. Temamîya milet wê dengê xwe bilind bikira û bigota: "Bona çi vê fîlmê bi meremê baş, ya derheqa van herdu merivên nezewicîda nîşan didin, yên ku tevayî dijîn û wana nava cîhada didine kivşê? Bona çi vê fîlmê çawa stîla jîyîna sade didine kivşê? Eva tiştekî nebawarkirinêye û gelekî şerme". Civaka berfireh wê ev fîlm boykot bikira.

Dêmek çi qewimî? Gelo Xwedê normên xwexweykirina qence nû qirar kirine? Gelo xetên sînora hatine cîhguhastinê? Yan jî diqewime em diha gihîştîne, lê merivên salêd 1950-î cûrekî mayîn bûn? Gelo eva pêşkevtine?

Eger em hesabkirinên civakêye sosylogî lêkolîn bikin, emê bidine zelalkirinê, wekî guhastinên nava fîlmada normên civaka guhartîye moralîne. Anegorî lêkolînên sosîlogîye van axirîya, himberî hesabên sala 1982-a, reqema jinên cahile ku tevî hevalên xwe dijîn dubare bûye. Anegorî hesaba, di navbera salên 2006-2010-a li Amêrîkaê nîvê jinên ji15-a hetanî 44-salî tevî hevalên xwe hetanî zewacê jîyîn derbaz kirine û ew reqem bi 11 selefava ji hesabên sala 2002-a û 41 selefava ji hesabên sala 1995-a zêdetire. Min dikaribû hesabên sosîlogîye diha zêde derheqa kûltûra ku tê guhastinê raber bikirana, lê meremê min ew yek nîne.

Li vê dinyayê *bêqîmetî* jî heye. Nava civaka meda qewimandin û guhastinên bêqîmet hene. Ew pêşkevtina, ku nava ulm, têxnologîya, mecalên tevgirêdanê, doxtirîyê û govekêd mayînda heye, karê bona merivatîyê tîne û kardarîya me zêde dike. Eva anegorî temîya Xwedêye ewline, ya ku Ewî dabû meriva: “pêşkevin û zêdebin” (Destpêbûn 1:28).

Feqet, gelo guhartinên meye moralî qîmetlûne? Yan ew li ser timayê, xwestinên başqe-başqe hatine hîmdanînê? Gelo me terbyetdarîya zaroka daye milahîmkirinê?

Gelo jin û mêrê ku tevayî dijîn, yên ku hela hê nezewicîne, çareserîyê didine zaroka, yan eva bona xwestinên dê û bavaye xwehizîyê hatîye îzindayînê? Gelo feşkirina qewimandina û xapandina, ya bona zêdekirina frotana eşîya alî bikirçî dike, yan ew yek timaya yê ku difroşe dide razîkirinê? Gelo marîxûanna, ya ku bi qanûnî hatîye qebûlkirinê, xebata mejûyê mêriv dide normalkirinê? Hemû lêkolînên ulmî didine kivşê, wekî mejûyê mêriv rûyê xebitandina van narkotîkada xirab dibe. Gelo ev xwestinên ne bi qanûnî me nêzîkî Efrandarê me dikin?

Kitêba Pîroz dibêje, wekî pêşdaçûyîna dinya me ji alîyê ruhên xirabda tê qirarkirinê, yên ku bi fêlbazî bi destî endamên nisleta me kar dikin (binihêre Efesî 2:2). Meriv dikare bêje, wekî “*kosmos*”

kûltûraye, ya ku ji alîyê merivên ku bi fikirên tarîne, tê çêkirinê. Yûhennayê şandî dibêje: "Dinîya dora me bin kontrola xirabîyêdane" (A Yûhenna 5:19, NLT). Ew bere-bere diha zêde-zêde ji dil û serwêrîya Xwedê dûr dikeve. Ji derva ev dinîya bi cûrê xirab nayê kivşê. Guhartinên wê bi cûrê *pêşdaçûyînê*, yan jî *qencîyê* veşartîne. Telebextra, bi rastî ev dinîya binelîyên xwe berbi xwe dikişîne û bi wî cûreyî ji dilê Efrandar wana dide dûrxistinê.

"Ênsîklopêdîya navnetewîye xeberên k*itêba Pîroz"* şirovekirina diha bi kûr pêşnîyarî me dike:

"Dinêhizî ese nîne, wekî bide kivşê ku meriv tevî îşên hevraqayîlnekirî dibe. Ew dikare pêrspêktîv, qîmetî û qirarên nefikirmîşbûyî bide kivşê, bêyî lênihêrandina wane ji alîyê kitêba Pîrozda". Bi gilîkî gotî, eger dinêhizî heye, wî çaxî em bi xwe qencîyê û xirabîyê şirove dikin. Prêspêktîv, qîmetî û tabîyên ku normên civakê qirar dikin, nava xwestinên bedenê, nava cedandinên razîkirina xwestinên çava û naskirinêdanin:

> "Dinyayê hiz nekin, ne jî wan tiştên ku dinyayêda hene, çimkî wextê ku hûn vê dinyayê hiz dikin, hizkirina Bavê nava weda tune. Çimkî ev dinya t*enê* xwestina qewat, ya hindava xwestinên bedenê pêşnîyar dike, çi ku em dibînin û kubar-babaxîya wî emirî, rûyê destanîn û hebûna meda. Ev tişt ne ji Bavê ne, lê ji vê dinyayê ne" (A Yûhenna 2:15,16, NLT).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê "ev dinîya tenê pêşnîyar dike". Ev beşa dide kivşê, ku çawa hukumê vê dinyayê naskin, yan jî bi gotina Aqûb, çawa bêesila bivînin, yên ku dicedînin me hijmekar bikin.

Ez hîvî dikim, guhdarîya min bike, peyîhatîyê Mesîhî hizkirî: *ev dinîya dicedîne we bide hijmekarkirinê*. Ev dinîya pêşnîyar dike, ku tevî wê heleqetîya îzbat bikin, bi xebitandina xeberên hijmekarîyê, tiştên logîkî, lefekî, mecal û usa jî serwêrtîyê û hukum, her dem karê û lezetê soz dide. Mar hindava Hêwayê wî cûreyî kir.

Hema vî cûreyî jî wî çaxî diqewime, wextê ku jina bêesil dixweze mêrekî hijmekar bihêle. Ew usa dike, wekî meriv difikire ku meremê wê hema ew mêre, lê nenihêrî wê yekê ew tenê dora wî torekê çê dike. Tora wê wî digre, ku ew bikaribe bi destî wî xwestinên xwe mîyaser bike.

Ev dinîya bi cûrê veşartî qurbanîyên xwe hema bi vê torê digre, yên ku mesîhîtîyê dihebînin, bona ku xwestina xwe mîyaser bike û bawermenda ji hazirîya Xwedê, jîyanê û duakirina bide dûrxistinê. Xudanê kitêba Gotinên Silêman zelal elam kir, wekî cîh û nivînên vê dinyayê odên mirinêne û rîya wê rîya dojêye. Xudanê kitêbê eşaretîyê dide, wekî *hukumê wê gelek mêr û jinên qewat berbi mirinê birine* (binihêre Gotinên Silêman 7:21-27).

## Ev dinîya çiye?

Bona şirovekirina vê dinyayê meriva diha gelekî guhdarî danîye ser cûre, lê ne ku ser menîyê. Dilê min xemgîn dibe, wextê ku ez fikirdarîyên bawarmendên bêqelp guhdar dikim, yên ku yan nava *qanûnparêzîyêda* hatine terbetkirinê, yan jî wextê ku gihîştî bûne ketine wê telê. Meriv gelek cara derheqa qanûnparêzîyêda xeber didin û gelekî aza vê xeberê didine xebatê. Dêmek hetanî ku em pêşda bilivin, werin em şirove bikin. Şirovekirina xebera *qanûnparêzî* eve: "xweykirina qanûnê yan jî xalên qanûnê, herfê, lê ne ku ruh'". Şirovekirina vê xeberêye mayîn jî eve, "qebûlkirina kirinên merivatîyê bi normên qanûna".

Ji me gelek meriv serhatîyên gelekî xirab bihîstine, girêdayî cûrê ji vî emirê mesîhîtîyê derra. Serwêr bi kitêba Pîroz sivira ber xwe dixin û bi wê yekê wan qanûna elam dikin, kîjan gerekê bi cûrê rast peyî wan herin û gurêdabin. Ewana wan jina, yên ku kincên modêrn xwe dikin, yan jî zêr û zîva xweva dikin, parfyûmêrîyayê didine xebatê, hesab dikin çawa yên dinêhiz. Mêr jî dîsa wî cûreyî, kincên wan, dirêjaya porên wan tên hesabhildanê.

Eva hela hê hemû tişt nîne. Ew jî dikevine bin gunekarkirinê, yêu ku tevî gunekara tevî kêfkirina dibin. Ew merivên ku diçine sînêmayê, yan jî tevî teşkîldarîyên şabûnêye mayîn dibin, tên rexnekirinê. Eger ji doranên qebûlkirîye der hevaltîke başqe heye, ew yek jî xirab tê qebûlkirinê, lê piştgirîkirina hindava undabûya dîsa çawa paşdavekişandin tê hesabê. Nava van qedexekirinadanin usa jî reqas, tevbûna tevî teşkîldarîyên civakî, her cûrekî mûzîka vê dinîyayê, temaşekirina têlêvîzyonê û tiştên mayîn. Eva tenê çend hebin, ku me

navên wan dan, kîjana pêwîst hesab dikin, “bona ku peyî Îsa herin û ji vê dinyayê dûr bimînin”.

Min çend nîşangehên eyan, yên merivên qanûnparêz nav kirin, feqet cûrên qanûnparêzîyêye mayîn jî hene, yên ku mînanî wana bi qezîyane. Gilî derheqa wan normadane, yên ku bi xwe hatine pêşdakişandinê, kîjana meriv gerekê xweykin, ku bighîjine xilazbûnê, bi ruhanî bighîjin, yan jî bikaribin meriva anegorî şikilê wan qîmet bikin. Dikevine nava wan tişta mesele duakirina bi seheta, rojîgirtin, yan jî xwendina kitêba Pîroz. Bêguman, ev tişt gelek kardarin, lê ewana gerekê usa bona qazanckirina zêdaya ruhanîye cûrekî neyêne kirinê.

Diqewime li me çetin tê ku em bona karê meye mîyaserkirî afûkirinê qebûl bikin, em usa dikin, ku xwe cûrekî ceza bikin bona wê şaşîyê, ya ku me kirîye. Wî çaxî em berê xwe ji xwîna Îsa dûr dixin û careke mayîn li îşên xwe dinihêrin.

Ew jî qanûnparêzî ye, wextê ku em bawer dikin, wekî em li ber Xwedê diha qebûlkirîne, çimkî em bi kel û ced bona Wî xebatê dikin, yan jî li civînê qulix dikin. Yan jî eger em bawar dikin, wekî duayên me diha lez tên guhdarkirinê, çimkî van axirîya me tu guneh nekirine. Fikira vê fikirdarîyêye hîmlî ewe, wekî em dikarin “navnîşa xweye ruhanî” bi terbyetdarîya baş û bi karên qencva tijî bikin. Qanûnparêzî îzinê nade mêriv rihet bibe, yan jî ji jîyanê lezetê bistîne, çimkî nava jîyana wîda her dem hukumê mijûlbûnê heye, yê bona “qulixkirina boy Xwedê”, usa jî bona serkarîkirina civînê, yan jî bi qulixa rezedilî, yan jî piştgirîya hindava feqîra. Menî ne ku hizkirine, lê qazanckirina xweşhatina Xwedêye.

Mesela qanûnparêzîyêye vî cûreyîye klasîk, hema ew fêrisîye, yê ku dada gunekarê bajarê wanî herî eyan dikir û jîyana xwe himberî jîyana ew merivê ku bac berev dikirin, dikir. Ew fêrisî bona wê kirinê Xwedê da razîkirinê. Ewî guneh nedikirin, meriv nedixapandin, bêesilî nedikir, çawa lazim bû rojî digirtin, dua dikir û destvekirî li civînê pêşkêş bela dikirin. Tiştekî xemgînîye, wekî hema wî çaxî, wextê ku ev rêberê ruhanî bi kirina xwe pesinê xwe dida û şaşîyên serkarê xirabkara dida dîyarkirinê, li dawîya civînê evê gunekar sekinîbû û rehma Xwedê hîvî dikir. Îsa got, wekî merivê duda afû bû, lê ne ku rêberê ku qanûnên “kamilî” xweyî dikirin.

Qanûnparêzîya vî cûreyî kûraya ruhê vê dinyayê daye, çimkî ev yek li ser statûsa mêrive û kubarîya wî tê merkezkirinê. Ew meriv ji xwe razîye û ew wê yekê texmîn dike, wextê ku peyî wan qanûnên ji alîyê merivada pêşdakişandî diçe. Bi vî cûreyî em îdî hesab hilnadin, wekî em karebûna Xwedêva girêdayîne û li ser qewatên xwe tên merkezkirinê. Qanûnparêzî jî ji me wê şabûnê didize, ya ku bi saya hazirîya Xwedê tevî meye.

Hevalekî min heye, yê ku bîznêsmêne û gelekî kardare, wextê ku ew kitêba Pîroz dighîne meriva. Ew nava atmosifêra qanûnparêzîyêda mezin bibû, lê paşê ji vî hukumî aza bibû. Carekê ewî gote min: “Con ez difikirîm, wekî ev hemû tişt, çi ku şabûnê û ken pêşda tîne, ji vê dinyayê û ji sînorên qanûna dere. Serwêr û rêberên wî li ser tabîya mêrive der merkez dibûn, lê ne ku li ser tabîya dil. Hukumê Civîna wî xêncî koma wan li ser yekî mayîn tunebû. Telebextra, rêberên wê civînê usa jî xeberên Pawlos fem nekirin: “Çimkî padişatîya Xwedê ew yek nîne, çi ku em dixun, yan jî vedixun, lê jîyîna bi qencîyê, edilayê û *şabûnêye* nava Ruhê Pîrozda” (Romayî 14:17, NLT).

Şabûna meye mezin û wededirêj heye, wextê ku em nava Ruhdanin. Şabûn undabûya dikişîne alîyê xwe, çimkî li vê dinyayê şabûn tune. Îsa, bona hemû merivên bêqelp balkêş bû, nava wanda usa jî gunekarên civakê. Her merivek, yê ku dicêribîne xilazbûna xwe qazanc bike, yan jî bi hînkirinên qanûnparêzîyêye nava Mesîhda bighîje, şabûna wîye rast tune. Ev meriv nava dinîya sînorkirîda dijî, çimkî ewên ku mînanî wana nafikirin, ji vî emirî tên “parzûnkirinê”.

Wê diha baş bûya, wekî rêberên hevalê minî bîznêsmên dora xeberên Pawlos bifikirîyana, kîjan ewî nameke mayînda nivîsîne:

> “Hûn nava Mesîhda mirine û Ewî hûn ji qewatên vê dinyayêye ruhanî aza kirine. Eger usaye, hûn bona çi peyî qanûnên vê dinyayê diçin, mesele: “Hilnede. Tem neke. Destê xwe nedê”. Qanûnên vî cûreyî hînkirinên merivatîyêne û derheqa wan tiştadanin, yên ku xirab dibin, wextê ku em wana didine xebatê. Ev qanûn dikarin li ber çavê me çawa yên gelekî serwaxtbin, çimkî ew dewa pêşkêşkirina qewîn, terbyetdarîya bedenîye berk dikin. Feqet ewana bi tu tiştîva alî wê yekê nakin, ku *meriv xwestinên xweye neqenc alt bikin*” (Kolosî 2:20-23, NLT).

Tiştekî hewask’are, wekî Pawlos ev qanûnên merivatîyê kire nava cêrga qewatên vê dinyayê. Bêguman (bêfitîya), ev yek nade kivşê, wekî xwestinên azaberdayî, dizî, îçikexurî û tiştên vî cûreyîye mayîn guneh nînin. Eva jî dinêhizîke mayîne. Merivên ku bi qanûnparêzîyêva mijûlin gelek cara fem nakin, wekî ew dikevine nava hema sîstêma vê dinyayêye wî cûreyî, derheqa kîjanêda ew herdem terîf dikin û dibêjin ku ji wê yekê dûr bimînin.

Nava xeberên Pawlosda gotina kilît gotina “altkirina xwestinên mêriv”-e. Qanûnparêzî dilê mêriv paqij nake, lê em bêjin, wekî nîşangeha vê dinyayê hema dile. Qewatên vê dinyayê dixwezin hema dilên mêriv bidine nexweşêxistinê. Eve menî, wekî nivîsare: “Ji her tiştî zêdetir miqatîyê dilê xwe bike, çimkî ew jîyana te dide qirarkirinê” (Gotinên Silêman 4:23, NLT).

Îsa dibêje: “Merivê qenc wê ji xizna dilê xweyî qenc, qencîyê derxe, lê merivê xirab ji xizna xirab wê tiştên xirab derxe” (Metta 12:35). Her tişt ji wê yekê tê, ku em nava xweda çi xweyî dikin û çi qîmet dikin. Dilê xwe paqij bikin û jîyana der wê bi xwe çêbe û wê anegorî wê yekêbe çi ku Xwedê qenc hesab dike.

Çawa tomerîkirina evî serê kitêbê, ev dinîya mêriv ne ku ji derva, lê ji hundurva kontrol dike. Ev kontrolkirin derheqa xwestinên dil û fikirêdane. Eve deşta meye şêr û tora vê dinyayê hema li vir kar dike. A hema li vir hevaltî yan jî bêesilî tevî vê dinyayê destpê dibe û li kîderê ew dighhîje tambûna xwe. Ev yek dikare usa jî bona wan merivabe, yên ku hindik diçine civînê, usa jî bona wan merivabe, yên ku her dem diçine civînê û nava qulixêdanin.

Bi femkirina wê yekê, ku ev dinîya çiye, werin em guhdarîya xwe bidine ser *hevaltîyê.* Em çawa tevî vê dinyayê dikevine nava heleqetîya, yan jî hevaltîyê dikin? Em çawa tevî vê dinyayê bêesilîyê dikin. Derheqa vê yekêda emê serê kitêbêyî mayînda xeberdin.

8

# HEVALTÎ

...Hevaltîya meye tevî Xwedê
bi mirina Kurê Wî hate dasekinandinê.
— Romayî 5:10, NLT

Dilê we bawerîya xwe li çi tîne û nêzîkî çiye,
Ew Xwedêyê weyî raste.
— Martîn Lyûtêr

Heval. Hevalên me hemûya jî hene û em wana hiz dikin. Nava salên zarotîya minda du hevalên mine nêzîk hebûn, Dênî û Glên. Min tevî wan temamîya wedê xweyî aza derbaz dikir. Me lîstikên sportê dilîstin, çerxesîyar diajotin, nava tebyetêda digerîyan, lîstikên cuda-cuda dilîstin, diçûne bajêr, yan jî rûniştî me xwera qise dikir. Qisa me derheqa têmayên bona me girîng bûn. Me derheqa hevalên mayîn, keçika, dersa, sportê, bijartina profêsîyayên pêşerojê û gelek têmayên mayînda xeber dida. Piranîya hevaltîya me saxlem bû. Me piştgirî dida hev ku em diha başbin, diha qewatbin, diha serwaxtbin û bighhîjine wê qewatê, ya ku nava meda bû. Me hev diparast û nava halên çetinda jî me alî hev dikir. Bi gilîkî, ji hemû tiştî zêdetir min dixwest wedê xwe tevî wana derbaz bikira.

Lê hûn? Hevalên xweye salên derbazbûyî bîr bînin. Bi xwe ji xwe pirs bikin ku hevaltîya we ji çi saz bûye. Ez li ser wê fikirême, wekî hûnê bêjin, wekî we wedê baş tevayî derbaz kirîye, we hev fem kirîye û hewaskarîyên weye tomerî hebûne. Hizkirin, aminayî, qedirgirtin, laqirdî û sîmpatîya himberî hev nava vê pirsêda cîhê xwe digrin. Hevaltî usa jî dikare ji gelek beşên başqebe, ew yek jî şexsîtîya

merivava girêdayî ye, lê bona me hemûya tiêtê herî girîng ewe, wekî em wedê baþ tevayî derbaz dikin.

Xebera Xwedê derheqa hevaltîyêda baş xeber dide. Ji gotinên kitêba Pîroze here hizkirî yek eve: "Çawa ku rûnên behnxweş texmînkirinên baş didine mêriv, usa jî hevaltîya baş şexsê we dide nûkirinê" (Gotinên Silêman 27:9, MSG). Em bona wê yekê nehatine çêkirinê, ku tenê bifirin: hevaltî qewatê dide me. Ew tiştê sereke bû, yê ku nava efrandarîya Xwedêye ewlinda tune bû. Ewî got: "Baş nîne, ku mêr tenê bimîne" (Destpêbûn 2:18). Em bi şikilê Wî hatine çêkirinê, bona wê yekê jî em berbi hevaltîyê dicedînin û lezetê ji wê dibînin.

Feqet, alîyê wêyî mayîn jî heye. Îsa, Aqûb û Yûhenna derheqa cûrekî hevaltîyêda *xirab* xeber didin. Careke mayîn gotinên şandî guhdar bikin: "Bêesilno. Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinyayê we dike neyarê Xwedê. Ez careke mayîn diwekilînim, eger hûn dixwezin bibine hevalê vê dinyayê, hûn dibine neyarê Xwedê" (Aqûb 4:4, NLT). Gotina wî ne tenê bi rengê xirabe, lê usa jî gelekî berke. Wî çaxî em vê yekê bipirsin: nîşanên destpêkirina heleqetîyên tevî vê dinyayê kîjanin?

## Romana klasîk

Serê kitêbêyî derbazbûyîda em pê hesîyan, wekî xebera "*fîlîya*" tê şirovekirinê çawa "bibin heval", yan jî "hevalbin" û nava wêda fikira "hizkirinê, yan jî bên hizkirinê" heye. "Ênsîklopêdîya xeberên k*itêba Pîroz*" dibêje: "Nava kûltûra yûnanîda fikira hevaltî baş pêşdaçûyî bû. Xebera "fîlîya..."bi fikira xweye berfireh dida kivşê "heval" yan jî "nas", lê bi fikira teng ew derheqa tevgirêdana şexsî û hizkirinêye kûrdane". Bi texmîn, Aqûb vê xeberê bi fikira berfireh dide xebatê û derheqa hevaltîyêda dibêje. Em hemû jî zanin, wekî sê derecên hevaltîyê hene û derheqa çida Aqûb dibêje her sê jî navdanin. Çawa tê kivşê, hemû cûrên hevaltîyê bêaminayêva girêdayîne.

Bêesilîya dijî Xwedê gelekî ji ssênara xayîntîya mêrê zewicî cuda nabe. Dêmek em wan gava lê binihêrin, kîjan berbi romana hizkirinêye sade dibin. Çawa qanûn mêr û hizkirîya wî wextê

rasthatina ewlin nakevine nava cî-nivîna. Ew roman dikare bibe ya fikirmîşbûyî, yan jî ya ne fikirmîşbûyî.

Hemû tişt ji rasthatinê yan jî *nasîyaxwedayînê* destpê dibe. Rasthatina wana dikare bi saya torên întêrnêtêye sosyalî, yan jî nava qewilên sadeda biqewime. Prîska wê yekê wextê nasandinê pê digre. Gelek cara menîya hewaskarîya mêr kêmasîya nêzîkaya tevî jina wîye. Lê carên usa jî dibin, wextê ku ew tenê berbi heleqetîyên nû dicedîne. Destpêkêda rasthatina wana tê bêjî ne zyandare, lê wextê her rasthatinekê hewaskarîya wanaye hindava hevda diha zêde dibe. Paşê ew hejmarên têlêfona û adrêsên êlêktronî didine hevdu. Hewaskarîya di navbera hevda çiqwas diçe zêde dibe, wextê ku ew dikevine nava heleqetîya, namên êlêktronî bi hevra dişînin, bi têlêfonê bi hevra xeber didin, yan jî rastî hevdu tên. Dereca tevgirêdanên wan diha kûr dibe. Ew îdî gelekî hev dixwezin, lê ji wana tu yek xwe mikur nayê. Wextê ku heleqetîyên wan pêş dikevin, ew dilên xweda wê yekê texmîn dikin û ev yek diha pêşda diçe. Nava vê êtapêda ew îdî ji sînorên hevaltîya îzindayî derbaztir dibin.

Paşê ew têra divînin ku gavekê jî zêde biavêjin, tevayî qawê vexun, nan bixun, yan jî cîhekî başqe rastî hevdu bên. Hîmlî hema vî çaxîye, wekî ew destpê dikin hindava hevda xwe bidine kivşê.

Ew îdî derheqa wê jinêda difikire û xwestin pêşda tê ku ew tevî wêbe. Ew têra divîne ku çawa bike, ku jina wî û hevalên wî pê nehesin. Dilê wî îdî berbi jina wî nacedîne, lê berbi jina mayîn dicedîne. Wextê ku ew tevî jina xweye, tê bêjî ew li cîhekî mayîne, çimkî fikira wî li cem hizkirîya wîye. Tenê pirsa wede dimîne, ku ewê kengê nava nivînadabin.

Ew hemû tişt çawa destpê bû? Hemû tişt nava êtapa nasandinê, fikira û qisada destpê bû. Ew kengê werguhêzî bêeislîyê bû? Meriv dikare bêje wî çaxî, wextê ku wana adrês û hejmarên têlêofnên xwe dane hev? Yan jî wextê ku ew xewile rastî hevdu hatin, yan jî wextê ku cara ewlin ewî ew jin hembêz kir. Diqewime wextê ramûsana ewlin ew yek qewimî? Yan jî ew yek wî çaxî qewimî, wextê ku wana kincên xwe êxistin û bi hevra ketin nava heleqetîyên fîzîkî?

Bi rastî, ew yek ji vî hemû tiştî pêşda qewimî. Îsa ronahîyê diavêje ser vê pirsê, dibêje: “Feqet usa nefikirin, wekî we başîya xwe xwey kir,

wextê ku hûn neketine nava nivîna. Dilê we dikare bi xwestinê diha lez zinêkarbe, ne ku bedena we” (Metta 5:28, MSG). Dil ewe, li kîderê em dijîn: karên ku tên kirinê dîna xwe didine halê dilê me. Ew bêesilî wî çaxî destpê bû, wextê ku wana *nasîya xwe didane* hevdu.

## Hevaltîya tevî vê dinyayê

Ev dinya jî hema wî cûreyî me berbi xwe dikişîne û ji “hizkirina ewlin”dide dûrxistinê. Ew destpê dike nava meda hewaskarîyê pêşda bîne. Ew dikare teglîfkirinê bi cûrê henek, razîbûnê, qewilên baş, heleqetîyên hizkirinêye xewile, yan jî açixîyê bide me: bi gilîkî bi her tiştîva, bi çiva dikare me berbi xwe bikişîne. Çawa ku nava mesela anîda hate kivşê, êtapa nasîdayînê dikare bi saytên întêrnêtê, bi têlêvîzyonê, yan jî wextê rasthatinê biqewime. Gelek cara ew yek wî çaxî diqewime, wextê ku em gelekî Xwedêra nêzîk nînin. Me texmînkirina hevaltîya Wî nava xweda unda kirîye. Wedê tevgirêdanên tevî Wî gelekî hişk û nebaş bûye. Hewcetîya bona heleqetîyên hevaltîyê me dibe cîhekî başqe. Hewaskarîya hindava vê dinyayê li rex wî wedeyî zêde dibe, wextê ku em wedê xwe didine wê yekê. Gelek wede derbaz nabe û fikirên me berbi vê dinyayê diçin. Eger em gotinên Pawlos lêkolîn bikin, yên ku bona herdu civînên cudane û guhdarîyê bidine ser eşaretîyên wî, emê ji bêesilîya vê dinyayê parastîbin.

> “Awa ku hûn tevî Mesîh ji mirinê rabûne, ku usaye li tiştên jorin *bigerin*, wê dera ku Mesîh li milê Xwedêyî rastê rûniştîye. Ser tiştên jorin *bifikirin*, ne ku ser tiştên vê dinyayê” (Kolosî 3:1,2).

We bi guhdarî ev beş xwend? Eger na, careke mayîn van gotina bixwînin û guhdarîyê bidine ser xeberên “*bigerin*” û “*bifikirin*”. Em derheqa wan tiştada *difikirin*, kîjana em *hîvî dikin,* yan jî *digerin*. Hetanî ku em xeberdana xwe dûmayî bikin, werin em bi guhdarî xeberên Pawlos bixwînin, yên ku bona romayane. Careke mayîn guhdarîyê bidine ser xebera “*bifikirin*”.

> “Yên ku li gora binyata merivayê dijîn, ew ser tiştên binyata merivayê difikirin, lê yên li gora Ruh dijîn, ew ser tiştên Ruh difikirin. Axirîya fikira

binyata merivayê mirine, lê axirîya fikira Ruh jîyîn û edilayî ye. Çimkî fikira binyata merivayê dijminê Xwedêye..." (Romayî 8:5-7).

Tiştekî balkêşe, wekî nava vê gotinêda xebera "*dijmin*" tê xebitandinê, ew hema xebera yûnanîye, ya ku Aqûb 4:4-da xebera "êxt*ra*"-ye. "*Ferhenga Strong*" wê xeberê çawa "dijminatî... menîya dijîderketinê" şirove dike. Pawlos careke mayîn berbirî wî bawarmendî dibe, yê ku tevî dinîya me tevgirêdanê îzbat dike.

Menîya wê yekê, wekî ez hindava Lîzayê bêesilîyê nakim tenê hizkirin nîne. Ez jî naxwezim hêrsa wê bivînim. Eger min ew yek bikira, ezê bibûma nîşangeha dijminatîya wê. Ez naxwezim, wekî hizkirîya min hindava minda bi cûrê dijminatîyê pêşda bê, li ser min hêrskeve û ji min acizbe. Feqet eva himberî wan tişta tiştek nîne, derheqa çida Pawlos û Aqûb dibêjin, çimkî tu mesîhîkî serwaxt wê nexweze ruastî dijminatîya Xwedê bê (bîr bînin, wekî Aqûb û Pawlos berbirî bawermenda dibûn).

Ûnis dijminatîya Xwedê kişand û kete zikê hût. Samson jî rûyê wê yekêda kete nava xulamtîyê û ewî jî ronahiya çava unda kir. Hêxî ew dijminatî kişand û hema wê rojê jî mir, wextê ku jîyana kurên wîye li ser dinyayê ser hevda hat. Meselên başqe jî hene, meriv dikare bêje ku nava wanda Şaûl, Balam, Hovak û paşê Axêksandrosê hesinkar û gelek merivên başqe jî hene. Rakirina hêrsa Xwedê fikireke gelekî xirabe.

Eger hûn dixwezin gelek mesela bivînin, hûn dikarin peymana Nû vekin û gotinên Îsaye bona civînê kitêba Eyantîda bixwînin. Îsa ji wan civîna yekîra bi hêrs xeberda, ya ku nava goveka heleqetîyên tevî Wî berbi berdaxustinê çûbû, çira wan bidine dûrxistinê (binihêre Eyantî 2:5). Civîneke mayînra jî eşaretî hate dayînê, wekî Xwedê "Wê wanra şer bike" (binihêre E'yantî 2:16). Hêrsa Xwedê ser civîneke mayîn rabû û Ewî got, wekî wê wana biavêje nava "cî-nivîna" û bike nava "halekî giran" (binihre Eyantî 2:22). Civîneke mayîn eşaretî stend, wekî Xwedê "wê mînanî dizekî here ser wan" (binihêre Eyantî 3:3). Dîsa civîneke mayînda Xwedê got, wekî Ewê ji devê Xwe wana birêje (binihêre Eyantî 3:16). Dêmek çetin em bixwezin rastî dijminatîya Xwedê bên.

Romayî 8:5-da guhdarîyê bidine ser gotina "*difikirin*". Werin em wê yekê bi meselekê binihêrin ku ev gotina nava înglîzîda bona çi tê şirovekirinê, ku fikirê bidine rastkirinê.

Bînin ber çavê xwe, wekî zivstane û sîstêma germkirina mala we li ser 21 derecê hatîye *sazkirinê*. Dereca hewê derva - 21C-ye. Endamekî malbeta we lez ji malê derdikeve û derî baş nagire. Ew dikeve avtomaşîna xwe û diçe, lê piştî çend deqa ba derî diha zêde vedike. Hûn odeke mayîndanin û piştî hinek wede texmîn dikin, wekî dereca germayê kêm bûye. Hûn destpê dikin menîya wê bigerin û dibînin, wekî dergê derva fireh vekirîye û hewa sar li malê tijî bûye. Hûn dêrî digrin, lê germaya malê îdî bûye 15C derece. Hema dereca germaya malê kêm dibe, sîstêma germkirinê sîgnalê dişîne bona sîstêma avgermkirinê û ew jî awqasî dixebite, hetanî ku dereca germayê tê *rastkirinê*. Bêyî tevbûna we, dereca germaya malê dîsa 21C-e.

Em paþda vegerine ser mesela ew mêre ku bêesilî dikir. Çend sal pêşda, wextê ku ew rastî dergîstîya xwe dihat, hizkirin û xwestina wî *berbi* wê keçikê bû. Wî mêrî dixwest ku li rex wêbe, nêzîkî wêbe, dianî li ber çavê xwe ku ewê çawa pêşnîyara zewacê bike. Ew keçik her dem fikira wîda bû, wextê ku ew hişyar dibû, wextê ku li cîhê xebatê bû û xwezima şev, wextê ku dixwest raza. Bi gilîkî gotî, wextê ku fikira wî mêrî berbi alîkî mayîn nedişuxulî, ew paşda vedigerîya li wê derê, li kîderê *berbi* wê keçikê bû.

Hevalên wî gelek cara li cem wî tevîhevbûn didîtin û jê dipirsîn: "Tevî te çi diqewime?". Ew tevîhev dibû û digot: "Ez derheqa gelek tiştada difikirim". Ewî nedixwest rastîyê bêje. Ewî nedixwest hevalên xwe bide xeydandinê û bide kivşê, wekî wextê rasthatina tevî wan ew derheqa wê keçikêda difikire. Fikirên wî *nava rastkirinêda bûn.* Feqet, piştî çend sala, piştî nîşankirinê, dewatê û bûyîna çend zaroka ew îdî nava bêeislîyêdane. Ew tevî jineke xerîb nava heleqetîya bêesildane. Li vir jî hema usaye. Ew her dem derheqa hiizkirîya xweda difikirî. Wextê ku hewce nîbû derheqa tiştekîda bifikire, fikirên wî paşda vedigerîyan li ser "*rastkirina*". Wextê ku ew tevî jina xwe bû, xwestinên wî dîsa *berbi* hizkirîya wî bûn. Ewî berbi wê dicedand, çimkî fikira wî berbi wê jinê bû. Çawa ku sîstêma germkirina malêye

avtomat germaya malê dide dasekinandinê, usa jî fikir her car paşda vedigere li ser *rastkirinên* xwe.

Ev yek bi çiva bawarmendva girêdayîye? Wextê ku em ji nûva xilaz dibin, em bi hizkiinêva tijîne. Em derheqa Îsada difikirin, wextê ku ji xewê hişyar dibin, wextê xwerina taştê, avtomaşînêda, li cîhê xebatê, piştî xebatê, wextê ku em tenêne, xwezima şev, wextê ku em nava cînivînadanin. Em bêsebir hîvîya sehetên xeberdana tevî Ruhê Wî ne. Em bi şabûn hîvîyêne, wekî emê tevî civîna bi sirê bibin, emê derheqa Îsada merivara gilîkin, yan jî tevî mesîhîkî emê derheqa rêyên Xwedêda xeberdin. Bi gilîkî mayîn gotî fikirên me derheqa Wîda bin.

Wede derbaz dibe. Em hîn bibûn, bi hîvyêsekinandinê tevî civînabin, hazirîya Wî texmîn bikin û Gotina Wî guhdar bikin. Niha em bi fîzîkî li wirin, lê bi rastî hazir nînin. Fikirên me berbi tîma sportêye hizkirî, bahên eşyaye li dikana nêzîk û tiştên başqe diçin. Gelo çi qewimî? Fikirên me bi rastî dûr dikevin, yan diçin li wir, berbi kîderêne ew û berbi çi em *dicedînin?* Diqewime wekî me nefikirmîşbûyî hizkirîyên nû dest xistine.

## Serpêhatîya min

Îzinê bidin ez serhatîya xwe gilî bikim. Wextê ku ez xwendikarê kûrsa duda bûm li ûnîvêrsîtêya “Fûrdyû”-yê, du hevalên meye xwendikar hatine oda min û derheqa wan her Çar qanûnên ruhanîda gilî kirin, yên ku wextê “berevbûnên li qampê” dihatine terîfkirinê. Çavên mine ruhanî hatine vekirinê û min jîyîna xwe pêşkêşî Îsa kir. Ez carekêra bi agrê hindava Xwedê da tijî bûm. Ez bengîyî li ser Îsa bûm û bi cûrê negotinê bona wê azayê awqas razî bûm, ya ku Wî dabû min. Derheqa Wî da min wanra gilî dikir, yên ku dixwestin guhdar bikirana, lê usa jî wanra yên ku nedixwestin guhdar bikirana. Lawikên me dicêribandin min ji cîhê jîyîna xwendikara dûrxistana, çimkî min tevî xwendikarên mayîn wextê êvarîya derheqa Îsada xeber dida.

Li rex me, li cîhê jîyîna xwendikara, usa jî avayê bona xwendikarên keç jî hebû û li wir çend keçik hebûn, kîjan me çawa “xwîşkên biç’ûk” nav dikirin. Ji wana dudu bi rastî xwîşkên heve helal bûn û wana tevî

nîvê wan lawikên avayê li rex wede derbaz dikirin. Eger ji wan lawika yekî bixwesta tevî jinekê bikeve nava heleqetîyên fîzîkî, ewî zanibû, wekî ew keçik dikaribûn rihet bona wê yekê qayîl bûna.

Ez û xortekî mayîn, me tevayî rêberî li yekê kir ku Îsa wê qebûl bike. Nava 24 sehetada ewê emirê xwe pêşkêşî Îsa kir. Me pêra negîhandibû derheqa kirinên wane wî cûreyîda xeberdin, wana îdî terka wan kirina da. Dewsa wê yekê wana destpê kir şedetîya wan xorta bidin, yên ku tevî wan bibûn. Evê yekê hêrsa lawikên li wir rakir. Wana ez hesab dikirim çawa serkarê wê komê, çimkî wî çaxî min îdî dersên lêkolîna kitêba Pîroz bona temamîya ûnîvêrsîtêyê hema li cîhê jîyîna xwendikara derbaz dikirin.

Bi kutasî, cîgirê sedirê avayê jîyîna xwendikara hate oda min û got: “Con, emê te derxin”. Paşê ewî got: “Con, bona çi tu ne mînanî wan mesîhîyayî, yên ku li vir dimînin”. Ewî derheqa wan xortada digot, yên ku rojên yekşemê (ledê) diçûne civînê, lê tevî hevalên xweye keç bêesilîyêva mijûl dibûn, serxweş dibûn û tevî tiştên başqe dibûn, kîjan li nava xwendikarada qebûlkirî bûn.

Ew dem bona min hêsa nîbû, lê nenihêrî wê yekê, ku cîgirê sedirê avayê jîyîna xwendikara soz da, ku wê min bide derxistinê, ew yek usa jî neqewimî. Tiştekî hewaskare, wekî wana nikaribû dengên anegor berev bikirana ku min bidana derxistinê. Me rêberîya gelek xwendikaraye berbi Mesîh kiribû û ew bibûne piştgirên min. Piştî rasthatina tevî Îsa û bengîbûnê, çend meh derbaz bûn, wextê ku êtapa fûtbola amêrîkî destpê bû. Piştî salekê xwendina min wê îdî ser hevda bihata û mînanî salên derbazbûyî mecala min hebû ku ez tevî hemû lîstika bibim. Nava herdu salên dawîda min lîstikek bernedabû, lê niha jî ez bi Îsava şa dibûm û min ew wede bona lêkolînkirina kitêba Pîroz dida xebatê. Li cîhê jîyîna xwendikara gelekî rihet bû, çimkî hemû diçûn lîstika temaşe bikin. Ew yek mecaleke gelekî baş bû bona rasthatina tevî Xwedê û duakirinê. Tu kesî negotibû min: “Tu gerekê herî lîstikên fûtbola amêrîkî temaşe bikî”, û fikira minra qet derbaz nedibû jî, wekî çûyîna li cîhê lîstika şaşîye. Saltireke mayîn ez wextê gelek lîstika hazir bûm. Ewê salê ez neçûm lîstika temaşe bikim, çimkî bona min ew yek mecala baş bû ku tevî Xwedêbim. Min gelekî dixwest Wî nas bikim. Fikira min berbi Wî bû.

Wextê ku min ûnîvêrsîtê xilaz kir, gelek xwendikarên me îdî Xudan nas dikirin. Lîza jî nava wanda bû, ya ku li ûnîvêrsîtêyê çawa ji wan keçên xirab dihate naskirinê. Hizkirina mine mezin, ya hindava Îsada usa bû, wekî meriv hebûn min hiz dikirin, yan jî hiz nedikirin. Nêzîkbûna navîn tunebû. Eger hûn rastî Con Bîvêr bihatana, weyê zû bizanibûya, ku dilê wî û fikira wî berê xwe dane kîderê, çimkî hizkirina hindava Xwedêda ji min dibarî. Ez mînanî merivê ku piştgirîya tîmeke sportê dike, yan jî xortekî bengîbûyî bûm.

Ez cîhguhastî bajarê Dallasê, ştata Têxasê, bûm. Piştî şeş meha Lîza jî cîhguhastî Dallasê bû û em zûtirekê zewicîn. Ez li hevaltîya "Rokvêl întêrnêyşinil"-ê çawa înjênêr dixebitîm. Li vir carkê jî ez rastî merivên usa hatim, ji kîjana hizkirina mine hindava Îsada li wan xweş nedihat. Ew difikirîn, wekî ez gelekî fikirên xwe raber dikim û wana fem nedikir ku bona çi ez tevî henekên wane nebaş nedibûm û piştî xebatê jî tevî wana îçika alkohol venedixwer. Feqet, nava atmosfêra pêşekzanîyêda meriva nihêrandinên min diha gelekî qebûl dikirin, ne ku li cîhê jîyîna xwendikara.

Piştî 22 meha ji min hîvî kirin, ku ez bighîjime admînîsrasîya civîna me. Ev civîn li Amêrîkayê ya here mezin û ya here eyan bû, hukumê wê jî li temamîya dinyayê hebû. Admînîstrasîya civînê ji 400 merivî bû, yên ku bi qulixên cuda-cudava mijûl dibûn. Wextê ku ji min hîvî kirin, ku ez bighîjime wê komê, ew yek bona min tiştê nebûyînê dihate texmînkirinê. Tiştê tek-tenê, yê ku dikaribû ji vê yekê baştir bûya, bona min çûyîna li Ezmîn bû. Bi vî cûreyî zehmetîyên min ser hevda hatin, çimkî ezê niha tevî mesîhîya bixebityama. Ezê ji wan şerkarîya aza bûma, yên ku li cîhê jîyîna xwendikara û li hevaltîya "Rokfêl întêrnêyşinil"-ê diqewimîn.

Wî çaxî koma Dallasêye fûtbolêye Kovboya komeke lîga miletîyêye baş bû. Min piştgirîya wana nedikir, çimkî ez li ştata Mîçîganê mezin bibûm, lê her duşem min dibihhîst, wekî xebatkarên civînê derheqa Kovboyada xeber didin. Ew li dora sivira qawê berev dibûn û bi aktîvî lîstika rojekê pêşda derbazbûyî, lîstikçîyên here baş, serkevtina komê, yan jî binketina wê gotûbêj dikirin.

Bi hesabhildana wê hewaskarîyê, min destpê kir bi têlêvîzyonê lîstika Kovboya temaşe bikim. Hemû tişt piştî lîstikekê yan duda

destpê bû. Kovboy li min xweş hatin, çimkî lîstika wan gelekî baş bû. Temaşekirinêdn min alî min kirin û niha jî min dikribû li ser tabîkê bisekinyama û tevî xebatkarên mayîn lîstik gotûbêj bikira.

Destpêkêda hemû tişt bêsûc û bêzyan dihate texmînkirinê. Feqet piştî hinek wede hewaskarîya mine hindava Kovboya diha zêde bû û min destpê kir bi temamî lîsitka temaşe bikim. Min bi şabûn têlêvîzyonêra xeber dida, pesinê lîstikçîya dida, lê carna jî li ser wan dikire qîrîn. Bi kutasî, hemû tişt gihîşte wê derecê, wekî min tu lîstikek bernedida. Xebatkarêd me îdî derheqa êtapên lîstikada xeber didan û me berdewam dikir derheqa wê yekêda xeberdin, ku koma Kovboya wê sala tê bi teşkîla çawava pêşda bê û lîstik wê çi cûreyîbin. Ez gelek cara derheqa wê komêda difikirîm, wextê ku min tevî xebatkarên me derheqa wê yekêda xeber nedida. Ez îdî piştgirekî fûtbolêyî tam bûm.

Şabûna min bêsînor bû, wextê ku êtapa lîstikaye bi sirê destpê bû. Her yekşem, (led) piştî qulixa xwe, ez lez diçûme malê û min têlêvîzyon dişuxuland, qet kincjên xwe jî nediguhastin. Kincên min bêfesal bûn û min dixwest biçûma himamê, feqet min nedixwest qet deqekê jî lîstikê berdim.

Wextê navbirîya lîstikê ez diçûme oda xwe û min kincên xwe diguhastin. Eger Lîza hewca alîkarîyê bû nava şuxulekîda, ewê dikaribû derheqa wê yekêda bîr bikira: "Delalê min Kovboy dilîzin". Wextê navbirîya lîstikê me xwerin dixwer, yan jî peyî lîstikêra, lê wextê lîstikê me xwerin nedixwer.

Derheqa Kovboyada min îdî hemû tişt zanibû. Min bi guhdarî ew lêkolîn dikirin û her dem difikirîm ku Kovboy dikaribûn diha baş bilîstana, yan na. Hemû xeberdanên derheqa wan lîstikada li cîhê xebatê min derbaz dikirin. Lîstika wanva ez firnax dibûm. Ev xeberdan tenê rojên duşema derbaz nedibûn, lê nava temamîya hevtêda. Li civînê merivên usa hebûn, yên ku belaş bilêt dianîn û min bi hazirîya mezin hemû teglîfkirinên bona lîstika qebûl dikirin.

Werin em derbazî êtapa lîstikaye mayîn, ya piştî salekê bibin. Pêşîya destpêbûna lîstika min dua kir, ya ku bi fikira min gelekî zelal bû û girîng nîbû. Min texmîn dikir, wekî ewê emirê min bide guhartinê. Duayê min bi vî cûreyî bû: "Xudan, ez hîvî dikim, ku dilê

min paqij bikî, ez dixwezim pîorzbim û bona Te başqekirî bim. Eger dilê minda tiştekî usa heye, çi ku li Te xweş nayê, eşkere bike û dûrxe". Min texmîn nedikir, ku kûraya vî duayî çiye û ewê di nava minda çi bide eşkerekirinê.

Êtapa lîstkaye wê salê nêzîkî dawîyê dibû. Bona lîstikên xilazîyê îdî hindik wede mabû. Min lîstikek temaşe dikir. Kê serbiketa, wê tevî lîstikên xilazîyê bibûya, lê yê ku bin biketa wê der bima. Ez li ber têlêvîzyonê bibûme kevir. Ez rûneniştibûm, seknîbûm. Lîstkeke gelekî sincirî bû. Para lîstikêye dawîyê bû û heyşt deqe mabûn ku ew xilazbe. Kovboy bi çar qala paş ketibûn, wextê ku bi rêberîya êrîşkirê wanî eyan kom pêş ket. Wextê ku êrîş destpê dibûn, ez paşda û pêşda diçûm û dihatim û ji hêrsê min dikire qîrîn, wextê ku lîstik xirab pêşda diçû, û bi dil şa dibûm, wextê ku baş pêşda diçû. Xilazîya lîstikêye neeyan hinek aktîvî pêşda dianî.

Nişkêva, bêyî tu eşaretîkê, Ruhê Xwedê ez berbi duakirinê def dam. Kirina wîye hundur usa nişkêva bû: "*Dua bike, dua bike, dua bike"*. Ew barekî mezin û texmîkirineke giran bû di kûraya dilê minda. Min zanibû, wekî defdana wî cûreyî wî çaxî pêşda tê, wextê ku Ruhê Xwedê dixweze ku ez başqebim û dua bikim.

Lîza ji wê odê dûr bû, lê min jî bi dengê bilind got: "Xudan, hetanî dawîya lîstikê heyşt deqe mane, wextê ku lîstik xilazbe, ezê dua bikim". Nenihêrî wê yekê, ew defdan neseknî û sist nebû.

Çend deqe derbaz bûn, min careke mayîn kire gazî: "Xudan, ezê pênc seheta dua bikim, wextê ku lîstik ser hevda bê. Şeş deqe mane".

Top li cem Kovboya bû. Min zanibû, wekî ewê nava wê lîstika girîgnda serbiketana. Feqet defdana berbi duakirinê sist nedibû, ew diha zêde dibû. Wî çaxî min gumanbirî texmîn kir. Min nedixwest lîstik berda. Min bi dengê bilind got: "Xudan, ezê hetanî dawîya rojê dua bikim, eger dixwezî ezê temamîya şevê jî dua bikim".

Min hetanî dawîyê lîstik temaşe kir, Kovboy ser ketin. Sera ji şabûnê tevîhev bibû. Ez gihîştime şabûna meriva. Feqet min soz dabû Xwedê. Min carekêra têlêvîzyon temirand û ez hilkişyame qatê duda û li oda xweye xebatê min derî dada û li ser xwelîçê çok da, ku dua bikim. Feqet ew defdana berbi duakirinê îdî tunebû. Barê duakirinê tunebû. Texmînkirina sivik jî tunbû, min tu tişt texmîn nedikir.

Min cêriband vê texmînkirinê gur bikim. Min cêriband dua bikim, lê gotinên min gelekî hişk û cûrekî mayîn bûn. Gelek wede lazim nehat, wextê ku min fem kir ku çi qewimî. Min lîstika Kovboya ji hîvîkirina Xwedê bilindtir hesab kir. Ez qûz bûm, min sifetê xwe gîhande xwelîçê û min got: “Xwedê, eger kesek ji min bipirsîya ku nava emirê teda kî diha girînge, Xwedê, yan Kovboyên Dallasê, minê bigota: “Bêfitîya Xwedê”. Feqet min hêca da kivşê, ku kî diha girînge. Hewcetîya Teye hindava minda hebû, lê min lîstik diha girîng hesab kir, ne ku Te. Ez hîvî dikim, ku Tu min bibaxşînî”.

Min dilê xweda carekêra bihîst: “Kurê min, Ez duakirina pênc sehetê naxwezim. Ez dixwezim, ku tu gura Min da bî”.

## Dilsozîya parevebûyî

Beşera min xweş nîbû, çimkî ez hinadava Wî da dilsoz nîbûm, Yê ku emirê Xwe bona min da. Min dixwest tiştek ji vê dinyayê bistenda, ew tişt bistenda, kîjan dilên wan meriva, fikirên wana tijî dike, çimkî kanîke wane tijîkirinêye mayîn tune. Hizkirina min eşkere berbi wê koma sportê bû.

Bin ronahîya vî hemû tiştî careke mayîn gotinên Aqûb bixwînin:

> “Bêeislno! Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinyayê we dike neyarê Xwedê. Ez diwekilînim, eger hûn dixwezin bibine hevalê vê dinyayê, hûnê bibin dijminê Xwedê. Bi fikira we, fikira gotina Xwedê çiye, wextê ku Xwedê dibêje, wekî ew Ruh, Yê ku Xwedê danîye nava me, bi kumreşîyêva tijîye? Nêzîkî Xwedêbin û Xwedê wê nêzîkî we be. Destên xwe bişon, hûn gunekarno: dilên xwe paqij bikin, çimkî *dilsozîya we di navbera Xwedê û vê dinyayêda hatîye parevekirinê*” (Aqûb 4:4,5,8, NLT).

Dilsozîya min hatibû parevekirinê. Dilsozî ji qirarên me tê kivşê, lê ne ji gotina. Gelek meriv dibêjin, wekî ew dilsozin û îşên wana wekî mayîn didine kivşê. Diqewime hema eve menî, wekî Xebera Xwedê dibêje: “Gelekê bêjin, wekî ew hevalên dilsozin, lê kê dikare merivekî aminî rast bivîne?” (Gotinên Silêman 20:6, NLT).

Hetanî ku minê bi guman bigota: “Îsa nava emirê minda Yê herî girînge, ne ku tiştekî mayîn, yan jî merivekî mayîn”, lê hevaltîya min

tiştekî mayîn da kivşê. Îşên ku tên kirinê, dereca tevgirêdanaye diha bilindin, ne ku gotin.

Yûhennayê şandî nava gotinên Silêman 20:6-da, nava peymana Nûda anegorî wê gotinê dide dîyarkirinê: "Werin em ku bi gotinê hiz bikin, lê em hiz dikin... werin em rastîyê bi îşên xweva bidine kivşê" (A Yûhenna 3:18, NLT). Bi rastî, Kovboyên Dallasê dilê minda cîhê qenckirinêyî ewlinda cîhê xwe girtibûn. Kumreşîya Ruhê nava minda min dabû gurkirinê. Min kitêba Pîrozda xwendibû, wekî gerekê min usa nekira, lê min ew eşaretî tê bêjî nedîtibû. Xwedê bi Rehma Xwe şaşîya min da kivşê.

Yûhenna jî dinivîse:

> "Zarokên hizkirî, ji wî her tiştî dûr bimînin, çi ku dikare dewsa Xwedê dilên weda cîhê xwe bigre" (A Yûhenna 5:21, NLT).

Niha ne ku Aqûb eşaretîyê dide me, lê Yûhennayê hizkirî. Hêjaye bidine kivşê, wekî ev gotin nava nama wîye dirêjda gotina dawî ye. Wan roja şandîya nikaribûn têlêfon bikirana, têkstên êlêktronî bişandana, "Fêysbûkê"-da binivîsîyana, yan jî nava rojekêda name hizkirîyên xwera bişandana. Name tiştekî cuda bû û bona gîhandina wê cedandineke mezin lazim dihat. Dêmek eger bi şabûna Ruhê Pîroz we name binivîsîya, Ewê jî înformasîya here girîng bihişta bona xilazîyê. Tevî Aqûb û Yûhenna Pawlos jî eşaretîyê dide, wekî îzinê nedin, ku ev dinîya dewsa Îsa dilê meda cîhê xwe bigre. Ew dibêje:

> "Hûn nikarin bi du cûra bijîn, rojekê tevî Xudan nava kêfêdabin, lê tevî cina jî roja mayîn. Xudanê vê yekê qebûl neke. Ew bona me yan hemû tiştî dixweze, yan jî tu tiştî. Hûn difikirin, wekî bi tiştên hindikva azabin? Ji alîkîva hûn dikarin bêjin: "Îzina hemû tiştî heye. Bi saya merdanîya Xwedêye bêsînor û kerema Wî em mecbûr nînin bi hûrgilî lê binhêrin û dîna xwe bidine hemû kirina, ku gelo ew tiştê qebûlkirîye, yan na?". Feqet fikir nava jîyîna cûrekîda nîne, em dixwezin baş bijîn..." (A Korintî 10:21-24, MSG).

Ez ji van gotina tirsyayîme. Ew gelekî anegorî rojên mene. Gotinên Pawlose bi tercima "Nyû Lîvîng"-ê li min jî xweş tê: "Gelo em dixwezin kumreşîya Xudan bidine gurkirinê? Bi fikira we, em ji Wî qewattirin? Hûn dibêjin: "Bona min îzina hemû tiştî heye". Feqet hemû tişt nîne, ku bona we başe" (Gotin 22:23, NLT). Em careke mayîn dibînin, wekî Xwedê bona me kumreşe.

## Îdî tu fûtboleke amêrîkî wê tunebe?

Dikare pirs pêşda bê: “Gelo ez îdî gerekê lehcên sportê temaşe nekim? Gelo ez gerekê tevî her tiştekî xwestî nebim, çi ku li vê dinyayê tê xebitandinê? Wî çaxî ezê çawa bikaribim li vê dinyayê bijîm û bişuxulim.

Îzinê bidin bersiva vê pirsê wa bidim. Gelo usa dernayê, wekî çawa mêrê zewicî ez gerekê tu jineke mayînra, xêncî jina xwe, xeberdim? Na xêr. Ez her dem jî tevî jina xeber didim. Wextê firînên bi teyarê ez li rex jina rûdinêm. Hema niha jî ez van xeta teyarêda dinivîsim û li rex min jinek rûniştîye. Ez tevî jina dixebitim, tevî wana li gelek cîhên başqe xeber didim.

Çawa mêrekî zewicî ez dicêribînim gelekî nazik berbirî jina bibim, xwezima bo wê yekê, wekî roja îroyîn ji wana gelek nêzîkbûna nerast ji mêra dibînin. Gelek cara jin werguhêzî parçekî goşt kirine, wextê ku mêr xwestiye xwestinên xwe mîyaser bike û himberî mêra ew li ser dereca weke hev hesab nekirine. Eva hêrsa min radike, çimkî ez zanim, wekî Xwedê bi şikilê Xwe him mêr û him jî jin çê kirine. Ewî fikira Mesîh him daye mêra, him jî daye jina, yên ku tevî Wî nava peymanêdanin. Ew piştgirîya tu alîkî nake, him mêra, him jî jina weke hev hesab dike. Dêmek bo çi em gerekê piştgirîya yekalî civînêda jî bidine kivşê.

Feqet, ez fesal dibim, ku dilê xwe li ber tu jinekê venekim, bi cûrê hizkirinê, yan jî cûrekî mayîn. Peymana min tevî Lîzayê heye. Wextê ku min ew stend, min xatirê xwe ji hemû jinên li ser vê dinyayê xwest û hizkirina xwe tenê pêşkêşî Lîzayê kir. Dêmek, eger usaye, ez gerekê wextê heleqetîyên tevî jina cûrekî cuda bidime kivşê.

Werin em evê meselê û hevaltîya tevî dinyayê himberî hev bikin. Temaşekirina fûtbola amêrîkî hela hê li min xweş tê, nenihêr’î wê yekê, wekî ez çetin hetanî xilazîya lîstikê teyax dikim. Nava minda îdî ew cedandina zor tune, ya ku pêşda hebû, wextê ku dilê min berbi Kovboya bû. Niha ez dicedînim xwestinên Xudan mîyaser bikim, hizkirinê û guhdarîyê hindava malbeta xweda bidime kivşê, bona alîkirina meriva bixebitim, bona qulixa me bixebitim û dîna xwe bidimê, wekî guhdarîya min bi serwaxtîya Xwedê û şêwira Wî tijîbûyî be.

Gelo hebûne tiştên usa, yên ku nava jîyîna minda tabîke şaş girtine. Telebextra hebûne. Ruhê Pîroz alî min dikir, ku ez wan tişta nas bikim, çimkî min derheqa wê yekêda hîvî ji Wî kiribû. Golf, xwerin, fîlm û şuxulkarîya qulixkirinê, ji wan tişta çend hebin, li ser kîjana gerekê ez bixebityama û ji kîjana ez gerekê hinek wede paşda bisekinyama, bona ku tabîya dilê min rast bûya.

Wextê ku hizkirina mine berbi golfê tabîke şaş li dilê minda girtibû, Ruhê Pîroz minra got, ku ez temamîya berevoka hacetên golfê pêşkêşî serwêrekî bikim. Bona çi Ruhê Pîroz usa kir? Bi cûrê zelal gotî, nava emirê wî serwêrîda golfê cîhê xweyî rast girtibû, lê nava emirê minda cîhê şaşda bû. Ji salekê hetanî sal nîvekê min golf nelîst, û piştî wê yekê Xudan dilê lîstikçîkî profêsîonalda usa danî, ku ew berevoka hacetên xweye golofê pêşkêşî min bike, ya ku bi qîmetê bi hezara dollara bû. Ewî merivî, yê ku merivê duayê bû, gote min: “Con, ez zanim, wekî ez gerekê vê yekê bikim.”

Piştî çend meha serwêrekî ku alî min kir ez li civîna dinyayêye here mezin qulix bikim, (ya ku li Korêya Başûre), gote min wekî Xwedê dilê wîda danîye ku berevoka hacetên golfê pêşkêşî min bike. Ez bi rastî navhev ketim. Min ji Xudan pirsî: “Ez vana çawa bikim?”. “Golfê bilîze”,– min dilê xweda bihîst. “Feqet sal û nîvekê pêşda Te got, wekî ez wana pêşkêş bikim”. Min bihîst, ku Xwedê çawa got: “Golf îdî bona te cîhê şaşda nîne. Ew bûye mecala hêsabûnê û wedederbazkirinê”.

Peyî wê yekêra min careke mayîn lîstika golfê destpê kir. Xwedê bi cûrê baş ev lîstik da xebatê û bi wê yekê hêsabûn da min û ew yek werguhêzî dika rasthatina tevî kurên min, rêberên civînêye mayîn û hevalkarên qulixa me kir. Qulixa me leca golfêye bi navê “Fîncana Mêsîncêr”-ê derbaz dike û ez dikarim bêjim, wekî sê sal pêşîya nivîsara vê kitêbê “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê bona projeyên mîsîya me ji sê mîlîona zêdetir dollar bi saya lîstika golfêye ji alîyê heval û hevalkarên min stendîye. Eger ez hetanî xilazîya emirê xwe ji golfê paşda bisekinyama, wê tiştê usa neqewimîya.

Em tu cara gerekê netirsin, wextê ku Xudan dewa şikestîbûnê dike. Bi rastî gurêdabûn reh’ete, wextê ku dewa Wî anegorî cedandinên meye. Wekî mayîn gurêdabûn dijware.

## Kedera xwedêtîyê

Aqûb zelal dide kivşê, ku kumreşîya Ruhê Pîroz hindava hevaltîya tevî vê dinyayê çi pêşda tîne. Min derheqa evî alîyê hevaltîyêda xeberda, lê alîyên diha zêde hene. Nava serê kitêbêyî mayînda ezê derheqa menîya hevaltîya vê dinyayêda xeberdim, lê niha diha girînge em bidine kivşê, ku em gerekê çi bikin, wextê ku cedandinêd meye şaş hene. Niha em şêwira Aqûbe bona wan bawarmenda binihêrin, yên ku tevî vê dinyayê ketine nava heleqetîyên cûrekî mayîn:

> "Destên xwe bişon, hûn gunekarno: dilên xwe paqij bikin, çimkî dilsozîya we di navbera Xwedê û vê dinyayêda pareve bûye. Bira çavên weda hêsir hebin bona wan tişta, çi ku we kirîye. Bira keder û derdê kûr hebe" (Aqûb 4:8,9, NLT).

Wextê ku Xwedê eyan kir, ku min çi kiribû (min dewsa duakirinê Kovboy bijartibûn), min kedereke kûr texmîn kir. Min fem kir, wekî min Ew êşandibû, Yê ku emirê Xwe bona min dabû.

Van axirîya min merivekîra xeber dida, yê ku hindava jina xweda bêesilî kiribû, lê paşê hatibû dasekinandinê, rast bibû. Ewî minra gilî dikir, wekî şeş meha nava wî gunehîda bûye û wextê ku gilî dikir, hema usa digirîya. Ew merivekî qewat bû. Nava salên xwendinêda ew endamê koma fûtbola amêrîkî bûye û niha bîznêsmênekî açixe. Bi rastî ew meriv her dem nagirî. Ez ecêbmayî mam, wextê ku min "girîyê wîye mêranîyê" dît. Ew bona wê yekê nedigirîya, wekî Xudan yan jî jina wî wê ew afû nekirana. Wî çaxî zewaca wî diha qewîn bû ne ku pêşda. Ew bona wê yekê digirîya, wekî hindava wê jinê ewî usa kirîye, ya ku wî hiz dikir. Ew ber xwe diket, wekî êşeke mezin gîandibû wê. Tiştekî baş bû, wextê ku meriv dikaribû bidîta, wekî ew hindava jina xwe çi cûreyî difikire.

Kirina wî rastîke xwedêtîyê da kivşê. Hema ew bawarmend, yê ku tevî vê dinyayê nava heleqetîyên wî cûreyîda bûye, gerekê usa bike. Çawa ku Aqûb dinivîse: "Bira keder û derdê kûr bibe". Vî merivî jina xwe gunekar nedikir, lê bi rastî bona kirina xwe ber xwe diket. Şikestîbûna wîye bêqelp gelekî hukumî li ser min kir. Min tevî merivên başqe xeberdaye, yên ku dîsa wî cûreyî hindava

jinên xwe kirine, lê wana hal cûrekî mayîn şirove dikirin. Wextê "xwemikurhatin"-ê yan jî "şedetî"-yê wana digot, wekî ew guneh payê pirê rûyê kêmasîya hizkirina merivê li rex wan, yan jî kêmasîyên başqeda qewimîye.

Kitêba Pîrozda derheqa "berxweketina li gora xwestina Xwedê" û "berxweketina ji vê dinyayê" nivîsare (binihêre B Korintî 7:10). Dawidê padişa mesela merivê berxweketî bû li gora xwestina Xwedê. Ew bi kûrayî ber xwe ket, çimkî bi kirina bêesilîyê û kuştinê Ew êşandibû, Yê ku wî hiz dikir. Ewî dikire gazî: "Miqabilî Te, û tenê miqabilî Te min guneh kirîye. Min ew tişt kirîye çi ku Tu çawa xirabî hesab dikî" (Zebûr 51:4, NLT). Ew çar roja ser hev digirîya û şîn dikir, deverû li erdê çokdayî û fikira wîra derbaz nedbiû, ku xulamên wî derheqa wîda çi difkirîn. Ewî nedicêriband qedirê xwe xweyî bike, dilê wî ji wî derdî hûr-hûrî dibû. Peyî wê yekêra ew hate dasekinandinê.

Şaûlê padişa cûrekî mayîn bû. Ewî jî dilê Xwedê êşand, wextê ku wî ew yek bijart, çi ku ev dinîya dibijêre. Ewî destpê kir şexsê xwe razî bike û bi wê yekê kubar bû, dewsa wê yekê ku gura gotina Xwedêda bûya. Ew jî bona kirina diêşîya, lê bi menîyên başqe ber xwe diket. Ew rastî tiştekî usa hatibû, wextê ku miqabilî wî derketibûn, û ew ketibû nava halekî xirab li ber bindestîyên xwe, li ber wan meriva, yên ku gerekê qedirê wî bigirtana. Xêncî wê yekê qirarên wîye şaş dikaribûn zyan bigîhandana tabîya wîye serwêrtîyê. Şaûl bi berxweketina li gora vê dinyayê ber xwe diket. Ew bi dil xwe mikur nehat çawa Dawid, yan jî ew merivê bîznêsmên, derheqa kîjanîda min gilî kir. Nava fikira xweda Şaûl xapyayî û herambûyî bû. Fikira wî bi wedê kurt hate guhastinê, lê paşê menîyên rast hatine kivşê: cedandina berbi kubarîyê û razîkirina şexsê xwe. Ewî usa jî nava fikira rastda guhastin nedît.

Pawlosê şandî elam dike: "Ew cûrê berxweketinê, yê ku Xwedê dixweze ku em bivînin, me ji guneh dûr dixe" (B Korintî 7:10, NLT). Ev berxweketin ji Xwedê hatîye dayînê, ew nava hizkirina Wî ya hindava medaye. Eger em wê yekê diha zêde hiz dikin çi ku Ew dikare bona me bike, ne ku Wî hiz dikin, wî çaxî karên me ji karên Şaûl nayêne cudakirinê.

Nava herdu serên kitêbêye mayînda emê bivînin, ku çawa hevaltîya tevî vê dinyayê hukumî li ser heleqetîyên me û Xwedê dike. Emê bidine kivşê, ku bi çiqwasîva biha li ser me rûniştîye, wextê ku me Xwedê bi qencîyêva guhartîye, him bi dereca şexsî, him jî bi dereca hemcivînê. Feqet hetanî welgerandina rûpelê kitêbê, hêjaye ku hûn bona duakirinê wede başqe bikin û hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew alî we bike, wekî hûn her heleqetîke xweye cûrekî mayîn, ya tevî vê dinyayê bivînin?

*Bavo, bi navê Îsa, ez hîvî dikim ku Tu dilê min gotûbêj bikî û min nas bikî, rê û menîyên min binihêrî. Eger nava jîyîna minda tiştekî usa heye, çi ku* wê *hizkirinê dest tîne, ya ku gerekê tenê ya Te be, ez hîvî dikim, wê yekê bi Ruhê Xwe eşkere bike. Ez ji Te tu tiştî venaşêrim. Bira ez bibime merivê ku Te bi rastî hiz dike û usa jî bimînim. Bira ez bibime merivekî usa, yê ku bona çûyîna peyî Xudan Îsa Mesîh û qulixkirina bona Wî xwe nehêvşandîye. Ez vê yekê bi navê Îsa hîvî dikim. Amîn.*

# 9

# RASTÎYA HESABHILNEDAYÎ

"...Li ser jîyînê bi emirê Pîroz
bixebitin, çimkî bêyî pîrozîyê tu kes wê Xudan nevîne".
– Îbranî 12:14, NLT

Ewên ku difikirin, wekî pîrozî acizîye hindik tiştî zanin.
Wextê ku meriv li ser xwe pîrozîya rast
texmîn dike... li ber wê nikarî ber xwe bidî
— K. S. Lyûîs

P*îrozî.* Hûn vê xeberê bîr bînin û hûnê bivînin, ku meriv çawa ji wê yekê direvin û lez têma xeberdanê diguhêrin. Bona geleka ew çawa rengekî xirabe, çimkî ew difikirin, wekî ew "modêrn" nîne û dikare emirê wan zeft bike, yan jî nav-hev bixe. Gelek cara pîrozîyê hesab dikin çawa sînonîma qazanckirina xilazbûnê, yan jî alîkî qanûnparêzîyê. Bi xeberdana derheqa pîrozîyêda, hûnê gelek cara vê yekê bibhên: "Ez azame û bi kerema Xwedê dijîm. Necêribînin min bibine binê qanûnê".

Feqet peymana Nûda pîrozî karên qanûnê, yan jî qanûnparêzîyêva girêdayî nîne. Bi rastî ew yek cûrê emirê başe û bi gelek alîyava ew tiştê xwestinêye. Nava rojên meda ew hîmlî şaş tê femkirinê.

## Bona çi em derheqa wê yekêda xeber nadin?

Menî çiye, wekî kurê Xwedê ji xeberdana derheqa pîrozîyêda xwe dûr dixe, nenihêrî wê yekê, wekî temîke zelal heye: "Herin peyî... pîrozîyê, çimkî bêyî wê tu kes wê Xudan nevîne" (Îbranî 12:14).

We fem kir, wekî ev gotin çi cûreyîye? Feydayê tunebûna pîrozîyê hema nedîtina Xudane. Ez gerekê guhdarîke mezin bidime li ser vê gotinê, lê hûnê wê yekê bikin?

Em meselekê derheqa serokê Ştatên Amêrîkayêye Yekbûyîda bînin. Çawa ku ez welatîyê vî welatîme, lê ew jî serokê welatê meye, “heleqetîyên mine tevî wî hene”. Ez bin serwêrtîya wîdame û hukumê qirarên wî li ser min jî heye, li ser temamîya 320 mîlîon welatîya. Nenihêrî wê yekê, wekî heleqetîyên wî cûreyî tevî serokê welêt hene, lê hetanî roja îroyîn ez rastî wî nehatime. Ez temamîya emirê xweda welatîyê Amêrîkayê bûme û îdî ji 50-î salî zêdetire, lê hetanî roja îroyîn ez rastî tu serokekî welatê me nehatime.

Feqet hene amêrîkî, yên ku carna rastî serokên welêt tên. Ew meriv hevalên wîne, yan jî tevî wî dixebitin. Çawa jî hebe, ew mervên ku Mala Sipîda dijîn ew bona wan diha nase, ne ku bona min.

Hema wî cûreyî jî bi mîlîona mesîhî hene, yên ku bin serwêrtîya Îsa Mesîhdanin. Ew hema ew Padişaye, Kîjanî ew dihebînin. Ew wana diparêze û hiz dike, hemû tiştî bo wan dike, usa jî caba hîvîkirinên wan dide. Feqet pirs pêşda tê, ku gelo ew Wî dibînin, rastî Wî tên? Bi gilîkî mayîn gotî, gelo ew hazirîya Wî texmîn dikin? Nava nama îbranyada nivîsare: “Em dikarin Îsa bivînin” (2:9, AMP). Pawlos diha bi hûrgilî wê yekê raber dike:

> “...Em hemû kes, yên ku ev xêlî dûr xistine, dikarin rûmeta Xudan *bivînin* û bidine kivşê” (B Korintî 3:18, NLT).

Gotina “rûmeta Xudan” gelek cara nayê femkirinê û bo wê yekê jî roja îroyîn ew gotin gelek nayê xebitandinê. Em dikarin dewsa wê gotinê bêjin “Mezinaya Xudan”. Bi zimanê meyî îroyîn, Pawlos dibêje: “Em hemû kes, yên ku ew xêlî dûrxistine, dikarin mezinaya Xudan *bivînin*”.

Îsa jî derheqa wanda xeber dide, yên ku wê bivînin, yan jî wê hazirîya Wî texmîn bikin. Wextê şîva dawî, Ewî wa got: “Piştî hinek wede ev dinîya îdî wê Min nebîne, feqet hûnê Min bivînin, çimkî Ez saxim û hûnê zûtirekê saxbin” (Yûhenna 14:19, MSG). Nava vê beşêda du tiştên kivş hene, ya ewlin, alîkî mesîhîtîyêyî rast dîtina Wîye. Ya duda, em dikarin Wî usa bivînin, çawa ku ev dinîya nikare.

Bona çi dîtina Xwedê girînge. Berî her tiştî, mînanî mesela serokê welêt, eger em nebînin, emê nikaribin Wî nas bikin, lê emê tenê derheqa Wî da bizanibin.

Menîk jî heye, ya ku dîsa wek wan girînge. Bêyî dîtina Wî emê neyêne guhartinê û emê nebine mînanî Wî. Hema dîsa wê gotinêda, ya ku me jorê raber kir, Pawlos dibêje, wekî ewên ku Xudan dibînin “Werguhêzî berbi wî şikilî dibin, ji dereceke rûmetê berbi dereceke mayîn” (B Korintî 3:18, ESV). Nava emirê bawarmendda werguhastin tiştekî gelekî girînge.

Gelo usa qewimîye, wextê ku hûn rastî merivekî usa hatine, yê ku bi wedê dirêj dihebîne, wekî Îsa Mesîh nas dike, lê usa dijî, tê bêjî tu cara rastî Wî nehatîye? Menî çiye? Ev meriv nehatye guhastinê, ew nabe mînanî Îsa Mesîh. Pawlos got, wekî rojên me wê gelekî dijwarbin. Tiştekî hewaskare, wekî bi gotina wî menîya vî wedê giran wê ew nîbe ku bona hebandinê meriva bizêrînin, lê wekî mesîhî wê Îsa bihebînin, lê wê gotinên Wî xweyî nekin. Ewê bibin mînanî merivên ku Xwedê nas nakin. Ewê xwehiz bin û wê pera hiz bikin, wê gura dê û bavên xweda nîbin, wê bi cûrê sert nêzîkî merivabin, wê nexwezin meriva afû bikin, wê bicedînin nav û deng dest bînin, wê hindava hevalên xwe xayîntîyê bikin, wê tiştê başqe diha hiz bikin, lê ne ku Xwedê û gelek tiştên mayîn. Pawlos zelal got: “Ewê xwe nêzîkî şikilê dînê me bigrin, lê qewata wîye rast ewê înkar bikin” (B Tîmotêyo 3:5, TEV). Ew qewata ku ewê înkar bikin, karebûna werguhastina berbi keremêye, ya ku alîkî mesîhîtîyêyî raste. Nava încîla “Êmpîlfaydê”-da nivîsare: “Kirina wan rastîya hebandina wan dide înkarkirinê”. Ev bawarmend xapyayîne, çimkî ew “...hergav hîn dibin, lê tu cara nikarin rastîyê nas bikin” (B Tîmotêyo 3:7). Ez her dem dibêjim, wekî pirsgirêka xapandinêye mezin heye: ew mêriv dixapîne. Em dikarin bi dil bawer bikin, wekî heleqetîyên meye tevî Xwedê başin, lê bi rastî usa nîne. “Bawarmendên” vî cûreyî gelekin û ew gelek cara diçin civîna, mektebên Încîlê û berevbûnên li malê. Ew hiz dikin hînbin, lê xeyset û kirinên wan nayêne guhastinê.

## Fikira wê eve...

Fikira wê eve: tenê ewên ku nava pîrozîyêda dijîn dikarin Xwedê bivînin, dikarin *bikevin nava hazirîya Wî.* Îsa nikaribû diha zelal şirove bikira, wextê ku got: “Hinek wede jî wê derbazbe û dinîyayê îdî Min nevîne, lê hûnê Min bivînin, çimkî Ez saxim û hûnê jî saxbin... Kî ku temîyên Min hildane û xweyî dike, ew Min hiz dike. Û ewê ku Min hiz dike... Ezê wî hiz bikim û Xwe li wî eyankim” (Yûhenna 14:19,21).

Şirovekirina xebera “*eyankirin*”dide kivşê “li ber çava yan jî fikirêda zelalkirin yan zelal nîşan bidin. “*Ferhenga lêkolînên xeberên Încîlê*” wê xeberê şirove dike, dide kivşê “êmfanîzo”, çawa “kivşkirin, nîşandayîn”*.* Ew şirovekirineke başqe jî dide û pêşnîyar dike: “Derheqa şexsekîda... bi wê fikirê, wekî kesek îzinê dide, ku bi cûrê wî naskin, yan jî fem bikin”.

Îsa got, wekî Ewê zelal Xwe tenê li wan meriva bide eyankirinê, yên ku temîyên Wî xweyî dikin. Ew merivin, yên ku wê Wî bivînin, wê bikevine nava hazirîya Wî û bona wê yekê ewê ji nêzîkva Wî nas bikin. *Ev yek bona hemû bawarmenda sozdayî nîne*, lê tenê bona wan merivaye, yên ku wê bicedînin gura Gotinên Wîda bin, yên ku wê berbi pîrozîyê bicedînin.

Salên 1980-êyî ji min hîvî kirin, ku ez serwêrê sereke, yê civîna dinyayêye here mezin, doktor Dêyvîd Yong Ço bi mêvandarî qebûl bikim. Ew ji Sêûlê bû, ji Korêya Başûr. Wî çaxî li civîna wî 750 000 hezar meriv hebûn. Teslîmî min kiribûn, ku ez ji mêvanxanê wî bibime civînê. Ew çend sal bûn, ku ez mesîhî bûm û kirina wê yekê bona min tiştekî mezin bû.

Doktor Ço tevî 15 bîznêsmênên ji civîna xwe rêwîtî dikir. Serkarê wê komê roja berevbûnê nêzîkî min bû got:

– Birêz Bîvêr, hûn gerekê êvarê rêberîyê li doktor Ço bikin, raste?

– Raste, birêz.

Ewî ew yek minra bi heyteholî got:

– Birêz Bîvêr, ez gerekê çend tiştên girîng bêjime we. Ya ewlin û ya here sereke ewe, ku rêva, wextê çûyîna li civînê, doktor Çora xeber nedin. Pêşîya qulixkirinê ew hiz nake xeberde.

Ev yek tiştê tek- tenê nîbû, lê nava navnîşa wanda tiştê herî sereke bû.

Wê êvarê ez bi avtomaşînê hatime mêvanxanê û hîvîyê sekinîm, hetanî kö doktor Ço û merivên tevî wî derê avtomaşîna min vekirin. Doktor Ço li pêşîyê rûnişt, li rex min û hazirîya Xwedê avtomaşîna min tijî kir. Min bi temamî hazirîya Wî texmîn kir: mezinaya Xwedê û hizkirina Wî gelekî rast û kivş bû.

Wextê ku min avtomaşîne diajot, hêsirên min li ser sûretê minra dikişîyan, nenihêrî wê yekê ku ez zû nagirîm. Li nîvê rê em bin îşiqa sorda sekinîn û min îdî nikaribû teyax bikira. Min usa nekir, çawa ku alîkarê doktor Ço minra gotibû. Ez tirsyayî berbirî wî bûm:

– Doktor Ço, hazirîya Xwedê nava vê avtomaşînêdaye.

Ewî li min nihêrî û got:

– Belê, ez zanim.

Min gelek wede tevî wî merivî, wextê seredana wî, derbaz kir. Me tevayî golf lîst. Min bi avtomaşînê ew dibire cîhên cuda-cuda û min tevî wî xwerin dixwer. Min rêberîya wî ji firegehê kiribû û wextê çûyîna wî jî careke mayîn rêberîya berbi firegehê kir. Nava hemû wedeyîda, li ber meriva, yan jî ji çavên meriva dûr, doktor Ço merivekî xwedêparêz, bi xofa Xwedê, zelal û şikestî bû. Ez derheqa wê yekêda difikirîm, wekî ewî her roj bi seheta tevî Xudan xeber dida. Tiştekî kivşe, wekî hema bo wê yekê jî hazirîya Xwedê nava emirê wîda awqas qewat bû. Ewî bi rastî dicedand gotinên Îsa mîyaser bike.

Wextê berevbûna, duakirinê û xwendina temîyên Xwedê, min gelek cara hazirîya Xudan texmîn kirîye. Ez fem dikim ku bona çi Mûsa hemû tişt bona evê hazirîya nebînayî hiit. Nava emirê minda gelek cara, wextê ku hazirîya Xwedê ji min dûr bûye, rûyê wê yekêda bûye ku min temîyên Wî xweyî nedikirin. Wî çaxî ez nava cêribandinada bûm. Ez fem dikim, wekî ya duda eseyîye, lê ya ewlin meriv dikare bide sekinandinê.

Xebera "*eyankirin*" fikira "dîtinê" nade kivşê, lê nava wêda hemû tişt heye, çi ku nava hazirîya Wî da heye. Eyankirin dide kivşê ku ji titên nedîtinê werguhêzî tiştên dîtinê bikin. Wî çaxî Xwedê Xwe fikira mera dike nas. Ew femdarîya nêzîk û zanebûnê nava rêyên Xweda dide. Xudanê nama îbranîya merivên wî cûreyî nav kirine çawa merivên usa, "yên ku bi zanebûn pêşkêşa ezmîn cêribandine û bûne tevbûyên Ruhê Pîroz" (6:4, AMP). Nenihêrî wê yekê, wekî hazirîya

Wî ya eyanbûyî bona her lawekî Xwedê nêzîke, tenê ewêdn ku gura temîyên Wîdanin, wê ewê yekê texmîn bikin.

Pawlos xeberên Xwedêye ku gotibûne Mûsa raber dike. Ev gotin rastîye, ya ku ne tenê derheqa peymana Kevindane, lê usa ya Nûdane, ew jî bona wan merivaye, yên ku îdî yên Wîne:

> "Ji nava bêbawara derkevin û ji wana başqebin,– Xudan dibêje.–Dest nedine tiştên heram û Ezê we qebûl bikim" (B Korintî 6:17, NLT).

Tiştekî kivşe, wekî Xwedê me nava hazirîya Xweda bi hinek qewila qebûl dike. Em gerekê hîvîkirina Wî mîyaser bikin, hetanî stendina mecala rasthatina tevî Wî. Gotina Pawlos anegorî gotinên Îsaye. Încîla "*Mêsîc*"-ê vê gotinê vî cûreyî şirove dike:

> "Dêmek ewên ku heramîyê û berdaxustinê berdin: heta-hetayê berdin,– Xwedê dibêje.–Wanva neyêne girêdanê, yên ku wê we heramkin, Ez we bi temamî bona Xwe dixwezim". Peyî wê yekêra Pawlos dide kivşê, ku em çawa gerekê caba sozdayîna Xwedê bidin:
>
> "...Werin em ji wî hemû tiştî paqijbin, çi ku dikare beden û ruhê me heram bike. Werin em bona pîrozîyê bişuxulin, çimkî em ji Xwedê ditirsin (B Korintî 7:1, NLT).

Em careke mayîn dibînin, wekî meremê cedandina berbi pîrozîya rast ewe, ku em layîqî qedirê qebûlkirina nava hazirîya Xwedê da bin.

## Atmosifêra, yan hazirî?

Peyî wê yekêr'a, wextê ku me gotinên Şandîya, Îsa û Xwedyêyê Bav ji peymana Nû xwendin, gerekê em pirsê bidin, wekî bona çi ev alîyê mesîhîtîyêyî peymana Nû diha gelekî nayê gotûbêjkirinê, hînkirinê û terîfkirinê. Diqewime, wekî dijmin bernama fêlbaz hazir kirîye û usa kirîye, ku em xilazbûneke usa qebûl bikin, ya ku ji pîrozîya rast dere, çimkî wî çaxî emê nikaribin Wî bivînin û emê neyêne guhar'tinê? Ew stratêgîya dijminê fêlbaz ne tenê li ser dereca şexsî, lê usa jî li ser dereca komê şuxulîye. Çi ku derheqa berevbûnên medane, diqewime me *hazirîya Xwedê* bi *atmosifêra* civînêva guhartîye? Pêşdaçûyîneke mezin jî ewe, wekî nava 20 salên axirîyêda li cîhên berevbûnên me

sazkirina atmosifêrayê diha başe. Çend sal pêşda, wextê meriv dikete civînê, ewê çawa qanûn, avayê anegorî normêdn neqebûlkirî bidîta, bi dîzayna kevinar û wê tevî qulixa nehewaskar bibûya. Mûzîka li wir meriv berbi xwe nedikişand, terîfkirin cûrekî mayîn bû, lê kinc jî gelekî bi stîla kevinar bûn. Me wî çaxî ew hemû tişt qebûl dikirin, çimkî ew yek “bi navê Xudan” dihate kirinê. Li ber civakê em cûrekî mayîn dihatine kivşê. Raste, hinek cudakirin hebûn, lê çend dehsalî pêşda civîn bi tomerî hildayî wî cûreyî bû.

Bi saya rêberên serwaxt me ev nimûne guhartin. Niha mûzîkeke balkêş heye, ya ku anegorî wedê meye. Me avayên civînêye baş çê kirine, bi sîstêmên denga û ronayîhêye wedê niha. Qulixên me kordînasîyakirî û modêrnin. Me atmosifêra baş bona zaroka û cahila çê kirîye. Niha li pêşîya civîna qawexane hene, li kîderê meriv dikarin rûnîn, bi hevra xeberdin, lê pêra jî dikana kitêbaye mezin heye. Em qulixa usa derbaz dikin, ku bona undabûya ew çawa yên acizkirinê nînin. Bi gilîkî, atmosifêra baş li cîhjn berevbûnên me sazkirîye û ez bawarim, wekî nava vê govekêda kirinên me li Xwedê xweş tên.

Feqet, diqewime, wekî ev tiştên ku me dane navkirinê, eve meremê me? Atmosifêra ya başe, eger ew meriva bona tiştên girîng, bona hazirîya Xwedê hazir dike. Atmosifêra ji alîyê mêrivda tê sazkirinê. Holîwûd, Las Vêgas, Dîsnêy, Brodwêy û merkezên wedederbazkirinêye mayîn nava vê yekêda hostane. Diqewime em jî derbazî van mêtoda bûne? Diqewime em tenê bi wê yekêva razî dibin, wextê ku merivên ku tên li cem me û wextê qulixkirina hazirin û ew bi ruhanî tên guhastinê? Gelo em gumanin, wekî hazirîya Xwedê wan cîhên me tijî dike, yan em nava doranên mesîhîtîyêda wê yekê dikin, çi ku li cem merivên başqe ew yek diha baş tê stendinê?

Rastî eve: *bona me hazirîya Wî lazime, bona ku em bêne guhastinê*.

Diqewime hema eve menî, wekî li civîna hene meriv, yêd ku bi dil mesîhîtîyê qebûl dikin û hînbûnê berdewam dikin, lê nayêne guhastinê? Wî çaxî encamên wê yekê wê gelekî giranbin: ew meriv wê bi şikilê Îsava neyêne guhartinê. Çend sal pêşda me atmosifêra xirab hesab hilnedida, lê tê bîra min wekî wextê wan berevbûna hazirîya Xwedê hebû. Ez bi rastî dihatime guhastinê, lê her dem nîbû, wekî min dikaribû şirove bikira, ku ew yek çawa diqewime.

Pirs eve: bona çi em nikarin usa bikin ku him atmosifêra baş û him jî hazirî hebe. Bi rastî, em dikarin usa bikin, wekî herdu jî hebin: hewce nîne, ku em ji wana yekê bibijêrin. Feqet, bona heyîna hazirîya Xwedê em gerekê berbi pîrozîyê bicedînin.

Dijmin sirîya xweda bernama fêlbaz hazir kirîye: ew dixweze mesîhîtîyê ji pîrozîyê miqûf bihêle, bona ku Mizgînîya Îsa Mesîh fikira dînê neqewat bona undabûya pêşda bîne û çûyîna li peyî Îsa bona wan girîng nîbe, nenihêrî wê yekê, wekî ew yek bi rastî emirê nebînayîye, kîjanî meriv dikare li ser vê dinyayê derbaz bike.

## Pîrozî çiye?

Bi vî cûreyî pîrozî çiye? Nava zimanê yûnanîda ew xebera "hagîyos"-e. Nava "*Ferhenga yûnanî-înglîsî, ya Tayêre peymana Nû*"-da şirovekirineke vê xeberê eve, "bona Xwedê cudakirî, wa gotî, cuda bona Wî". Bin ronahiya vê şirovekirinêda, îzinê bidin careke mayîn xeberên Xwedê bînime ber çava: "Wanva neyêne girêdanê, yên ku wê we heram bikin. Ez we bi temamî bona Xwe dixwezim" (B Korintî 6:17, MSG).

Wextê ku ez û Lîza zewicîn, ew bû ya min, lê ez jî bûme yê wê. Ewê xwe pêşkêşî min kir, ku bona min bijî, lê min jî xwe pêşkêşî wê kir. Hetanî zewaca me min xwestinên wê û xiyalên wê hesab hilnedidan, min ew nas nedikir. Lîza eşîyayên malêye rengên tarî hiz nake, lîstikên sportêye profêsyonal û hinek cûrên fîlma, mûzîka caz, yan jî ya dengê bilind li wê xweş nayên û cêrge tiştên mayîn. Min ew hemû tişt hiz dikirin, min ew temaşe dikirin û guhdar dikirin. Feqet, wextê ku em zewicîn, ez ji wan tişta paşda sekinîm, çimkî min zanibû, wekî ew tişt Lîzayê xweş nedihatin. Gelek tişt hene, wekî em tevayî bi hewaskarî dikin.

Serbara serda min destpêkir ji tevgirêdanên başqeye tevî jina dûr bimînim. Hetanî zewaca me gelek hevalên min yên jin hebûn û bona min tiştekî sade bû ku wana teglîfî êvarîya bikim, yan jî tevî wana nava heleqetîyada bim, rasthatina teşkîl bikim. Feqet wê rojê, wextê ku min Lîzayêra got "erê", heleqetîyên mine tevî jinên mayîn hatine guhartinê.

Bi gilîkî mayîn gotî, ez bengîyî ser Lîzayê bibûm û bona min hewaskar bû, ku ez bona xwestinên wê bijîm, lê ne ku bona xwestinên xwe.

Min gelek mêr dîtine, yên ku bona xwestinên jinên xwe xemgîn nînin, ew bi êgoîstî difikirin. Ew zewicîne, lê di navbera wanda nêzîkaya usa tune. Wextê ku em peymana zewacê mor dikin, em borcdar dibin ku qulixî mêrivên li rex xwe bikin, hetanî dawîya jîyîna xwe. Nava zewaca başda cîhê êgoîzmê, xwehizîyê tune.

Hetanî peymana tevî Îsa em ji vê dinyayê bûn û ji alîyê vê dinyayêda hatibûne hizkirinê. Bona me tiştekî sade bû, ku em bi xwestinên bedena xwe û çavên xwe bijîn. Me dicedand ku em dereca bilind, nav û her tiştî dest bînin, çi ku wê bona kubarî û xwehizîya me qulix bikira.

Niha, wextê ku em rastî Îsa hatine û heleqetîyên meye tevî Wî hene, em gerekê bi bêqelpî pirsa vî cûreyî bidin: em bona xwe dijîn, yan bona Wî? Heleqetîya meye tevî Îsa dikare hebe, lê dikare usa bibe, ku nêzîkaya Wî tunebe. Wî çaxî emê bi tu tiştîva ji mêrê êgoîst cuda nebin.

Pawlos dinivîse: "Ewên ku emirê Wî yê nû distînin, wê îdî bona xwe nejîn. Dewsê ewê bona Mesîh bijîn" (B Korintî 5:15, NLT). Eva cûrê tek-tenêye, bi kîjanî em dikarin tevî Wî bikevine nava heleqetîyên saxlem.

Bi lêkolînkirina wê beşê, kîjanêda Aqûb derheqa bêesilîya tevî vê dinyayê xeber dide, emê bivînin, wekî ew dijî wan bawarmenda derdikve, yên ku paşda vegerîyane berbi emirê *xwehizîyê*:

> "...Eger dilê we tijîbûyîye... bi *xwehizîyêva,* bona veşartina rastîyê kubar nebin, yan jî derewa nekin. Ev cûrê serwaxtîyê ji jor nayê. Ew yê dinyayê û *xwehizîyêye*, û ew hema ji mîrêcin tê. Wextê ku meriv... *xwehizin*, ew problêma pêşda tînin û her cûre xirabkarîya dikin.
>
> ...Bona çi hûn hevra şer dikin? Gelo menî ew nîne, wekî hûn bi xwestinên *xwehizîyêva* tijîbûyîne, yên ku bona kontrolkirina bedena we şerkarîyê dikin. Hûn tiştekî usa dixwezin, çi ku li cem we tune û hûn hemû tiştî dikin, ku wê yekê dest bînin... Feqet yeke, hûn nikarin xwestina xwe bistînin û hûnê nestînin, eger şer bikin û bi hevra qayîl nebin. Hûn gerekê bona wê yekê dua bikin. Raste, wekî duakirinên we nayêne cabdayînê, çimkî hûn tenê bi menîyên xwehizîyê dua dikin. *Hûn hindava Xwedêda dilsoz nînin* (hûn bêesilin, him mêr, him jî jin). Gelo hûn nizanin, wekî eger vê dinyayê hiz

> dikin, hûn neyarên Xwedêne. Eger hûn qirar dikin bibine hevalê vê dinyayê, hûn xwe dikine neyarê Xwedê" (Aqûb 3:14-16; 4:1-4, CEV).

Hûn divînin, wekî xebera "*xwehiz*" nava van gotinada çiqwas tê xebitandinê? Aqûb vê yekê dike, çimkî du cûrên kirinê hene, yê ku *pêşkêş dike*, û yê ku *hildide*. Ewê ku tenê hildide xwehize û hindava Xwedê da dilsoz nîne. Ew bawarmendê ku vî cûreyî dijî, çawa yekî bêesil tê navkirinê. Temîyên Îsa bona wî cîhê pêşinda nînin. Dewsa wê yekê cîhê pêşinda *xwestinên wîye şexsîne.*

Ev dinîya bi xwehizîyêva tê rêberkirinê, çawa ku ew bawarmendê ku pîroz nîne. Ewî xwe bi temamî pêşkêşî Xwedê nekirîye. Ew xwehize û bo wê yekê jî ew wan tiştava hijmekar dibe, kîjan beden û çavên wî razî dikin û alî wê yekê dikin ku ew tabîyê û nav dest bîne.

Menîya gunekirinê xwehizîye. Kî ku didize, wê yekê bona xwe dike. Kî ku derewa dike, wê yekê bona parastina xwe, yan jî berjewandîya xwe dike. Kî ku bêeslîyê hindava jina xwe dike, ne ku jina xwe û zarokên xwe hesab hiltîne, lê xwestinên xwe. Kî ku dikuje, wê yekê bona xwe dike. Kî ku gura serwêrtîyêda nîne, li ser wê fikirêye, wekî ew diha baş zane, ku gerekê çi bike û bona xwe tiştê diha baş dixweze. Ew merivê ku dicedîne, ku hizkirî û naskirîbe, wê yekê bona bêçarî û kubarîya xwe dike. Wextê ku min lîstik temaşe dikir û min nedixwest gura Gotina Xwedê bikim, têlêvîzyonê bitemirînim û dua bikim, min ew yek bona xwe dikir.

## Tebyeta nû

Merivên vê dinyayê li ber van kirina bûne xulam, çimkî ew bi xwestin û cedandinên bedenî (xwehizîyê) tên serkarîkirinê. Bawarmend ji vê xulamtîyê aza bûye (binihêre Romayî 6:11-14). Kur bi rastî em aza kirine.

Nava peymana Kevinda bona cimeta Xwedê temî hatibû dayînê, ku guna nekin, lê wana nikaribû ew yek bikira, çimkî tebyeta wana ya xwehizîyê bû. Peymana Kevin dide kivşê, wekî meriv bi karebûna xwe tu cara nikare jîyîna qenc, ya anegorî normên Xwedê, derbazke. Meriv bûbûn xulamên xwestin û cedandinên bedenî, lê ew yek jî dijî xwestina Xwedê bû.

Em, yên ku ji nûva çê bûne, tebyeta meye nû heye. Em bi şikilê Îsa hatine çêkirinê û karebûna meye mexsûs, ya bona jîyîna qenc heye. Werin em gotinên Pawlos bixwînin:

> "Bi navê Xudan vê yekê dibêjim: îdî usa nejîn, çawa pûtperest, çimkî ew bi bêgumanî navhevketîne. Fikirên wan bi tarîyêva tijîne: ew digerin û ji vî emirî dûr dikevin, yê ku Xwedê dide, çimkî wana fikirên xwe dadane û dilên xwe miqabilî Wî dane berkkirinê. Şerma rûyê xwe unda kirine. Ew bona wedederbazkirina hêsa dijîn û her cûre heramîya dikin" (Efesî 4:17-19, NLT).

Bêbawar bi xwestinên bedena xwe bûye xulam. Ruhê wî mirîye, yan bêjîyane. Li ber Xwedê karebûna wîye bona derbazkirina jîyîna qenc tune. Bona min tiştê ecêbmayînêye, wextê ku mesîhî rûyê kirinên bêbawarada zendegirtî dimînin. Ew bawar nakin, wekî merivên wî cûreyî dikarin tenê himberî tebyeta xwe wî cûreyî bikin. Ew guna dike. Ew xwehize. Eger qewata wîye ruhanî hebe, ew dikare tabîke qenc qebûl bike û dikare li ber çavê meriva xwe pêşkêş bike. Feqet bêyî şikberî ew xulamê tebyeta xweye ketîye.

Pawlos dîsa derheqa bawarmendê rastda dibêje:

> "Çawa ku we derheqa Îsada bihîstîye û hûn rastîyê hîn bûne, ya ku ji Wî tê, tebyeta xweye kevine gunekar û cûrê jîyîna xweye berê dayînine alîkî, ya ku bi xapandinê û bi xwestinên heramkirîye. Dewsa wê yekê îzinê bidin, wekî Ruh fikir û qirarên we çê bike. Tebyeta nû xwekin, ya ku mînanî Xwedê hatîye çêkirinê, bi rastî heq û pîroze" (Efesî 4:21-24, NLT).

Himberî merivê xilaznebûyî, bawarmend tebyeta nû stendîye. Gotina Xwedê temîyê dide me, ku em gura wê tebyetêda bin, bona jîyîna emirê pîroz. Bona mesîhî bijartin heye, ya ku bona bêbawer tune. Mesîhî dikare li ber tebyeta hundre nûçêkirîye qewat daxwe, yan jî teslîmî xwestinên bedena xwe bibe: bijartin ya meye.

## Tabî û cûrê kirinê

Niha tiştekî girînge, ku bidine zelalkirinê, ku em derheqa çida xeber didin. Du alîyên pîrozîyêye girîng hene û herdu jî peymana Nûda hatine raberkirinê. Şabûna derheqa pîrozîyêda wî çaxîda pêşda tê, wextê ku meriv dicêribînin van herdu alîya tevî hev bikin.

Ya ewlin derheqa *tabîya* meye nava Mesîhdane. Pawlos dinivîse: "Hetanî çêkirina dinyayê, Xwedê em hiz kirin û em nava Mesîhda bijartin, bona ku li ber Wî *pîroz* û paqijbin" (Efesî 1:4, NLT). Ev pîrozîya bona me xût bona wê xebatêye, ya ku Îsa bona me kir, û tabîya nava Mesîh da dide kivşê. Bi cûrên kirinên me meyê nikarbûya ev tabî qazanc bikira: eva pêşkêşa Îsaye bona me.

Wextê ku Lîza bû kevanîya min, ewê tabîya nû qazanc nekir, lê ewe ew yek stend, çimkî min dilê xwe da wê. Ewê jî ew yek bona min kir. Me peymana heta-hetayê bi hevra mor kir.

Alîyê pîrozîyêyî duda *cûr*ê kirinêye, yê ku feydayê tabîgirtina nava pîrozîyêdane. Wextê ku Lîza bû kevanîya min, kirinên wê bi dilsozîya wêye hindava minda hatine kivşê. Ewê îdî tevî mêrên başqe derheqa têmayên başqeda xeber nedida. Kirên wê anegorî heleqetîyên meye zewacê bûn. Ez jî, çawa mêrê wê, hindava wêda wî cûreyî bûm.

Vê kitêbêda ez hema vî alîyê pîrozîyê şirove dikim. Petrûs derheqa wê yekêda dibêje:

> "Dêmek, hûn gerekê çawa lawên Xwedêye şikestî bijîn. Berbi rêyên emirê berê paşda venekişin, ku xwestinên xwe razî bikin. Wî çaxî we gelek tişt fem nedikir. Lê niha gerekê nava hemû kirên xweda pîrozbin, çawa Xwedê, Yê ku hûn bijartin û pîroze. Çimkî kitêba Pîroz dibêje: "Hûn gerekê pîrozbin, çimkî Ez pîrozim". Bîr bînin, wekî hizkirîyên Bavê Ezmana, li ber Kê hûn dua dikin, tunene. Ewê we gunekar bike, yan jî wê rewa bike, anegorî *kirên we*. Dêmek, hûn gerekê bijîn, ji wî bitirsin, nava wî wedeyîda, kîjanî hûn çawa "xerîb li vê dinyayê" derbaz dikin" (A Petrûs 1:14-17, NLT).

Tiştekî ber çavaye, wekî Petrûs derheqa lawên Xwedêda xeber dida, lê ne ku derheqa undabûyada. Ew dibêje, wekî Xwedê wê anegorî *kirên me* yan me gunekar bike, yan jî rewa bike û ew yek jî derheqa *kirinên* meda dibêje, lê ne ku derheqa *tabîya* nava Mesîhda. Xwîna Mesîh hemû guna afû dike, lê dîwan heye, kîjanêra lawên Xwedê wê anegorî *kirên xwe* derbazbin. Pawlos vê yekê B Korintî 5:9-11-da îzbat dike. Jîyana nava gurênekirinêda tiştekî biçûk nîne. Eger em bi rastî yên Wîne, em gerekê bicedînin, ku nava gunehêda nejîn û dilê Wî neêşînin.

Aqûb, Pawlos û Petrûs îzbat dikin, wekî rêyên jîyîna meye kevin bi xwestinên xwehizîyêva dihatine rêberkirinê û ber dilê meda tên, ku em nava hemû kirên xweda *pîrozbin*. Îzinê bidin, ku careke mayîn

guhdarîya we bînime ser vê yekê: ew derheqa *kir û cûr*ê jîyîna meda dibêje, lê ne ku derheqa *tabîya* nava Mesîhda. Nava vê parêda, lê ya nava tercimeke mayînda nivîsare, wekî em gerekê “nava hemû kirada û cûrê jîyînêda pîrozbin” (Gotin 15, AMP). Nava gotinên Petrûsda tu tiştê nefemdarî û tiştên ku meriva şaş dikin, tunene. Bi qayîlîya tevî Pawlos, ew dibêje: Eger em bi keremê xilazbûyîne, tebyeta meye nû karebûnê dide, ku em cûrekî mayîn bijîn, ne ku çawa ev dinîya, dêmek bi jîyîna emirê pîroz.

Îbarnî 12:14-e bîr bînin, ya ku temîyê dide, ku em berbi pîrozîyê bicedînin. Van axirîya min terîfeke Çarlz Spêrşên dît, ya ku guhdarîya min kişande ser xwe. Parçekî wê menîya wê yekê wê bide kivşê:

> “Ji alîyê hinekada cêribandineke bêguman hatîye kirinê, ku ji wê temîyê azabin (Cedandina berbi pîrozîyê) ya ku Ruhê Pîroz dixweze nava vê parêda me bide borcdarkirinê. Wana gotîye, wekî li vir gilî derheqa pîrozîya Mesîhdane, ya ku usa jî derheqa medane. Gelo ew niznin, wekî ew feş xeber didin, bi cûrê eşkere nivîsarê nav hev dixin...? Em gerekê peyî pîrozîyê herin: ev pîrozî gerekê praktîkbe û miqabilî heramîyêbe, çawa ku nivîsare: “Çimkî Xwedê gazî me nava heramîyê nekir, lê gazî nava pîrozîyê kir”... Eva pîrozîke cûrekî mayîne. Fikira vê berbirîbûnê pîrozîya praktîk û bîyolocîke. Ev pîrozî anegorî qirara Xwedê û qebûlkirina temîyên Xudane”.

Belê, eva şirovekirineke gelekî başe. Tiştekî kivşe, wekî fikira pîrozîyê cara ewlin nîne, wekî li civînê rastî êrîşê tê, çimkî Spêrşên salên 1800-î hîn dibû. Feqet wextê ku fikira me li ser rîya kitêba Pîroz hatîye hîmdanînê, em dikarin fem bikin, wekî pîrozî him heyîna meye nava Mesîhda û usa jî xweykirina qirara Wîva girêdayîye.

Rastîke girîng heye: em bi qîmetîyên xwe û qewata xwe ne tabîya xweye nava Mesîh da, ne jî cûrê kirina qazanc nakin, yan jî dest naynin. Herdu jî belaş (bêpere) bona me hatine dayînê. Feqet, çi ku derheqa ya dudadane, em gerekê tevî tebyeta xweye nû hevkarîyê bikin, yan jî ber wê daxun, bona ku kirina cûrê qenc hebe.

## Nava sînorê pîrozîyêye mayînda

Çawa ku em dibînin, pîrozî dide kivşê ku ew yek hê zêdeye, ne ku bûyîna çawa yê Wî. Ew cûrê kirinêye usa dide kivşê, yê ku

bona Xwedê yê qebûlkirinêye. Em dikarin derheqa şirovekirineke pîrozyêye mayînda jî bêjin. Xebera yûnanîye "hagîos" usa jî derheqa xwexweykirina "paqij, bêsûc û heq"-da dibêje. Ev fikira hineka ditirsîne, lê ew yek gerekê usa nîbe. Ez dikarim şirove bikim, ku fikira min çiye û derheqa serhatîke zarotîya xweda gilî bikim, wextê ku ez ketibûme nava halekî bêfesal.

Malbeta meda şeş zarok hebûn û ez kurê tek-tenê bûm: dêmek hemû kirinên girêdayî hewşêra borcdarîyên min bûn. Min avtomaşîna me dişûşt, şînaya ber dêrî didrût, belçên daraye ketî berev dikirin, berfa li hewşê paqij dikir û tiştên mayîn. Ez û hevalên min, me lîstikên sportê hiz dikirn û bo wê yekê jî me lez hemû karên xwe dikirin, ku diha zêde wede bona lîstika bima.

Bihar teze destpê bibû û şînaya li ber dêrî peyî zivistana wededirêjna dîsa şîn dibû. Tevî hevalên xwe min qirar kiribû ku em peyî dersara rastî hevdu bên, ku tevayî bilîzin. Min dirûtina şînaya ber dêrî hesab hilnedabû û ew şînayî bilind bibû. Êvara derbazbûyî bavê min gotibû, wekî min dikaribû tenê peyî dirûtina şînaya ber dêrî tevî hevalên xwe bilîsta. Feqet ew xebat gerekê hetanî hatina wîye ji xebatê bihata kirinê.

Peyî dersara ez lez çûme malê, min kincên xwe guhastin û cara ewlin wê biharê min maşîna gîhadirûtinê derxist. Min zanibû, wekî min gerekê lez ew hemû tişt bikira, çimkî hevalên min wê îdî bona lîstikê hazir bûna. Min çend cara şirîta motorê kişand, lê ew nexebitî. Paşê min çend cara bişkoka qalpaxê wê guvaşt, bona ku diha gelek bênzîn here karbyûratora wê. Min ser hev şirîta motorê kişand, lê tu tişt neqewimî.

Ez fikirîm: "*Diqewime min karbyûrator şil kirîye û gerekê çend deqa bisekinim ku ew zîhabe*".

Ez hîvîyê sekinîm û nava wî wedeyîda min rûnê wê nihêrî. Paşê min hemû tiştên mayîn jî nihêrîn, ku bizanibim, ku ew pêvakirîne, yan na. Tê bêjî hemû tişt cîhda bû û ez gerekê hîvîyê bisekinîyama. Paşê min dîsa cêriband, lê motora maşînê nexebitî.

Ez ber xwe ketim: paşê min perçekî maşînêyî mayîn jî lê nihêrî. Feqet hemû tişt normal bû. "*Pirsgirêk (problêm) k*îjane?",– ez fikirîm. Her deqe hêrsa min diha zêde dibû. Eger maşîna gîhadirûtinê

nexebitîya, minê ew şînayî nedirûta, bavê minê razî nîbûya, minê nikaribûya tevî hevalên xwe bilîsta.

"*Ez çi dikarim bikim,*– ez fikirîm-*Eger ez bibime li cîyê çêkirinê, wî çaxî ezê îdî êvarê dereng paşda vegerim û ezê l*isîitkê berdim. Diqewime, ez maşîneke gîhadirûtinê ji merivekî mayîn hîvî bikim, lê bona wê yekê jî wê gelek we*de lazimbe*". Meqesên meye destaye mezin hebûn. Feqet çetin min bikaribûya temamîya şînayê hetanî evarê dereng bidrûta û wî çaxî jî gîha wê rast nîbûya wê xirab bihata lênihêrandinê. Usa wê nebûya.

Ez li ser wê maşîna kevin hêrs ketim: "*Rûyê wêda ezê lîstikeke baş berdim*",– ez fikirîm. Min zanibû, wekî maşîne xirab bibû. Ez ketibûm nava halekî bêfesal, çimkî minê nikaribûya gîha pêra bigîhanda bidrûta û wededa rastî hevalên xwe bihatama.

Hevalekî min, yê ku gerekê tevî min bihata lîstikê, hate cem min.

– Con, tu hazirî?,– ewî pirsî.

– Na. Bavê min gotîye, wekî ez gerekê şînaya ber dêrî bidrûm, hetanî hatina wî, lê maşîna gîhadirûtinê naxebite,– min gotê-wedê min tune, ku ez çê bikim, yan jî maşîneke mayîn li cem kesekî hîvî bikim. Îro ezê neyême lîstikê.

Hevalê min, yê ku ji min hinekî serwaxttir bû, got:

– Îzinê bide ez lê binihêrim.

– Binihêre,– min gote wî.

– Ewî pêşda cîhê ardû vekir, li hundurê wir nihêrî û destpê kir bikene:

– Awa eve pirsgirêka te, Con. Maşînêda bênzîn tune.

Ez ketime nava halekî mayîn, min şerm kir, lê pêra jî min sivikayî texmîn kir.

"*Serê vala,*– ez fikirîm,– *te gerekê sirîya ewlin ew yek binihêr*îya". Min bênzîn kire maşînê û ew carekêra xebitî. Min lez ew şînaya ber dêrî dirût û em çûn gihîştine hevalên xwe.

Ev serhatîya çi cûreyî pîrozîyêva girêdayîye? Wextê ku em şirovekirina pîrozîyê dinihêrin (xeberên "*paqij*", "*bêsûc*", û "*heq*"), em tê bêjî gumana xwe unda dikin û difikirin: "*Eva tiştê nebûyînêye*". Menî ewe, wekî em dicêribînin bînine ber çavê xwe, ku em çawa bi qewatên xwe wê yekê bikin. Ev jî mînanî wê yekêye, wekî bicêribînin

bi meqesa mezin şînaya hewşê bibirin û wededa bighîjine lîstkê. Eva tiştê bûyînê nîne, çimkî wê îdî tarî bikeve erdê û hûnê pêra negihînin qet parçekî hewşê jî xilazkin.

Feqet tebyeta meye nû heye, kîjanê meriv dikare himberî maşîna gîhadirûtinê bike. Feqet eger maşînêda bênzîn tunebe, halê me wê dîsa wî cûreyîbe, çawa ku wî çaxî, wextê ku maşîne tunebû. Maşînêda gerekê bênzîn hebe ku ew bixebite.

Serê k'itêbêyî mayînda emê bivînin, ku çi tebyeta meye nû gur dike, dêmek bi saya çi em dikarin li ber Xwedê kirinên paqij mîyaser bikin.

10

# ARDÛ

“...em wê kerema Xwedê weva didine hesandinê,
ya ku civînên Mekedonîyayêra hatîye dayînê...
çimkî ez şedeme, ku wana weke qewata xwe û ji
qewata xwe zêdetir jî bi rezedilî didan...”
— B Korintî 8:1-3

...Gotina “Kamilbin”... temîya usa nîne, ku
nikare bê mîyaserkirinê.
Xwedê wê me werguhêzî yên usa bike,
yên wê bikaribin gura vê temîyêda bin.
— K. S. Lyûîs

Cedandina berbi pîrozîyê meremê bi xwe nîne, lê ew derîye berbi hazirîya Îsaye. Xudan zelal dibêje: “Ewê ku temîyên Min qebûl dike û wana xweyî dike, ewe, yê ku (bi rastî) Min hiz dike... Û Ezê jî wî hiz bikim û Xwe wîva eyan bikim (Ezê zelal xwe li wî bidime kivşê û Ezê Xwe bona wî bikime yê rast)” (Yûhenna 14:21, AMP). Em Xudan ji nêzîkva wî çaxî nas dikin, wextê em gotinên wî xweyî dikin.

Xudanê nama îbranîya vê yekê îzbat dike: “Bikin ku tevî hemûya edilbin û jîyîna pîroz derbazkin. Bêyî pîrozîyê tu kes wê Xudan nebîne” (Îbranî 12:14). Hemû tişt zelale, wekî bêyî pîrozîyê meriv nikare Xudan bivîne, dêmek nikare bikeve nava hazirîya Wî.

Fikira pîrozîyê ewe, kà meriv bibe yê Wî, bona Wî cudakirîbe. Ew yek dide kivşê, ku meriv “paqij, bêsûc, heq”-be. Ew herdu şirovekirin jî ji hevdu nayêne qetandinê. Eger meriv yê Wî ne, ew yek dide kivşê, ku gerekê bona wî bijîn, bi kirinên xwe Wî razî bikin. Kolosî 1:10-da nivîsare, wekî Ew dixweze, “ku hûn gava biavêjin (bijîn û bişuxulin) bi

cûrê layîqî Xudan, Wî razî bikin" (AMP). Bi kutasî Ewê paşda vegere peyî civîna rûmet, "bona ku tu leke, yan qerçimok li ser tunebe, lê paqij û bêqisûrbe" (Efesî 5:27).

Tiştekî hewaskare, wekî eva şirovekirina tek-tenê nîne derheqa wan merivada, bona kîjana Ew paşda vedigere. Derheqa wê yekêda bifikirin: kitêba Pîroz Dergîstîya Wî çawa qewat, modêrn, rêberên baş û nava civakêda naskirî, yan jî şa nayîne ber çava. Ev hemû tişt tiştên başin, lê nava wê yekêda çi ku Ew bona Dergîstîya Xwe dixweze "pîrozî û paqijî"-ye

Tiştekî hewaskar jî derheqa wê yekêda heye: pîrozî xeysetê diha bilinde, bi kîjanî kitêba Pîroz derheqa Xwedêda şirove dike. Îşayayê pêxember û Yûhennayê şandî derheqa dîtina textê Xwedêda dinivîsin. Her du jî nikaribûn nedîtana, wekî mîlyaketên qewat, yên ku dora Wî bûn her dem dikirine gazî: "Pîroz, pîroz, pîroz" (binihêre Îşaya 6:3 û Eyantî 4:8). Wana nedikire gazî: "dilsoz", "hizkir", "qenc", yan jî "merd". Ev hemû tişt li cem Wî hene, lê pîrozî ji vî hemû tiştî zêdetire.

## Du cûre

Temîya bûyîna paqij, bêsûc û heq her, dem ev pirs pêşda anîye: "Em çawa dikarin bi vî cûreyî bijîn?". Me cêribandîye vê yekê bi qewata xwe bikin, lê mera li hev nehatîye. Me dixwest, ku em gura qanûna Xwedêdabin, ya ku nava wijdanê meda dijî (binihêre Romayî 2:14,15), lê ew yek mera li hev nedihat. Feqet, *kerema* Xwedê hat. Me nikaribû bi kirina xweye qencva ew qazanc bikira û hetanî roja îroyîn jî em nikarin. Em layîqî wê yekê nîbûn û hetanî roja îroyîn jî layîq nînin. Pêşkêşa Xwedê bi temamî me afû dike û wê ewê afûkirinê berdewam bike, wextê ku ew yek careke mayîn mera li hev neyê. Em ji gunehên xwe xilaz bûne.

Nenihêrî wê yekê, wekî ev zanebûna ecêbmayînê li cem me heye, hetanî roja îroyîn em acizbûyîne, çimkî em nikarin temîyên Wî xweyî bikin. Bona çi em ketine nava şerkarîya wî cûreyî? Em ji nûva hatine dinyayê û tebyeta meye nû heye. Wî çaxî bona çi em her dem tên teribandinê?

Em destpê dikin derheqa cûrekî mayînda bifikirin, kîjan dikare halê me bide sivikkirinê. Em dikarin hîn bikin, wekî pîrozî tenê derheqa tabîya meye nava mesîhdane û bi tomerî hildayî wê yekê hesab hilnedin, wekî Încîl bangî me dike ku bi kirinên xweva pîrozbin, bi wê yekêva wê gunekarîyê sivikkin, kîjanê em texmîn dikin. Em dikarin wê yekê afûkin, wekî jîyîna me nayê guhartinê û bêjin, wekî em merivne sadene û her dem emê şaşîya bikin. Em dikarin guhdarîya xwe bidine ser hostatîya keremêye kurt, wekî kerem gunhên paşeroje, wedê niha û pêşeroja me vedişêre. Eger em vî cûreyî hîn bikin û tenê vî cûreyî bawar bikin, emê çareserîya feş çêkin, çimkî emê wijdanê xwe bidine kerkirinê. Feqet, eger diha bi guhdarî guhdarîya dilê xwe bikin, emê dengê qîrîna wî bibhên: “Gerekê zêdetirbe!”.

Mixabin, ji me gelek meriv bi vî cûreyîva razî bûne û bi gilîkî gelek gotinên peymana Nû hesab hildnedane, yên ku bangî me dikin, ku kirinên me gerekê li Xwedê xweş bên. Minê bikaribûya gelek beşên Încîlê bianîya ber çava, yên ku girêdayîne vê têmayêra, lê ewê cîhê gelek rûpela bigrin, feqet îzinê bidin tenê beşekê raber bikim:

> “Zarokên min ên biha, ez vê yekê wera dinivîsim, wekî hûn guna nekin... Û em dikarin gumanbin, ku em Wî nas dikin, eger em temîyên Wî diqedînin. Eger yek dibêje: “Ez Xewdê nas dikim, lê temîyên Wî naqedîne, ew derewîne û rastî nava wîda tuneye. Lê yên ku xebera Wî diqedînin, bi rastî didine kivşê ku ew çi cûreyî tam Wî hiz dikin. Bi vê yekê em zanin, ku em nava Wî da nin. Ewên ku dibêjin, wekî nava Xwedêda dijîn, gerekê usa bijîn, çawa Îsa jît (A Yûhenna 2:1,3-6, NLT).

Yûhenna nenivîsî:” Xemgîn nebin, eger hûn guna bikin, çimkî em merivin”. Na, ew dinivîse: ...“ku hûn guna nekin”. Ev yek gerekê bibe meremê me. Eger em tê berdidin, bêfitîya, nava emirê meda xwîna Îsa heye, ya ku me paqij dike. Feqet çi jî hebe, meremê me gerekê ew be, ku em mînanî Îsa bijîn. Anegorî nivîsara kitêba Pîroz ew yek tiştê nebûyînê nîne. Usa dertê, wekî kesê ku gunehê kê tê wekilandinê hesab hilnade, wê yekê bi tebyeta merivatîyê”-va afû dike û ew yek ne anegorî gotinên Yûhennaye û usa jî ne anegorî beşên peymana Nûye.

Gelo ew hemû tiştên me tunene, çi ku bona me lazimin? Gelo Xwedê dudilîya me têra nedîtîye û helkirina wê çareser nekirîye? Bêguman, Ewî usa kirîye. Derheqa wî cûreyîda diha hindik xeber

didin, feqet ew tam anegorî hînkirina peymana Nûye. Gilî derheqa wî alîyê keremêdane, yê ku bona geleka eyan nîne. Ew jî ew ardûye, yê ku qewatê dide tebyeta meye nû. Zelal gotî, kerem qewatê dide me, ku jîyîna meye qence rast hebe.

## Rastîya neeyan derheqa keremêda

Sala 2009-a li temamîya Amêrîkayê lêpirsînek hatibû derbazkirinê, tevî kîjanê bibûn bi hezara mesîhî. Gilî derheqa wan bawarendadane, yên ku ji nûva hatine dinyayê, bawarîya xwe li Încîlê tînin û tevî civînên cuda-cuda dibin. Ev pirsa didane hemûya: “Derheqa sê şirovekirinên kerema Xwedêda bêjin, yan jî eger dikarin ji sisîya zêdetir”. Piranîya bersiva ev bû: “xilazbûn”, “kerema nelayîq dayî” û “afûkirina gunxha”.

Tiştekî gelekî başe, wekî mesîhîyên amêrîkî fem dikin, wekî em tenê bi keremê xilazbûyîne. Xilazbûn bi avreşandinê, bi bûyîna endamê civînê, xweykirina qanûnên ruhanî, bi kirina îşên qenc û tiştên mayîn nayê dayînê. Piranîya bawermendên amêrîkî derheqa vê rastîya hîmlîda, ya derheqa kerema Xwedêda zanin, çimkî ew li cem me hatine terîfkirinê û ez li ser wê fikirême, wekî ew yek li Xwedê xweş tê.

Feqet tragêdîya ewe, wekî tenê du selefê bi hezara mesîhîya gotine, wekî kerema Xwedê *qewate*. Xwedê kerema Xwe wî cûreyî şirovekir. Ew dibêje:

> “Kerema Min besî teye, çimkî qewata Min nava sistaya teda mîyaser dibe” (B Korintî 12:9, TEV û NLT).

Xwedê dibêje, wekî kerema Wî qewata Wî ye. Xebera *“sistayî”* li vir nekarebûnê dide kivşê. Xwedê dibêje: “Kerema Min qewata Min e û ew bona halên usa têra hatîye dîtinê, yên ku ji karebûna te zêdetirin”.

Pawlosê şandî jî hema bi wî cûreyî kerema Xwedê şirove dike. Ew dinivîse: “De bira kerem û edilayî bi wê zanebûna Xwedê û Xudanê me Îsa li ser we zêdebe. Qewata xwedêtîya Wî her tiştê ku li jîyana xwedênasîyê dikeve, pêşkêşî me kir, bi wê zanebûna meye hindava Wî da, Yê ku rûmetê û qencîyêra gazî me kir” (B Petrûs 1:2,3). Kerem careke mayîn çawa “qewata Wî ya xwedêtîyê” tê naskirinê. Petrûs

dibêje, wekî hemû mecal û karebûn, yên ku bona xwedêparêzîyê û jîyana Pîroz lazimin, bi saya qewatkirina keremê dikarin hebin.

Feqet ewê lêkolînê da kivşê, wekî tenê du selefê mesîhîyên amêrîkî derheqa wê yekêda zanin. Îzinê bidin şirove bikim. Em gerekê bawer bikin bona ku ji Xwedê bistînin. Hema bo vê yekêye, ku peymana Nû tê naskirinê çawa "xebera bawarîyê" (binihêre Romayî 10:8). Bi zelal gotî, eger em bawar nekin, emê nestînin.

Awa meseleke zelal: Îsa bona gunehên temamîya dinyayê mir. Lê ew meriv tenê xilaz dibin, yên ku bawerîya xwe li wê yekê tînin. Dêmek gelek pirsgirêkên (problêmên) me hene: eger 98 selefê mesîhîya nizane, wekî kerema Xwedê qewata Wî ye, wî çaxî usa dertê, wekî 98 selefê mesîhîya dicêribiînin bi karebûna xwe pîrozbin. Nava wê yekêda ew bin dikevin û aciz dibin. Tebyeta wane nû qewatê nastîne: bi cûrekî mayîn gotî, nava baka wanda ardû (bênzîn) tune.

Em gavekê jî nava yûnanîda pêşda herin. Ew xebera ku peymana Nûda gelek cara bi xebera *"keremê"*-va tê tercimekirinê, xebera *"xarîs"*-e. "Dîyalêkta Stronge tam" wê yekê çawa *"pêşkêş"*, *"kar"*, *"merd"* û *"dilovan"* şirove dike.

Eger em şirovekirina pêşîyê hildin û himberî çend xeberên ji namên Romaya, Galatîya û Efesîya bikin, hûnê wê şirovekirina xebera "*kerem*"-ê bistînin, ya ku piranîya Amêrîkayêra nase. Feqet, "Ferhenga Strong"şirovekirinê berdewam dike: "hukumê xwedêtîyêyî li ser dilê mêriv û kivşbûna Wîye nava jîyanêda". Em dibînin, wekî şedetîya der, ya xebata dilê mêrivda kirî heye, ya ku usa jî şedetîya qewatbûna keremêye.

Kitêba karên Şandîyada Barnabas hate civîna Antîokê û wextê ku gihîşte cîh "şedetîya kerema Xwedê dît" (Karên Şandîya 11:23, NIV). Ewî derheqa keremêda nebihîst, lê şedetîya wê bihîst. Kirina endamên civîna Antîokê îzbat dikir, wekî dilên wanda qewata keremê dişuxulî.

Bo wê yekê jî Aqûbê şandî dinivîse: "Bawarîya (kerema) xwe nîşanî min bide bêyî kirên xwe, lê ezê jî bawerîya (kerema) xwe bi kirên xwe nîşanî te bidim" (2:18, NKJV). Min xebera "kerem" dewsa xebera "bawarî" da xebatê, çimkî em kerema Xwedê bi bawarîyê distînin (bi bawarkirina Xebera Xwedê): "Em bi bawarîyê dikevine

nava vê keremê" (Romayî 5:2, NKJV). Bêyî bawarîyê qewat (kerem) tune. Aqûb dibêje: "Şedetîya qewatbûnê nîşanî min bide". Eve tiştê rastî derheqa wê yekêda, wekî me bi saya bawarîyê kerem stendîye.

Kerem *pêşkêşe.* Werin em fikirdarîya xweye derheqa keremêda berfireh bikin û wê yekê bîra xweda xweykin, çi ku em hêca hînbûn. Xilazbûn *pêşkêşa keremêye*. Afûkirin *pêşkêşa keremêye*. Doxtirî *pêşkêşa keremêye.* Dayîn *pêşkêşa keremêye*. Nava jîyana meda ev hemû tişt nîşandayînên razîbûna Wî ne û em nikrin ji wana tu yekê qazanc bikin, yan jî layîqî wê yekê bibin.

Bi gotina *qewatbûn* em dixwezin bêjin, wekî *kerem karebûna usa dide me, ya ku ji karebûna meye tebyetî zêdetire.* Karebûna me tune, ku em bikaribin bi xwe ji dojê azabin, lê keremê ew yek kir. Em gerekê nava azadyêda nîbûna. Lê keremê ew karebûn da me. Me nikaribû tebyeta xwe biguharta, lê keremê ew yek bona me kir. Karebûna meye bona jîyana bi pîrozîyê tunebû, lê em wê yekê bi saya keremê distînin. Eve menî, wekî em wê yekê çawa tiştê ecêbmayînê nav dikin.

## Pirsa ku wê me berbi firkirmîşbûnê bibe

Van axirîya, wextê duakirinê, Xudan ji min pirsî: "Kurê min, Min kitêba Xweda, peymana Nûda, kerem çi cûreyî raber kirîye?".

Min ji deha zêdetir kitêb nivîsîne û ew pirsa bona min gelekî girîng bû. Îzinê bidin şirove bikim ku bona çi usaye. Wextê ku ez fikireke nû kitêbekêda raber dikim, ya ku bona geleka nenase, ez şirovekirina wêye sereke raber dikim, wextê ku cara ewlin didime xebatê. Rûpelên kitêbêye mayînda ez dikarim îdî şirovekirinên wê femdarîyêye ne sereke raber dikim. Dêmek, wextê ku kitêbeke xudanekî profêsyonalda tiştekî nû tê dîtinê, ez hesab dikim, wekî şirovekirina wêye sereke gerekê bê raberkirinê. "Nizanim",– min bersiva Xudan da.

Min carekêra Încîl hilda û beşa peymana Nûda, li kîderê cara ewlin xebera "kerem" tê xebitandinê, dît: "Me hemûya ji têr-tijîya Wî, kerem ser keremêda stend" (Yûhenna 1:16).

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Yûhenna dinivîse: "Kerem ser keremêda". Hevalekî min heye, yê ku li Atînayê- Yûnanistanê hatîye dinyayê û li wir dijî. Yûnanî zimanê wîyî dayîkêye û xêncî wê yekê jî

ew pêşekzanê yûnanîya kevine. Ew ji wan merivaye, berbirî kîjanî dibim ez, wextê ku pirsên girêdayî yûnanîra pêşda tên. Ewî gote min, wekî bi rastî şandî dixwest bigota, wekî Xwedê “merdanîya keremêye mezin” dixwest derbazî me bikira. Bi gilîkî mayîn gotî Yûhennayê şandî digote me, wekî em têr-tijîya Îsa Mesîh bi saya keremê distînin. We fem kir? *Têr-tijîya Îsa Mesîhe bi Xwe.* Eva tiştekî pirfikire, bi taybetî bi fikira tebyeta dayî, karebûn û qewata ji alîyê keremêda dayî.

Werin em çend mesela bînin, bona ku nîşan bidin, wekî ev gotin çiqwasî kivşe.

Bînin ber çavê xwe, wekî ez nêzîkî lîstikçîkî koma mektebêye baskêtbolê dibim, yê ku nava koma xweda endamekî gelekî aktîve. Ew her dem nava lîstikêda nîne hetanî wî çaxî, hetanî ku du deqe dimînin ku lîstik ser hevda bê û wî çaxî kom bi 20 qala yan serketîye, yan jî binketîye.

Ez wî def didim û dibêjim:

– Me eyantîke ulmî kirîye, bi saya kîjanê em dikarin tijîbûna baskêtbolîstekî herî baş LêBron Cêyms bidine te.

Bi fikira we, ewê çi bêje? Ewê bêje:

– Belê, hema niha jî bikin. Ez gerekê çi bikim?

Hûn dikarin pêşda texmîn bikin, ku çi dikare biqewime, wextê ku em wê yekê bikin. Ewê ne tenê bibe lîstikçîyê koma mektebêyî herî baş, lê koma wî jî wê serbikeve. Ewê bi pênsîya xwe li ûnîvêrsîtêtekêda bê qebûlkirinê û nava navnîşa “Asosîasîya Amêrîkayêye baskêtbolêda” wê bibe yê ewlin.

Meseleke mayîn, ez nêzîkî bîznêsmênekî dibim, problêmên kîjanî hene û ez dibêjime wî:

– Me eyantîke ulmîye nû kirîye, bi saya kîjanê em dikarin tijîya Donald Tramp, Stîv Cobs û Bîll Gêyts bidine te.

– Bi fikira we ewê çi bêje?

Ewê bi şabûn bike gazî:

– Ez wê yekê dixwezim. Wê yekê hema niha bikin.

Lê piştî wê yekê ewê çi bike? Ewê mecalên învêstîsîya bivîne, kîjan berê fikira wîra derbaz nebûne û wê bighîje açixîya mezin.

Keremê tu cara tijîya LêBron Cêyms, Stîv Cobs, Donald Tramp’, Bîll Gêyt’s, Albêrt Êynştêyn, Yohan Sêbastîyan Bax, Rocêr Fêdêrêr, yan jî

mêr û jineke nava dîrokêda jîyayî nedaye me. Na: Ew hema tijîya Îsa Mesîhe bi Xwe dide me. Hûn fem dikin, ku gilî derheqa mezinaîyke çawadane?

Bi vî cûreyî eva yeka dikare geleka ecêbmayî bihêle, feqet peymana Nûda Xwedê cara ewlin kerem raber nekirîye, çawa pêşkêşa belaş (bêpere), xilazbûn yan jî afûkirina guneha.

Îzinê bidin ez zelal şirove bikim. Ez heta-hetayê bona van tişta razîme, feqet nava peymana Nûda ew diha dereng tên kivşê. Xwedê cara ewlin kerem çawa derbazkirina tijîbûna Îsa Mesîh raber kir. Eva dide kivşê, wekî ewê ku qebûl dike, ew tebyet û qewata Wî distîne. A hema bo vê yekê jî Yûhenna dibêje: "...çimkî çawa ku Ewe (Îsa), usa jî emin li vê dinyayê" (A Yûhenna 4:17).

We qet bihîstîye, ku qulixçîk bêje: "Em bi tu tiştîva ji gunekara cuda nabin: em tenê afûkirîne", yan jî "Em awqasî kurên nelayîqin", yan jî "Em, meriv, dîlê tebyeta xweye gunekarin"? Çawa diqewime merivê ku Încîlê dixwîne tiştên usa bêje? Tebyet jî diha baştir hîn dike.

We qet bihîstîye, wekî şêr heywanekî mayîn bîne dinyayê? Yan jî hespê cûrê eyan kurmekî bîne dinyayê? Kitêba Pîroz dibêje, wekî em endamên bedena Wîne (binihêre Efesî 5:30). Xeber dibêje: "Delalno, em niha kurên Xwedêne (A Yûhenna 3:2). Gilî derheqa nihadane, ne ku *paş*ê, wextê ku herine E'zmîn, lê *niha* em îdî kur û keçên Xwedêne. Gelo Xwedê dikare bûyînê bide kurê nelayîq. Em ji Xwedê xuliqîne û toximê Wî nava medane, dêmek tebyeta Wî ya Xwedêtîyê li cem meye. Çawa ku Ewe, usa jî emin li vê dinyayê, ne ku jîyana mayînda, lê *li vê dinyay*ê.

Werin em careke mayîn xeberên Petrûs bixwînin:

> "De bira Xwedê kerema hê *zêde* û *zêde* bide we... Bi qewata (kerema) xwedêtîya Xwe Xwedê ew hemû tişt daye me, çi ku em hewcene, ku bi jîyana xwedêparêzîyê bijîn" (B Petrûs 1:3, NLT).

Bi fikira qewatê, wextê xilazbûnê pêşkêşa keremê carekê nayê dayînê. Ew her dem jî bona me lazime: em hewcê "kerema zêde û zêdene". Bo wê yekê jî Ew temîyê dide me: "De îdî em mêrkîmî nêzîkî textê Xwedêyî Keremê bin, wekî rehmê bistînin û keremê bivînin, ku gava em hewcebin, alîkarîya me bike" (Îbranî 4:16). Kerem ew ardûye, bi kîjanê bakê me gerekê her dem tijîbe.

Lê niha bixwînin, ku Aqûb derheqa wan bawarmendada çi dinivîse, peyî wê yekêra, wextê ku ew jîyana wane xwehiz û bêesil eşkere dike.

> "Bêesilno! Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinyayê mêriv dike dijminê Xwedê?... Lê Ew *diha zêde keremê* dide me, ku dijî xwestinên xirab bisekinin... Dêmek, li ber Xwedê şikestîbin (Aqûb 4:4,6, NLT).

Careke mayîn bi guhdarî van xebera bixwînin. "Ew *hela serda zêde û zêde* dide me" bona ku dijî xwestinên xwehiz bisekinin. Tercima Încîlêye "Êmplîfayd"-ê vê gotinê wa raber dike: "Feqet Ew kerema diha zêde û zêde dide". Ev qewata ku bi cûrê nelayîq hatîye stendinê, bona karebûna jîyîna pîroz, bona me hatîye dayînê, ya ku berê tunebû.

Ev kerem bona wan tê dayînê, yên ku şikestîne û bawarîya xwe li gotina Wî tînin. Ew yek *qewata* tebyeta Wî ya xwedêtîyê derbazî nava me dike. Merivên kubar gumana xwe didine li ser karebûna xwe, lê yên şikestî qewata Xwedêva girêdayîne. Birayê Dawidî mezin Yêxîya merivekî kubar bû. Ew qewata Xwedêva girêdayî nîbû û bo wê yekê jî ew gerekê bi qewata xwe rastî Golyat bihata (binihêre A P'adişatî 16,17). Dawid merivekî şikestî bû. Ew bi qewata Xwedê derkete dijî ewî merivê mînanî hûta. Em zanin ku ew hemû tişt çawa ser hevda hat.

Îsa da kivşê, ku girêdana kerema Xwedêva çi dide kivşê. Li baxçê Getsemanîyê Ew nava şerkarîyêda bû. Bedena Wî dixwest ji wê yekê bireve, çi ku Bavê wî temî kiribû, lê Wî nava duakirinêda Xwe şikênand, wextê ku şagirtên Wî razayî bûn. Ewî bona vî "ardûyî" kire gazî, bona ku bikaribûya şerê Xweyî mezinî miqabilî xwehizîyê bighîne altindarîyê. Ew yek wextê wedê hewcetîyê bû û Ewî usa kir, bona ku kerema Bavê Xwe bistenda û nava wê şerkarîyêda serbiketa. Şagirtên Wî teribîn, feqet Îsa pêşda eşaretî dabû wana: "Ruh dixweze, lê beden siste" (Metta 26:41, NLT).

Nava serhatîya minda, wextê ku min gerekê li hewşa meda şînayî bidrûta hetanî çûyîna lîstikê, min ne maşîna gîhadirûtinê kir'î, ne ardû, û ez layîqî wana nebibûm. Herdu jî pêşkêşên ji alîyê bavê minda bûn. Maşîna gîhadirûtinê dikare bibe sembola tebyeta nû, ya ku tenê carekê tê dayînê. Bi heyîna wê, min qewata dirûtina şînayê dest anîbû, lê wextê ku ardû tunebû, ez dîsa wî halîda bûm, wextê ku

maşîna gîhadirûtinê tunebû. Ardû sembola *qewata* keremêye. Ardû pêşkêşa carekê nîne: çimkî her car ardû lazim bû, wextê ku min gîha didrût.

Keremê tebyeta Wî da me, wextê em xilaz bûn, lê em hewcê kerema zêde û hê zêdene, bona ku em tebyeta xwe diha qewat bikin û mînanî Îsa bijîn.

## "Îzin heye" û "îzin tune"

Em careke mayîn gotinên Pawlos bixwînin, yên ku bona efesîyane. Fikira wana wê diha femdarîbe bona me peyî wê yekêra, çi ku me hêja eşkere kir.

> "Ez bi navê Xwedê temî li we dikim, ku hûn îdî tu cara usa nejîn, çawa pûtparist, çimkî ew bêyî gumanê şaş bûne... Şerma rûyê xwe unda kirine. Ew bona razîbûnên hêsa dijîn û bona kirina hemû cûre h'eramîyê hazirin... Merivê nû li ser xwe wergirin, ku kirasê Xwedêda bi rastîyê û helalîyê, bêqelpî xuliqîye" (Efesî 4:17,19,24, NLT).

Di navbera undabûya û bawarmendada gerekê firqîya zelal hebe, ew gerekê ne tenê nava hebandina medabin, lê usa jî nava jîyîna meda. Menî ewe, wekî tebyeta meye nû heye, lê em gerekê wê li xwe wergirin. Bi gilîkî mayîn gotî, em gerekê xwe bişkênin, bawar bikin û cîh bidine qewatbûna keremê. Bi vî cûreyî dîna xwe bidine vê yekê: bavê min dikaribû maşîna gîhadirûtinê pêşkêşî min bikira, lê ewê bêfeyda bûya, eger min ardû nekira wê, motora wê neşuxulanda û ew neda xebatê. Xwekirina tebyeta nû dide kivşê ku wê bidine xebatê.

Pawlos dîsa xebera xwe berdewam dike û dibêje ku ev yek bi praktîkî çawa gerekê bê kirinê:

> "Dêmek, terka derewkirinê bidin. Werin em rastîyê bêjine merivên xwe, çimkî em hemû jî endamên bedenekêne. Û "guna nekin, ku îzinê bidin, wekî hêrs serkarîyê li we bike". Îzinê nedin, ku hêrsa we bimîne hetanî wî çaxî, wextê ku ro îdî çûye ava, çimkî hêrs cîhê nigê mîrêcine. Eger hûn dizin, terka dizîyê bidin. Dewsa wê yekê bi kel û ced, bi destên xwe bixebitin û bi merdanî bidine wana, yên k nava h'ewcetîyêdanin. Xeberên qirêj yan jî bêhurmetkirinê nedine xebatê" (Efesî 4:25-29, NLT).

Meriv dibêjin: “Peymana Kevin bi gotinên “îzin heye” û “îzin tune” tijîye, lê peymana Nû tenê derheqa keremêda dibêje. Niha, wextê hemcivîna û li civîna meriva hîn dikin, wekî kerema Xwedê ji xweykirina temîya aza dike û gelek meriv li ser wê fikirêne. Feqet, Îsa got, wekî tenê ewên ku *temîyên* Wî guhdar dikin û mîyaser dikin, wê hazirîya Wîye eyankirî bijîn. Ev dersdar difikirin, wekî azayê didine guhdarvanên xwe, lê bi rastî ew meriva ji hazirîya Xwedê dûr dixin. Tiştekî xemgînîye!

Ew yek tiştekî ber çavaye, wekî Îsa temîya dide me. Ew teslîmî me dike: “Dêmek, herin hemû mileta hîn bikin, çi ku min bona we *temî kir*, ku ew wana xweyî bikin” (Metta 28:19,20). Ewî negot: “Ew hemû tişt, çi ku min *pêşnîyarî* we *kir*”.

Roja îroyîn gelek meriv gotinên Îsaye derheqa serwêrtîya Wî da hiz dikin, lê ew bi sivikayî nêzîkî wan beşa dibin, kîjanada Ew bang dike, ku kirên xweda xwedêparêzbin. Bêyî şikberî, Xwedê serwêrê herî bilinde, feqet bêyî femkirina wê yekê, wekî bijartina mêriv azaye, em dikarin bikevine nava halekî usa, wekî destpê bikin temîyên Wî yên xwedêparêzîyêye derheqa jîyanêda çawa pêşnîyar fem bikin.

## Temî

Şandîya temîyên Îsa derbazî me kirin. Îzinê bidin ez careke mayîn gotinên Yûhenna biwekilînim: “Em dikarin li ser xwe gumanbin, wekî Wî nas dikin, eger em temîyên Wî mîyaser dikin û gura wandanin” (A Yûhenna 2:3, NLT). Hema nava wê temîyêda hatîye nivîsarê: “Hizkirina Xwedê xweykirina temîyên Wî dide kivşê” (A Yûhenna 5:3, NLT).

Pawlos dinivîse: “Çimkî hûn zanin, ku me bi saya Xudan Îsa çi temî dane we” (A Têsalonîkî 4:2). Peyî wê yekêra ew dinivîse: “Xwestina Xwedê ewe, ku hûn pîrozbin” (A Têsalonîkî 4:3, NLT). Em gerekê temîyên Îsa xweykin, ku pîroz bijîn.

Petrûs derheqa temîya jîyana Pîrozda xeber dide. Ew derheqa wê tragêdyayêda dibêje, wekî rojên dawî (xilazîyê) merivê ji bawarîyê paşda vekişin. Ew dinivîse, wekî ewê wê yekê înkar bikin- “ew temî, ya ku hate dayînê bona wana, ya bona jîyana pîroz” (B Petrûs 2:21, NLT). Dêmek, nava peymana Nûda me temî stendine, kîjana tevayî meriv dikare nav bike “temî... bona jîyana bi emirê pîroz”.

Bi lêkolînkirina gotinên Pawlosê şandî, yê nava Efesî 4:25-29-da em temîyên bona jîyana bi emirê pîroz dibînin:

Derewa nekin.

Guneha nekin, ku îzinê bidin, wekî hêrs serwêrtîyê li we bike.

Nedizin.

Xeberên qirêj yan jî bêhurmetkirinê nedine xebatê.

Hûn dikarin niha bêjin, wekî peymana Nûda gotinên “îzin tune” tunene? Ev temî hema wî cûreyî tên kivşê. Lê bona we?

Vî cûreyî wana binihêrin: wextê ku ez zarok bûm, bavê min temî da min: “Kurê min, bêyî nihêrandina herdu alîyên rê peyî topê nereve”. Eva bi fikira “îzin tune” bû, lê ew gelekî berk yan jî xirab nîbû. Bavê min ev temî dida min, ku ez nişkêva neketama bin avtomaşîna û jîyana min wededirêj bûya.

Xwedê dibêje me, ku em gerekê çi nekin, bona ku jîyna me tam, kardar û wededriêj be. Tiştê herî baş ewe, wekî bona mîyaserkirina temîyên Wî, tebyeta meye xwedêtîyê û ardûyê keremê hene.

## Terka xeberdana derew bidin

Werin em wan gotinên “îzin tune”, kîjan min dane rêzê, gotûbêj bikin. Wextê rêwîtîyên min, min gelek serhatîyên usa dîtine û guhdar kirine, yên derheqa wê yekêda, yên ku kirên mesîhîyên nehelal gîhandine çi derecê. Van axirîya min 15 bîznêsmên bona gera li Înkêrê biribûne Maçû Pîkçûyê. Wedekî baş bû: me dîna xwe dida cîhên bedew, qulixî hev dikir û bi xeberên milahîm gotî, me telîmên giran mîyaser dikirin.

Wextê gera çend seheta, min cûre- cûre serhatî derheqa bîznêsmênên mesîhîye mayînda dibhîstin, yên ku wextê mîyasekirina kir’în- frotanê derew dikirin. Wextê xebata tevayî sozdayînên vala û nemîyasekirî dihatine hesabê çawa tiştên sade. Minra derheqa wan mesîhîyada gilî dikirin, yên ku matêrîyalên xirab didane xebatê, hemû normên xebatêye qebûlkirî û qanûnên wan diteribandin, qulixdarî pêşnîyar dikirin û hemû borcdarîyên xwe jî nediqedandin.

Ji wan bîznêsmêna yek, yê ku avayîçêkir bû, minra derheqa avayîçêkirekî mayînda gilî kir. Ew tevayî li cîhekî dixebitîn. Ewî nava

erdê mayînda çel kolabûn, nava wan çelada bermayên matêrîyalên çêkirinê tijî kiribû. Peyî wê yekêra ewî bi xwelîyê ew veşartibûn. Bi rastî ewî gerekê bona cîguhastina wan bermaya pere bidana. Wextê wê gerê min serhatîyên diha xirab bihîstin, lê ev serhatî fikira minda ma, çimkî evî merivî li civînekê rêberîya komê dikir.

Derew tenê nav goveka bîznêsêda belabûyî nîne. Ew usa jî nava govekên hukumatê, xwendinê, qulixdarîya ruhanî û saxlemîxweykirinêda belabûyî ye, usa jî nava endamên malbetê û hevalada. Em derewa dikin, ku ji halên dijwar derkevin, nav û tabîya xwe xweykin, yan jî qulixê dest bînin, yan jî lez bighîjine meremên xwe. Derewkirin balkêşe. Ew dikare prosêsa tiştên usa bide lezêxistinê, bona kîjana em gerekê gumana xwe bidine ser Xwedê.

Gelek cara em dibêjine meriva, wekî bona wana dua dikin, lê bi rastî dua nakin. Em soz didine zarokên xwe û hetanî dawîyê wî sozî naqedînin. Em pevketina piştî sozdayînê diter'ibînin. Bona girankirina tişta em gilîya zêde dikin. Ev hemû tişt derewin, nava feydayên kîjanada em zyanê didine meriva.

Îzinê bidin, ku careke mayîn evî tiştê girîng bidime kivşkirinê: bi xweykirina temîyên Îsa, emê *sozê hazirîya Wî* bistînin. Zebûr vê rastîyê îzbat dike û dipirse: "Kî dikare bikeve nava hazirîya Te (Xwedê)?" (Zebûr 15:1, NLT). Peyî wê yekêra ew dibêje, ku ew meriv, yên ku "sozên xwe xweyî dikin, sozê xwe wî çaxî jî xweyî dikin, wextê ku ew yek wana diêşîne" (Gotin 4). Încîla "Mêsîc"-ê bi vî cûreyî vê gotinê raber dike: "Gotina xwe xweyke wî çaxî jî, wextê ku ew yek bona te gelekî giranbihaye".

Eger em qirarkin, ku temîya Pawlose derheqa derewkirinêda hesab hilnedin, ya ku ewî gotibû efesîya, em dikarin vegerine li ser temîya Aqûb. Ew dinivîse: "Rastîyê veneşêrin, bi pesindayînê û derewkirinê (3:14, NLT). Pawlos temîke usa jî dide kolosîya: "Hev nexapînin" (3:9, NLT). Hûn dikarin bînin ber çava? Pawlos, ewê ku Xwedê ji alîyê xweda da xebatê ku eyantîya mezine derheqa keremêda bide, temîya "îzin tune" dide me. Eger me gelek gotinên ji peymana Nû başqe bikirana, yên ku him Pawlos, him jî şandîyên mayîn nivîsîne, meyê bikaribûya ew nava dijî hînkirina keremêda gunekar bikirana, lê bi rastî, nava gotinên wanda dijîderketin tune.

Eger em guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî kerem perda meye, ku xwe veşêrin û bawarmenda derheqa jîyana qewatkirîda hîn nekin, kîjan pareke keremêye (li vir derheqa derewnekirinêda), merivên ku tên civînê wê vê yekê afû bikin, ku bighîjine meremên xwe. Meriv dikare bêje, wekî ne hînkirina balanskirî û fikirên derheqa keremêda, yên ku derheqa pîrozîyêda nadine kivşê, berbi feydayê usa dibin? Meriv dikare bêje, wekî hînkirina wî cûreyî me hîn dike ku em îsafê hesab hilnedin?

## Îzinê nedin, ku hêrs serwêrtîyê li we bike

Ya duda nava navnîşa meda eve: "*Guneha nekin û îzinê nedin, wekî hêrs serwêrtîyê li we bike*". Min sifetên wan jina û wan mêra dîtine, yên ku li rex merivên hêrs dijîn. Wana gilî dikir, ku li mala wana tirseke çawa bû, wextê ku ew meriv, yên ku bawarmend bûn, hêrs diketin. Gelo ew zarok çi texmîn dikin, wextê ku hêrsa dê û bavên wan bi zordarîyêva tê rêberkirinê. Merivên wî cûreyîye hêrs zyana fîzîkî, ya li ser bedenê, dighînine endamên malbetê û eşîyayên malê xirab dikin. Wî çaxî endamên wê malbetê nava tirsêda dijîn û hîvîyêne ku hêrsa bi sirê wê kengê rabe. Hêrs hukumê xirabkirinê li ser atmostfêra malê dihêle û malbet heyîna xweye çawa cîhê jîyanê unda dike. Roja yekşemê şebeqê li civînê ew mînanî malbeteke sadene, lê ew tiştekî formale. Telebextra, me qirar kirîye, ku bi sivikayî nêzîkî vê temîyê bibin, yan jî vê temîyê hesab hilnedin.

Ev yek tenê nîne. Nava namên Şandîyada meriv dikare derheqa berdana hêrsêda temîyên başqe bivîne. Pawlos dinivîse: "Ji temamîya telayê, hêrsê û xeberên hişk azabin" (Efesî 4:31, NLT). Aqûb temîyê dide: "Hûn hemû gerekê... hêdîbin bona hêrsketinê. Hêrsa mêriv wê heqîtîyê mîyaser nake, ya ky Xwedê dixweze" (Aqûb 1:19,20, NLT). Pawlos careke mayîn temîyê dide kolosîya: "Ji hêrsê azabin" (3:8, NLT).

Îzinê bidin careke mayîn pirsê bidim: gelo ev xeber ji alîyê wan merivada hatine nivîsarê, yên ky eyantîya Xwedêye derheqa keremêda stendine û mînanî "îzin tyne" nînin? Diqewime me tiştek fem nekirîye?

## Nedizin

Terka dizîyê bidin. Çiqwas cara em bi deynî pera hildidin û paşda venagerînin? Çiqwas cara em dikevine nava deynên mezin? Em bawar dikin, wekî emê bi kutasî duayê Xwedê bistînin û bêrûmetkirina serwêrtîyê berdewam bikin û bikevine nava deynên hê mezin. Bi kutasî em dikarin xwe çawa binketî elam bikin. Ev xebera qebûlkirî îzinê dide me, ku em xwe mikur neyên, wekî me ew deyn paşda nedaye, yê ku em deyndarên meriva bûn.

Çiqwas cara me mecalên hevaltîya xwe bona hewcetîyên xweye şexsî dane xebatê? Ew yek tê navkirinê çawa zeftkirina hebûna yên mayîn. Em li ser xwe guman elam dikin: “Ez mesîhîme û bi kerema Xwedê xilazbûyîme”. Feqet em gura temîyêd Îsa nakin, kîjan Wî bi destî şandîyên Xwe dane me. Serwêrek, tevî kîjanî ez dixebitim, tevî hemû berevbûnên civînê dibû, ew ecêb didîtin, yên ku wextê qulixa diqewimîn û carekê ber min pesinê xwe dida, wekî ewî dikaribû hêsa wextê rojîyên wededirêj dua bikira. Feqet nava wî wedeyîda ewî bi hezara dolar ji civînê hildida. Bi kutasî ew hate girtinê. Eva tenê serhatîke derheqa wê yekêda, wekî mesîhî didizin û bi cûrekî wê yekê afû dikin.

Ji me çend meriva hesabên bacdayînêye şaş raber kirine û hesabên kara xwe nedane kivşê. Wî çaxî em temîke mayîn hesab hilnadin, ya ku Pawlos daye: “Bacên xwe bidin” (Romayî 13:6, NLT). Em dizîya xwe bi “serkarîkirina şaş”, ya rêberên wedê niha, afû dikin, lê emê kengê fem bikin, wekî şaşî bi şaşîyêva nayê rastkirinê?

## Xeberên qirêj, yan jî xeberên bêhurmtkirinê nedine xebatê

Tercima Încîlêye “Êmplîfayd”-ê bi vî cûreyî wê temîyê r’aber dike: “Bila tu xebereke qirêj, yan jî xebereke xirab û tu xebereke nesaxlem, yan jî bêqîmet ji devê we derneyê” (Efesî 4:29). Min gelek cara bona wan meriva qulix kirîye, yên ku ji alîyê bawarmendên başqeda bêhurmetkirin stendine. Xeberên bêhurmetkirinê êşeke mezin gîhandine wana. Wan meriva birîn stendine, bona qencbûna kîjana wede lazim tê.

Min gelek cara xeberdanên vala di navbera bawarmendada, serbara serda laqirdîyên nebaş li ofîsên qulixdarîyêda bihîstine. Gotinên necayîze ji dikê elamkirî îdî tiştên nebihîstî nînin.

Van axirîya min tevî keç û xortekî cahil xwerin dixwer, yên ku qulixa baş li civînê dikirin. Wana qulixdarîke navnetewî hiz dikir û ew bona xwe hesab dikirin çawa mesele. Carekê mecal dane wî xortî û keçê, ku tevî rêberekî wê teşkîletê xwerinê bixun. Wextê nanxwerinê, wî merivî çend cara gotinên necayîz dane xebatê. Ji wê rojêda çend meh derbaz bibûn, lê ew xort û keç hela hê ji wî tiştê qewimî ser hişê xweda nehatibûn.

## Me kerem tam qîmet nekirîye

Çi qewimîye? Gelo em usa cuda bûne, wekî îdî me xweweykirina xwedêparêz danîye alîkî? Gelo me şedetîya xwe kirîye qurban, bona ku em diha gelekî mînanî dinîya dor- berabin? Ez bi yekdengî piştgirê wedê niha, pêşkevetî û pêşverûme, lê ne ku kîsî dewsêdayîna Xebera Xwedê.

Em gerekê pirsa vî cûreyî bidin: eger şandîya lazim hesab kirin, ku temîya derheqa jîyana xwedêparêzda bidine me, bona çi em wana bîr naynin? Gelo em diha zêde zanin, ne ku ew? Gelo em diha gelek tişta zanin, ne ku Îsa?

Diqewime dijmin bala me kişandîye ser xwe, mînanî Hêwayê? Vê carê hemû tişt hinekî bi cûrekî mayîn hatîye stendinê. Hêwayê baş zanibû, wekî Xwedê temî dabû ku berê dara zanebûna qencîyê û xirabîyê nexwe. Dêmek, dijmin gerekê berbi rîskê biçûya, û carekêra dijî Xebera Xwedê derketa, çimkî bernama wî dikaribû bihata eşkerekirinê. Bona vê yekê fesalbûn û fêlbazî lazim bûn.

Me îşê mîrêcin diha daye hêsakirinê. Me bi cûrê fesal cêrge beş ji Xebera Xwedê hesab hilnedane. Tê bîra we, wekî Xwedê temî da: “Ji her dareke baxçe bixwe, lê ji dara ulmê qencîyê û xirabîyê nexwe, çimkî ew roja te xwer, tê bi mirina xwe bimirî” (Destpêbûn 2,16,17). Çawa dijî wê gotinê, roja îroyîn hineka wê bigota: “Ji her dareke baxçe bixwe”, û xilaz, bêyî berdewamkirin. Ew hesab hilnadin gotina “...lê... nexwe” yan jî “îzin tu*ne*”, ew hemû tişt çi girêdayîye kirên xwedêparêzîyêva.

Bi vî cûreyî, me kerema Xwedê tam qîmet nekirîye. Em dibêjin, wekî ew xilaz dike, afû dike û wekî ew yek pêşkêşa ji alîyê Xwedêda belaşdayîye. Bêfitîya ew hemû tişt raste. Feqet, me hesab hilnedaye, wekî ew yek heyîna dilê meda diguhêre û qewatê dide me, ku em mînanî berê nejîn. Em nabêjine meriva, wekî ew niha qewatbûyîne bona terkdayîna kirên ku li Xwedê xweş nayên. Feydayê bêdengîya vî cûreyî ewe, wekî şabûnên bawarmendaye derheqa xwedêparêzîyêda tunene û ew ji hazirîya Xwedê miqûf dimînin.

## Kirên me girîngin

Van axirîya, şebeqekê wextê ez gihîştibûme nîvê xwendina Încîla xwe, ev tişt qewimî. Min gerekê ji kitêbên Zebûr û Îbranîya bixwenda. Min îdî beşa Zebûra xilaz kiribû û nama Îbranîya vedikir, wextê ku min texmîn kir, wekî Ruhê Pîroz dibêje min: "Na: nama Îbranîya nexwîne, kitêba Eyantî bixwîne". Kitêba Eyantî min çend hevtîya pêşda bi gotina Ruhê Pîroz careke mayîn destpê kiribû bixwenda. Min îdî du serên wê xwendibûn, lê bi dilêşî dibêjim, min hewaskarîya xwe unda kiribû û roja mayîn ez vegeryabûm li ser xwendina xweye progiramkirî. Û niha, piştî du hevtîya, ez paşda vegeryame hema wî cîhî, li kîderê min xwendina serê sisîya da sekinandinê. Hindik mabû, ku ez ji ser kursî biketama, wextê ku min gotinên Îsaye bona civîna Sardeysê xwendin.

> "Ez haj ji hemû kirên te heme, navê te heye, yan tu saxî, lê rast tu mirîyî" (Eyantî 3:1, NLT).

Ya ewlin, guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Îsa dibêje: "Ez haj ji wî hemû tiştî heme, kîjana tu dikî", lê ne ku "Ew tişt, kîjana tu bawar dikî". Ew usa jî nabêje: "Ez haj meremên te heme". Nava tericimeke mayînda Ew dibêje: "Ez kirên te zanim". Tiştekî ber çavaye, wekî ew derheqa heqîtîya civînêda xeber nade, lê derheqa pîrozîya wane derda, derheqa kirên wanda, bijartinên wan û tiştên mayînda dibêje. Ew dide kivşê, wekî navê civînêyî sax heye. Gelo bi vê yekê fikireke çawa pêşda tê? Diqewime reqema endamên wana zêde dibû, ew bi nav û deng bûn, qulixên wana ruhdar dikirin û atmostfêra li wir ban

bû. Bîr bînin, wekî em dikarin bi nezanî hazirîya Xwedê bi atmostfêra başva bidine guhartinê. Eger hûn herine konsêrteke sade, hûnê gelek meriva bivînin, şabûnê û atmostfêreke êvarîyêye baş bivînin, lê gelo ew hemû teşkîldarî anegorî wê yekêne, çi ku dilê Xwedêdane?

Pirseke girîng heye, ya ku saxî yan mirina civînêda eşkere dike: gelo em gura gotinên Îsa dikin, yan ola me bi rastî ji temîyên Wî dixalife? Pirseke mayîn, gelo em rastîyê elam dikin, ya ku halê dilê mêriv eşkere dike û nava feydayê wê yekêda kirê wî diguhêre, yan em wan tişta terîf dikin, kîjan fikira me ruhdar dikin.

Piştî xebera Xweye vekirinê Îsa berdewam (dûmayî) dike:

> "Hişyarbe. Ewê biçûk qewat bike, yê ku hela hê dimîne, çimkî ew çi ku maye hema bi temamî mirîye. Ez hesab dikim, wekî kirên te anegorî xwestinên Min in" (Gotin 2, NLT).

Îsa careke mayîn derheqa kirên wanda dibêje, lê ne ku derheqa fikirên wanda. Çawa ku min îdî da kivşê, peymana Nûda gelek "îzin heye" û "îzin tune" hene û ew temî bona kirên mene. Anegorî gotina Îsa, ev civîn nacedîne û xwe nêzîkî jîyana pîroz nake. Ew serda zêde dike:

> "Paşda vegere li ser wê yekê, çi ku te pêşda bihîst û bawarîya xwe lê anî: ese nêzîkî wê bibe. Tobeke û careke mayîn li Min vegere. Lê eger tu hişyar nebî, Ezê mîna dizekî nişkêva ser teda bigrim" (Eyantî 3:3, NLT).

Bîr bînin wekî Îsa berbirî civîna Serdeysê bibû, lê ne ku bajarê Serdeysê. Eger xeberên Wî tenê bona evê civîna dîrokîda bûna, wî çaxî ewê nava kitêba Pîrozda nîbûna. Eger xeberên Wî nivîsarin, usaye bona rojên me şuxulkarîya wane pêxembertîyê heye. Ew derheqa bawarmendadanin, çawa wî çaxî, wextê ku hatibûne gotinê. Gotinên Wî bona mene, çimkî Xebera Xwedê saxe. Dêmek ezê bi vê hemtêkstê vegerime li ser gotinên Îsa.

Îsa emirî li ser me dike, ku em vegerine li ser wan tişta, li kîjana me pêşda bawarîya xwe dianî. Bi gilîkî mayîn gotî, em ji jîyana pîroz xalifîne. Me hîndarîya keremê usa çê kirîye, ku îzinê dide me ku em mînanî merivên bêbawere dora xwe bijîn. Ev hînbûn bi cûrê baş tê kivşê, lê gelo ew Xebera Xwedêye? Îsa temîyê dide civînê, ku tobekin

û paşda vegerine li ser gotinên Wî. Dersdarên wedê niha hene, yên ku elam dikin, wekî wextê ku dibine mesîhî, îdî hewcetîya tobekirinê tune, çimkî hemû gunxhên pêşda, niha û yên pêşerojê tên afûkirinê. Eger eva raste, bona çi Îsa temîyê dide civîna Xwe, ku tobekin û paşda li Wî vegerin.

Eger guhdarîyê bidine ser hînkirinên "keremê"-ye nebalanskirî, yên ku îro gelek meriva berbi alîyê xwe dikişînin, gelek rêberên ku terîf dikin bi piranî nava atmostfêra qanûnparêzîyê û bin hukumê hînkirinên tevîhevkirîye derheqa pîrozîyêda mezin bûne. Belê, pîrozî nava gelek doranada hatîye teveîhevkirinê, lê pîrozî nava mesîhîtîyêda hukume û ev yek nayê guhartinê. Nava temamîya dîroka civînêda banga berbi pîrozîyê hebûye û ew yek beşeke girînge, ya mîsîya meye tevayîye. Em gerekê paşda vegerine li ser hîmên xwe, li ser wî hemû tiştî, çi ku "me bihhîstîye" û "pêşda me bawarîya xwe li çi anîye".

Îsa xebera xwe berdewam (dûmayî) dike:

> "Lê Serdeysêda çend kesên te hene, yên ku kincên xwe bi xirabîyêva nelewitandine. Ewê bi kincên çîle-qerqaş tevî Min bigerin, çimkî ewe hêjane" (Eyantî 3:4, NLT).

Guhdarîyê bidine ser gotina "lewitandina kinca". Gotinên Pawlos bîr bînin, kîjan me bona hazirîya Xwedê hazir dikin: "...de em xwe ji hemû kirêtîya qalib û ruhê xwe paqijkin û bi xofa buhurtî-jibarebin" (Korintî 7:1). Îsa şuxulkarîya vê civînê dide rastkirinê, bang dike, ku ew paşda vegerine jîyana pîroz û kincên xweye bedenê û ruh, bi kirên bêxwedêtîyêva nelewitînin. Bi mîyaserkirina temîya Wî, emê hazirbin him bona hazirîya Wî, him jî bona paşdahatina Wî, çimkî nava vê xeberêda Ew dibêje: "Ew meriv duakirîne, yên ku hîvîya Min in, yên ku kincên xwe hazir xweyî dikin" (Eyantî 16:15, NLT). Ew gotina xwe tomerî dike û dibêje:

> "Hemû serkevtî wê kincên sipî xwekin. Ezê tu cara navên wan ji kitêba jîyanê dernexim, lê Ezê li ber Bavê Xwe û milyaketên Wî eyan bikim, wekî ew yên Min in. Her şexsek, yê ku guhên wî hene, gerekê guh bide Ruh û fem bike, ku Ew çi dibêje civîna" (Eyantî 3:5,6, NLT).

Derxistina navê kesekî ji kitêba Jîyanê, tiştekî biçûk nîne. Feqet ev gotin ji devê Xilazkir derketin. Gelekî girînge, wekî em bi guhdarîke mezin guh bidine wê yekê, derheqa çida Ruhê Xwedê bi saya Xebera Xwedêye nivîsar dibêje. Usa jî girînge, wekî em wan beşa hesab hildin, yên ku ne anegorî fikirên meye şexsîne û nava hînkirinên nihada belabûyîne.

Xwedê em afû kirine: em tu tiştî nikarin bikin, ku evê tabîya nava Mesîhda qazanc bikin. Feqet, kivş dibe, wekî Ew jîyana pîroze anegorî vê tabîyê bi mezinayî girîng hesab dike.

Pawlos dinivîse: "Çimkî Xwedê kerema Xwe bona xilazbûna meriva eyan kirîye. Ew kerem me şîret dike, wekî em terka jîyana bêxwedê û xwestinên wî cûreyî bidin û nava vê dinyayêda bi jîyana heq û xwedêparêz bijîn" (Tîtos 2:11,12, TEV). Eva gotineke zelale. Wî çaxî bona çi em vê rastîyê ji dikên xwe elam nakin?

Werin em tu cara wê hînkirinê nedine sekinandinê, wekî em nikarin lêxweşhatin, afûkirin û xilazbûna Xwedê qazanc bikin. Werin em elamkirina vê mizgînîyê berdewam (dûmayî) bikin. Feqet, werin em kêm qîmetkirina kerema Wî bidine sekinandinê. Werin em temamîya rastîya derheqa keremêda elam bikin.

11

# QENC, YAN KARDAR?

“Hûn dibêjin îzina min heye her tiştî
bikim, lê her tişt nîne, ku kardare”.
— A Korintî 10:23, NLT

...Pîrozîya tomerî ne tenê girînge
çawa qewilê bona çûyîna Ezmîn, lê...
usa jî lazime bona ku li ser dinîyayê nava jîyana
mesîhîtîyêda bighîjine feydayên here baş.
— Dagan Klark

Çawa qulixçî, yê ku her dem terîf dike û “bi Xeberê dilê xwe vedike”, guhdarkirina bangên qulixçîyên Xwedêye mayîn li ser min hukumê nûbûnê dihêle. Van axirîya mecaleke usa rastî min hat. Ew serwêrê ku terîf dikir, li welatê me xweyîqedire, rêberê civîna mezine û bi serwaxtîya xwe nava pêşdaçûyîna civîna cîhda eyane. Banga wî hewaskar bû, piştgirî dida û eyantî derbaz dikir. Bi hezara merivên li wê berevbûnê hazir bi guhdarî dîna xwe didane wî.

Êmekê ewî nava xeberdana xweda rastkirinek kir, ya ku gelekî baş, serwaxt û şikestî dihate texmînkirinê, lê ewê rastkirinê nerihetî da min. Ewî got: “Ew çi ku ez hazir dibim bêjim diqewime hinekî xirab bê texmînkirinê. Ez vî cûreyî her dem xeber nadim, çimkî ez bi terîfên xwe dijî meriva dernakevim. Temamîya dijîderketinê ez Ruhê Pîrozra dihêlim”.

Min cêriband vê hêrsê ji xwe bidime dûrxstinê, ya ku ruhê minda bilind bû, lê ew yek minra li hev nehat. Pêşda min gotinên wî cûreyî ji rêbera bihîstibû. Ev gotin çawa ya nêzîkî aqila dihate texmînkirinê, lê

bona çi ez xemgîn bûm. Wî çaxî min gotinên Pawlosê şandî, yên bona Tîmotêyo bîr anîn. Peyî berevbûnêra min ew gotin dît:

> “Xeberê dannasîn bike, ser wê nêt-fikirê be, eger wextêda be, yan bêwext be, li şaşîya hilê, pêşîya neheqîyê bigre, dil bide meriva, bi temamîya sebirê hîn bike” (B Tîmotêyo 4:2).

Îzinê bidin, pêşda ez hemtêksta vê gotinê raber bikim. Wî çaxî, wextê ku Pawlos ev name dinivîsî, Tîmotêyo li Efesîyê serwêrê civîneke mezin bû. Ev serê kitêba peymana Nû gotinên Pawlose nivîsare xilazîyêne, kîjan ewî ne tenê gote şagirtên xweye cahil, lê gote me hemûya. Bi fikira min ewî xilazî (dawî) texmîn dikir û gelekî fesal têma xwe, xeberên xwe bijartibûn.

Min nedixwest bi sivikayî derheqa xeberên Pawlosda pê bihesîyama “li şaşîya hilê, pêşîya neheqîyê bigre, dil bide meriva”. Min destpê kir vê gotinê lêkolîn bikim. Min pêşda tercima Încîlêye “Êmplîfayd”-ê vekir, bona ku diha zelal fem bikim, lê hetanî ku min xwest wê gotinê bixwînim, gotina pêşîya wê guhdarîya min kişande ser xwe:

> “Ez TEMÎYÊ DIDIME te bi hazirîya Xwedê û Îsa Mesîh, Yê ku dîwana saxa û mirîya dike…” (B Tîmotêyo 4:1).

“*T’emîyê didim*” bi herfên mezin hatîye nivîsarê. Ez şaş nebibûm, ew yek mexsûs bona guhdarîyê hatîye kirinê. Ez hevalê xwe Rîk Rênnêrva hatime girêdanê, yê ku bi salên dirêj pêşekzanê yûnanîye û min derheqa fikira vê xeberêda jê pirsî. Awa bersiva (caba) wî ev bû:

> “Nava yûnanîda xebera “TEMÎKIRIN” xebera “dyamartûromay”-e û ew wî çaxî tê xebitandinê, wextê ku nevsên resmî bona qulixa dewletê sond dixun. Ewê ku sondê qebûl dike, bangî hemû xwedêya dike, ku dîna xwe bidine wî û wî guhdarkin, lê paşê bangî ewê ku sond duxwe dike, ku ew bi cabdarî şuxulê xwe bike û bîr bîne, wekî ew xwedê dîna xwe didine wî. Bona Tîmotêyo Pawlos digot: “Ez bangî Xwedê dikim, ku dîna xwe bide, wextê ku tu wan xebera qebûl bikî, kîjana ez hazir dibim bêjime te...”. Ev xeber gelekî bi heyteholî bû û ew yek Tîmotêyora femdarî bû, wekî diha başe ew bi guhdarî guhê xwe bide ser, çimkî Xwedê wê bi Xwe guhdar bike û wê dîna xwe bide wî. Eve menî, wekî beşa gotinêye mayîn derheqa dîwanêdane. Pawlos dixwest ku Tîmotêyo fikira wê gotinê tam fem bikira,

> kîjan ew hazir dibû bêje û kîjan wê ji alîyê şagirtê wîyî cahilda bihata guhdarkirinê. "Xebera "temîkirin" cabdarîke mezin bû bona wî merivî, yê ku ev xeber distend".

Pawlos vî cahilîra gelekî berk xeber dida (usa jî mera), dida kivşê, wekî temîya wî gerekê çawa borcadrî bûya. Çawa ku Rîk got, Pawlos Tîmotêyo, bi hazirîya Xwedê û Îsa Mesîh, da sondxwerinê. Bi cûrekî mayîn gotî, Xwedê wê dîwana Tîmotêyo, usa jî her qulixçîkî mayîn bikira, eger ewî ev gotin mîyaser nekira:

> "Xeberê dannasîn û terîfke. Texmînkirina xweye lez xweyî bike (her dem nêzîk û hazirbe), nenihêrî wê yekê, wekî ew mecal kardare, yan na, yan jî (nenihêrî wê yekê ku ew yek fesale, yan nefesale, tiştê xwestinêye, yan ne yê xwestinêye û çawa terîfkirê Xeberê, tu gerekê nîşanî meriva bidî ku jîyanên wana çi cûreyî şaşin)?" (B Tîmotêyo 4:2, AMP).

Qulixçîyê Mizgînîyê gerekê "nîşanî meriva bide, ku jîyanên wana çi cûreyî şaşin": eva tiştekî gelekî balkêşe.

Ez carekêra derheqa wê bangêda fikirîm, ya ku min bihîstibû: "*Tiştê ecêbmayînê nîne, wekî gotina wî serwêrî ez xemgîn kirim*". Ew baş dihate texmînkirinê, lê rastî ne ew bû. Diqewime bi zanebûn, yan jî bi nezanî ewî ew yek bijartibû, çi ku bona wî baş dihate texmînkirinê. Dewsa wê yekê ewî gerekê ew yek bibijarta çi ku ji Xwedê bû. Ewî rêberî, cabdarî dabû ser Ruhê Pîroz, lê Pawlos zelal dibêje, wekî nava vê pirsêda emin cabdar. Van axirîya serwêrekî eyan, tevî jina xwe, wextê bernameke navnetewî hatibû teglîfkirinê. Spîkêr (dîktor) têma derheqa bêeslîya bedenîda pêşda kişand û wana got: "Em gerekê nebêjine meriva ku ew çawa bijîn".

Ez zanim, wekî ev jin û mêr jî meriva hiz dikin. Ew dixwezin, wekî undabûyî guhdarîya Mizgînîyê bikin û Îsa nas bikin. Dîtinoka wane mezin heye. Wê tiştekî nebînayî bûya, eger hemû qulixçî mînanî wana aktîv bûna. Feqet diqewime, wekî em temîya *Xwedê*, ya "nîşanî meriva bidin ku ew çi cûreyî şaş dijîn", bi wê bi fîlosofîya meye *qencva* diguhêrin û dewsê wa dibêjin "nebêjine meriva, ku ew çawa gerekê bijîn?".

Gelo şandî ev stratêgîya didane xebatê? Carekê Pawlosê şandî stratêgîya xwe elamî padişakî nexilazbûyî kir:

> "Awa, Egrîpa padişa ez dijî wê dîtina li ber çavaye ji Ezmîn nesekinîm. Lê min pêşyê yên Şamê, Orşelîmê û temamîya topraxên Cihûistanêra dannasîn kir, usa jî ne cuhuyara, ku tobekin û berbi Xwedê vegerin, kirên qenc bikin, bi îşên xwe bidine kivşê, wekî ew hatine guhartinê" (Karên şandîya 26:19,20, NLT).

Ew yek, wekî kesek temîyê dide merivên xilaznebûyî, ku *tobekin* û paşî paşdahatinê *bidine kivşê, wekî ew hatine* guhartinê, carekêra wê yekêva girêdayîye ku *ew çawa gerekê bijîn.* Telebextra fîlosofîyayên Pawlos û wan herdua, ya jin û mêr, dijî hevin. Yek ya *Xwedêye*, ya mayîn *qence*.

Pawlos qirara xweye bona guhdarîya li ser stratêgîya xwedêtîyê da kivşê, wextê ku mecala wî hebû tevî rêberekî xilaznebûyî û jina wî xeberde. Wê stratêgîyayê lêkolîn bikin, ya ku ewî dida xebatê û dîna xwe dida têmayên ku ji alîyê wîda tên bilindkirinê:

> "Çend roja şûnda Felîks tevî Lirûsîla kulfeta xweye cihû hat, gazî Pawlos kir û bona ewê bawarîya ser Mesîh Îsa ji wî bihîst. Pawlos hê bona rastîyê, xwegirtinê û dîwana Xwedêye ku wê bê, xeber dida, lê Felîks texmîn kir, wekî ew ji çapê zêdetir nêzîkî xwestinên wî dibe û gote wî ku ew here. "Bona îro bese. Gava wextê min hebe ezê gazî te bikim"" (Karên Şandîya 24:24,25, MSG).

Felîks emir kir ku Pawlos ji zindanê bînin, çimkî ewî û jina wî dixwestin banga Pawlose derheqa jîyana heta-hetayêda guhdar bikirana. Bi xeberdana derheqa merivên xilaznebûyîda, Pawlos derheqa du têmayên hîmlîda xeberda: terbyetdarîya moralî û dîwana ku wê bê. Gotina Pawlos awqas berk bû, wekî wana eşkere da kivşê ku şerm dikirin. Gelo bi çiqwasîva ev yek dijî stratêgîya qulixa meye wedê nihaye bona gunekaraye? Rêberên civînê hene, meremê kîjanayî ewlin ewe ku usa bikin, wekî ewên ku Xwedê digerin roja ledêye (yekşema) mayîn paşda vegerin. Bi hesabhildana wê yekê, wekî ew dikarin meriva paşda vegerînine civînê, tiştê silavkirinêye, lê ew yek meremê sereke nîne. Meremê Pawlos ew nîbû ku ew xwestina careke mayîn hatina li civînê pêşda bianîya, lê meremê wî ew bû ku ew rastîyê xeberde.

Van axirîya ez tevî berevbûneke serwêrekî cahil bûm. Ew li bajarên cuda-cuda digerîya û derheqa hizkirina Xwedêda terîf dikir. Vê carê

jî li aûdîtorîya tijî ji hezarî zêdetir meriv berev bibûn ku guhdarîya wî bikin. Atmosfêreke usa saz bibû, wekî merivên berevbûyî hîvîyê bûn ku guhdarîya wî rêberê cahil bikin. Hetanî destpêkirina bangê, du cara elamî meriva kirin, wekî wê êvarê ewê tenê derheqa “Mizgînîyêda” bibihên û ewê derheqa tu “tiştekî xirabda” xeber nede. “Ewî Mizgînî çawa fikira xebera “xirab”-e wekî mayîn raber dikir. Feqet, usa dibe wextê ku Mizgînî pêşda xirab tê texmînkirinê, xwezima wextê ku ew alîyê jîyanê diguhêre. Lê eger ew guhartin me ji rîya mirinê xilaz dike, emê çi cûreyî wê yekê binihêrin.

Ew serwêr çawa rabû ser dikê tevî temaşevana tevgirêdan saz kirin û nava 20 deqên ewlinda ewî henek kirin. Peyî wê yekêra ewî gilî kir, wekî Îsa çawa me hiz dike. Banga wî gelekî ya ruhdarkirinê bû. Wextê ku ewî xeberdana xwe ser hevda anî, ewî banga xilazbûnê li meriva kir. Ewî bangî gunekara kir, ku jîyana xwe rast bikin, hizkirina hindva vê dinîyayêda daynine alîkî. Ewî derheqa tobekirina gunehada tu tişt negot, derheqa wê hînkirina hîmlîda, ya ku gerekê berbi xilazbûnê rêberîyê bike (binihêre Îbranî 6:1). Wê êvarê geleka caba banga wî dan. Gelo banga wî serwêrî anegorî ya Pawlos bû, ya ku ewî gote Egrîpayê padişa, usa jî Felîks û Drûsîlayê? Gelo banga wî anegorî gotinên Petrûs bû, yê ku bi cûrê berk temî da wana, yên ku dixwestin xilazbûna: “Gunehên xwe tobekin û paşda vegerine li alîyê Xwedê, bona ku gunehên we paqijbin” (Karên Þandîya 3:19, NLT). Gelo ew merivên ku Xwedê digeriyan, yên ku ji wê berevbûna wî serwêrî diçûn, xilazbûyî bûn?

## Berkbûnên wekî mayîn

Werin em pirsekê jî bidin: bona çi awqas hêsaye şirîta bi xwe pê dikilên berbi alîyê mayîn bibin û awqasî ji qanûnparêzîyê dûr bikevin, wekî îdî destpê dikin, qirarên Mizgînîyêye hîmlî girîng (ferz) hesab nekin?

Ji rêberên rojên me gelek ji alîyê merivên usada hatine terbyetkirinê, yên ku roja îroyîn tên hesabê çawa bavên civînêye berk. Sedsala 20-îda ev bavana nedtirsîyan dijî guneh derkevin û wê yekê eşkere bikin: wana bangî me dikirin, ku bi jîyana pîroz bijîn. Wan

sala civînên awqas mezin tunebûn, çawa îro. Bangên wane nivîsarên pîroze pêşîgirtina şaşîyê gelek cara ew meriv paşda didan, yên ku bi dil Xwedê nedigerîyan.

Hinek wede şûnda komeke rêbera gaveke stratêgî avîtin, hema dijî wê fikirê. Ew hatine ser wê fikirê, wekî dikarin gelek peyîhatîya bihêlin, wextê ku *bangên ruhdarkir, baş* terîfkin. Me pêşîgirtina şaşîyê, şîret û rastkirin dane kêmkirinê û me destpêkir nava Încîlêda bangên piştgirîyê bigerin. Me terîfên derheqa gurêkirinêda, yên hindava Xebera Xwedêda dane sekiandinê. Sedsala 21-êda eva bû stratêgîya me. Feqet, niha guh bidine peyîhatina xeberên Pawlosê şandîye bona Tîmotêyo:

> "(...tu çawa terîfkirê Xeberê, gerekê nîşanî meriva bidî, ku jîyanên wana bi çi cûreyî şaşin) ser wê nêt-fikirêbe, eger wextêdabe, yan bêwextbe, li şaşîya hilê, pêşîya neheqîyê bigre, dil bide meriva, bi temamîya sebirê hîn bike" (B Tîmotêyo 4:2, AMP).

Nava vê gotinêda sê xeberên ferz (girîng) tên xebitandinê, "êlêgço", "êpîtîmao" û "*parakalêo*". "*Ferhenga Strong*" xebera "êlêgço", vî cûreyî şirove dike: gunekarkin, şaşîyê bidine kivşê, miqabil (dijî) derkevin, şîretkin". "*Ferhenga lêkolîna xeberên Încîlê"* şirovekirina diha zelal pêşnîyar dike: "Peymana Nûda miqabilderketin, kivşkirin ewe ku bidine kivşê, ku kesek şaşe û bi wê yekê şermîyê bidine wî". Bi rastî eva şirovekirineke hukumdare.

Xebra duda, "êpîtîmao" tê şirovekirinê çawa raberkirina gunekarîyê, miqabilderketinê". Xebera sisîya *"parakalêo"*, tê şirovekirinê çawa "ber dilada bê, piştgirîyê bide". Eva alîyê ruhdarkire, yê ku bêyî şikberî lazime.

Eger em derbazî herdu xebrên ewlin bibin, emê bivînin, ku Pawlos temî da qulixçîya, ku bangên usa terîfkin, yên ku nava xirabkarîyêda gunekar dikin, miqabil (dijî) derdikevin, şîret dikin, şaşîyê didine kivşê û şaşîya kesekî eşkere dikin. Şirovekirina van xebera me berbi wê yekê dibe, ku em wan mêtoda lê binihêrin, kîjan li civînên rojavayêye wedê niha bona rêberkirinê tên xebitandinê. Gelo ev stratêgîya wedê niha serwaxtîya Xwedêye, yan serwaxtîya *qencîyêye*? Çawa qulixçîyê wedê tam, yê ku îdî ji 25 sala zêdetire ku wextê civîna

terîf dike, ez dikarim bêjim, wekî em berbi *qencîyê* xalifîne. Derheqa wê yekêda ez gelek serhatîya dikarim çawa mesele bînim, lê îzinê bidin ez tenê yekê zêde bikim. Ji min hîvî kirin ku ez li bakûr-rojava Ştatên Yekbûyî li civîneke mezin terîf bikim. Ez bi begemîya mezin nêzîkî rêberê wê civînê û xebata wîye kirî dibûm û ez bêsebir hîvîya wî wedeyî bûm, yê ku minê tevî wî merivî, jina wî, koma qulixê û li civînê derbaz bikira.

Çend hevtê pêşîya civînê min nama êlêktronî ji wî serwêrî stend, kîjanêda nivîsar bû: "Con, em bêsebir hîvîya hatina te û ewê xebera tene, kîjanê tê li civîna me raber bikî. Tu bangên xwe hazir dikî, lê wê diha baş bûya ku min derheqa kûltûra civîna meda tera gilî bikira. Civîna me ya başîyêye û endamên wê hîn nebûne guhdarîya bangên nebaş bikin. Dêmek, wextê ku tu berbirî civîna mebî, ez hîvî dikim ku bangên te yên piştgirîyê, yên rengên başbin". Careke mayîn pirs pêşda tê: bi çiqwasîva ev "serwaxtî" anegorî wê temîyêye, ya ku Pawlos da Tîmotêyo? Çawa himberîhevkirin, ezê fikirên wan hersê xeberên yûnanîye, ku nava rojên meda çawa yên "baş" û "nebaş" tên hesabê, nav bikim.

**Baş**: 1) "*parakalêo*"-ber dilda hatin, piştgirtin.

**Nebaş**: 1) "êlêgço"-gunekarkin, şaşîyê bidine kivşê, miqabil derkevin, şîret bikin, bidine kivşê, wekî kesek şaşe.

2) "êpîtîmao"-gunekarîyê raber bikin, miqabil derkevin.

Pawlos sê temîya dide, ji kîjana dudu tên hesabê çawa yên "nebaş" û tenê yek çawa ya "baş". Îzinê bidin, ku bi cûrekî mayîn vê yekê bêjim: 67 selef "yên ku rastkirina tînin", lê 33 selef "yên ku begemîyê didin". Ez naxwezim bêjim, wekî nava terîfên meda 67 selef gerekê ew bin, yên ku rastkirina tînin. Feqet, em gerekê pirsê bidin, gelo em nava halekî nebalanskirîdanin? Eger meremê me ewe, ku em gerekê bi sed selefîva li civînên me bangên piştgirîyê û ruhdarkirinê terîfkin, wî çaxî diqewime li cem me merivên baş zêde bûne, yên ku bawar dikin, wekî heleqtîyên wane tevî Xwedê rastin, lê bi rastî ew ji xeyset û hazirîya Wî dûr dikevin?

## Fikira temîyê

Xudanê nama îbranîya wa dinivîse:

> "Tu şîretek niha dilê merîya şa nake, lê diêşîne. Lê belê, paşê yên ku bi wê *hînbûyîne*, bi vî cûreyî berê edilayê ji jîyîna rast distînitn" (Îbranî 12:11, NLT).

Nava vê xeberêda du fikirên girîng (ferz) hene. Ya ewlin, şîret, miqabilderketin, rastkirin û nîşandayîna şaşîyê *diêşînin*, lê piştgirî na. Ya duda, ew şîret derheqa kîjanîda xudanê nama Îbranîya dinivîse, bona jîyana pîroz hîn dike.

Niha em gerekê vê pirsê bidin: Xwedê çawa me hîn dike? Eger em paşda vegerine ser wan xebera yên ku Pawlos Tîmotêyora nivîsîn, wî çaxî hemû tişt zelal dibe:

> "Her pareke nivîsarên pîroz ji Xwedêda ruhdarkirîne û bona şîretkirinê, miqabilderketinê, rastkirina şaşîyê, *hînkirina* bona heqîtîyê kardarin, bona ku merivê Xwedê kamilbe, anegorî karê qenc sîlihkirîbe. Ez TEMÎYÊ DIDIM (te) bi hazirîya Xwedê û Mesîh Îsah, Yê ku wê dîwana saxa û mirîya bike, him bi hatina Wî, him bi padişatîya Wî Xeberê elamke û terîfke" (B Tîmotêyo 3:16-4:2, AMP).

We guhdarî da ser xeber û gotinên "şîret", "*miqabilderktin*", "şaşîyê rastkin", "*nava gunehda şîretkin"* û "*bi şikestî şîretkin*"? Lê we usa jî guhdarî da ser wê yekê, wekî kitêba Pîroz me *bona jîyîna bi emirê pîroz* hîn dike, û peyî wê yekêra Pawlos temî da Tîmotêyo û me, ku *Xeberê* (Încîlê) *terîfkin?* Bi hesabhildana van hemû gotina fikira vê temîyê eve:

> Tîmotêyo, û her quixçîkî Mizgînîyê: rastî ewe, wekî şîretê xwedêtîyê diêşîne, lê ew me bona jîyana pîroz hîn dike. Xwedê serkarîyê li şuxulkarîya vê şîretê dike, bi Xebera ji Xwedê ruhdarkirî, bi Încîlê, ya ku wî mêrî, yan jî wê jinê sîlih dike, yê (ya) ku gerekê ji navê Xwedê xeberde. Bo wê yekê jî Xeberê, Încîlê terîf bike, çimkî borcdarîya teye, ku tu nîşanî meriva bidî, ku şaşîyên jîyana wan kîjanin. Vê yekê meriv dikare Încîlê bi cûrê r'ast bide xebatê, bi hizkirin şîret bike, şaşîya rast bike û bona şikestîbûnê şîret bike. Eve ew şuxulkarîya xwedêtîyê, ya ku guhdarvana bona jîyana pîroz hîn dike.

Ez fem dikim, wekî eva yeka bi dereca civîna qurna (sedsala) 21-êye, wekî meriv dikare ecêbmayî bimîne. Feqet, em dixwezin ku civîna

me qewatbe, yan nava şaşîyêda be? Em dixwezin ku reqema merivên bi ruhanî saxlem zêde bikin, yan reqema yên xapîyayî? Ev bang hatine dayînê bona ku em bi nezanî ji dilê Xwedê dûr nekevin. Eger em dixwezin ku nava Îsada bi çareserkirî bişuxulin, em gerekê nava Încîlêda qewînbin. Ew yek tiştê bûyînê nîne ku em kûltûra xweye niha anegorî gotinên peymana Nû bikin. Werin em vê guhastinê bikin û emê civîna saxlem bivînin.

## Tiştê xwestinê, yan yê kardar?

Bi eyantîya ji Ruh stendî, Pawlos pêşda got, wekî wê qulixçî û bawarmendên başqe hebin, yên ku wê guhên xwe nedine ser van temîya û pêra jî encamên wane zyankar da kivşê:

> "Çimkî ew zeman tê, wextê ku (meriv) wê guh nedine hînkirina saxlem, lê xwestinên dilê xwera wan dersdara ser hev topkin, yên ku titşên ku guhê wan xweş tê, wê hîn bikin, yên ku bijartîne bona razîkirina şaşî û xwestinên wan, berbi kîjana ew xwe digrtin" (B Tîmotêyo 4:3, AMP).

Werin em bipirsin, ku kîjan tişt diha yên xwestinêne?: bangên piştgirîyê, şa, baş û sivik, yan yên usa, yên ku eşaretîyê didin, şaşîyê rast dikin û şîreta didin, usa jî şaşîyên meriva nîşan didin?

Hemû kes, ez jî t'evî wan, wê bixwestana, ku banga cûrê ewlin bibhîstana. Ez jî merivekî usame û ez jî berbi bangên bi optîmîstî xwe digrim. Eger bijartin hebûya, her merivek jî wê wî cûreyî bikira.

Eger du civînên li rex hev hebûna û we bizanibûya, wekî yekêda weyê terîfeke usa guhdar bikira, ya ku dijî gunhê we diçe, lê ya mayînda terîfa optîmîstîye û piştgirîyê dide, hûnê biçûna civîna duda. Pawlos digot, wekî evê biqewime: merivê *qencîyê* bibijêrin, lê ne ku Xwedê. Lazim nîne bipirsin ku kîjan diha ya xwestinêye, lê kîjan diha kardare.

Werin em bêqelpbin: piranîya meriva derheqa wê yekêda hiz nakin xeberdin. Feqet em vê yekê bi meselekêva şirove bikin. Merivek, navê kîjanî Stîve, li cem wî nexweşîya penceşêrê eşkere dikin. Ew kul nava stadîya destpêkêdane. Û bi rîya qelaştinê û dûrxistina wê kulê wê qezîyayê be sekinandinê. Doxtir dibêje wî: "Em dikarin bi qelaştina sivik wê kulê dûr bixin".

Stîv diçe li cem doxtirekî mayîn, yê ku bi lêkolînên doxtirîyêva mijûl nabe û dîna xwe nade wan nîşandayînên doxtirîyê, yên ku ewî wextê xwendina li ûnîvêrsîtêya doxtirîyê hîn dibû. Li wî doxtirî xweş tê ku ew doxtir be û alî meriva bike, lê bi cûrê xwe. Ew dibêje Stîv, wekî ew dikare ber xwe nekeve, çimkî hemû tişt başe û jîyaneke baş hîvîya wîye. Ev doxtira bi şabûn dibêje: “Stîv, saxlemîya te gelekî başe”.

Stîv sivikbûyî ji cem doxtirê duem diçe. Ew difikire: “Çiqwas doxtirekî başe. Ewî derheqa minda baş xeberda. Ewî piştgirîya min kir”. Serbara serda ew hinekî li ser doxtirê ewlin hêrsketî bû, çimkî meremê wî gelekî xirab bû û ewî hîvî dikir ku tiştekî usa bike, çi ku bona wî nefesal bû, wê wî biêşanda û xercê wî wê hebûya. Ewî gotibû Stîv, wekî halê wî nebaş bû. Ewî rast xeberdabû û piştgirîya Stîv nekiribû. Bi saya cûrê duem Stîv gumane, wekî tu tiştekî xirab li pêşîya wî tune. Feqet, piştî du sala halê wî xirab dibe û wî çaxî dibêjine wî ku jîyana wîye çend hevtîya maye, çimkî ew kula biçûk mezin bûye û bona wî bûye qezîya rast. Ew derbazî ser organên bedenêye mayîn bûye. Niha îdî tu qenckirin nikare alî Stîv bike.

Du sal pêşda diha hêsa bû guhdarîya doxtirê ku rîya başîyê dida pêşîya Stîv bikira. Feqet bona wê yekê çi lazim bû wî çaxî?: rastî, lefekî, mecalên rastkirina hal, yan xeberên baş? Stîvra gotibûn, wekî ew saxlem bû, lê bi rastî ew nexweş bû. Paşê îdî dereng bû. Xwezil wî çaxî ewî guhdarîya rastîyê bikira.

Gelo ew yek tiştê bûyînê bû, wekî civîna rojavayê bi ruhanî nava halekî wî cûreyîda bû, him qulixçî, him jî endamên civînê? Nava dîroka Îsraêlêda wedekî usa hebû, wextê ku qulixa rêberên ayîna dîn ji bangên başîyê bû. Ewana ji rû bi rû sekinanidnê xwe dûr dixistin û terîfên wana tenê yên optîmîstî bûn. Xwedê da kivşê ku çi cûreyî nêzîkî nêzîkbûna wî cûreyî dibe: “Ew qenckirinên sivik bona birîna mirinê, ya cimeta Min, pêşnîyar dikin. Ew didine bawarkirinê, wekî edilayîye, lê edilayî tune” (Yêrêmîya 8:11, NLT).

Tiştekî hewaskare, wekî bangên wane terîfkirî bi tu tiştîva ji wê şêwirê cuda nabin, ya ku doxtirê duda da Stîv.

“Terîfên wî li min xweş nayên”

Qebûlnekirina rastîyê û rastkirinê pirsgrêkeke (problêmeke) usaye, ya ku her dem hebûye. Ji padişên Îsarêlê yekî bona teşkîldarîke

mezin xwe hazir dikir. Ewî gazî bi seda şêwirmendên ruhanî kir û ji wan pirsî ku gelo progiramên wî wê bi açixî ser hevda bên, yan na? Mecala van şêwirmenda hebû ku rastîyê bêjine padiþê, lê ji wana her yekî got: "Belê, açixîya te wê hebe". Wana got, wekî teşkîldarîya padiþê wê gelekî baş ser hevda bê.

Padişê Cihûdayê dilê kîjanî hindava Xwedêda gelekî nazik bû, li wir hazir bû. Ewî dixwest rastî guhdar bikira, ku halê rast ji hev cuda bikira. Ewî dengê Xwedê texmîn nekir, lê hemû şêwirmendên ruhanî ew yek diwekilandin. Ew hela hê hîvîya wê xeberê bûn, caba kîjanê dilê wî wê bida.

Bi kutasî padişê Cihûdayê ji rêberê Îsarêlê pirsî:

Şêwirmendên teye başqe tunene, yên ku rast xeber didin?

Padişê Îsarêlê got:

– Bi rastî merivekî usa tenê maye, feqet ez wî hiz nakim. Ew tu cara tiştekî baş bona min terîf nake: tenê dibêje xirabkirin, xirabkirin, xirabkirin (G Padişatî 22:8, MSG).

Feqet, bona xatirê wî, padişê Îsarêlê emir kir ku ewî şêwirmendê "xirab" bînin serayê.

Navê wî pêxemberî Mîkîya bû û merivê padişê, yê ku ew dît gotê:

– Hemû pêxemberên mayîn mînanî merivekî bona padişê açixî têra dîtin. Bira gotina te jî anegorî ya wanbe: bi cûrê baş xeberde (G Padişatî 22:13, NIV).

Mîkîya got:

– Xudan saxe, ezê tenê usa bêjim, çawa ku Xudan temîyê bide min (G Padişatî 22:14, NLT).

Ewî usa jî kir. Gotina wî dewa rastkirinê dikir û wê yekê hêrsa padişê rakir. Feqet, eyan bû, wekî hemû şêwirmendên baş şaş derheqa feydayê teşkîldarîya padişêda xeberdabûn, lê Mîkîya rast bû.

Gelo şêwirmend û qulixçîyên mînanî Mîkîya roja îroyîn li kîderêne? Gelo em bona çi diha gelekî eşaretî û rastkirinên wan guhdar nakin? Bona çi kitêbên wana, yên ku banga jîyana pîroz li me dikin, nabine yên eyan?. Bona çi ew meriv wextê teglîfbûna li hemcivîna terîfkirên here eyan nînin? Bona çi ew nava qulixçîyada li «YouTube»-ê diha zêde nayêne temaşekirinê?

Xwedê, bi destê Pawlosê şandî temîyên xwe derbaz kirin, bona rêberkirina meriva, feqet em cûrekî mayîn hîn dikin. Carekê min tevî serwêrekî eyan nan dixwer, yê ku gote min:

– Con, eger tu dîna xwe bidî piranîya wan serwêra, civînên kîjana li welatên me yên açixin, têma terîfkirinên wan tenê guman, kerem û piştgirîye.

Alîkarekî wî serda zêde kir:

– Con, tu naxwezî hînkirinên xweye derheqa keremêda careke mayîn lê binihêrî?

Ewî nikaribû bi cûrê tam alîyê keremêyî qewatkirinê û guhartinê qebûl bikira.

Bêyî şikberî, em hewcê gumanê û piştgirîyêne, lê bona me usa jî rastkirin, şîret û nîşandayîna şaşîyê lazime. Hema ev jî Pawlos çawa *temî da* Tîmotêyo. Bona çi em gerekê şirîta xwekilandinê berbi alîyê mayîn cîh biguhêzin? Bona çi em gerekê eseyî ji herdu alîyê berk nava yekîdabin? Werin em wî hemû tiştî bidine meriva, çi ku Pawlos gote Tîmotêyo.

## Parçê sereke

Îzinê bidin ez meselekê bînim. Merivê fêlbaz û qelp, yê ku avtomaşînên xebitandî difroşe, wê her dem wê yekê bêje we, çi ku hûnê bixwezin guhdar bikin. Ewê wera bikene, lê we bide bawarkirinê, wekî hûn merivekî başin û aqilin, çimkî we avtomaşîna here baş li cem wî bijart. Hûn dikarin bifikirin: "*Kulfeta min jî usa piştgirîyê nade min*". Menî ewe, wekî kulfeta we we *hiz dike*, lê ew meriv lefekîya dike bona ku pera ji we bistîne. Bi vî cûreyî em parçê sereke, yê çêkirina banga dibînin, û ew *hizkirine*. Nava bedena Mesîhda bangên me gerekê bi hizkirinêva tijîbin û ji dilê rehm bikişin.

Carekê, cahilek piştî berevbûnê nêzîkî sivira frotana kitêbên min bû. Ewî bi ken got:

– Ez hatime gazîkirinê, wekî bi pêxembertî rastkirinê bînime civînê, çawa hûn.

Ji cûrê xeberdana wî min nerihetî texmîn kir. Min texmîn kir, wekî xwestina bêhurmetkirina meriva nava wîda diha zêde bû, ne ku fikirdarîya wîye bêqlpe derheqa wanda.

– Tu dixwezî sura pêxemberbûnê bizanibî?,– min jê pirsî.

Sifetê wî vebû: ewî xwe hazir kir ku şêwirê bona qulixa açix bistîne.

– Her car, wextê ku tu terîfa rastkirinê bela dikî, yan jî bangî meriva dikî,– min gotê,– tu gerekê bi temamîya dilva wana hiz bikî, berbirî kîjana tu dibî. Ev cahilê ecêbmayî li min nihêrî. Piştî çend deqîqa ewî got:

– Bi fikira min, Xwedê gerekê hela hê xebatê nava minda bike.

Ez bi wî cahlîva firnax bûm, çimkî ew li xwe mikur hat.

Gelek cara nava minda jî şerkarî diqewimî, girêdayî terîfkirina bangên rastkirinêra. Ez bi dil meriva, civînê û qulixçîyên Xwedê hiz dikim. Wextê nivîsara vê kitêbê, yan jî wextê terîfkirina bangên rastkirinê, dilê min diêşe, çimkî ez dixwezim piştgirîyê bidime meriva û wana îzbat bikim. Feqet ji alîkî mayînva ez zanim, wekî hizkirin lefekîya nake, ew rastîyê dibêje. Hizkirin wê yekê dibêje, çi ku bona saxlemkirina guhdarvanên wîye ruhanî lazime. Pawlos dinivîse, wekî em gerekê bi hizkirin rastîyê bêjin û wî çaxî bawarmendê bi ruhanî pêşda herin û wê nava Mesîh da bighîjin (binihêre Efesî 4:15).

Hebûne qulixçî, yên ku bangên rastkirinê û derheqa pîrozîyêda bi hêrsêva tijîbûyî elam kirine. Rehma dilê wan, ya hindava wan merivada, yan kêm bûye, yan jî qet tunebûye. Eva tiştekî tragîke û encamên wê gelekî giranin. Em hemû jî gerekê bi hizkirina hindava wan meriva pêşda bilivin, kîjana em terîf dikin, yan jî gerekê qet xeber nedin. Em gerekê bi dil berbi gulvedanê bicedînin, diha zêde, ne ku berbi tiştekî mayîn. Em gerekê usa nefikirin: “Ne min tera digot?”, “Ez diha zêde zanim, ne ku tu”, yan jî “Ez ji te baştirim”. Em gerekê merivara bi şabûn xeberdin û wanra tiştê herî baş bixwezin. Em gerekê peyîhatîyên xwe, yan jî her merivekî mayîn, kîjana em rast dikin, ji xwe girîngtir hesab bikin. Xwedê, Îsa Mesîh û Ruh hema bi vî cûreyî nêzîk dibin.

12

# HÎNBÛNA JÎYANA PÎROZ

“Birînên ji hevalên bêqelp diha başin
ne ku ramûsanên ji dijmin
— Gotinên Silêman 27:6, NLT

Her tiştek, çi ku pîrozîya Xwedê biçûk
dike yan jî hesab hilnade, bi şaşî
hizkirina Xwedê dinihêre, ew hindava
eyantîya Xwedêda dilsoz nîne,
ya ku bi saya Îsa Mesîh hatîye dayînê.
— Osvald Çembêrs

Şêwirmendê şexsî, pêşekî usaye, meremê kîjanî ewe ku alî meriva bike, ku ew cûrê jîyana xwe bidine milahîmkirinê. Pawlosê şandî ji alîkîva emir dike ku em bibine şêwirmendê ruhanî. Bi dînaxwedayîna Rêyên Xwedê, em tenê jîyana xwe baştir dikin, lê usa jî jîyana wana, bona kîjana em rola şêwirmendîyê mîyaser dikin.

Em nikarin rêyên Xwedê bidine milahîmkirinê. Adem û Hêwayê jî cêribandin wê yekê bikin û teribîn, û ketine nava halê feqîrîyê. Ew ji wan meriva yên ewlin bûn, yên ky cêribandin vê xêfiktîyê bikin. Dêmek çawa şêwirmend, em gerekê ne tenê şîret bikin, lê usa jî eşaretîyê bidin û rast bikin. Eger em rastkirinê nekin, em wî çaxî îzinê didin ku nava jîyana wan merivada, nava kîjanada em hukum dikin, ew bi rîya xirabbûnê pêşda herin. Eve menî, wekî Pawlos ber dilê Tîmotêyoda tê: “Tu çawa terîfkirê Xeberê gerekê nîşanî meriva bidî, ku jîyanên wan çi cûreyî şaşin” (B Tîmotêyo 4:2, AMP).

Nava destpêka nama bona civîna Efesîyêda Pawlos derheqa tebyeta meye nûda dibêje, ya ku bi kerema qewatkirinêye. Bawarmend dikare bi temamî jîyana xwe hema bi saya van her du tişta biguhêre. Bi vî cûreyî ew dikare xwe mînanî Mesîh bike û ji hemû qezîya dûr bimîne.

Pawlos cêrge temîya dide, yên ku derheqa jîyana nûda didine kivşê. Ev temî yên giran yan jî tiştê nebûyînê nînin, çawa temîyên peymana Kevin, lê tenê derheqa wê kirinêdanin, kîjanê em gerekê bikin, çimkî tebyeta meye nû heye: niha em peyîhatina vê navnîşê bixwînin:

> "Bira nava weda tu qavî, heramî yan jî timayî tunebe. Cîhê gunehên wî cûreyî nava cimeta Xwedêda tune. Gotinên bêmerîfetî, yan bêfemî, yan henekên qelpê xirab: ev hemû tişt bona we nîne. Dewsa wê yekê bira şikirdarîya Xwedê nava wedabe... bi şerabê serxweş nebin..." (Efesî 5:3,4,18, NLT).

Careke mayîn, eva mînanî navnîşa "îzin tune"-ye. Ez dixwezim careke mayîn vê yekê bidime kivşê: eva navnîşa temîya nîne, bi xweykirina kîjana emê xilazbin. Meremê vê navnîşê ewe, ku em xwe ji vê bêesilîya tevî dinyayê dûr bigrin, bona ku her dem nava hazirîya Îsaye eyankirîda bimînin. Îzinê bidin careke mayîn wan hemûya bînin ber çava:

- Derewa nekin.
- Guneha nekin, ku îzinê bidin, wekî hêrs serkarîyê li we bike.
- Nedizin.
- Xeberên qirêj, yan jî bêhurmetkirinê nedine xebatê.

Awa xalên navnîşêye mayîn:

- Bêesilîyê nekin.
- Heram nîbin.
- Tima nîbin.
- Gotinên bêmerîfet nebêjin.
- Tevî xeberdanên bêfem nebin.
- Henekên qelpê xirab nekin.
- Bi şerabê serxweş nebin.

Peymana Nû banga keremêye û hinek dibêjin, wekî nava banga keremêda temî û "îzin tune" tunene. Bona merivên vî cûreyî

ev navnîş, tenê kitêbeke peymana Nû da hatîye nivîsarê. Tiştê ecêbmayînêye, wekî ew navnîş ewî şandîyî hazir kirîye, yê ku eyantîya derheqa kûrayên keremêda stendîye. Bi fikira we, gerekê van temîya hesab hilnedin, yan gerekê bi cûrê fesal nêzîkî wanbin.

## Qabîyêra na

Xala ewlin, ya navnîşa meye nû eve: "*Qabîyêra na*". Çawa kur û keçên Xwedê, em gerekê qabîyê nekin û hetanî zewacê tevî tu kesî nekevine nava heleqetîyên bedenî.

Ez gelek cara rastî jin û mêrên usa hatime, yên ku tevayî dijîn, yên ku bawarmendin û mesîhîne. Ev yek li gelek cîha belabûyîye û ev yek li civînê jî belabûyîye. Ji van jin û mêra gelek li civîna diqesidin, derheqa hebandina xweda eşkere xeber didin û gelek cara bi şabûn gilî dikin, ku nava jîyanên wanda "Xwedê çi dike". Li cem wan tu nîşanke lêhilatinê, tengasîyê, yan jî kederê tune. Ew bawar nakin, wekî hetanî zewacê jîyana tevayî şane. Bo çi? Diqewime wana ji dika civînê bangên derheqa Xwedêparêzîyê û jîyana rastda nebihîstine, çawa ku Pawlos, Petrûs, Aqûb, Yûhenna û Cihûda terîf dikirin. Terîfên serwêrên wane rojên ledê (yekşemê) yên optîmîstî û piştgirîyêne, lê ne ku yên miqabilî gunehane. Wana bona jîyana pîroz şîret nekirine.

Nava civaka meda jîyana tevayî, pêşîya zewacê jîyana bedenîye tevayî û heleqetîyên du jina yan jî du mêraye tevayî qebûlkirîne û ew çawa tiştekî baş jî tê hesabê. Mixabin, zanebûnên mesîhîyaye vî cûreyî yên sivikin. Bêyî bi guhdarî lêkolînkirina Xebera Xwedê, ji me gelek meriva normên kûltûra me qebûl kirine. Gotina van merivaye sereke eve: "*Eger em hev hiz dikin, bona çi em tevayî nejîn?"*. Lê jîyana du mêraye tevayî (yan jî du jina)? Ew tiştekî belabûyîye, lê ne tenê nava jîyana wanda, yên ku civînêva girêdayî nînin.

Van axirîya malpereke fêysbûkêda jinek nîşanî min dan, ya ku berê qulixdarîkêda dixebitî. Niha ew bengîyî ser jineke mayîn bûye û wana qirar kirîye hev bistînin. Min bi kedereke mezin şikilên wan û şikilên nîşanîya wan dinihêrî.

Berê merivên ku ji Xwedê paşda vekişîyayî bûn derheqa paşdavekişandina xweda zanibûn. Feqet wê jinê bi şabûn derheqa

hizkirina Xwedê û derheqa xwepêşkêşkirina hindava Xwedê da xeber dida. Ew çawa dikare jineke din bistîne, wextê ku Îsa zelal dibêje: “Gelo we Încîlêda nexwendîye, wekî Efrandar pêşda mêr û jin bona hev çêkirin, nêr û mê…çawa ku Xwedê ev yektîya tebyetî çêkir, tu kes gerekê xebata efrandarîya Wî heram neke” (Metta 19:3-6, MSG). Îsa dide kivşê, wekî zewac bona mêrekî û jinekêye, dêmek bona du qisma. Bona çi ew jin haj pê tune, wekî ew îzbatîya ji alîyê Xwedêda hîmdanî heram dike? Gelo ji dika civînê derheqa wê yekêda zelal nehatîye gotinê?

Ez fem dikim, wextê ku civak ji meremê Xwedêyî pêşine derheqa zewacêda dûr dikeve. Tebyeta merivên xilaznebûyî ya gunekare. Mêr û jinên li vê dinyayê undabûyî bêyî Xwedê dijîn û zanebûna wane derheqa qencîyê û xirabîyêda sînorkirîye. Xwexweykirina wan gerekê beşera me xirab neke, çimkî ew usa difikirin û usa dikin, çawa ku tebyet dibêje wan. Ew yek xemgîn dike, wekî bawarmend wê yekê qebûl dikin, çi ku ev dinîya hesab dike çawa tiştê qenc û usa jî nav dike çawa ji alîyê Xwedêda qebûlkirî. Anegorî lêpirsînên sosîyologî, li civîna fikira piştgirîya bona jîyana yekqismê (jin jinê distîne, yan jî mêr mêr distîne) zêde dibe. Feqet, civîn ne ku bi xeberê piştgirîyê dikin, lê usa, bi bêdengîyê. Bi guhdarî van gotina bixwînin:

> “Eger merivekî heq ji heqîtîyê berê xwe vedigerîne…ewê bimire: çawa ku te eşaretî nedane wî: ewê bimire nava gunehê xweda û kirên wîye heq, yên ku ewî kirine, wê neyêne bîr, feqet Ezê dewa xwîna wî ji destê te bikim” (Hezeqêl 3:20, AMP).

Ev gotina bona bawarmenda derheqa eşaretîya bona merivê heqe. Eger em derheqa gunehên wanda eşaretîyê nedine bawarmenda, encamên wê yekê wê gelekî xirabbin.

Diqewime hûn minra qayîl nebin, bêjin: “Feqet Con ev yek peymana Kevinda nivîsare. Tu çawa dikarî bêjî, wekî nava wedê peymana Nûda ji destê quliçîya wê dewa xwînê bê kirinê?”.

Carekê min li hemcivînekê terîf dikir, li kîderê serwêrek hema vê pirsêva dijî min derket. Ewî bi hêrs got:

— Hûn çawa dikarin bêjin, wekî ji destê me wê dewa xwînê bê kirinê? Ew yek peymana Kevinda nivîsare.

Min gotê:

– Hûn dikarin kitêba Karên Şandîyada serê 20-î vekin û bona min xeberên 26 û 27-a bixwînin?

Wî serwêrî bona min ev xwend: “Ez *ji xwîna we her yekî* paqij û bêsûcim û bona wê yekê cabdar nînim. Çimkî min xwe neda paş, temamîya qirara Xwedê wera got” (AMP).

Wî serwêrî ecêbmayî li min nihêrî û got:

Con min ev para xwendibû, lê min tu cara ev yek nedîtibû. Ez hîvî dikim, ku tu min bibaxşînî, wekî min te gunehkar dikir. Min bêqelpîya wî qîmet kir.

Ez niha dixwezim berbirî rêberên civînê bibim. Raste, wekî Pawlos ev xeber bona rêberên li Efesê, yên ku ji alîyê wîda hatibûne kivşkirinê, digotin, lê emê jî gunehkarbin, eger qirara Xwedê bi temamî elam nekin, wextê ku em cimeta Wî hîn dikin û terîf dikin. Eger em tenê bangên “baş” terîf bikin, emê piranîya qirara Xwedê veşêrin. Wî çaxî merivên me wê berbi qezîya vê dinyayê bicedînin, mînanî zarokên neterbyetkirî, yên ku ji fikirdarîya rast dixalifin û destpê dikin tiştên bêfemî bikin. Eger wî cûreyîbe, xwîna wan wê li ser destên mebe.

Îzinê bidin ez meselekê jî bînim. Min bi weşana întêrnêtê temaşe dikir ku çawa serwêrekî elamî endamên civîna xwe kir, ku ew bi xwe ji alîyê zewacêda mêra hiz dike. Ewî gilî kir, ku ji xweveşartinê îdî westîyaye: ewî dixwest, wekî merivên başqe jî derbazî jîyana wî cûryî bûna û her dem lêhilatî texmîn bikirana (ewî xebera “gunehkarî” dida xebatê).

Ewî yeko-yeko hemû gotinên Încîlêda, kîjana derheqa fikira Xwedêye derheqa zewaca yekqismêda bûn, elam dikirin û yeko-yeko ew bêhurmet dikirin. Peyî wê yekêra ewî gote temaşevanên xwe: “Pawlosê şandî gelekî baş derheqa wê yekêda xeber dida, wekî em “nava Mesîhda”-nin, feqet ewî gelekî xirab heleqetîyên merivatîyê fem dikirin”. Bi van xebera ewî gotinên Pawlose derheqa jîyana heleqetîyên bedenîda hêç kirin, paşê wî serwêrî xeberdana xwe berdewam kir û got, wekî Pawlos para Romayîyaye ewlinda, şaş bibû, wextê ku dinivîsî, wekî em nava feydayên qebûlkirinekirina Xwedêda berbi robetîyên yekqismê diçin” (binihêre Romayî 1:21-27). Bi gotina wî sewêrî nivîsara Pawlosê şandî nikare rastbe, çimkî “nîvê qulixçîyên Amêrîkayêye ruhanî, yên wî cûreyîne” (Tiştekî hewaskare,

wekî hesabkirinên kîjan lêkolînê ewî didane xebatê?). Min terîfkirina wî temaşe kir û min dît, wekî tevbûyên civînê nava wî wedeyîda çend cara li ser pîya destê xwe li hev xistin.

Peyî wê yekêra, wextê ku min xeberên vî serwêrî yên navhevxistî guhdar kir, Xwedê minra xeberda û got: "Para ewlin, Romayîya bixwîne". Awa li wir nivîsare:

> "Bona vê yekê Xwedê ew dane bênamûsîyê. Heta jinên wan jî hewcetîya xweye edetê dinyayê hewcetîya eksîedetîyêra guhêrîn. Usa jî mêra hewcetîya jinaye edetî hiştin, pê temên xweye xirab bi hevra şewitîn. Mêra tevî mêra robetî dikirin û heqê xweye qazanckirî hildidane ser xwe. Ewana ha ji rastîya qanûna Xwedê hene, ku yên van tişta dikin, hêjayî mirinêne, lê belê, ne ku tenê van tişta dikin, lê usa jî helana didine merivên mayîn, ku wê yekê bikin" (Romayî 1:26,27,32, NLT).

Gelo ewê qulixçî çawa dikaribû ew gotin bêhurmet bikira, bi kîjanê dihate gotinê, wekî heleqetîyên wî cûreyî yên şermêne. Hewce nîne, wekî meriv merivê ruhanîbe, wekî fem bike, ku kirina wî cûreyî tiştê tebyetî nîne. Heywan jî tiştên usa nakin. Bo çi em difikirin, wekî Xwedê wê yekê hesab hilnade, qebûl dike, yan jî helana dide wê yekê?

Derheqa wan merivada bifikirin, yên ku hela hê nava hebandinêda îzbatbûyî nînin û şerkarîyê dijî vê xwestinê dikin. Gelo wê çawa bibe, eger ew vê bangê guhdar bikin. Wijdanê wa dibêje: "Kurê Xwedê gerekê usa neke". Mixabin, gotinên vî serwêrî wê bona kerkirina dengê wane hundur bê xebitandinê. Ew ne tenê xwe li ber dîwanê dide sekinandinê, lê serbara serda helanê dide yên mayîn, ku ew jî wî gunehî bikin.

Lê gelo meriv dikare derheqa wê yekêda çi bêje, wextê ku li civînê meriva li ser pîya destê xwe li hev dixistin?. Nava tercima Încîlêye "Êmplîfaydê"-da nava Romayî 1:32-da nivîsare, wekî ewên, ku "*begemîyê didine wê yekê û destê xwe li hev dixin* yên ku dikin" tiştên vî cûreyî, hêjayî dîwanêne.

Wî çaxî em van xeberên Pawlosra çi bikin?

> "Çima hûn nizanin, ku yên neheq wê Padişatîya Xwedê war nebin? Xwe nexapînin. Yên ku xwe didine bênamûsîyê, yan jî ewên ku pûtparistin, yan zinêkarîyê dikin, yan jî qundetîyê dikin, yên ku konene, yan dizin, yan timane, yan serxweşin, yan jî yên ku zordarîyê dikin, yan jî meriva dixapînin ji vana tu yek wê padişatîya Xwedê war nebe" (A Korintî 6:9,10, NLT).

Tiştekî ber çavaye, wekî gelek gunehên zyandar jî hene. Feqet em gerekê wê yekê hesab hildin, ku ev gotin derheqa kirinên vî cûreyî, yên ji jîyana rast xalifîda eyan dikin.

Rîya vê dinyayê jehrkirîye. Eger em ji dika xwe rastîya derheqa vê yekêda elam nekin, wî çaxî merivê nizanibin, ku kirên Xwedêparêzîyê kîjanin û wê ji alîyê xirabîyêda bên xapandinê. Ewê wê yekê qebûl bikin, çi ku ev dinîya çawa tiştê qenc hesab dike û wê yekê jî hesab dike çawa ji alîyê Xwedêda qebûlkirî.

## Heramîyêra na

Xala bi sirê, ya navnîşa "îzin tune" eve "*heramîyêra na*". Em gerekê ji pornografîyayê, ji hemû vîdêoyên bêmerîfet û fikirên ku daxwezê dikin, dûr bimînin. Îsa dibêje: "Her merivek, yê ku eger bi temê başqe jinê dinihêre, ewî îdî dilê xweda tevî wê zinêkarî kirîye" (Metta 5:28, NLT). Zebûr dinivîse: "Ezê tu tiştekî bêmerîfet, yan heram daneynime li ber çavên xwe" (Zebûr 101:3, AMP).

Pornografîya texmînkirinên me dide pêşixstinê û razîbûnê dide wana, çimkî ew yek li tebyeta meye bedenî xweş tê. Feqet, pornografîya karebûna meye tevî merivê li rex me, yan jî nêzîkbûna tevî Xwedê xirab dike. Nava feydayên wê yekêda li cem me nerazîbûn hindava merivê li rex me û usa jî hindava meda pêşda tê. Tê texmînkirinê, wekî pornografîya pirîskeke biçûk dide, lê ew pirîsk dikare şaşbûnê pêşda bîne, usa jî pêra texmînkirina guneh, şermê û bêçareserîyê pêşda bîne.

Hetanî van axirîya saytên pornografîk nava întêrnêtêda yên here zêde bûn, ku dihatine temaşekirinê, lê saytên sosyalî niha ji wana zêdetir bûne. Ji deh sayta, ji yekê zêdetir sayta pornografîke. Ji 40 mîlyonî zêdetir amêrîkî her dem dikevine wan sayta û her deqe pornografîyayê temaşe dikin.

Gilî tenê derheqa mêrada nîne. Ji pênc jina yek, here kêm hevtê carekê, yan du cara întêrnêtêda pornografîyayê temaşe dike û gelek dibêjin, wekî nikarin dijî xwestina xweye xwerazîkirinê derkevin. Him mêr, him jî jin ji întêrnêtê der jî kovara û kitêbên wî cûreyî dixwînin.

Feqet li civînê çi diqewime? Kovara "*Mesîhîtî roja îroyîn*" lêpirsîn derbaz kirîye û hîvî ji cêrge serwêra kirîye, ku ew bêjin, wekî nava

sala derbazbûyîda gelo ew ketine sayta pornografîk. 55 selefê ku hatine lêpirsînê gotine, wekî ketine wan sayta. Ev jî rêberên meye civînêne!Lêpirsînên mayîn didine kivşê, wekî ji 50-î selefî zêdetir mêrên mesîhî pornografyayêva girêdayîne, lê lêpirsîna ji alîyê kanala têlêvîzîonêye “CNN”-êda derbazkirî dide kivşê, wekî 70 selefê mêrên mesîhî dijî wê yekê şerkarîyê dikin.

Dêmek em gerekê pirsê bidin, ku gelo diqewime, wekî ev nexweşî, ya ku îro belabûyîye, rûyê wê yekêda pêşda hatîye, ku ji dikên civîna bangên optîmîstî tên terîfkirinê.

Hetanî 27-salîyê pirsên mine pornografîyayêva girêdayî hebûne. Wî çaxî îdî çend sal bûn, wekî ez nava qulixêda bûm. Ez guman bûm, wekî ew guneh wê wî çaxî bisekinîya, wextê ku min keçeke bedew bistenda. Feqet ew yek nesekinî, lê diha giran bû. Wê yekê di navbera Lîzayê û minda dîwar çêkir. Hetanî payîza sala 1974-a ez ji wê yekê aza nebûm, wextê ku min derheqa wê yekêda qulixçîkîra gilî kir. Ewî raste-rast minra got: “Terka wê yekê bide”. Ew bi cûrê berk li min hilat. Min ji alîyê wîda banga helandayînê nestend, lê min eşaretî stend, kîjanê xofa Xwedê li cem min pêşda anî.

Gotinên vî merivî nava jîyana minda destpêka gerê anî û min destpêkir Xwedê bigerim, ku ji wê yekê azabim. Piştî neh meha ez tam ji wî gunehî azabûm û hetanî roja îroyîn jî ez nava azayêda dijîm. Min eyan kir, ku kerema Xwedê çiqwas qewate. Ew dikare merivekî aza berde, yê ku ji 11- salîyêda pornografîyayêva hatibû girêdanê. Eva menîya bi sirêye, ya ku kederê li cem min pêşda tîne, wextê ku ez dibînim, wekî serwêr hemû alîyên kerema Xwedê hîn nakin. Eger min kerem eyan nekira, ne tenê çawa pêşkêşa belaşdayî, afûkirina guneha û xilazbûn, lê çawa qewata Xwedê, ya ku îzinê dide, ku ez ji karebûnên xweye tebyetî zêdetirbim, ezê hetanî niha nava wê girtinêda bûma.

## Timayêra na

Şirovekirina xebera “timayî” eve: “cedandina qewat û xwehizîyêye berbi tiştekî, xwezima hebûnê, serwêrtîyê, yan jî xwerinê”. Gelo bawarmend çiqwas cara rûyê timaya xweda sozên Xwedê navhev dixin, yên ku derheqa duakirinêdanin, ku em bibine açix û gulvedayî.

Ew li ser xwe guhdarîyê didine merkezkirinê, lê ne ku bona wê yekê dikirin, ku qulixî meriva bikin û mecala duakirinê bidin. Timayî yan jî çavbirçîbûn pûtp'aristîye (binihêre Kolosî 3:5). Wextê ku em timane, em xwestinên xwe, cedandin û navê xwe û fînansên xwe diha bilindtir hesab dikin, ne ku Xwedê û merivên mayîn.

Meriv dikare gelek serhatîya derheqa wê yekêda gilî bike, ku çawa timayî dikeve nava jîyana bawarmenda. Balam heleqetîyên xweye tevî Xwedê hema rûyê vê yekêda unda kirin, çawa usa jî Kayên, Korx û gelek merivên mayîn, yên ku wextêda nava hazirîya Xwedêda bûn. Gelek dikevine nava timayê, çimkî eşaretî nestendine. Em gerekê bi saya hînkirina û terîfa eşaretîyê bidine meriva, lê bona wê yekê lazime terka terîfkirina bangên wa gotî baş û optîmîstî bidin. Eger em dixwezin, alî meriva bikin, ku ew nava Mesîhda bighîjin, em gerekê ne tenê *hîn bikin*, lê usa jî *eşaretîyê bidin* (binihre Kolosî 1:28).

Wextê ku ez zarok bûm, li min xweş dihat, wextê ku dê û bavê min ez hîn dikirim, lê min guhdarî nedida li ser eşaretîyên wan. Feqet, paşê ez pê hesyam, wekî hema eşaretîyê jîyana min xilaz kir. Eger bavê min eşaretî neda min, wekî ez bi cûrê rast tevî xetên êlêktrîkî bixebitim, minê cûrekî mayîn ew yek bikira û ezê ji ênêrgîya êlêktrîkî bihatama kuştinê.

Pawlos gote civîneke xweye hizkirî: "Hişyarbin û bîr bînin, wekî sê sala ser hev ez nesekinîme, şev û roj bi hêsira min eşaretî daye her yekî" (Karên Şandîya 20:31). Her roj û şev nava sê salada! Û ewî ew yek bi hêsira dikir! Gelo em eşaretîyê didine meriva? Gelo em wê yekê her roj dikin? Yan em terîfkir û dersdar, gumana me heye, ku bangên me wê guhdarvanên me ji timayê dûrxin? Gelo ev yek me xemgîn dike? Eva îdî salên dirêjin, ku min tu bangeke derheqa dûrketina ji timayê nebihîstîye.

Pawlos ew şandîyê, ku derheqa keremêda terîf dikir, dîsa qîrînîya dilê xwe dida berbi civîna Efesê, usa jî mera digot: "Nekevine nava timayê".

Niha xeberên Aqûbê şandî guhdar bikin:

> "Şer û dewên nava weda ji kîderê tên? Gelo ew ji wan xwestinên weye xirab pêşda nayên, yên ku dilê weda şer dikin? Hûn wê yekê dixwezin, çi ku li cem we tune û hûn tişta teşkîl dikin... bona ku wê yekê bistînin. Hûn çavnebarîyê bona wî hemû tiştî dikin, çi ku yên merivên mayînin, lê hûn nikarin wana dest bînin. Hûn şer dikin, ku wan tişta ji wana bi destê zorê

bistînin. Hûn dest naxin, çimkî hûn hîvî ji Xwedê nakin. Lê gava hûn hîvî dikin, hûn nastînin, çimkî menîyên we şaşin, hûn tenê wê yekê dixwezin, çi ku kêfa dilê we dixweze. Bêesilno" (Aqûb 4:1-4, NLT).

De, Aqûb, awqas jî bi cûrê xirab rexne neke, gelo ev şandî merivekî dilsar û gelekî berk bû? Yan ewî ew meriv hiz dikirin, kîjanar'a ewî dinivîsî? Diqewime ew bû menî, wekî ewî rastîya ku mêriv tîne ser hişê wî, xeber dida, dewsa wê yekê, wekî bangên optîmîstî tên terîfkirinê? Diqewime Xwedê hema rûyê wê yekêda ew da xebatê, ku pareke peymana Nû bihata nivîsarê û wan roja yekî mayîn bibijarta, yê ku wê bangên ruhdarkirinê hazir bikira.

## Gotinên bêmerîfetra na

Xala bi sirê, ya navnîşa meye "îzin tune" eve: "*tevî xeberdanên bêfem nebin* û gotinên bêmerîfet û henekên wî cûreyî gilî nekin". Nava vê xalêda usa jî temaşekirina vîdêoya û guhdarkirina stirana, yan jî dengnivîsara hene.

Ji min hîvî kiribûn ku ez alî komeke cahila bikim, yên ku endamên koma qulixdarîyê bûn. Ew ketibûne nava şaşîyê, çimkî serwêrên wan xeberên qirêj didane xebatê, henekên xirab dikirin û xeberdana wana bi tu tiştîva ji xeberdana merivên undabûyî cuda nedibû. Bona çi serwêrên wan usa dikirin? Diqewime, wekî em rêberên Xwedê û cimetêra nabêjin: "Kirên wî cûreyî bona welatîyê Padişatîyê cayîz nînin".

Pawlos Kolosîyara dinivîse: "Bira xebera we keremêva tijîbûyî be û balkêşbe" (4:6, NLT). Xebera me gerekê keremêva tijîbûyî be.

## Serxweş nebin

Xala mayîn: (*serxweş nebin*), ne bi avcehê (bîra), ne bi şerabê, ne jî bi îçikeke alkohole mayîn (em dikarin wê yekê usa jî derheqa narkotîkada bêjin, dixwezî derheqa yê qanûnî, yan jî neqanûnîda û usa jî derheqa yên ku ji alîyê doxtiranda tên pêşnîyarkirinê). Careke mayîn em bêjin, wekî tiştek heye, ya ku îzin tune.

Alkohol tiştekî balkêşe (binihêre Gotinên Silêman 23:31-33). Ew dikare rihet me berbi xwe bikişîne, bona ku em zêde vexun û fem nekin, ku kengê gerekê bisekinin. Alkohol fikirdarîya rast kêm dike,

yan jî bi temamî dide hildanê. Qedexekirin nayêne hesabhildanê û şuxulkarîya ku fikira tebyetî û dil diparêze, îdî hukumî li ser mêriv nake. Vê yekê meriv dikare himberî sîstêma bêqezîyabûnê, ya di navbera tora hundrê întêrnêtêda bike. Fikirdarîya rast bere-bere kêm dibe û em bona fikirên zyandar diha vekirî dibin. Alkohol sîstêma parastinê, ya mejûyê me dide dûrxistinê. Carna jî eger em zanin, ku norma me kîjane û em dikarin ji wê zêdetir venexun, diqewime, ku em bi nezanî yên mayîn berbi vexwerinê defdin. Îzinê bidin ez serhatîkê gilî bikim.

Serwêrekî civîna li rêstoraneke bajarê xwe alkohol dida xebatê. Endamekî wê civînê, yê ku van axirîya paşda vegerîya bû, hema li wê rêstoranê xwerin dixwer. Ew bîznêsmênekî dewletî bû, yê ku hetanî xilazbûnê rastî problêmên tevî alkoholê dihat Piştî paşdahatina xwe ewî îdî alkohol nedida xebatê. Ew ji wan meriva bû, yên ku “bi cûrekî ji jîyana xapandinê revîbû” (B Petrûs 2:18, NLT).

Peyî wê yekêra hinek wede derbaz bû û ew bîznêsmên sê rojada nava serxweşîyêdabû. Nava sê rojada ewî qirarên usa qebûl kirin, wekî rûyê wê yekêda hemû fînansên xwe unda kirin. Tiştê herî xirab jî ew bû, wekî ewî malbeta xwe unda kir. Piştî hinek wede ji wî pirsîn, ku ewî bo çi usa kirîye? Ewî got: “Min dît, wekî serwêrê min alkohol dida xebatê û ez fikirîm, wekî *eger îzina wî heye, usaye îzina min jî heye”.*

Bi rastî bona bijartina şaş ew bi xwe cabdare, lê gelo ev qewimandin gerekê me mecbûr neke, ku ew hukumê me hesab hilidin, yê ku li ser merivaye.

Van axirîya îdî gelek qulixçî aza alkoholê li cîhên civakî didine xebatê. Ew xeberê Încîlê didine xebatê, ku bidine kivşê, wekî îzina wan heye. Ji wana yek A Tîmotêyo 3:3-ye, kîjanêda Pawlos dibêje Tîmotêyo, wekî rêberên civînê gerekê “şerabhiz” nîbin. Nava yûnanîda xebera “*paroînoû*” tê xebitandinê, şirovekirineke kîjanê anegorî “*Ferhenga lêkolîna xeberên Încêlêye tam”* eve: “Şerabêva girêdayî, serxweş”. Ev xebera çawa cabdarê alkoholê û xebitandina wêye norme nade kivşê, lê dide kivşê, xebitandina şerabêye her dem. Bi vê xeberê merivek tê ber çavê me, li ber kîjanî şûşê alkholê danîye û ew pêva girêdayîye”. Tercima “Nyû Lîvîngê” ev gotin vî cûreyî şirove kirîye “…serxweş nîbe” (A Tîmotêyo 3:3, NLT).

Pareke mayînda jî Pawlos şêwirê dide Tîmotêyo: "...hinek şerab bona cîhê mihandina xwerinê û bona ku tu zû-zû nexweş dikevî, bide xebatê" (A Tîmotêyo 5:23). Tîmotêyo meriv dikare hesabke serwêrê civîna Efesêyî sereke. Roja îroyîn gelek qulixçîyên civînê difikirin: "*Eger rêberê civînê gerekê nêzîkî şerabê nebe, mînanî nivîsarên peymana Kevin, Pawlos temî neda Tîmotêyoyê serwêr, ku şerab bida xebatê, hema bona kara wêye bo saxlemîê*". Ew para, ku gelek cara tê gotinê, ewe, wekî Îsa av kire şerab (binihêre Yûhenna 2:1-11). Fikira wê eve: "Îsa wê wextê berevbûna civakî av nekira şerab, eger îzina vexwerinê tunebûya".

Eger em van gotina hesab hildin, wî çaxî meriv dikarin bêjin, wekî ew serwêrê, ku li cîhê civakî alkoholê dide xebatê, rast kirîye. Feqet em nava civakeke usada dijîn, li kîderê vexwerina alkoholê bi berfirehî belabûyîye. Hersal li Ctatên Amêrîkayêye Yekbûyî rûyê qewimandinên ku alkholêva grêdaîyne nêzîkî 88 hezar meriv dimirin. Li vir xebitandina alkoholê, serxweşî tê hesabê, kîjan menîya mirinêye sisîyaye. Sala 2007-a rojnama "Waşîngton post"-ê nivîsîye, wekî li Amêrîkayê her merivê sisîya t'evî alkoholê nava problêmada bûye. Anegorî hesabên "Înstîtûta alkoholîzmêye miletîyê"-ê sala 2012-a 25 selefê welatîyên ku bûne 18-salî elam kirine, wekî meha derbazbûyî ew nava serxweşîyêda bûne. Ev hesab mêriv didine tirsandinê, çimkî usa dertê, ji çara yek nava mehekêda nava wî halîda bûye. Min dikaribû hesabên sosyologîye diha zêde bianîyana ber çava, lê fikira vê yekê ewe, wekî amêrîkî hindava alkoholê aktîvin.

Xebitandina alkoholêye ji normê der, ne tenê li Ştatên Yekbûyî belabûyîye. Sala 2012-a li temamîya dinyayê şeş selefê menîyên mirinê hema vexwerina alkoholêva girêdayîye. Li temamîya dinyayê xebitandina alkoholêye ji normê der, faktora mirinê, yan jî nexweşîyêye. Ji15-a hetanî 49-salî ew meriv nava wê komêdanin.

Nava qewilên vê nexweşîya alkoholêda, em çawa bawarmendên cabdar gerekê gavekê pêşda herin. Em gerekê diha berfirehî wan gotina bidine xebatê, kîjan Pawlos dan, yên derheqa xwerina goştê qurbana pûtada. Ew dinivîse: "Eger ew çi ku ez dixum, bawarmendekî mayîn berbi guneh def dide, wî çaxî ezê goşt nexum, wextê ku dijîm, çimkî ez naxwezim bibime menîya şimitandina bawarmendekî

mayîn” (A Korintî 8:13, NLT). Pawlos zelal dibêje, wekî xwerina goştê qurbanîya pûta guneh nîne. Feqet ewî got, ku eger rûyê wê yekêda birayekî diha zeyf tê xapandinê û nava bawarîyêda dişimite, wî çaxî ewê îdî nexun.

Meriv dikare mesela pêşda bikişîne, kîjan dikarin hinekî mafê mesîhîyaye xebitandina alkoholê biparêzin, lê çawa bawarmend (xwezima ew, yê ku li civînê rêberin), em gerekê bersiva vê pirsê bidin. Gelo em dixwezin bibine kevirê wê xapandinê, bona wan meriva, yên ku çetin ji gunhê vexwerina alkoholê aza bûne, yan careke mayîn wana berbi wê yekê bişînin, bi hesabhildana wê yekê, wekî em nava civakeke usada dijîn, wekî xebitandina alkoholê ji normê der nikare bê kontrolkirnê. Eger ew serwêrê ku li rêstoranê alkohol vedixwer, bi wê serwaxtîyê bûya, diqewime ewê bîznêsmên ji ewê tragêdîya vexwerina sêroje dûr bima.

Em gerekê ji her cûrekî vexwerina alkoholêye ji normê der birevin. Ev kirin ne cayîzî kurê Xwedêye û eva pirseke biçûk nîne. Me eşaretîke berk stendîye: “Çima hûn nizanin ku yên neheq wê Padişatîya Xwedê war nebin? Xwe nexapînin. Yên ku xwe didine bênamûsîyê, yan jî ewên ku pûtparistin, yan zinêkarîyê dikin, yan jî qundetîyê dikin, yên ku konene, yan dizin, yan timane, yan *serxweşin*, yan jî yên ku zordarîyê dikin, yan jî meriva dixapînin, ji vana tu yek wê padişatîya Xwedê war nebe” (A Korintî 6:9,10, NLT).

Alîkî girîng jî heye, kîjanî em gerekê hesab hildin. Em nava leca ruhanîdanin û Serkarê me temîyê dide me, “… ji her giranîkê azabin, ya ku pêşdaçûyîna me dide sistkirinê, xwezima ji wî gunehî, yê ku hêsa me dike nava telê” (Îbranî 12:1, NLT). Hene guneh, yên ku diha bi hêsanî dora me digrin, ne ku yên mayîn. Vê yekê meriv dikare nava meselên li jorê anî bibîne, kîjanada tê kivşê, wekî ji normê der xebitandina alkoholê cîhekî bilind digre. Dêmek, hêjaye tevî tiştekî usa bikevine nava lîstika hizkirinê, ya ku gelek meriv unda kirine.

Çawa tomerîkirin, em pirsekê bidin: bona çi bi heyîna cêribandina tijîbûna Ruhê Pîroz meriv dicedîne bona stendina edilayê, yan jî sivikkirina sertbûnê berbirî tiştê wî cûreyî bibe? Diqewime, wekî em tenê bi navkirin bi Ruhva tijîbûyîne, lê ne ku bi cêribandinê û bo wê yekê jî hewcetîya mecalên başqe pêşda tên?

## Nexapin

Ji nama Efesîya me tenê serîkî kitêbê lêkolîn kir. Peymana Nûda gelek temîyên başqe jî hene. Careke mayîn bîr bînin, wekî hûn van temîya bona xilazbûnê xweyî nakin, lê cûrê jîyanêyî vî cûreyî bona wan meriva cudaye, yên ku nava hazirîya Xwedêda dijîn.

Awa Pawlos çi cûreyî navnîşa xweye "îzin tune" tomerî dike:

> "Ji wan meriva nexapin, yên ku dicêribînin van guneha afûkin, çimkî hêrsa Xwedê wê li ser wanda bibare, yên ku gura Wî da nînin. Tevî tiştên usa nebin, kîjan ew meriv dikin…fesal qirarkin, ku çi li Xudan xweş tê. Tevî kirên xirab û tarî nebin, dewsa wê yekê wana eşkere bikin. Hema xeberdana derheqa wan tiştada jî, çi ku ew merivên bêxwedê veşartî dikin, şerme…dêmek, fesalbin, ku hûn çawa dijîn" (Efesî 5:6,7,10-12, NLT).

Ji wan meriva nexapin, yên ku dicêribînin gunehên xwe afû bikin. Encamên wan wê gelekî xirabbin. Em gerekê fesal, lê ne ku bi cûrê sivik qirar bikin, ku nava jîyana meda çi li Xwedê xweş tê. Ji me gelek meriv usa dikin, tê bêjî em nava meydana lîstikêdanin, lê bi rastî em nava deşta şêrdanin. Em nava şêrdanin, serên me nîşangeha dijminin û ew bêyî rihetî dişuxule, ku me tune bike. Feqet eger em nava ronahîyêda bimînin, ewê biteribe, çimkî nava jîyana meda kerema Xwedêye ecêb heye.

Ez dibêjime we: berbi vê jîyana bilind herin. Gumana xwe bidine ser keremê, bona ku hûn bi jîyana xwedêparêz û paqij li vê dinîya herambûyî û ya ku dimire, bijîn. Ew hemû tiştên we hene, kîjan lazimin, çimkî Xwedê tebyeta Xweye xwedêtiyêye belaş daye we. Badîhewa xerc nekin, ne jî badîhewa kerema Xwedêye ecêb qebûl bikin.

# MENÎYA ME

“Bona vê yekê ezê her gav derheqa van tiştada
bînime bîra we, nenihêrî wê yekê, wekî hûn îdî wana zanin
û nava wê rastîyêda hîmgirtîne, ya ku hûn hîn bûne.
Û ezê vê yekê jî rast bibînim wekî heta vî qalibîdame, bînime bîra we.
Çimkî çawa ku Xudan Îsa Mesîh nîşanî min da, ku ezê
zûtirkê vê jîyana li ser dinyayê bihêlim:
ku peyî çûyîna minra jî hûn her van tişta bîr bînin.
— B Petrûs 1:12-15, NLT

...Em hesab dikin, wekî dûrketina ji hevaltîya
Xwedê tiştê tek-tenêyî xirabe, û bûyîna hevalê
Xwedê em hesab dikin tiştê tek-tenê, yê ku
layîqî qedire û hêjaye wî hiz bikin.
— Grîgor Nyûsasî

Banga jîyana pîroz ne pêşnîyare, ne jî şêwire. Eva tiştekî usa nîne, berbi çi em dicedînin, lê bi rastî em nikarin bigihîjinê. Eva temîye û kirina wê ji me tê xwestinê.

Petrûsê şandî zelal got, wekî wekilandina rastî û temîyên ji alîyê Xudan Îsa Mesîhda dayî, gelekî girîngin. Fikira bîranînê nava wê gotinêda sê cara hatîye nivîsarê. Merivên ku nama Petrûs dixwendin, îdî zanibûn, ku çi hatibû nivîsarê: feqet, ewî da kivşê, wekî piştî çûyîna li Ezmîn jî xwendevanên wî gerekê wan rastîyên girîng bîr bianîyana. Hêjaye, wekî em jî guhdarîyê bidine ser evê banga girîng.

Destpêka her du namên xweda Petrûs dinivîse: “Hûn *gerekê* nava şuxulên xweda pîroz *bin*” (A Petrûs 1:15, NLT). Kitêba Pîrozda gelek cara du cûrên berbirîbûnê, pêşnîyara û temîya diwekilin. Em

serwaxtin, eger em guhdarîyê didine ser pêşnîyara, lê bêfemin, eger em temîya hesab hilnadin. Ev gotinên Petrûs temîye.

Tiştekî kivşe, wekî şandî derheqa cûrê jîyanêda xeber dide. Bo vê yekê jî em gerekê netirsin û gumanbir nebin. Sozê me heye: “Temîyên Wî giran nînin” (A Yûhenna 5:3). Ev yek dide kivşê, wekî mîyaserkirina temîya tiştê bûyînêye, lê ne ku çawa difikirin, ne tiştê bûyînêye.

Nava nama xweda, para wêye mayînda, Petrûs derheqa jîyana pîroze praktîkda xeber dide, û diha zêde ne ku nama duemda. Awa gotineke wî: “Ez eşaretîyê didime we çawa “binelîyên wedelî û welatîyên xerîb”, ku hûn ji xwestinên vê dinyayê dûr bimînin, yên ku dijî we şerkarîyê dikin” (A Petrûs 3:11, NLT).

Deşta şêr fikira meye. Em gerekê fikir, texmînkirin û xwestinên xwe zeftkin. Hemû guneh ji vê yekê destpê dibin. Şerkarî hîmlî wî çaxî diqewime, wextê ku em hîvîya tiştê herî hindikin: gelek cara ew yek diqewime, wextê ku em tevî bêbawaranin, yan jî tevî bawarmendên ku berbi berdaxustina diçin. Petrûs miqîm derheqa wê yekêda dibêje: “Fesalbin, ku hûn bi cûrê rast nava cînarên bêbawarda bijîn” (A Petrûs 2:12, NLT).

Şandî derheqa wê yekêda dibêje, wekî kirinên me gerekê him nava xebatê, him nava zewacê û him jî nava heleqetîyên başqeda pîrozbin. Ew dide kivşê, wekî em bi cûrê herî kardar dikarin şedetîya mesîhîtîya me bidine cînarên bêbawar, xebatkara, hevalên li cîhê xwendinê, xwezima wana, tevî kîjana hetanî qebûlkirina Mesîh em nava heleqetîyada bûne. Ew dibêje:

> “Bi rastî, hevalên weye berê fem nakin ku bona çi hûn îdî tevî dorana xweye berê nînin. Feqet hûn gerekê şirovekirina nedine wana. Ewin, yên ku wê bona cabdarîyê bên gazîkirinê û ew jî xût li ber Xwedê” (A Petrûs 4:4:5, MSG).

Destpêka nama xweye duemda Petrûs me şîret dike: “...bicedînin ku bidine kivşê, wekî hûn bi rastî nava wan merivadanin, yên ku ji alîyê Xwedê da hatine gazîkirinê û bijartinê. Van tişta bikin û hûnê tu cara paş nemînin” (B Petrûs 1:10, NLT). Bona nîşandayîna rastîya li cem me gerekê cêrge alîyên xeyset hebin, nava kîjanadanin zêdaya moralê, xwegirtin, sebir, rehm û hizkirin. Evana berên keremêne, kîjana em bi bawarîyê mezin dikin. Eger em van tişta bikin, “...wî çaxî

Xwedê wê îzinê bide me, ku em dergera bikevine padişatîya Xudan û Îsa Mesîhê Xilazkirê heta-hetayê" (Xeber 11).

Petrûs dîsa eşaretîyê dide, wekî dersdarê pêşda bên, yên ku "Bi fêlbazî tiştên xirabkirinê hîn dikin" (B Petrûs 2:1, NLT). Ewê aûdîtorîyayên mezin zeftkin: "Gelekê peyî hînbûna wane xirab û bêeslîya eyb herin" (xeber 2). Nava Încîla "Mêsîcê"-da derheqa dersdarên qelpda nivîsare: "Ew li ser rîya ku lez berbi xirabkirinê dibin, sekinîne, lê ew yekê neqewime, hetanî cimeteke mezin berev nebe, yên ku şaşîyê ji rastîyê cuda nakin. Ew bi cûrê xirab derheqa rîya rastîyêda xeber didin" (xeber 1,2, MSG).

Ew dersdar wê "nava meda"-bin, wextê hemcivînên me, li civîna û li komên mala. Xeber eşaretîyê dide me: "Ev meriv tevî me wextê nanxwerinên pêşkêşî bîranîna hizkirina Xulam dixun" (Cihûda 12, NLT, usa jî B Petrûs 2:13). Nava hînkirinên wane qelpda wê awqas rastî jî navhevxistîbe, wekî wê du tişt biqewimin.

Ya e'wlin ewe, wekî merivê nikaribin rastîyê bi şaşîyê cuda bikin. Ew kirina ku me ji dilê Xwedê dûr dixe, wê çawa ya qebûlkirî bê hesabê, lê hinek cara jî çawa ya baş. Xweyîkirina Xebera Xwedê, elamkirina wê, wê çawa nêzîkbûna qanûnparêzî û gunekarkirina merivên başqe bê hesabê.

Tevî belakirina cûrê jîyana "mesîhîtîyê", ev hînkirin wê pircûretîya meriva bidine tarîkirinê. Ev qulixçî û dersdarên ku xapandinê tînin, wê xeberdankirên gelekî başbin û ewê hukumî li ser geleka bikin û wê geleka bikine nava şaşîyê. Wî çaxî şêwira Xebera Xwedêye *tomerî* îdî wê neyê hesabê çawa norma here bilind û merivê diha zêde bikevine nava tela gurênekirinê, lê ne ku çawa berê.

Ya duda wê ew be, wekî navê Mizgînîyê wê bikeve. Ew jî dikare wî çaxî biqewime, eger ew dersdar xeberên rastîyê bidine xebatê:

> "Wekî ji rîya rastkirî hiştin, xalifîn..." (B Petrûs 2:15).

Van rêbera şuxulkarîya xwe çawa Mesîhîyên Xwedêparêz destpê kirin, lê dirêj nekişandin. Usa hatîye stendinê, wekî ew zimanê mesîhîtîyê zanin, lê hindava rastîya wê dilsoz nînin.

Petrûs dide kivşê, ku eger em peyî jîyana pîroz herin, emê nekevin, emê tu cara nekevine bin hukumê dersdarên wî cûreyîye derewîn.

Çareserîya me hema nava vê yekêdane. Peyî wê yekêra ew berbirî wan meriva dibe, yên ku guhdarîya wan hînkirinên qelp dikin û berbi jîyana wî cûreyî diçin”

> “Û wextê ku meriv ji heramîya vê dinyayê direvin, bi naskirina Xudan û Xilazkirê me Îsa Mesîh, lê paşê careke mayîn dikevine nava guneha, û wana dikine xulam, ew dikevine nava halekî diha xirabtir ne ku pêşda. Wê diha baş bûya, ku wana tu cara rîya heqîtîyê nas nekira, ne ku nas bikirana, lê paşê jî *temîya ku stendibûn, ya bona j*îyana pîroz, înk*ar bikirana*” (B Petrûs 2:20,21, NLT).

Ev gotin nava fikira mêrivda çetin tê cîwarkirinê. Werin em careke mayîn wê yekê biwekilînin, çi ku nava vê parêda nivîsare. Ev şandîyê bi navê mezin derheqa wê yekêda dinivîse, yên ku bi rastî ji guneh revîbûn û Îsa Mesîh nava jîyana xweda qebûl kiribûn. Feqet rûyê dersdarîya ne bi fikira rast, bi cûrê şaş bawarkirinêda, ew paşda diçin berbi jîyana bêxwedê. Petrûs dibêje, wekî ew niha nava halekî hê xirabtirdanin, ne ku hetanî qebûlkirina Îsa û bona wana wê diha baş bûya, wekî tu cara rîya rastîyê nas nekirana, lê ne ku temîya bona jîyana pîroz înkar bikirana.

Careke mayîn em dibînin, wekî jîyana pîroz temîye û ew ya hîmgirtîye.

## Du qewatên ku bin nakevin

Temîyên Xudan giran nînin, çimkî tebyeta meye nû tevî qewatkirina keremê karebûna xweykirina wê yekê dide me. Feqet werin em rastbin: bi heyîna vê karebûnê çi me def dide ku em wextê dema şerkarîyêye here gur vê temîyê xweyî dikin. Bersiva vê pirsê eve, her du qewatên ku bin nakevin.

Îzinê bidin ez bi serhatîkê şirovekirina derheqa qewata ewlinda raberî we bikim. Ew yek salên 1980-êyî qewimîye, wextê k1 ez hela hê serwêrê q1lixa cahila bûm. Carekê min bona q1lixa me terîf hazir dikir û min texmîn kir, ku Xudan dixwest minra xeberda. Min xwe edil kir û dilê xweda bihîst: “Bixwîne Yûhenna 14:15”.

Min nizanibû ku Yûhenna 14:15-da çi hatibû nivîsarê û bo wê yekê jî min lez vekir û dît, wekî Încîla minda ew bi beşeke nû destpê

dibe. Min Xeberên Îsa xwendin: “Eger hûn Min hiz dikin, temîyên Min xweykin…”.

Peyî wê yekêra min xeberên ji 15-a hetanî 24-a xwendin. Ev hemû xeber Yûhenna 14:15-va girêdayî bû. Têma vê beşê xweykirina xeberên Îsa bûn. Bi xwendina van xebera, min fem kir: “Hûn didine kivşê, wekî bi xweyîkirina temîyên Min hûn Min hiz dikin”. Min xebera xilazîyê xwend, Xudan dilê minra xeberda: “Te ev beşa fem nekir: careke mayîn bixwîne”.

Min careke mayîn ev deh xeber xwendin. Li cem min careke mayîn fikir pêşda hat, wekî meremê vê gotinê eve: “Hûn didine kivşê, ku Min hiz dikin, bi xweykirina temîyên Min”. Min careke mayîn dengê Xudan bihîst: “Te ev beşa fem nekir: careke mayîn bixwîne”.

Hewaskarîya mine hindava vê beşêda diha zêde bû. Min dîsa ev xeber xwendin û dîsa dengê Xudan bihîst: “Dîsa bixwîne”. Ev yek hevt, yan heyşt cara wekilî û ez gumanbir bûm.

Min qirar kir lez nekevim û gelekî hêdî- hêdî van deh xebera bixwînim. Min xebera “*eger*” xwend, sekinîm, bi dengê bilind ew xeber got û derheqa wê yekêda fikirîm. Peyîra ez derbazî xebera mayîn “hûn” bûm û dîsa wekiland. Wî cûreyî min temamîya xeberên wê beşê xwendin û ewê yekê gelek wede ji min bir. Piştî 15 deqa min ev hemû deh xeber ser hevda anîn û carekêra guhdarîya Ruh kir: “Te ev beşa fem nekir, careke mayîn bixwîne”. Min bi diltengî kire qîrîn: “Xudan, ez hîvî dikim, ku Tu nezanîya min bibaxşînî. Diqewime ez nezanim. Çavên min veke, wekî ez bibînim, ku Tu çi dibêjî.

Min careke mayîn xebera 15-a xwend: “Eger Min hiz dikin, Temîyên Min xweyîkin.. Min dît, wekî li ser xebera “xweyîkin” steyrk heye. Min şirovekirina wêye rexda nihêrî, li kîderê nivîvsar bû, wekî tercima wêye diha rast eve: “hûn xweyîkin”.

Wextê ku min xebera “xweyikin” bi vê gotinêva guhart, wa hate stendinê: “Eger hûn Min hiz dikin, hûnê temîyên Min xweyîkin”. Bi xwendina vî cûreyî tê bêjî nava minda teqînek qewimî û min fem kir.

Peyî wê yekêra min dengê Xwedê bihîst: “Con Min nedigote te ku eger tu temîyên Min xweyîkî, tê bidî kivşê, wekî Min hiz dikî. Ez îdî zanim, ku tu Min hiz dikî, yan na. Min digot, wekî eger tu hetanî guhên xwe bengîyî ser Min bûyî, menîya teye xweyîkirina temîyên Min wê hebe”.

Texmînkirina mine pêşin, ya derheqa vê xeberêda tê bêjî ya qanûnparêzî bû, lê ya nûda îdî bi mesela heleqetîyên hizkirinê bû, kilîta bona heyîna menîya rast bû.

## Hizkirina bi agirê gur

Îzinê bidin vê yekê bi meselê şirove bikim. Hûn qet bengî bûne? Wextê ku min Lîza nîşan kir, ez hetanî guhê xwe bengî bibûm. Ez her dem derheqa wêda difikirîm. Min hemû tişt dikir, ku tevî wê wede derbaz bikim. Tê bîra min, carekê em çend seheta tevayî bûn. Min xatirê xwe ji wê xwest û ji mala wan derketim, lê hinek wede şûnda Lîzayê minra têlêfon kir û got:

– Con, te êlekê xwe li mala me bîr kirîye.

– Ez gelekî şa bûm, wekî min êlekê xwe bîr kiribû, çimkî minê careke mayîn Lîza bidîta. Min gotê:

– Ez difikirim, ku ez gerekê niha bêm û hildim.

– Em herdu jî kenîyan. Ew yek menî bû, ku dîsa çend seheta tevayî derbaz bikin.

Eger Lîzayêra tiştek lazim bûya û dîtina wî tiştî tiştê bûyînê bûya, nenihêrî wê yekê, ku ew yek bi çiqwasîva bona min bêfesal bû, minê ew yek bidîta. Eger ewê nîvê şevê têlêfon bikira û bigota: “Delalê min, ez sarsarokê (dondirme) dixwezim”, minê bigota: “Sarsaroka (dondirma) bi kîjan tamê? Ezê piştî pênc deqa li wirbim”. Minê hemû tişt bikira, wekî hîvîkirina wê mîyaser bikira. Fikira vê yekê ewe, wekî *xwestina wê bona min emirkirineke hizkirî bû.*

Çawa ku ez bengîbûyî bûm, min xwestinên wê bi şabûn mîyaser dikirin. Tu hîvîkirineke wê bona min çetinayî pêşda nedianîn. Min xwestinên wê mîyaser dikirin, ku bidime kivşê, wekî min ew hiz dikir: min ew hemû tişt dikirin, çimkî ez ser wê bengîbûyî bûm.

Îsa hema vê yekê dixweze bêje. Wextê ku em ser Wî bengîbûyîne, em şabûnê texmîn dikin û xwestinên Wî mîyaser dikin. Xebera Wî giran yan jî sînorkirî nîne, ew xwestina dilê meye bi şewate.

Werin em çend sala pêşda herin, wextê ku em îdî zewicî bûn. Mijûlîya mine nava qulixêda zêde bû û bêyî femkirin hizkirina mine

hindava Lîzayêda kêm bû. Niha xwestina wê îdî bona min mînanî berê nîbû. Gelek cara ew bêfesal bû, lê gelek cara giran bû. Min bi nêzîkbûneke başqe îdî qulixî wê dikir. Min mînanî berê bi şabûn usa qulixî wê nedikir, çawa ku em teze rastî hevdu dihatin. Min îdî nedigote wê: "Bi kîjan tamê, ezê niha li wirbim". Min digotê: "Bi rastî? Delala min, şuxulên min awqas gelekin!". Min îdî mecal nedigerîyan, ku tevî wê wede derbaz bikim, lê min tevî wê wede derbaz dikir, çimkî ew yek rast bû. Cedandina mine nû îdî xebat bû. Niha guhdar bikin, ku Îsa li civînekê çi dibêje:

> "Ez ha ji kirên te, xebata te û sebira te heme… lê gazineke min li te heye, ku tu mînanî berê min hiz nakî. Niha bîne bîra xwe, ku tu ji kîderê ketîyî û ji gunehkirinê vegere, kirên xweye pêşîyê bike…" (Eyantî 2:2,4,5).

Careke mayîn xeberên Îsa bixwînin: "Ez ha ji kirên te heme…tu ketîyî: tobeke û *kirên ewlin* bike". Li vir derheqa şuxulên cûre-cûreda nivîsare. Kirên ewlin girêdayî bûn hizkirina hindva Îsara, mînanî nêzîkbûna min, wextê ku min digot: "Bi kîjan tamê? Ezê pênc deqa şûnda li wir bim". Piştî hinek wede şuxuên civînê jî dest pê kirin çawa borcdarî bên kirinê, mînanî mesela min, wextê ku min digot: "Bi rastî? Delala min, niha ez gelekî mijûlim".

Em dikarin vê yekê bi vî cûreyî bidine tomerîkirinê: pêşda, wextê ku em ser Îsa bengîbûyî bûn, me bi şabûn her tişt bona Wî dikir: lê niha wextê ku agir temirîye, gurêkirin bûye çawa borcdarî.

Vê şaşîyê çawa rast bikin? Bona wê yekê lazime, ku diha zêde wede tevî Wî, nava Xeberê, duakirinê û hebandinêda derbazkin. Wextê ku em fikirên xwe didine berbi Wî, ne tenê li civînê, yan jî duakirina şebeqê û xwendinê, lê nava temamîya rojêda em fem dikin, wekî Ew tevî meye. Em jî gerekê hîvî ji Ruhê Pîroz, Rêberê meyî hertimî bikin, bona ku her roj dilên me bi hizkirina Xwedêva tijî bibe.

Hûn nikarin ji normê der Xwedê hiz bikin: hizkirina Wî wê tenê cedanina weye hindava Wî da zêde bike. Bîr nekin: "Hizkirin tu cara xilaz nabe" (A Korintî 13:8).

## Xofa pîroz

Qewata duem, xofa xwedêtîyêye. Pawlos dide dîyarkirinê, wekî ev yek dikare li ser rîya pîrozîyê me xweyîke:

> "...em xwe ji hemû kirêtîya qalib û ruhê xwe paqijkin û bi xofa Xwedê lap buhurtî- jibarebin" (B Korintî 7:1).

Pîrozî bi xofa Xwedê mîyaser dibe, yan jî dighîje. Vê rastîyê meriv dikare nava temamîya peymana Nûda bibîne.

Pawlos bona civîneke mayîn dinivîse: "...bi xof û tirs bixebitin, ku wê yekê bighînine sêrî" (Fîlîpî 2:12). Bona ku gura temîyên Xwedê da bin, lazime ku xof, tirs û xofa pîroz hebin. Petrûs derheqa xweyîkirina temîya bona jîyana pîroz dinivîse, usaye hûn gerekê ji Wî xofê bikişînin, nava wî wedeyîda, yê ku hûn çawa "merivên vî welate xerîb" derbaz dikin (binihêre A Petrûs 1:17, NLT).

Xudanê nama Îbranîya ber dilê meda tê, ku em berbi pîrozîyê bicedînin û dibêje: "Em padişatîke nehejîayî distînin û bi vî awayî, bi xof û tirs Xwedê bihebînin, çawa ku li Wî xweş tê" (Îbranî 12:28). Xofa ji Xwedê dide kivşê, ku bi cûrê xweşhatinê, yan jî qebûlkirinê bona wî qulix bikin. Gelek meriv derheqa xofa Xudanda rast texmîn nakin û wê yekê tirsêva didine girêdanê. Ew difikirin: "Gelo em niha ji *tirsê* aza nebûne? Nava jîyana meda niha cîhê tirsê kîjane?".

Xwedê hizkirine. Ew Bavê meye. Feqet em gerekê derheqa *xofa* ji Wî bêjin, çimkî derheqa vê yekêda peymana Nûda gelek cara tê gotinê.

Hineka fikira derheqa xofa Xudanda dane kêmkirinê û dibêjin: "Ew yek dide kivşê, ku Xwedê bihebînin". Ez li Afrîka başûr li hemcivînekê bûm û dersdarekî dinêeyan li oda bona hêsabûna qulixçîya pêşîya terîfkrina min ev xeber gotine min. Wî çaxî min jê pirsî: "Eger usaye, bona çi Pawlos peymana Nûda çar cara derheqa tirs û xofêda dibêje, eger ew yek tenê "hebandinê" dide kşivşê. Tirs ji hebandinê zêdetire. Xebera yûnanîye "*tromos*" nava "*Ferhenga Strongda*" tenê bi cûrekî tê şirovekirinê: "Ji tirsê bilerizin". Wî çaxî ji me tê xwestinê, ku "xilazbûna xwe bi lerizandina ji tirsê mîyaser bikin". Tê texmînkirinê, wekî ew yek *qedirgirtina k*ûre û meriv dikare bêje, wekî *tirsa saxleme*, ya ku diha zêdetire, ne ku fikira meye derheqa hebandinêda.

Wextê ku gilî derheqa xofêdane, meriv dibêjin: “Eva hînkirina peymana Kevine. Em gerekê ji Xwedê netirsin, çimkî Wî ruhê tirsê nedaye, lê ruhê hizkirinê daye”. Ew ruhê tirsê xofa Xudanra şaş dikin.

Wextê ku Mûsa cimeta Îsraêlê anî ber çîyayê Sînayê û Xwedê hazirîya Xwe eyan kir, hemû kes ji wî çîyayî revîn û tevhevbûyî berbi Mûsa kirine qîrîn, wekî ewî lava ji Xwedê bikira, ku Wî mezinaya Xwe li wan eyan nekira. Niha guhdarkin, ku Mûsa çi gote Îsraêlê:

> “Netirsin, çimkî Xwedê bona cêribandina we hatîye. Dêmek usaye, ku xofa Wî li ber webe, ku hûn guneha nekin” (Derketin 20:20).

Usa tê texmînkirinê, wekî Mûsa bi xwe dijî xwe derdikeve: “Netirsin… Xwedê… hatîye… bona ku xofa Wî li pêşîya webe…”. Feqet ewî firqî dikire nava gotinên *ji Xwedê tirsîayî* û heyîna xofa Xudan. Firqî gelekî mezine. Çetin Xwedê bixwesta, ku em ji Wî bitirsîyana. Tu kes nikare tevî wî kesî nêzîk be, ji kîjanî ew ditirse, lê Xwedê bi cedandin dixweze tevî me nêzîkbe. Merivê ku ji Xwedê ditirse, usaye tiştê wîyî veşartinê heye û ew yek jî menîya tirsa wîye. Ya ewlin, çi ku Adem û Hêwayê kirin, wextê ku miqabilî Xwedê guneh kirin, ew bû, wekî ji hazirîya Wî xwe veşartin (binihêre Destpêbûn 3:8).

Lê ew merivê ku li cem wî xofa Xwedê heye, tiştê wîyî veşartinê tune. Ew tenê ditirse, ku dikare ji Xwedê dûr bimîne.

Bi vî cûreyî şirovekirina ewlin, ya xofa Xudan ewe, *wekî ditirsin ji Xwedê d*ûr bik*evin.* Heyîna xofa Xwedê dide kivşê, ku qedirê Wî bigrin û Wî bihebînin. Em bi temamîya dilê xwe qedirê Wî digrin û Wî qîmet dikin, usa jî xofê hindava Wî da texmîn dikin.

Xofa pîroz wê tabîya rûmet dide Xwedê, layîqî kîjanîye Ew. Em li ber Wî bi xofa kûr dilerizin. Em xwe ji dilê Wîva digrin, xwestinên Wî qîmet dikin. Çi ku em hiz dikin, Ew jî we hiz dike û wê yekê hiz nakin, çi ku ew hiz nake. Ew çi ku bona Wî girînge, bona me jî girînge. Bo wê yekê jî nivîsare: “Ewên ku ji Xudan ditirsin, wê xirabîyê hiz nekin” (Gotinên Silêman 8:13, NLT).

Derketin 20:20 dibêje, wekî xofa Xwedê me ji guneha dûr digre. Xebera Xwedê usa jî mera e’yan dike: “Bi tirsa ji Xudan, meriv ji xirabîyê xwe dûr digrin” (Gotinên Silêman 16:6, NLT). Pawlos jî dinivîse, wekî xofa Xudan ew qewate, ya ku me def dide, em ji guneha

dûrkevin (binihêre B Korintî 7:1). Ev xeber wî çaxî bona min bûne rastî, wextê ku ez çûme cem terîfkirekî bi têlêvîzyonê, yê ku hebsêda bû. Ew meriv qulixçîkî bi nav û deng bû li temamîya dinyayê. Lê salên 1980-î qanûnên dewletê teribandibû û pêra jî zinêkarî kiribû.

Ew îdî serê pênc sala bû, ku li hebsê bû, lê wextê destêbûna derbazkirina wedê xweyî li hebsê li oda hebsê rastî Îsa hatibû û wê yekê jîyana wî guhartibû. Kitêbeke min tê bêjî derheqa wîda bûye û ewî hîvî kiribû ku ez herime cem wî.

Ezê tu cara wê yekê bîr nekim, wextê ku ew kete oda hebsêye seredana. Ewî ez ji deqekê zêdetir hembêza xweda girtibûm û hêsir ketibûne çava. Paşê ewî sergirkê milên min hembêz kirin û bi germayî ji min pirsî:

– Ev kitêb we nivîsîye, yan ji alîyê xudanekî kirêkirîda hatîye nivîsarê?

– Na xêr, min ew kitêb nivîsîye, ji destpêkê hetanî dawîyê.

– Em derheqa awqas tiştîda gerekê xeberdin, lê tenê 90 deqê me hene,– ewî bi şabûn gote min û carekêra serhatîya xwe minra gilî kir.

Destpêka xeberdanêda ewî gote min:

– Con, ev hebsa bona min dîwana Xwedê nîbû, lê rehma Wî bû. Eger min usa, çawa berê jîyana xwe berdewam bikira, ezê biketama dojê û ezê heta-hetayê unda bûma.

Gotinên wî min zendegirtî hiştin, lê ew zelalî û şikestîbûna wî gelekî hukumî li ser min kirin.

20 deqa min guhdarîya wî kir, paşê min pirsek dayê, ya ku ez xemgîn dikirim. Min zanibû, wekî ewî Îsa gelekî hiz dikir û destpêka qulixa xweda ew bi agirê Xwedêva tijîbûyî bû, lê min dixwest bizanibûya, ku ewî ew yek çawa unda kir.

Bi kutasî, min jê pirsî:

– We kengê terka hizkirina Îsa da, ji kîjan wextîda? -Min dixwest bizanibûya, ku nîşanên undakirina hizkirina hindava Îsa çawanin, bi taybetî nava jîyana merivê qulixçîda.

Tu cara,– ewî li ser xwe guman bersiva min da.

– Ez ji nişkêva ji bersivdayîna wî tevîhev bûm. Ewî çawa dikaribû tiştekî usa bigota? Ez dijî wî derketim:

– Hûn çi dixwezin bêjin? We zinêkarî kirîye. Hûn xapandina girêdayî perava mijûl bûne, rûyê çida hûn hebsêdanin. Hûn çawa dikarin bêjin, wekî we terka hizkirina Îsa nedaye?

Ewî careke mayîn çavên min nihêrîn û dîsa li ser xwe guman got:

– Con, min Îsa wî çaxî, wextê wan kirina jî, hiz kirîye.

Min dengê xwe nekir û ez gumanim, wekî ewî li ser sifetê min ew tevhevîbûn texmîn kir û xeberdana xwe berdewam kir:

– Con, min Îsa hiz dikir, lê ez ji Wî neditirsîyam.

Em çend deqa bêdeng man. Ewî îzin da min ku ez gotina wî fem bikim. Nava minda hemû tişt tevîhev dibû. Ewî ew bêdengî teriband û got:

– Con bi mîlyona amêrîkî hene, yên ku mînanî minin. Ew Îsa hiz dikin, lê ji Xwedê natirsin.

## Îsayê bi fikira wan

Ev rasthatina bona min ya werguhastinê bû, çimkî peyî wêra li cem min hewcetîya dîtina bersivên gelek pirsa pêşda hat. Çawa dikaribû ew mervê ku Xwedê hiz dike bikeve nava gunehekî giran, yan jî gunehê hertimî? Çawa bi mîlyona meriv dikarin, yên ku Xwedê hiz dikin, bi jîyana nepîrozva bijîn. Ew Xwedê dihebînin û li civînên xwe qulix dikin, cedandina wane berbi Xwedê heye, lê ew bi jîyana heleqetîyên bedenîye nerast dijîn, poronografîyayêva girêdayîne, her dem derewa dikin, her dem serxweşin, ji jin, yan jî mêrên xwe diqetin…û vê navnîşê meriv dikare berdewam bike. Ew Îsa hiz dikin, mînanî wî merivî, lê bo çi xeberên Wî xweyî nakin? Îsa got, wekî eger me Ew hiz bikira, qewata meyê hebûya, ku em gura Wî da bûna. Şaşî çiye?

Diqewime bersiv ewe, wekî ew kesekî hiz dikin, lê bi rastî wî nas nakin? Diqewime, wekî ew merivê terîfkirê bi têlêvîzyonê û usa jî gelek meriv, derheqa kîjanada ewî digot, nava fikira xweda kesek çê kirine, yê ku mînanî Îsayê rast nîne? Ew Îsayê fikira wanda wê yekê dide tebyeta wane bedenî, çi ku ew bi cûrê xwezeftkirinê dixwezin.

Derheqa vê yekêda bifikirin: li welatên me gelek meriv hindava sportsmên û artîstên Holîvûdê hewaskarin. Navên wana li malên me bûne tiştekî sade, lê prêsa derheqa jîyana wane şexsîda bi hevpeyvînên têlêvîzyonê û miqalên rojnama yan jî kovara gilî dikin.

Min bihîstîye, wekî ew meriv derheqa wan merivên eyanda xeber didin û usa dibêjin, tê bêjî ew hevalên wane nêzîkin. Min dîtîye, wekî ew meriv ji pirsgirêkên wan merivên eyan ber xwe dikevin, wextê ku ew rastî tragêdîya tên, tê bêjî ew endamekî malbeta wanin.

Feqet, eger ji wan meriva yek li derva rastî wî merivê eyan bihata, ewê qet silav jî neda wî. Eger wî merivî bixwesta ew merivê eyan bida sekinandinê û pêra xeberda, fikira wîye derheqa wî merivîda wê bihata guhastinê, çimkî bi rastî usa nîne. Fikira vê gotinê ewe, wekî heleqetîyên wî merivî yên xiyalîne.

Îsraêlê hema usa kir, wextê ku ji Misirê derket. Wextê ku Mûsa hilkişîya ser çiyê û 40 şevî û roj tevî cimetê nîbû, Xwedê deng nekir, lê ne ku bona Mûsa, lê bona cimetê Harûn û rêberên mayîn, yên ku ji hazirîya Xwedê dûr bûn, bona xwe "Xwedêk" çê kirin, yê ku tebyeta wanra û xwestinên wanra qayîl dibû.

Bi sala ser hev min nava vê serhatîyêda tu tiştekî girîng nedidît, çimkî min ev beşa lêkolîn nedikir. Harûn golika xweye rokirî çawa "*Yêhova*" nav kir, yê ku navê Xwedêye (binihêre Derketin 32:5). Xêncî vê yekê navê "Yêhova" Încîlêda nayê xebitandinê bona navkirina Xwedêkî qelp, yan jî tiştekî mayîn. Ev nava usa pîroze, wekî nivîsarên cihû herfên bi deng zêde nedikirin (Em herfê bi deng zêde dikin û dinivîsin, lê wextê nav hildidin, dibêjin "*Yahvêh*").

Harûn tenê nîbû. Cimetê jî wî cûreyî golika wîye rokirî qebûl kir û elam kir: "Eve Ê*lohîm*, Yê ku em ji Misirê aza kirin" (binihêre Derketin 32:4,8). Ev xebera 32 cara nava kitêba beşa ewinda, ya kitêba Destpêbûnê tê xebitandinê. Nava xebera Încîlêye ewlinda nvîsare: "Pêşda Ê*lohîm* ezman û dinîya çê kirin".

Himberî xebera "*Yahvêh*", Încîlêda 90 selefê xebitandina xebera "Ê*lohîm"* derheqa wî Xwedêyîdane, Yê ku hemû tiştî dikare bike. Nava deh selefên mayînda ew nav bona navkirna xwedêyên derew tê xebitandinê. Çawa ku Harûn ew golik çawa *"Yahvêh*" nav kir, em dikarin hesab bikin, wekî meriva hema wî cûreyî hesab dikir, çawa ku wî.

Fikira wê eve: temamîya cimetê qebûl dikir wekî Yahvêh ew xilaz kiribûn, ji dîltîyê aza kiribûn û pirsên wan hel kiribûn. Feqet wana bi fikira xwe yahvêh çê kiribûn, yê ku ji Yahvêhê rast cuda dibû, Yê ku tevî Mûsa li ser çiyê bû.

Nivîsare: “Xofa Xudan destpêka zanebûnêye” (Gotinên Silêman 1:7, NKJV). Meriv dikare pirsê bide, zanebûna çi? Ev gotin nikare derheqa zanebûna nivîsarên kitêba Pîrozdabe, çimkî fêrisî zaneyên kitêba Pîroz bûn, lê ji hazirîya Xwedê dûr bûn û ew li Wî xweş nedihatin. Dêmek zanebûnên çawa gerekê hebin? Bersiva vê pirsê Gotinên Silêman 2:5-da nivîsare: “…Tê xofa Xudan fem bikî, û *zanebûna Xwedê bib*înî”.

Îzinê bidin ez bi vî cûreyî şirove bikim: Bi heyîna tirsa bi cûrê rast yan jî xofa wî cûreyî, hûnê ji nêzîkva Xwedê nas bikin. Hûn Xwedêyê rast, Îsayê rast nas bikin, lê ne ku ewê ku fikira wan merivadane. Pawlos korintîyara dibêje: “Hûn bi şabûn wê yekê qebûl dikin, çi ku her merivek dibêje we, eger ew derheqa Îsayekî mayînda terîf dike, lê ne ku ewê em terîf dikin” (B Korintî 11:4, NLT).

Ew terîfkirê têlêvîzyonêyî eyan, mînanî gelek meriva, derheqa kêda ewî digot, Wî Îsayî hiz nakin, beramberî Kîjanî yekî mayîn tune, Yê ku li alîyê milê Xwedêyî rastê rûniştîye. Ew wî Îsayî hiz dikin, Yê ku nava fikira wandane, Yê ku îzinê dide wan, ku ew xwestinên xwe mîyaser bikin. Van meriva yan tu cara bi rastî Ew nas nekirine, yan jî ji heleqetîyên tevî Wî xalifîne. Cûrê duem meriv dikare mînanî vê meselê bike. Du heval, yên ku rûyê jîyanêda ji hev qetîyane, piştî çend sala rastî hevdu tên û zelal dibe, wekî ew bi xwe hatine guhartinê. Hizkirina Îsayê nava fikira wanda wê ewê qewatê nede, ku gotinên Îsa Mesîhê rast bên mîyaserkirinê. Bi texmîn çetine bi rastî merivekî hiz bikî, kîjanî tu nas nakî. Bêyî xofa Xudane pîroz em nikarin Xwedê rast nas bikin. Mûsa ji nêzîkva Ew nas dikir. Ewî zelal dengê Xwedê dibihîst û rêyên Wî didîtin. Îsraêlê Xwedê tenê bi şuxulên Wîva nas dikir, bi wê yekê, ku çawa Ewî bersiva dyakirinên wan dida. Bona Îsraêlê dengê Xudan birûsk bû. Xwedê îzin da Mûsa, ku nêzîkî hazirîya Wî bibe, lê emir kir, ku Îsraêl paşda vegere konên xwe (binihêre Qanûna Ducarî 5:30).

## Çi cûreyî dikare xofa pîroz hebe?

Nava vê yekêda pirsa here sereke eve: meriv çawa dikare xofa Xwedêye pîroz bistîne? Em gerekê hîvî bikin, lê bi bêqelpî.

Îsa dibêje: “Hûn ku xirabin, zanin tiştên qenc bidine zarokên xwe, lê Bavê Ezmana wê çiqwas zêde Ruhê Pîroz bide wana, ewên ku ji wî

dixwezin" (Lûqa 11:13). Diqewime em bipirsin: "Îsa derheqa Ruhê Pîrozda dibêje, lê ne ku derheqa Xofa Xudanda, usa nîne". Awa Îşaya derheqa Îsa û Ruhê Pîrozda çi dinivîse:

> "Ji koka Yêşa tûrekê derê û ji rawê wî çiqilekê şîn be. Ruhê Xudan wê ser Wî bimîne, Ruhê serwaxtîyê û femdarîyê, Ruhê şîretê û zorayê, Ruhê zanistîyê û xofa Xudan. Şabûna Wîyê xofa Xudan be..." (Îşaya 11:1-3).

Şirovekirina Ruhê Xwedê, ya dawî, ya ku li vir hatibû raberkirinê, eve "Ruhê xofa Xudan"-e. Ez bi xwe bawar dikim, wekî eva alîyê herî girînge, kîjanî em gerekê hîvî bikin. Du menîyên fikira min hene. Ya ewlin ewe, wekî çawa nivîsare, xofa Xudan destpêka serwaxtîyê, şêwirê, femdarîyê û zanistîyêye (Zebûr 111:10, Gotinên Silêman 1:7, Gotinên Silêman 8 û 9). Ya duda û menîya here berbiçav ewe, wekî xofa Xudan hema şabûna Îsaye. Gelo şabûna Wî gerekê şabûna me nîbe? Nava Xebera Xwedêda nivîsare, wekî Îsa *bona* xofa Xweye xwêdêtîyê hate guhdarkirinê (binihêre Îbranî 5:7). *Duakirin* tiştekî mayîne, lê guhdarkirin tiştekî mayîne.

Him xofa Xudan, him jî hizkirina Xwedê, encamên tijîbûna bi Ruhê wîne. Pawlos dinivîse: "Hizkirina Xwedê dilên meda bi destê Ruhê Pîroz belabûyîye, yê ku bona me hate dayînê (Romayî 5:5). Ez berbirî we dibim, ku hûn bi bêqelpî hîvî bikin, wekî hûn bi Ruhê xofa pîroz û hizkirina Xwedêye bi alavî, alava ku dişewitîne, tijî bibin.

## Derdanên qirêj

Bi xeberdana derheqa vê yekêda, em nikarin derheqa wê krîzîsa mezinda xeber nedin, ya ku roja îroyîn heye. Li civîna sedsala 21-êda kêmasî heye, lê ne ku kêmasya derdana, lê ya derdanên *paqij*, nava kîjanada Xwedê Ruhê xwe wê birêje. Em paşda vegerine ser xeberên Pawlose nivîsare dawî. Ew li ser xwe bi guman dibêje:

"Lê belê, hîmê ku Xwedê danî, qedîm dimîne û ev mor sere: "Xudan yên para Xwe nas dike" û "Ew kesên ku navê Xudan hildane ser xwe, bira ew ji neheqîyê dûrbin"" (B Tîmotêyo 2:19, TEV). Pawlos dida kivşê ku çi me qedîm dike, çawa civîn û çawa şexs. Li ser wî hîmî, derheqa kîjanîda ew dibêje, du gotin nivsarin. Anegorî Încîla "*K*îng

Cêyms”-ê ew gotin li ser hîm “morkirîne”, lê anegorî Încîla “Mêsîc”-ê ew “*nexşkirîne*”.

Ya ewlin, Xudan wan meriva zane, yên ku para Wî ne. Ev gotin yên berdildahatinêne. Wextê ku em bi temamî xwe teslîmî Wî dikin, Ew me bîr nake. Em dibine merkeza çavên Wî.

Gotina li ser hîm nexşkirî ya dueme û ew jî vî cûreyîye: “Ewên ku dibêjin ku yên Xudanin, gerekê ji neheqîyê dûrkevin”. Em nava vê gotinêda xebera “*gerekê*” dibînin. Eva *temîye*, lê ne ku *pêşnîyar*e. Ev gotin gelekî berke, çimkî meremê wê ewe, ku girîngîya dûrketina ji jîyana neheq bê nîşandayînê. Bo çi? Bersiva vê pirsê nava herdu gotinên bi sirêda hatîye nivîsarê:

“Maleke mezinda ne tenê derdanên zêr û zîv hene, lê yên ji dar û herîyê çêkirî jî hene. Hinek bona derecên bilindin, lê yên mayîn na. Bona meriva jî wî cûreyîye. Ewên ku terka kirinên xirab bidin û xwe paqij bikin, wê bibine yên derecên bilind. Jîyanên wana wê pîrozbin û wê Xudan xweş bên û ewê bikaribin her cûre şuxulên qenc bikin” (B Tîmotêyo 2:21, CEV).

Eger em çawa derdan paqijin, usaye em bona şuxulê Xudan lazimin. Bona tijîbûna bi hazirîya Wî em dest didin.

Ez li kîjan parçê dinîyayê bim jî, ez her şebeq dîsa wê taştê dixum. Ez destpê dikim ava lîmonêye golî vexum, peyî kîjanêra fîncaneke bi çaya kulîlka vedixum. Piştî 15 deqa ez taştê dixum. Bona xwerina taştê derdanên bona çayê, û fîncaneke sade, usa jî derdana bona xwerinê lazimin. Min tu cara derdana qirêj bona taştê nedaye xebatê. Tama taştîya min li min xweş tê û bo wê yekê jî ez her dem derdanên paqij digerim. Tama taştîya xwe ez hiz dikim û naxwezim wê xirab bikim. Eger nava wan derdanada tiştekî qirêj hebe, her tiştekî baş wê pêra qirêj bibe. Wî çaxî bona çi Xwedê gerekê bixweze Ruhê xwe dagire li derdana qirêj?

Anegorî gotinên Pawlos, em bona paqijbûna xwe cabdarin. Ewî negot: “Xwîna Îsa me ji gunehên berê, niha û yêu pêşîya me paqij dike. Dêmek bo wî gunehî xemgîn nîbin, nava kîjanîda dijîn, çimkî hûn bi xwînê hatine pêçanê”. Na xêr, ewî got: “Bi vî cûreyî, kî ku xwe paqij bike (ji wî hemû tiştî çi ku paqij nîne û xwe ji tiştên heram cuda bike) wê bibe cudakirî û derdana kardar” (B Tîmotêyo 2:21, AMP).

Em gerekê şexsê xwe paqij bikin û xilaz bikin. Nava vê beşêda Pawlos derheqa heleqetîyên tevî Mesîh nedigot, ewî derheqa ewê tabîyêda nedigot, ya ku me bi saya xebata Mesîhe kirî dest anîye. Ewî derheqa kirên meda digot. Careke mayîn van xebera bixwînin: "Ewên ku terka kirên xirab bidin û xwe paqij bikin, wê bibine merivên dereca bilind".

Careke mayîn em dibînin, wekî hazirîya Xwedê, Ruhê Wî wê nerije derdana qirêj û ewê birije nava derdana paqij.

## Encam

Em ji Xebera Xwedê zanin, wekî neheqî şêwire û nava civakêda dişuxule. Feqet mizgînî ewe, ya ku çawa qewata zeftkirinê û teribandinêye:

> "...Sura neheqîyê îdî ya xwe dike, lê ewê ku niha nahêle, wê nehêle heta ku xwexwe ji navê bê hildanê" (B Têsalonîkî 2:7).

Em gerekê pirsê bidin, ku kî neheqîyê diteribîne. Meriv dikare du cûra bersiva vê pirsê bide: yan Ruhê Pîroz yan jî bedena Mesîh. Nava Încîla înglîzda nivîsare: "...hetanî ku Ew ji rê neyê hildanê". Eyane, wekî bi nivîsara xebera "Ew" bi herfa mezin, tercimeçî li ser wê fikirê bûn, wekî gilî derheqa Ruhê Pîrozdane. Werin em hesab bikin, wekî ew rastin.

Wextê nivîsara vê kitêbê ez îdî ji 50-î salî derbaztirim û nava jîyana xweda min nedîtîye, wekî neheqî welatê meda awqas zêde be. Min tu cara nedîtîye, wekî hukumat, prêsa û civak tiştên ne bi qanûnî hesab bikin çawa yên qenc. Menî eve: qewata ku ji ortê dide hildanê-Ruhê Pîroz, nava rojên meda awqas hukumdar nîne. Destpêka sedsala 20-îda li rojavayê hazirîya Xwedê lez kêm dibe.

Menî çiye? Eger em mizgînîke usa elam bikin, ya ku werguhastina mêriv nade kivşê, wî çaxî emê kêmasîya derdanên paqij bivînin, rûyê çida hazirîya Xwedêye eyankirî wê li seranserî dinyayê kêm bibe. Wê yekê bîr bînin, wextê ku Îsa li ser xaç mir, perda paristgehê ji jor hetanî jêr qelişî. Hazirîya Xwedê ji wî cîhî derket, ku birije nava derdanên ne bi desta çêkirî, lê nava dilên jin û mêra.

Ruhê Xwedê cîhguhastî cîhekî mayîn nebû. Ew cîhguhastî bedenê bû û kete nava derdanên bi xwînê. Eger derdan qirêjin, wî çaxî hazirîya Xwedê nava civakêda kêm dibe û neheqî diha hindik ji ortê tê hildanê, yan jî zeftkirinê.

Em nikarin evê ketina lez bidine guhartinê, dengê xwe bidin bona kara kandîdatên sîasîya baş, hukumî li ser hukumata me bikin, komên mecalên prêsayê ji xebatê derxin û gelek tiştên mayîn bikin. Mecala tek-tenê, ya şerkarîya rast ewe, ku ewê teslîmî qewata kerema Xwedê bikin û bi jîyana xwedêparêzîyê bijîn. Bi vî cûreyî nava civaka meda emê dengê guhdarkirinê û hukum bidine Ruhê Pîroz.

T'erîfnekirina derheqa pîrozîya rastda gelekî biha li ser me rûniştiye, bi dereca şexsa, ola û miletîyê. Feqet, em dikarin wê yekê biguhêrin. Serwêrno, rêberno û cimeta Xwedê, werin em yekbûyî bisekinin û şêwira Xwedêye nava kitêba Pîrozda nivîsar elam bikin. Werin em hîmekî qewîn û avayê hîmlî nava jîyanên merivên bin hukumê xweda çê bikin. Werin em nava civaka xweda, bi qewata Ruhê Pîroz, neheqîyê bidine zeftkirinê, nava encamên kîjanêda çandina meriva wê bona padişatîya Xwedê bereket be.

14

# NORMÊN ME

“Ewên ku bi kardarî wê yekê didine
xebatê, çi ku stendine, wê hê zêde
bistînin û bereketa wan wê hebe”.
— Metta 25:29, NLT

Li vir ne ku karebûna min girînge,
lê bersiva min, ya bona karebûna Xwedê
— Korîn Tên Bûm

Werin em paşda vegerine ser mesela malçêkirinê. Pêşda me derheqa serwêrtîya Îsada xeberda û ew yek hîmê meye. Paşê me derheqa avayê hîmlîda xeberda, ew jî jîyana pîrozbûyîye. Niha em derbazî êtapa çêkirinêye dawî bin. Ew derheqa şuxulkarîya cudadane, derheqa berdayînê, xiyala, progirama, stratêgîya û qirarên medane. Pawlos dinivîse:

> “Belê, em çêkirçîyên wîne. Ewî me ji nûva nava Mesîh Îsada çê kirîye bona ku em bikaribin wan tişta bikin, yên ku Ewî zûva bona me pirogram kirine” (Efesî 2:10, NLT).

Em nava Mesîh Îsada ne tenê çawa lawên Xwedê, lê usa jî çawa welatîyên padişatîya Wî ya kardar hatine çêkirinê.

Nava çêkirina malêye rastda meriv dikare vê yekê himberî cîhwarkirina eşîyaên malê, cîwarkirina tiştên ronahîyê û usa jî xebatên rengkirinê bike. Feqet nava vê êtapa xebatêda hemû tiştê cûrên bedew bistîne û wê bi wedê dirêj qulix bike, eger çêkirinên her du êtapên ewlin qewînin. Em gelek cara ber bijartinên jîyanê disekinin, yên ku baş tên kivşê, lê gelek cara ew bona me tiştên

Xwedêye here baş nînin. Em gelek cara texmîn dikin, wekî bijartina me sînorkirîye. Abraham û Sara jî hatine ser wê fikirê, wekî bona ku kurê wan hebe mecala tek-tenê ew bû, wekî Abraham carîya Sarayê Hagar bistenda. Ji qirara wana Îsmayîl hate dinyayê. Feqet Xebera Xwedê zelal dibêje, wekî "...kurê carîyê gerekê tevî kurê jina aza war nebe" (Galatî 4:30). Nava vê yekêda Xwedê şaşîya wane nava bijartinêda rast kir, lê her dem nîne, wekî usa dibe. Gelek cara rûyê bijartinên şaşda emê ji mîyaserkirina qewata xweye here bilind miqûf bimînin.

Şaûl, yê ku ji wan gelek meselên ji peymana Kevine, bin hukumda qirara şaş qebûl kir û hetanî hatina Samûêl qurban da. Wî çaxî şaşîya bijartina wî nehate rastkirinê. Şaûl padişatî unda kir (binihêre A Padişatî 13).

Derheqa qebûlkirina qirarên girîngda vî cûreyî bifikirin: eger hûn çûne nava çîya û hûn rîya here vekirî dibînin, hûnê bixwezin wê rêyêra derbazbin. Eger tevî we merivê cêribandî heye, ew dikare derheqa rêke mayînda bizanibe, ya ku diha bedewe û wê we diha zû bighîne li wir, kuda hûn diçin. Rêberê komê wê alî we bike, ku hûn qirareke baş qebûl bikin.

Nivîsare: "Gotina Te çiraye bona rêberkirina lingên min, û ronahîye bona rê" (Zebûr 119:105, NLT). Zanebûna Xebera Xwedê rîya me dide ronahîkirinê û ew yek nava jîyana meda girînge, ku em qirarên serwaxt qebûl bikin.

Him Abraham, him jî Sarayê Xwedê dane sînorkirinê. Ev yek gelek cara diqewime, wextê ku em qirarê qebûl dikin, ku em rîya xweda herin. Dêmek werin em Xebera Xwedê lêkolîn bikin, ku Ew bona qebûlkirina qirara rêberîyê li me bike.

## "Eva bona mala nîne"

Nava çend salên ewlinda, yên zewaca min û Lîzayê, ez û Lîza li bajarên cuda-cuda diman-li Dallasê û Orlandoyê. Her du malên xweye ewlin me bi dijwarîya kirîn. Pêşda em li malên tomerîda diman, çimkî perên me awqas tune bûn, ku me mal bikirîya. Em diçûn û me malên bona firotanê dinihêrîn, lê ew yek tenê bona xiyala bû.

Çawa ku me karibû malê bikirin, faktora here mezin bahê malê bû. Piranîya mala me nikaribû bikirîya, çimkî miaşa min ya salê 18 hezar dolar bûn li Dallasê û 27 hezar dolar li Orlandoyê. Me îdî nikaribû li wan malên tomerîda bijîta, çimkî îdî wî çaxî du zarokên me hebûn û me dixwest ku hewşa me hebûya, li kîderê zarok bikaribûna bilîstana. Bi hevtîya ser hev, em li herdu bajara jî mala digerîyan, ku bahên wan mera dest bida, û ew nêzîkî civîna me û cîhê xebatê bûya. Me da zelalkirinê, wekî bona herdu cûra jî cûrê herî arzan li mehelên here arzan bûn. Herdu hevaltîyên avayîçêkirinê jî, berbirî kîjana em bibûn, pênc- şeş cûre malên wan hebûn û me dikaribû nava wanda bo xwe bibijarta. Me malên here arzan bijartin.

Wextê destanîna mala ewlin em gelekî şa bibûn, bi taybetî wextê ku roja cîhwarkirina eşîyaye li malê hat. Wekîlê hevaltîyê em birine sera nîşandayînêye tomerî, li kîderê matêrîyalên bedewe cûre-cûre hebûn. Me gelek tiştên bedew li wir dîtin.

Paşê ewî em birine serake mayîn, li kîderê matrîyalên diha baş hebûn, lê her car me bersiva vî cûreyî distend: “Eva bona mala we nîne”, yan jî “Wî çaxî hûn gerekê pera serda zêde bikin”. Wextê ku me dipirsî, ku perê zêdekirinê çiqwasin, wana reqemeke usa pêşnîyar dikir, ya ku me nikaribû bida. Ez û Lîza ji wê serayê derketin û me cêriband ber dilê hevda bên, lê bi rastî em ber xwe diketin.

## Dikare bike

Em li dinîyake usa dijîn, ya ku mînanî cêribandina meye li sera hevaltîya avayîçêkirinêye. Merivara gelek cara dibêjin: “Hûn nikarin”, “Bira gumana we tunebe”, “Eva fikreke gelekî bilinde”, “Hûn gerekê yole herin û mînanî jîyana sade bijîn”, yan jî “Ew yek bona we nîne”. Ev gotinên sînorkirinê gelekin. Gelek cara ew mînanî logîka rastin û şêwira başin, lê rastî kîjane?

> “Awa şikir ji Wîra be, Yê ku *dikare* her tiştî hê zêdeke, ne ku çawa em dixwezin, yan difikirin, bi wê qewata ku nava meda dixebite” (Efesî 3:20).

Ew çi ku ev xebera kitêba Pîroz eyan dike, ji gotinên ku li sera hevaltîya avayîçêkirinê me bihîstibûn, cuda dibin. Sînorên wê diha

zêdene, ne ku çi em dikarin bibînin, derheqa wêda bifikirin, bînin ber çavê xwe, guman bin yan jî hîvî bikin.

Li vir xebera kilît, hema “*dikare*”-ye. Îzinê bidin vê yekê bi meselekê şirove bikim.

Merivekî xweyîmîlîyard nêzîkî sê bîznêsmênên cahil dibe û pêşnîyar dike:

— Ez dixwezim şuxulê xiyala we bidime fînansekirinê. Dewsa wê yekê ez tu tiştî naxwezim, ez tenê dixwezim ku hûn açixbin. Ez *dikarim* awqas mecal bona destpêkê bidime we, çiqwas we lazimin, ku hûn şuxul destpê bikin. Nava wan hersêkada yek jineke cahile, ya ku qirar dike dikana nan veke. Bona wê dergehê pêşîya dikanê, çend sobe, derdanên hesin bona petina nan, eşîyayên mayîn lazimin. Ew progirama xwe raberî wî merivî dike û sed hezar dolara jê hîvî dike. Ev meriv wan pera derbazî ser hesabê wê dike.

Bîznêsmênê duda xortekî cahile. Ew qirar dike mala çê bike. Bona wî erd, matêrîyalêdn çêkirinê û avtomaşîna barbir lazimin û usa jî bona ofîsê cîhekî kirê bike. Ew progirama xwe raber dike û 250-î hezar dolara hîvî dike. Ev merivê xweyîmîlîyard wan pera derbazî ser hesabê wî dike.

Merivê sisîya dîsa jineke cahile, ya ku dixweze merkeza bîznêsê çê bike, bi merkeza wedederbazkirinê û parka berfirehva. Ew dixweze nava bajêrda erdekî mezin hilde. Ew jî erdê bajêrî herî başe û êpêce wedeye, ku ew derxistine frotanê, feqet gelek nikarin bikir’in. Ew jî pêşnîyara derheqa kir’îna wî erdîda raber dike, ya ku tê qebûlkirinê.

Ew koma arxîtêktora berev dike, ku projeya xiyala xwe hazir bike. Ew teslîmî wan dike, ku projeya du avayên 12-qatê, bi hewşa berfirehva, hazir bikin. Li beşa mayîn program dike merkeza wedederbazkirinêye vekirî, bi dikanên derecebilind û rêstorana çê bikin, yên ku gerekê qatên wan avayaye ewlindabûna. Ew usa jî teslîmî wan dike, ku hema orta wê komplêksêda mêvanxaneke pêncsteyrkê çê bikin. Beşa erde xilazîyê ew bona çêkirina parkeke bedew dihêle. Li wan dor-bera darên bedew tên nikandinê, ew usa jî rêyên bona çerxesîyara çê dike û wî hemû tiştî bi daristanê û baxçê kulîlkava ser hevda tîne.

Meremê wê ewe, ku guhdarîya bîzênêsmênên açix, mêvana û binelîya bona mêvanxanê bikişîne alîyê wir. Ewê qewilên derecebilind bona kirîna tişta, atmosifêra edil û rêstoranên baş pêşnîyar bike. Mêvanxana wê wê qewilên derecebilind bona mêvanên wan bîznêsmêna pêşnîyar bike, yên ku wê bi mêvanî bên li cem wan bîznêsmêna, yên ku li wir ofîsên xwe kirê kirine. Ew usa jî dixweze, ku ew komplêksa bibe cîhê wedederbazkirnêyî eyan. Gumana wê heye ku ji temamîya welêt, ewên ku bona hêsabûnê bên li vir, usa jî tişta bikrin û li parka wêda wedê xwe derbazkin.

Ew progirama xwe tevî koma arxîtêktora hazir dike, hetanî ku ew dibe progirameke bêkêmasî, ya bona şuxulê efrandarîyêyî rast. Ew diçe li cem wî merivê xweyîmîlîyard, progirama xwe raber dike û 245 mîlîon dolara jê hîvî dike. Mînanî kirina tevî herdu bîznêsmênên mayîn, ew carekêra wan pera derbazî ser hesabê wê jina cahil dike.

Piştî sê sala ew merivê xweyîmîlîyard wan hersê bîznêsmênên cahil teglîfî rasthatinê dike. Ew dixweze bibîne, ku şuxulên wan çawa pêşda diçin. Ew yeko-yeko pêşketinên xwe raber dikin. Dikana nan mehê tenê çend hezar dolara karê dide. Ewê ku avayî çê dikirin, tenê çar avayî çê kiribûn û nava sê salada kara 200 hezar dolara stendibû.

Bîznêsmêna sisîya radibe ser pîya û raportê derheqa komplêksa xweda raber dike. Bi hesabên wê, mêvanxana wê bi 90 selefîva bi mêvanava tijîye, cîhên bona kirêdayîna ofîsa 87 selefava mijûlin. Hemû malên ku ewê çê kiribûn, hatine frotanê. Merkeza wêye wedederbazkirinê bi 98 selefava, bi dikanên derecebilind û rêstoranava, bi merivava tijîye. Kara wêye her meh bi mîlîona dollarin. Ew gilî dike, wekî seroketîya bajêr roj kivş kirîye, ku bi heyteholî komplêksa bide xelatkirinê, çimkî ewê kareke mezin daye bajêr: komplêksa wê çawa qîmetîya êstêtîkî, gelek cîhên xebatê hatine sazkirinê, bala gelek tûrîsta kişandîye ser xwe, bi saya çi fînans tên bajêr û kara baş jî daye bajêr. Bi perên ji kara xwe ewê beşek daye xebatê, ku li nehîyên bajêre feqîr cîhên xwerina germ veke.

Feqet ev hemû tişt tenê nîne. Ew dibêje, wekî bi saya kara stendî ewê pere başqe kirine bona çêkirina komplêksên wî cûreyîye li sê bajara, yên ku wê şeş meha carekê peyî hev bên vekirinê. Ewê sê komên admînîstratîv hazir kirine, yên ku wê serkarîya van

komplêksên nû bikin. Nava pênc salên pêşîyêda ew têra dibîne, ku bi kara stendî dîsa pênc komplêksên wî cûreyî li bajarên mezin çê bike.

Piştî guhdarkirina raporta wê, herdu bîznêsmên mayîn xwe ker dikin, serê xwe dikine ber xwe. Bi texmînkirina vê yekê, merivê xweyîmîlîyard dipirse, ku menîya xemgînîya wan kîjane.

Jina cahil, ya ku dikana nan vekiribû, dibêje:

— Bêguman, şuxulên wê diha başin, ne ku yên me, çimkî ewê perên diha mezin hîvî kiribûn, ne ku me. Ew dikare tiştên hê zêde bike, çimkî we diha zêde da wê.

Merivê xweyîmîlîyard berê xwe dide alîyê avayîçêkirê cahil:

— Hûn wêra qayîlin?

Bi rastî gotî, belê,–ew dibêje. Mecalên wê jinê diha mezin bûn.

Merivê xweyîmîlîyard dibêje sêkrêtara xwe, ku protokolên rasthatina ewlin bîne. Piştî çend deqa ew tê û wan protokola tîne. Ew merivê xêrkir hîvî ji sêkrêtarê dike:

Wê yekê bixwînin, çi ku min sê sal pêşda gote van hersê bîznêsmêna.

Sêkrêtar dixwîne:

“Ez dixwezim şuxulê xiyala we bidime fînansekirinê. Ez *dikarim* awqas mecalên pêşin bidime we, çiqwas wera lazimin, ku hûn destpê bikin”.

Ew merivê xweyîmîlîyard herdu bîznêsmêna dinihêre, kîjana serên xwe kiribûne ber xwe û dipirse:

— Hûn bona çi hevsûdîyê li wê yekê dikin, çi ku ewê stendîye? Hûn bona çi difikirin, wekî ew ji we zêdetire? Min we her yekîra got, wekî min *dikaribû* awqas mecal bidana we, çiqwas bona we lazim bûn, ku we xiyala xwe mîyaser bikira. Min tu sînor danenîn, ku alî we bikim û min awqas da we, çiqwas we hîvî kir. Bona çi xiyal û progiramên we mezin nîbûn?

Ew berbirî xweya dikana nan dibe û dipirse:

— Bona çi we progiram nekir ku dikana nane diha mezin hebe? Minê mecal bona wê yekê bidana we. Bona çi we fînansekirina diha zêde bona serêwêrîkirinê nexwest? Eşîyaên we meriva xweş tên û açixîya weye nava wî karîda wê hebûya. Feqet pirsa mine here mezin eve: bona çi we pirogram nekir, ku diha zêde dikanên nan li temamîya

bajêr hebûna û bi kutasî we lîsênzîyaên xwe li temamîya welêt belakirana, ku şuxulê we pêşda biçûya?

Peyî wê yekêra ew berbirî cahilê avayîçêkir dibe:

— Bona çi we çend alîkar hîn nekirin û çend kirêkirî negirtin bona ku dewsa yekê salê 20 mal bihatana çêkirinê? We dikaribû cîhên xebatêye zêde sazkirana. We bona çi erdê diha mezin nekirî? Bona çi we çiqlên hevaltîya xwe li temamîya welêt venekirin, ku bona malên bedew li bajarên cuda-cuda çê bikirana? Minê xiyala we bida fînansekirinê, çimkî weyê alî malbetên wan bajara bikira û bi kutasî weyê alî welatê xwe bikira. Wedê şuxulkarîya we sînorkirî bû, çimkî mecalên weye pêşin sînorkirî bûn, çimkî xiyala we sînorkirî bû.

## Zêdayî

Em, mesîhî, gelek cara bi zanebûn difikirin, wekî gerekê gelek tiştên me tunebin. Lê bi çiqwasîva fikirdarîya wî cûreyî anegorî Xebera Xwedê ye? Îsa elam dike:

> "Bona wana, yên ku bi kardarî, çi ku stendine, didine xebatê, wanra wê bê dayînê û serda zêdebe û zêdaya wan wê hebe" (Metta 25:29, NLT).

Xwedê ne dijî zêdayêye. Ew dijî wê yekêye, wextê ku zêdayî serwêrtîyê li me dike. Firqî eve: ew merivê ku nava jîyana xweda xweyê zêdaya matêrîyalîye, berbi dua, tişta, pera, hebûnê, yan jî serwêrtîyê dicedîne, ku xwestinên xwehizîyê mîyaser bike. Yan jî ew ji tirsê mecala berev dike.

Gelek meriv, dawîya sedsala 20-î bi guhdarkirina têorîya derheqa gulvedanêda, bi xwestinava tijî bûn. Rûyê timaya wanda gelek dersdar û bawarmenda terka xeberdana derheqa gulvedana rastîya Xwedêda dan. Geleka destpê kir ji xebera "*gulvedan*"-ê xwe dûr bigrin. Feqet rastî ewe, wekî zêdayî bona me lazime, bona ku em xebata diha mezin û kardar bona Padişatîyê bikin. Diqewime Xwedê hema bo vê yekê jî got: "Delalê min, ji her tiştî zêdetir ez dixwezim, ku tu gulvedî û saxlembî, çawa ku şexsê te gulvedide" (G Yûhenna 2, KJV).

Nava mesela meda xêrkirê xweyîmîlîyard bona her bîznêsmênekî 245 mîlîon nedane, çawa ku da ew jina cahil. Ewî pere anegorî xiyala

her yekî da. Eger em wê gotinê lêkoloîn bikin, li kîderê Îsa derheqa zêdayêda dibêje, hûnê bibînin, wekî carîya bi perê wekehev destpê nekirin. Wana perên newekehev stendin: “Ewî pênc torbe zîv da yekî, du torbe zîv dane yekî mayîn û torbek zîv da yê xilazîyê, her kesîra weke xebata wî bela kir” (Metta 25:15, NLT). Karebûna wan bi wê yekêva dihate qirarkirinê, ku wana bona pêşeroja xwe çi didît.

Nava mesela minda jina cahile ewlin tenê dikaneke biçûk didît. Avayîçêkirê cahil nava salêda tenê çend mal didîtin. Karebûna jina cahile sisîya ew bû, wekî ewê çi ku didît û ewê yekê jî dewa hê zêde dikir.

Em qewata Xwedê bi cûrê kardar didine xebatê, wextê ku em jîyanên meriva û padişatîya Xwedê çê dikin. Eger em bi guhdarî vê gotinê bixwînin, emê tiştekî hewaskar bibînin. Ji carîya du meriv hindava merivê dewletî dilsoz bûn: çi ku bona wan hatibû dayînê, wana dubare û çend bare kirin (nava serpêhatîya meda ji hersê bîzênêsmêna tenê yekî ew hebûn çendbare kir). Nava serhatîya Îsaye gilîkirîda, ew merivê dewletî zêdekirina hebûnê çawa *baş* yan jî *qenc* nav kir (binhêre Metta 25:21,23).

Wî merivî ew xulamê ku hebûn xweyî kir û zêde nekir, çawa merivê xweranedîtî nav kir. Ewî torbekî zîva ku dabû wî, paşda hilda û da yê mayîn, yê ku gîhandibû deh torba û bi wê yekêva reqema torbên wî bûne 11. Nêzîkbûna wî cûreyî ji ya *sosîalîstî* dûre: ew diha zû nêzîkî ya *kapîtalîstîye*.

Em difikirin, wekî mesîhîyê baş gerekê çi ku heye xweyî bike. Bi gilîkî mayîn gotî, meriv bi wê yekêva razî dibin, eger hebûna wana têra jîyanê dike, lê bi rastî ew *xweranedîtîne*. Temîya Xwedêye ewline bona merivatîyê ev bû: “Bigîjin û zêdebin” (Destpêbûn 1:28). Ewî tenê derheqa hebûna zarokada nedigot, lê elam dikir: “Ez hîvîyême, wekî hûnê zêdebin, wî hemû tiştî çendbare bikin, çi ku Ez didime we û wê yekê paşda bidine Min”.

Xwedê karebûna hînbûnê daye min. Bi kerema Wî ew pêşkêş çendbare bûye û paşê paşda hatîye vegerandinê, daye Wî, û bi saya hînkirinên min, nivîsara kitêba, belakirina bangên meye nava întêrnêtêda, li temamîya dinyayê bona serwêra û qulxçîya matêrîyalên hînbûnê, cîhwarkirina matêrîyalaye întêrnêtêda û gelek şuxulên mayîn, bela bûye. Roja îroyîn Ewî diha gelek tişt mîyaser

kirine, ne ku min dikaribû derheqa wê yekêda bifikiryama, wextê ku ez cahil bûm. Feqet bi dîtina wê yekê, ku hetanî roja îroyîn çi qewimîye, du fikir pêşda tên, ya ewlin ewe, wekî ez difikirim, ku gelo min bi cûrekî Ew sînor kirîye, yan na. Ya duda, ew hemû tişt şabûnê dide min, çi ku bi karebûna Wî hatîye kirinê. Ev herdu fikir jî alî min dikin, ku ez şikestî û aktîv bimînim.

## Derdana me

Gelek tişt hene, wekî Ew dikare bi destî me bike. Nenihêrî wê yekê ku em fem dikin, yan na, sînorkirinên ji me her yekî jî hene. Anegorî Efesî 3:20 ew bi wê yekêva tên qirarkirinê, ku çi dikarin “hîvî bikin, yan bifikirin” bona alîkirina merivên başqe. Banga Xwedêye zelal, ya bona me eve: “Kerema Min ji wî sînorî gelekî dûr bela bûye, ya ku we qirar kirîye”. Îsa dibêje: “Kî ku bawar dike, bona wî hemû tişt, tiştê bûyînêye” (Marqos 9:22, NKJV).

Sînorên me (ew çi ku em dikarin bikine nav) qirar dikin, ku para meye ji alîyê dayîna Xwedêye bêsînorda wê çiqwas be. Nava serpêhatîya meda, ya derheqa merivê xweymîlîyard û sê bîznêsmênada bû, derdana meriva ewlin xiyalek bû, bona kîjanî sed hezar dolar lazim bûn, bona yê duda 250-î hezar dolar, lê bona ya sisîya 245 mîlîon dolar lazim bûn.

Bi rastî gotî, hema norma derdana me Xwedê dide sînorkirinê. Diqewime Xwedê ji me bipirse?: “Bona çi hûn tenê derheqa awqasîda difikirin, çiqwas têra we û malbeta we dike? Hûn bona çi ji wê qewatê hilnadin, ya ku min nava weda danîye? Bona min ev fikirdarî ya *qenc* nîne: ew *xweranedîtine*.

A bo vê yekê jî Pawlos bi dil û can dua dike, ku em bizanibin û fem bikin, ku:

> “...çîhe qewata Wî ya *bêhesab* û *bêsîno*r û *mezinaya here bilind*, ya ku nava medane û bona meye, ku em bawar dikin...” (Efesî 1:19, AMP).

Bi guhdarî wan xebera bixwînin, kîjan min nava vê xeberêda başqe kirine. Dora her yekê bisekinin û bifikirin. *Bêhesab*. Hûn nikarin wê hesabkin. *Bêsînor*. Tu sînor tunene. *Mezinaya here mezin*. Nava temamîya ezmînda qewata ji wê zêdetir tune.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî ew qewat bi temamî *nava* medane. Usa nîne, wekî em dikarin car-carna wê qewatê ji sera “Textê Xwedê” bistînin. Qewata Wî îdî nava medane.

Ew jî *bona meye*. Ew karebûna çend barwarkirina dide me. Alî me dike, ku em zêdebin. Ew me dike kardar, ku em alî merivên başqe bikin. Bi wê yekêva em mîna ronahîyê diçûrisin.

Ev qewat hema kerema Xwedêye.

## Nava jîyanêda serwêrîyê bikin

Kerema Xwedê nayê ber çava. Ew belaş (bêpere) hatîye dayînê, bi saya çi xilazbûn, afûkirin, tebyeta nû û qewata me heye, ya bona jîyana bi emirê xwedêparêzîyê. Ew usa jî karebûnê dide me, ku em zêdebin, berê xwe bidin û nava emirda serwêrtîyê bikin. Kerem bi rastî meriva ecêbmayî dihêle. Bi guhdarî xebrên Pawlos bixwînin:

> “Ewên ku kerema Xwedê zêde qebûl dikin û belaş (bêpere) xwe li ber Wî afû dikin, wê bi saya Mesîh nava jîyanêda serwêrîyê bikin” (Romayî 5:17, TEV).

Mezinaya vê gotinê gelekî rast nayê texmînkirinê, bona ku ew yek rastîbe, çimkî fikirên ji wê hatî meriva zendegirtî dihêlin. Diqewime hema eve menî, wekî geleka ew yek hesab hilnedaye. Bi saya Xwedê em gerekê nava jîyanêda serwêrîyê bikin. Em qewatbûyîne, ku her çetinayîkê alt bikin, kîjanê ev dinîya wê bicêribîne li ber me bide sekinandinê. Jîyana li ser vê dinyayê gerekê tiştê herî baş ji me nestîne: dewsê em gerekê nava jîyanêda serwêrîyê bikin. Em hatine kivşkirinê, ku em rêçeke mezin nava dorana hukumê xweda bihêlin. Eve mîsîya me.

Ev yek bi praktîkî çawa diqewime? Em gerekê ji statûsa xweye niha derkevin, ji normê sînorkirî zêdetirbin. Em hatine gazîkirinê, ku hukum bihêlin û bibine serî, lê ne ku poç, li ser bilindayê bin, lê ne ku li ser nimizayê (bnihêre Qanûna Ducarî 28:13). Em ne tenê gerekê ji qewimandinên jîyanêye xirab bilindbin, lê gerekê diha kivş bin, ne ku ew meriv, yên ku tevî Xwedê peyman mor nekirine. Li dinîya tarî em gerekê rêber bin. Serî alîyê çûyînê, şuxulkarîyê û fikira qirar dike, lê poç tenê piştêvaye. Nava hemû govekên civaka meda em gerekê

rêberbin, lê ne ku peyîhatîbin. Gelo niha usa nîne? Diqewime em anegorî wê normê nînin, kîjanê Xwedê çawa qencî nav dike?

Îzinê bidin diha zelal şirove bikim. Eger hûn nava goveka saxlemîxweykirinêda dixebitin, bi kerema Xwedê hûn dikarin mecalên diha nû bona qanckirina nexweşa lêkolîn bikin. Qewata we bêhesab û bêsînore. Xebatkarên we gerekê bi hijmekarî dîna xwe bidine eyantîyên we û xebata we gerekê wana ruhdar bike. Mêtodên weye nû û serwaxtîya we wê usa bikin, ku ew ecêbmayî bêjin: "Awaqas fikir ew ji kîderê destine?". Hûn ne tenê dikarin bibriqin, lê usa jî dikarin kardarîya xweye nava goveka xebatêda çend cara zêde bikin. Merivê bicedînin peyî we bên û wê bixwezin derheqa kanîya karebûna weda bizanibin.

Eger hûn dîzaynêrê komyûtêrêne, wî çaxî şuxulên weye sazkirî gerekê usa nûbin, bighîjine wê derecê, wekî merivên mayîn şuxulên xwe nêzîkî yên we bikin. Hûn û bawarmendên goveka weye mayîn gerekê fikirên usa pêşda bikişînin, wekî temamîya civakê bide peyî we. Li hemû cîha wê hewcê şuxulê we bin û hûnê bi xebata xweye nû eyan bin. Hûnê awqas pêşda herin, wekî merivên mayîne nava goveka weda wê ecêbmayî ji hev bipirsin: "Ew ji kîderê wê yekê distîne?". Hûnê diha zêdebin, eger hûn zanebûnên xwe derbazî wan meriva bikin, goveka xwe bidine berfirehkirinê û emekê xwe bikine nava padişatîya Xwedê.

Eger hûn dersdar, yan jî dersdara mektebêne, bi wê qewata keremê, ya ku nava wedaye, şagirtên xwe hîn bikin, ku ew zanebûna dest bînin, femdarî û serwaxtîya nû, mecalên çêkirina nû dest bînin, kîjan qet fikira dersdarên mayînra derbaz nebûye. Hûn dikarin normên usa pêşda bikişînin û şagirta usa ruhdar bikin, wekî yên mayîn zendegrtî bimînin. Dersdarên mayîn wê ji hev bipirsin: "Ew van fikira ji kîderê distîne?". Hûnê çendbarebin û hûnê hemû karebûnên xwe derbazî şagirta bikin û bi wê yekê dersdarên nû hîn bikin.

Eger hûn bîznêsmênin, hûn dikarin eşîyayên nû û mêtodên frotanêye nû pêşnîyar bikin, yê ku wê ji yên mayîn zêdetirbin. Hûnê stratêgîyayên kirîn- frotanêye kardar pêşnîyar bikin, yên ku wê diha nûbin. Hûnê texmîn bikin kar ji çi tê û ji çi nayê. Hûnê bizanibin kengê bikirin û kengê bifroşin, kê tev bikin û kê derxin. Bîznêsmênên mayîn wê ecêbmayî bicêribînin fem bikin, ku hûn bo çi usa açixin. Hûnê zêdebin, bi hînkirina bîznêsmênên cahil û bi merdanî xebitandina mecalaye bona çêkirina padişatîya Xwedê.

Hema ev prînsîp jî ya xebitandinêye, eger hûn sazbendin, xebatkarê ulmîne, sportsmênin, ulmdarin, xebatkarê polîsîyayêne, dayîk û kevanîya malêne, eger hûn têlêvîzyonêda dixebitin, nava qulixa leşkerîdanin, yan jî nava govekên mayîndanin. Ev hemû mesele bi çiqwasîva jî berbiçavbin, yeke ew nimûna mîsîya me didine kivşê.

Ji me her yek hatîye gazîkirinê, ku nava govekên civakêye cuda-cudada bixebitin. Em li kîderêbin jî, em gerekê rêber û pêşketî bin. Serwêrtîyên me gerekê gulvedin, wî çaxî jî, wextê ku pirsgirêkên mayîn hene. Cîh û warên me gerekê bêqezîyabin, diha bedew û çareserkirîbin. Cîhên xebatên me gerekê pêşketî bin. Sazbendîya me gerekê ya nûbe û sazbendên vê dinyayê gerekê meselê ji me hildin. Hema wî cûreyî gerekê nava hemû govekên mayînda jî bibe. Efrandarîya me gerekê meriva ruhar bike û nava hemû derecada ya xwestinêbe.

Xebata me nava govekên sportê, wedederbazkirinê, kûltûrayê, prêsayê, yan jî her govekeke mayînda gerekê berbiçavbe. Wextê ku merivên heq serwêrîyê li bajar û welatên me dikin, ew bajar û welat gerekê gulvedin. Ew mekteb, li kîderê em hîn dikin û rêberîyê dikin, gerekê pêşketina mezin bidine kivşê. Wextê ku bawarmend nava tiştekîda dixebitin, li wir gerekê zêdaya çêkirinê, tezebûnê, kardarîyê, edilayê, hevfemkirinê û bêqelpîyê hebe. Em, şagirtên Îsa gerekê bona dinîya tarî bibine ronahî. Bi kerema Xwedê em gerekê nava civaka meye tarîda *berbiçav bin*.

## Ji normên sînorkirî derbaztirbin

Vê şedetîya derheqa Danîêlda bixwînin:

> "Danîêl nava serkar û serwêrada bi cudatîyên xweva usa berbiçav bû, wekî padişê têra didît, ku wî li ser temamîya padişatîyê çawa serkar kivş bike" (Dnîêl 6:3, NIV).

Bi rastî meriv ecêbmayî dimîne. Nivîsare, wekî Danîêl berbiçav bû. Nivîsar nîne: "Xwedê Danîêl berbiçav kir". Hemû tercimên Încîlê dibêjin, wekî hema Danîêl berbiçav bû. Încîla "Mêsîcê"-da nivîsare, wekî ew "bi temamî ji yên mayîn derbaztir bû".

Ew yek Danîêlra çawa li hev hat? Karebûnên wîye başqe hebûn, çimkî ew Xwedêva girêdayî bû. Her merivek, nava kîjanîda Ruhê

Xwedê dijî, gerekê hema rastî wî cûreyî be. Nava Încîla "Standarta Amêrîkîye Nû"-da nivîsare: "Danîêl destpê kir berbiçav be, …çimkî ruhê wî *cûrekî mayîn* bû". Bûyîna "*cûrekî mayîn*" dide kivşê, ku "ji normên sînorkirî derbaztirbin, ji halê niha derkevin, ji cûrê sade zêdetir bikin". Carna em dikarin diha baş xeberekê fem bikin, bi dîtina wê yekê, ku fikira wê ew nîne, dêmek bi lêkolînkirina antonîma wê xeberê. Antonîma gotina "*cûrekî mayîn*" xeberên "*sade*" û "*normal*"-in. Dêmek usa dertê, wekî jîyana bi emirê sade miqabilî jîyana bi ruhê cûrekî mayîne.

Ruhê Danîêl cûrekî mayîn bû. Eger ruhê me cûrekî mayîne, wî çaxî fikira me û bedena me jî wê wî cûreyî bin. Eger ruhê me rêberîyê li me bike, wî çaxî efrandarî, fikirdarî, serwaxtî, zanistî û hemû alîyên jîyanêye mayîn wê cûrekî mayînbin, lê ne ku eger em bi qewata xwe bijîn. Eger em bi rastî wê keremê fem bikin, ya ku nava *medane* û *bona meye*, emê bizanibin, wekî nava jîyana meda tu sînorkirin tune.

Em wê gotinê bîr nekin, ya ku qewata Xwedêye nava meda şirove dike: *bêhesab, bêsînor û mezinaya zêdetir*. Danîêl ew yek hilda, çi ku bona wî bû û ew yek nava feydayên heleqetîyên tevî Xwedê qewimî. Ewî zanibû, wekî anegorî peymana wîye tevî Xwedê, ew gerekê bibûya serî, lê ne ku poç. Feqet peymana meye tevî Xwedê diha mezine, ne ku peymana Danîêl.

Em diha bi hûrgilî jîyana Danîêl lê binihêrin. Ew û sê hevalên wî ji alîyê Îsraêlêda hatine dîlhildanê, yê ku welatekî biçûk bû û welatekî dinîyaêyî herî hukumdar bû. Eger hûn amêrîkîne û difikirin wekî nava sedsala dawîda welatê me welatê herî hukumdar bû, lê rastî ewe, wekî ew welat tu cara nêzîkî serwêrtî û hukumê Babêlonê nîbûye. Babêlonî li ser temaîya dinyayê serwêrtî dikirin. Ew nava govekên êkonomîkî, sîyasî, leşkerî, civakî, ulmî, xwendinê û kûltûraêda yên ewlin bûn.

Babêlon bawar bikî nava hemû govekada pêşketî bû û ji temamîya dinyayê derbaztir bû. Feqet em derheqa Danîêl û hevalên wîda bixwînin: "Padişê çi pirs bida, yan jî çi pirs bilind bikira, van her çara *ji deh cara zêdetir* ji serkarên padişatîêye mayîn zanibûn" (Danîêl 1:20, TEV). Nava tercimên mayînda nivîsare, wekî ew deh cara zêdetir baştir bûn, deh cara zêdetir serwext bûn û deh cara

zêdetir fem dikirin. Wana fikirên usa didane xebatê, yên ku ser fikira serwaxtên wî welatîra derbaz nedibûn û ew fikir kardar bûn. Bi texmîn, efrandarî, nûkirin û serwaxtîya wana ji deh cara zêdetir hukumdar bûn, ne ku rêberên mayîn, li cem kîjana Ruhê Xudan tune.

## Diha mezin, ne ku Danîêl

Bi bîra xweda xweykirina vê gotinê Îsa bixwînin: "Yûhenna diha mezin bûye, ne ku her mrivekî ku jîyaye" (Lûqa 7:28, TEV). Ev yek dide kivşê, wekî Yûhennayê Nixumdar diha mezin bû, ne ku Danîêl. Hûn necêribînin van herdu meriva bi kirên wanva himberî hev bikin. Yûhenna nava qulixa ruhanîda bû, lê nevsê hukumatêyî resmî bû. Feqet Îsa zelal eyan dike, wekî Yûhenna zêdetir bû:

> "Feqet nava padişatîya Xwedê da yê herî biçûk diha mezine, ne ku Yûhenna" (Lûqa 7:28, TEV).

Bona çi nava padişatîya Xwedêda yê herî biçûk diha mezine, ne ku Yûhenna. Îsa hela hê xaç bilind nekiribû, bona ku merivatîyê xilaz bike û ruhê Yûhenna hela hê xilaz nebibû. Derheqa Yûhennada meriv nikarbû bigota: "Çawa ku Îsaye, usa jî Yûhennayê Nixumdare li vê dinîyaê" (binihêre A Yûhenna 4:17). Dêmek derheqa meda hema usa nivîsare. Yûhenna nehatibû bilindkirinê û li ezmîn tevî Mesîh rûniştibû (binihêre Efesî 2:6). Çawa jî hebe eva derheqa medane. Bo wê yekêye ku roja îroyîn, yê herî biçûk nava padişatîya Xwedêda diha mezine, ne ku Yûhenna. *Hûn vê yekê fem dikin*?

Hinek xwedêzan li ser wê fikirêne, wekî piştî rabûna Îsaye ji nava mirîya hetanî rojên me li ser vê dinyayê ji du mîlîyarda zêdetir mesîhî jîyane. Eger nişkêva zelalbe, wekî hûn nava wan du mîlîyard bawarmendada yê herî biçûkin, hûn diha mezinin, ne ku Yûhennayê Nixumdar û ew yek dide kivşê, wekî hûn *diha mezinin, ne ku Danîêl*. Wî çaxî cêrge pirs pêşda tên. Hûn bi temamî fem dikin ku hûn kîne? Hûn berbiçavin? Meriv dikare bêje, wekî hûn deh cara zêdetir serwaxtin, başin, efrandarin, ne ku ew meriv, tevî kê hûn dixebitin, yên ku tevî Xwedê bi destî Îsa Mesîh nava peymanêda nînin? Eger na, menî kîjane? Diqewime hûn bawar nakin, wekî hûn dikarin kerema Xwedê diha zêde bistînin?

Werin em hinekî zêdetir derheqa vê yekêda bifikirin. Îsa eyan kir, wekî em "ronahîya dinyayê"-ne (binihêre Metta 5:14).

Nava peymana Nûda carekê nîne, wekî jîyanê li dinîya tarî himberî ronahîyê dikin (binihêre Metta 5:14-16, Yûhenna 8:12, Karên Şandîya 13:47, Romayî 13:12, Efesî 5:8,14, Kolosî 1:12, Fîlîpî 2:15, A Têsalonîkî 5:5 û A Yûhenna 1:7; 2:9,10). Ev rastî gerekê nava merkeza jîyana meye mesîhîtîyêda hebe.

Bûyîna ronahîya vê dinyayê çi dide kivşê? Gelek hesab dikin, wekî ew tenê derheqa kirên medane, dêmek em gerekê qenc û hizkirîbin, li hemûya xweş bên û ysa jî Yûhenna 3:16 ezberî bizanibin. Gelo wê çi biqewimîya, eger Danîêl ronahîya wî cûreyî bûya? Wê hemû tişt çawa bûya, eger her roj, wextê çûyîna li ofîsên dewletê, meremê wî ew bûya, ky tevî xebatkarên xwe baş xeberda û bigota: "Gyhdar bikin, rêberên babêlonî, Zebûr 23-ada nivîsare: "Xydan Serwêrê mine û ezê bîra tu tiştî nekim…".

Gelo serkar û serwêrên mayîn wê derheqa Danîêlda çi bigotana, wextê ku ew dema nanxwerinê ji ofîsê biçûya bona duakirinê? Ez difikirim, wekî wanayê bigota: "Em usa şane, wekî ewê fanatîk ji vir çûn. Em gumanin, wekî ewê hetanî dawîya rojê dua bike. Ew gelekî cûr*ekî mayîne*".

Bona çi wana qanûneke usa qebûl kir, ya ku îzin nedida, ku Danîêl dua bike (binihêre Danîêl 6:6-8). Diqewime menî ew bû, wekî ew deh cara ji wana aqiltir, serwextir û efrandar bû, ne ku ew. Danîêl her dem pêşketin distend û bi qulixa xwe ji yên mayîn bilindtir bû, hetanî ku ew bû serkarê hemû serkara û diqewime wan meriva hevsûdî lê dikirin.

Ew serkar ketibûne nava hesarê. Diqewime ewana tevayî şêwira xwe dikirin: "Em fem nakin. Dersdar, ulmdar û serwêrên usa em hîn kirine, yên ku li temamîya dinyayê yê here eyan û here serwaxt bûne. Ew ji welatekî biçûk hatîye. Fikirên xwe ew ji kîderê distîne? Ew çawaye, wekî ew diha gelekî kardare, ne ku em? Diqewime menî ewe ku ew rojê sê cara dua dike? Werin em qanûnekê qebûl bikin, ya ku îzinê nede, ku ew dua bike, bona ku ew me nava sîyêda nehêle (bi rastî, wana dixwest Danîêl bigirta).

Danîêl ronahîke kivş bû, çimkî ew şexsekî cuda bû. Ew bona merivên wedê xwe, bi saya cudatîyên xwe diçûrisî. Li merivên ku li

dora wîbûn, ew xweş nedihat, çimkî wana hevsûdî Danîêl dikir. Feqet, ez dikarim bînime ber çavê xwe, wekî gelek meriva, nava wanda usa jî padişa bû, şedetîya heyîna Xwdêyê sax bi saya karebûnên Danîêl didîtin. Ew yek li wana xweş dihat û def didan, ku ew jî qedirê Xwedêyê Danîêl bigrin.

Danîêl guhdarîya meriva dikişande ser xwe ne ku bona wê yekê, wekî ewî Încîl baş zanibû, ne ku bona xeysetê milahîm û bona rojê sê cara duakirinê, lê bona wê yekê, wekî ew diha kardar bû nava xebata xweda û xeysetê wî yê Xwedêparêzîyê bû. "Hîmê wî, avayê wîyî hîmlî û matêrîyalên wîye çêkirinê" berbiçav bûn.

## Şedetîya kerema Xwedê nava jîyana minda

Ez bi xwe nava jîyana xweda bûme şedê kivşbûna qewata kerema Xwedê. Wan salên ku ez diçûme mektebê, bona min dersa here dijwar înglîzî bû û xebata here dijwar nivîsara serhatîya bû. Ez gelekî nerazîbûm, wextê ku teslîmî min dikirin, ku ez serhatîya ji sêrûpelê binivîsim. Min bi seheta dinivîsî û min bi çetinayî nîvê rûpelê bloknota xwe tijî dikir. Nivîsarên xweye nebaş min diqelaştin û diavîtin. Wextê întamên mektebêye xilazîyê, min ji qalê înglzî 800-î tenê 370 qal berev kirin. Bona ku hûn fem bikin, wekî ew qîmet bi çiqwasîva nimize, ez dikarim bêjim, wekî wextê seferên xweye nava hemû salada ez rastî merivekî hatime, yê ku qîmetê diha nimiz stendibûn.

Sala 1991-ê, wextê duakirinê, Xwedê minra e'yan kir, wekî dixweze ku ez kitêbê binivîsim. Wexê ku ew yek qewimî, ez fikirîm, wekî Ewî min yekî mayînra şaş kirîye. Mînanî serhatîya Sarayê, ya ku peymana Kevinda nivîsare, ez gelekî kenîyam. Minê çawa bikaribûya hema serîkî kitêbê binivîsîya, lê serbara serda temamîya kitêbê? Wî çaxî min derheqa kerema Xwedêye bêhesab, bêsînor û mezinaya zêdetir hesab hilnedabû. Piştî stendina wê gotinê, ya derheqa nivîsara kitêbêda, deh meh derbaz bibûn, wextê ku ji ştatên cuda-cuda, bi firqîya du hevtîya du jin hatine cem min û gotine min: "Con, Xwedê dixweze, ku tu binivîsî. Eger nenivîsî, Ewê wan banga bide yekî mayîn". Peyî wê yekêra min peyman tevî Xwedê mor kir û ew yek qebûl kir, wekî ez kerema Wîva girêdayîme. Beşa vê serhatîyêye

mayîn ezê serê kitêbêyî mayînda gilî bikim, lê vî serîda ezê tenê bêjim, wekî min îdî 19 kitêb nivîsîne, yên ku ji 90-î zêdetir zimana hatine tercimekirinê û bi mîlîyona mesela li temamîya dinyayê hatine belavkirinê.

Keremê ne tenê karebûna nivîsara kitêba, lê usa jî ya terîfkirinê da min. Cara ewlin, piştî zewaca me, wextê ku Lîzayê terîfa mine ewlin bihîst, ew li cêrga ewlin rûniştî xewra çû. Min awqas xirab terîf dikir. Hevala Lîzayê, ya ku li rex wê rûniştibû usa raza bû, wekî ji devê wê şirik dikişiya. Eva qet piştgirî jî nîbû. Niha meriv ranazên, wextê ku ez terîf dikim. Berê min ew yek bi qewata xwe dikir, lê niha ez hîn bûme bawarîya xwe li kerema Wî bînim, kerema Wîva bême girêdanê û îzinê bidim, wekî kerema Wî bixebite.

Nenihêrî wê yekê, wekî ez bi qewata xwe negihîştime açixîyê, lê Xwedê mecal da min, ku ez bi wan her du goveka qulixî mîlîyona meriva bikim.

## Jîyana bi rastî baş

Werin em normên bona jîyana baş tomerî bikin. Eger hûn dikarin bawar bikin, bona we tu tiştekî nebûyî wê tunebe, çimkî Ew dikare bi destî we zêde bişuxule û ji hemû tiştî zêdetir bike, lê ne ku wê yekê ku hûn hîvî dikin û pê dihesin. Ev qewata hundur, bi kîjanê Ewê xebata Xweye nava jîyana weda bike bêhesabe, bêsînore û ji her qewatekê zêdetire. Jîyana we gerekê mînanî serpêhatîya min û Lîzayêye li sera hevaltîya avayîçêkrinê nîbe, wextê ku me matrîyalên bona mala nû bijartin. Tu sînorkirineke we tune, çimkî şuxul û şexsên we bin hukumê kerema Xwedêdanin. Bi vî cûreyî, îzinê bidin Ruhê Pîroz, ku ew xiyala we bide berfirehkirinê. Derheqa tiştên mezinda bifikirin, bawar bikin û bi avîtina gavên anegor pêşda bilivin.

Faktorek heye, ya ku rola qirarkir bona mîyaserkirina nivîsara vî serê kitêbêda dilîze. Eger ev cudatî tunebe, emê bi texmîn, acizbin û emê şaşbin, wextê ku em bicedînin kardarbin û çendbarebin (zêdebin). Serê kitêbêyî mayînda emê derheqa vê cudatîyêda xeberdin, ya ku çawa *cûre-cûretî* tê navkirinê.

15

# JIHEVDERXISTIN

"Lê xwerina giran bona merivên gihîştîye,
yên ku sewdayê xweda ketî-rabûyîne,
qencî û xirabîyê ji hev derdixin"
Îbranî 5:14

Pîrozî dewlemendî nîne, ya ku bona
çend meriva têra hatîye dîtinê, lê ew borcadrîya we û mine.
— Dayîka Têrêza

Çawa merivê gihîştî, ew meriv tên hesabê, yên ku yazyên xweda mezinin (gilî ne ku derheqa bedenêdane, lê derheqa gihîştina ruhanîdane). Em hemû jî çawa zarok ji dayîk dibin û mezin dibin, dighîjin. Hema bi wî cûreyî jî, em bi ruhanî tên dinyayê çawa zarok û hîvîyêne, wekî emê qasî yaşê Mesîhî kamil bigihîjin.

Di navbera van herdu gotinada firqî heye. Gihîştina tebyetî wedeva girêdayîye. We qet bihîstîye, wekî zaroka du salî bigihîje hetanî 180 santîmêtrî? Bona gihîştina wî cûreyî ji 15-a hetanî 20 sal lazimin. Feqet, gihîştina ruhanî wedeva girêdayî nîne. Hûn qet rastî bawarmendên usa hatine, yên ku nava Îsada yeksalîne, lê ew diha gihîştîne, ne ku ewên 20 sal pêşda ku xilaz bûne? Anegorî nivîsara Îbranî 5:14-a, norma gihîştinê ewe, wekî sewdayê me bikaribe bêyî şaşî qencî û xirabîya rast ji hev derxe.

Ew yek jî girînge bidine kivşê, wekî pênc alîyên dilê weye texmînkirinê hene, çawa bedena we. Derheqa wê yekêda li beşên Încîlêye cuda-cuda zelal hatîye nivîsaraê. "*Tam bikin* û hûnê *bib*înin, wekî Xudan qence" (Zebûr 34:8, NLT). Nava vê gotinêda carekêra derheqa alîyê dilda hatîye nivîsarê.

Carekê Îsa nava cimetêda elam kir: “Her merivek, guhê kîjanî bona *guhdarkirinê* heye, gerekê guhdar bike û fem bike” (Metta 11:15, NLT). Hemû merivên hazir dikaribûn bi guhên xweye tebyetîva guhdar bikirana, lê Ewî derheqa guhên hundurda digot.

Pawlos xebera Xwedêye bona Îsarêlê got: “Dest nedine tiştên wane heram, û ezê we qebûl bikim” (B Korintî 6:17, NLT). Hema ewî şandîyî jî nivîsî, wekî “behna zanebûna Xwedê bi me li her cîha bela dibe” (B Korintî 2:14).

Em dikarin wan hemû pênc alîyên dile bona texmîkirinê nava van çar gotinada bivînin.

## Jihevderxistin

Meriv çawa dikare qencîyê û xirabîyê bi hevra şaşke, bi taybetî nava wedên usada wextê ku xapandin bi berfirehî belabûyîye? Meriv çawa dikare usa bike, ku nekeve dîsa wê telê, kete nava kîjanê usa jî Hêwa, wextê ku ewê bawar kir, wekî xirabî qenc û serwext bû? Bersiva vê pirsê ewe, ku meriv gerekê *jihevderxistinê* bide xebatê. Wî çaxî meriv çawa dikare wê yekê pêşda bibe, bi xofa xwedêtîêye rast? Malaxîyê pêxember pêşda got, wekî nava wedê dawîda wê du cûrên bawarmenda hebin: yên ku bi xofa Xwdêne û bêyî xofa Xwedêne. Wextê ku dikevine nava halê çetin, ew bawarmendên bêyî xofa Xwedê destpê dikin tişta himberî hev bikin û şikyat bikin. Li wana xweş nayê, wekî ew gerekê bi dijîderketinê, tengasîyê û zehmetîyê qulixî Xwedê bikin, lê wî çaxî, wextê ku gunehkar, yên ku Xwedêva girêdayî nînin, gulvedidin, pêşda diçin.

Merivên, ku ji Xwedê ditirsin, dîsa nava dijwarîyên wî cûreyîra derbaz dibin, lê cûrekî mayîn dikin. Ew derheqa qencîya Xwedêda dibêjin. Ew, bi dîtina tengasîyê, şerkarîyê dikin û li wî hemû tiştî bawar dikin, çi ku Ew derheqa halên dijwarda dibêje wana. Ew diha gelekî derheqa xwestinên Xwedê, pirogram û padişatîyêda difikirin, lê ne ku derheqa halê wanî wedelîyî çetinda. Ew zanin, ew nava dilsozîya Wî da îzbatbûyîne. Nêzîkbûna wan vî cûreîye:

> “Eger darên gêlasa kulîlk nedin û fêkî negihîjin, eger hemû sêv kurmîbin, û gihîştina deştên gêngim bisekine, eger axlê pêz bêyî pez bimînin û

> tewilên heywana valabin, ezê rûmetkirineke şabûnê bo Xwedê bistirêm. Ezê berên tekerên şabûna xwe bidime berbi Xwedêyê Xilazkirê xwe. Bi wê gumanê, wekî padişatîya Xwedê wê serbikeve, dilê min qewîn û qewat dibe. Ez mînanî xezalê direvim. Ez xwe mîna padişê çîya texmîn dikim" (Hebaqûq 3:17-19, MSG).

Bi destî Malaxîyê pêxember Xwedê got, wekî wê wana bike xiznên Xweye mexsûs (bîr bînin, wekî Pawlos derheqa "derdanên mexsûs"-da B Tîmotêyo 2:21-da, CEV) digot. Malaxî pêşda got, wekî bona merivên bi xofa Xwedê tiştekî şabûnê jî wê evbe: "Hûnê careke mayîn merivên heq û neheq ji hev derxin" (Malaxî 3:18, NKJV). Bi gilîkî mayîn gotî ev bawarmend wê qencîyê wî hemû tiştîra şaş nekin, çi ku qenc nîne.

Serê kitêbêyî derbazbûyîda me norma qencîya Xwedê, zêdayî dît ya ku diha zêdeye, ne ku em dikarin hîvî bikin, yan jî bizanibin. Zêdaya bona kesekî dikare bibe menîya ketina Wî, lê kesekî mayîn bibe mecaleke mezin. Eger zêdayî meremê meye hûnê bêyî şikberî bikevine dîsa wê telê, ketine nava kîjanê Hêwa, Kayen, Balam, Korx, Şaûl, Gêhêzîya, Cihûda, Alêksandros, civîna Lavodîkê û gelek merivêş başqe. Feqet, eger meremê weyî pêş xweşhatina li Xwedêye, hûn gerekê bikarbin qencîyê û xirabîyê ji hev derxin, bona ku hûn bikaribin serwêrtîya bi rastî li wê zêdayê bikin.

Jihevderxsitin cudatîke kilîte, lê norma karebûna meye jihevderxistinê meriv dikare himberî xofa meye hindava Xwedê bike. Îzinê bidin careke mayîn vê fikirê biwekilînim: bi çiqwasî zêde xofa meye Xwedê hebe, bi awqasîva zêde serwaxtîya diha mezin emê bistînin, bona ku ji hev derxin. Destpêka padişatîya Xwedê Silêman kire gazî: "…dilê serwaxt bide Xulamê xwe, bona cimeta Te bifikire, qencîyê û xirabîyê *ji hev* derxe" (G Padişatî 3:9).

Ew serwaxtî, kîjanê Silêman serwêrî dikir, tiştê gotinê nîbû. Wan sala, wextê ku ew peyî Xudan diçû, ewî dinivîsî: "Eger tu bona *jihevderxistinê* bikî gazî…eger tu mînanî zîv wê bigerî û mînanî xiznên veşartî bigerî, wî çaxî tê xofa Xudan fem bikî" (Gotinên Silêman 2:3-5, NKJV).

Feqet, hema Silêman xofa xweye hindava Xwedêda unda kir, ew şaş bû û îdî nikaribû qencîyê û xirabîyê ji hev derxe. Bona wî hemû tişt bû weke "valayê" û "xebata bayê". Temamîya kitêba Zanebûnê

merivê şaşbûyî û tevîhevbûyî dide kivşê, yê ku xofa hindava Xwedêda unda kirîye û ew nikare ji hev derxe. Fikira wî bi keder bû. Nava salada dilê min bona wan gelek rêbera û bawarmenda diêşîya, yên ku wî cûreyî xofa Xudan unda dikirin û diketine nava xapandinê, çimkî ew ji jihevderxistinê miqûf diman. Çawa ku min îdî got, wextê ku xofa meye Xwedêtîyê heye, em îzinê didin ku kerema Xwedê hemû heramîya ji me dûr bixe. Tiştekî hewaskare, feqet jihevderxistina me jîyana xwedêparêzîyêva girêdayîye. Dêmek em careke mayîn dibînin, wekî pîrozî çêkirina hîmlîye, li ser kîjanê em hemû qirarên xwe diatînin, girêdayî karîêra mera, heleqtîyara, fînansara, mecalara û her govekeke jîyanêra.

Berî her tiştî em gerekê bicedînin, ku xofa ji Xwedê li cem me hebe. Eger ev yek bibe pirsa meye sereke, emê rûyê zêdayêda neyêne xapandinê. Nivîsare: "Ewê ku gumana xwe diatîne ser hebûnê, wê jorda bikeve" (Gotinên Silêman 11:27). Feqet, hema wê kitêbêda jî nivîsare: "Ezim yê pir'zane... Hebûn û rûmet li cem Min heye..." (Gotinên Silêman 8:14,18). Û careke mayîn: "Heqê şikestîbûnê û xofa Xudan hebûn..." (Gotinên Silêman 22:4). Hebûna rast mecale, ya ku îzinê dide wî hemû tiştî bikî, bona çi Xwedê gazî me kirîye, lê navkirina wî her dem hukumê li ser merivatîyê têra dibîne, dêmek-çêkirina padişatîya Xwedê.

Her şebeq hûn gerekê vê pirsê bidine xwe: "Îro menîya min xofa Xudane, yan destanîna hebûnêye?". Eger meremê we xofa xwedêtyêye, wî çaxî ewê we ji xapandinê biparêze, hûnê nebine tevbûyê xirabîyê, bona ku hûn wê yekê dest bînin, çi ku qence".

Îzinê bidin bidime zelalkirinê: "Mecal, hebûn, dewletîbûn û zêdayî *qencin*. Feqet eger ewin meremê we, hûn nikarin ji hev derxin û hûnê fem nekin, eger wextê destanîna mecala, ew mecal yên *xirabbin*. Ezê ji Încîlê serpêhatîkê bidime xebatê bona şirovekirina vê fikirê.

## Wedeye bistînin?

Li Îsraêlê dayîna qurbanekê, yan dayîna pêşkêşekê qebûlkirî bû, wextê ku diçûne cem pêxember. Şaûlê cahil, yê ku gerekê bibûya padişa, tevî xulamê xwe kerên bavê xwe digerîyan, yê ku unda bibûn.

Gera wana ew dane westandinê û xulamê Şaûl pêşnîyar kir, ku herine bajarê nêzîk û li wir herine cem pêxemberê bi navê Samûêl, ku ew alî wan bike, kera bibînin. Şaûl carekêra got: “Eger em herin, em gerekê çi bidine wî? Torbên meda nan jî nemaye. Tu tiştekî me tune, ku em çawa pêşkêş bidine wî merivê pîroz” (A Padişatî 9:7, MSG). Meriv wextê ku diçûn cem pêxember, usa difikirîn.

Niha em cîguhastî wedekî mayînbin. Fermandarê eskerê asorîya Nêman hate mala Êlyaz pêxember û bi kutasî gura gotinên wî kir, û bi temamî ji nexweşîya gurîbûnê qenc bû. Ew paşda vegerîya cem Êlyaz, ku razalixîyê elam bike û pêşkşêşê bide. Pêxember gotê: “Xudan saxe, li ber Kê ez sekinîme, eger qebûl bikim” (D Padişatî 5:16). Nêman zor lê dikir, ku ew pêşkêşên wî qebûl bike, lê Êlyaz careke mayîn înkar kir.

Alîkarê Êlyazî şexsî- Gehezîya li wir hazir bû. Ew ecêbmayî dinihêrî, wextê ku Nêman ji wir dûr ket, bêyî dayîna pêşkêşa giranbiha. Wextê ku Êlyaz dûr ket, Gehezîya peyî koma Nêman revî. Bi dîtina wî, Nêman koma xwe da sekinandinê û menîya hatina Gêhêzîya pirsî.

Gêhêzîya da bawarkirinê, wekî hemû tişt başe, lê paşê derew kir, gote Nêman, wekî li cem Êlyaz nişkêva hewcetî pêşda hatibû. Ewî got: “Hinekî pêşda ji çîyayê Yêprêmê du pêxemberên cahil hatin. Ewî 34 kîlogiram zîv û du dest kinc bona wana dixwest” (D Padişatî 5:22, NLT).

Nêman du cara zêdetir da, ne ku çiwqas “lazim” bû. Wana xatirê xwe ji hev xwestin û Gehezîya paşda vegerîya, ew pêşkêş nava eşiyayên xweda veşartin.

Paşê ew vegerîya cem Êlyaz û li ber wî sekinî. Êlyaz ji wî pirsî, ku ew çûbû kîderê, lê Gehezîya derew kir û got, wekî tu cîhekîda neçûye. Wî çaxî Êlyaz got:

> “Tu fem nakî, wekî ez bi ruhê xweva li wirim, wextê ku Nêman ji faytona xwe peya bû, ku pêşîya teda bê. Gelo ew wede hatîye, ku pera û kinca, baxçê zeytûnê û baxê tirîya, pêz û golika, jin û mêra bistînin? Eger te ev tişta kir, tu û nisiletên te wê heta-hetayê bi nexweşîya Nêmane gurîbûnê bizêrin” (D Padişatî 5:26,27, NLT).

Kêmasîya xofa xwedêtîyê (û rûyê wê yekêda jî ya jihevderxistinê) nava jîyana Gehezîyada bû menîya xapandinê. Ew fikirî, wekî wedê stendinê hatîye, lê ew wedê wê nîbû. Ew guman bû, wekî ew pêşkêş

layîqî stendinê bû û diqewime difkirî, wekî ewî dikaribû hilda, çimkî serkarê wî ji wî pêşkêşî paşda sekinî. Bi kutasî, mînanî Êlyaz, ewî jî emekê xwe kiribû nava şuxulê Xwedê. Gelo Xwedê nedixwest, wekî ew pêşbiketana? Û awa dewletîkî usa hatibû cem wan, yê ku xwedêyên xerîb dihebandin. Gelo hebûna gunehkara bona merivên heq nayê xweykirinê? Ew hate ser wê fikirê, wekî Êlyaz ew yek rast nekir, wextê ku heqê anegor bona qulixa xwe nestend.

Fikirdarîya Gehezîya ew gav afû kirin, kîjan ewî avîtin, ku ew yek bistenda, kîjan ew çawa tiştê layîq hesab dike. Karebûna wîye jihevderxistinê tunebû û rûyê wê yekêda jî ewî xirabî çawa qencî hesab kir. Bona wê yekê jî ewî bihakî gelekî xirab bona gurênekirinê da.

## Merem mecala dide afûkirinê

Ez dikarim gelek mesela gilî bikim, bidime kivşê, ku çawa cedandina berbi hebûna dinyayê, ji ya xofa Xudan zêdetir, bûye menîya şimitandina him rêbera, him jî bawarmenda. Wededa ew bijartin gelekî biha li ser wan rûniştiye. Pêşda mecala bona destanîna karê li ber çavê merîya gelekî baş û bi aqilmendî tê texmînkirinê. Pêşda tê texmînkirinê ku şuxulên wana tên duakirinê û ewê zûtirekê bighîjine açixiyê. Feqet, piştî hinek wede hemû tişt xirab dibe, lê hê dereng ew îdî bona qirarên xwe bihakî giran didin. Min zewacên xirabbûyî, qulixdarîyên belabûyî, ketinên fînansî, çetinayên nava saxlemîyêda, heleqetîyên xirabbûyî... û tevî vî hemû tiştî, meriva bêqelpîya xwe û aminaya tevî hizkirîyên xwe unda dikirin.

Bîznêsmênên mesîhî gelek serhatîyên nebaş, yên derheqa xwehizîyê, derewa, dizîya, hevsûdîyê, feşkirina û stendina mecalên ne bi qanûnî minra gilî kirine, wextê kîjana bîznêsmênên mesîhî bûne şede. Menîya wî cûreyî kîjane? Bersiva pirsê zelale: xilazîya ku baş tê texmînkirinê, wê yekê afû dike, ya ku lazim tê texmînkirinê, ku bighîjine wê yekê. Meriv difikire: “Xwestina Xwedêye, wekî ez bighîjime açixiyê, dewlemendtiyê û hukumê min hebe”. Feqet, ew Xebera Xwedê nade xebatê çawa karebûn, ku fesal dîna xwe bide rîya xwe. Gelek cara ev yek çawa mecala tek-tenê tê texmînkirinê. “Eger em niha tu tiştî nekin, wê gelekî derengbe. Emê mecala mezin,

yan dua têberdin". Lazime, ku xeysetê gihîştî hebe, bona hîviyê sekinandina dayîna Xwedê.

Mîrêcin Îsa wextê qulixa Wîye zû bire berbi berdaxustinê. Ewî pêşnîyar kir, ku bêyî çetinayî hemû padişatîyên dinyayê paşda bide, çimkî ew hema bi wî meremî hatibû. Feqet, Ew gerekê mîrê cin bihebanda. Bona tebyeta Îsaye merivatîyê ev pêşnîyareke balkêş bû. Eger Ewî pêşnîyara mîrêcin qebûl bikira, Ewê bikaribûîya lez qulixeke mezin çê bikira, bêyî çetinaya û zehmetiya. Lê Ewî tenê gerekê mîrêcin bihebanda.

Gelek cara mîrêcin pêşnîyar dike wê yekê bikin, çi ku Xwedê daniye nava dilê me, lê bona wê yekê em gerekê berbi berdaxustinê herin, tevî zelalîya, xeyset û şikestîbûna xwe. Hebandin, bi xeberên çêkirinê sitiraneke hêdî nade kivşê. Diqewime usa bibe, wekî em li civînê sitiranên hêdî distirên lê jîyana me, ya ku ji stiranên me diha bilindtir dibêje, tarîyê dihebîne.

Hela hê pêşda min got, wekî hemû xudanên nivîsara, bi xebitandina xeberên nû û nenas, berê ewlin fikira wane sereke didine kivşê. Eger nava kitêba Pîrozda hûn beşekê bibînin, kîjanêda cara ewlin xebera "hebandin" tê xebitandinê, hûnê fikira wêye rast fem bikin. Cara ewlin xebera "hebandin" Încîlêda hate xebitandinê, wextê ku Xwedê gote Birahîm, ku tiştê herî girîng nava jîyana xweda bike qurban.

Birahîm sê roja tevî kurê xwe rê çû û gihîşte çîyayê Morîyayê û gote xulamên xwe: "Hûn tevî kerê li vir bimînin, ez û kurê xwe emê herine wir û hebandina xwe bikin" (Destpêbûn 22:5).

Ew hilnedikşîya li ser çîyê bona ku stiraneke xweşe hêdî bistirê. Birahîm, bi kirina gura Xwedê, hildikişîya çîyê, ku wê yekê teslîmî mirinê bike, çi ku nava jîyana wîda bona wî tiştê herî granbiha bû.

Diqewime, wekî hema bo vê yekê jî Xwedê carekê gote cimeta Xwe: "Sitiranên xweye hebandinêye bi dengê bilind dûrxin. Ezê miqamê sazên we guhdar nekim. Dewsa wê yekê ez dixwezim lêya maf, ya mezin bibînim, ç*emê jîyana heqe, ku xilaz nabe*" (Amovs 5:23,24, NLT). Gotina "Çemê jîyana heqe, ku xilaz nabe" li min xweş tê. Minê ew nav bikira çawa "*gur*êdabûna qewîn". Jîyana merivên hêna Amovs ne anegorî Xebera Xwedê bû. Feqet wana sitiranên hebandinê diefrandin û wextê berevbûnên xwe distiran. *Hebandin bi wê yekê tê kivşê, ku em gura kêdanin, lê ne ku em bona k*ê distirên.

## Bijartina qencîyê, lê ne ku Xwedê

Îzinê bidin ez wera gilî bikim, ku çawa carekê ketime tela wî cûreyî, wextê ku ez berbi berdaxustinê hindava gurêdabûna xwe çûm. Qulixdarîya me wî çaxî gelek cahil bû, qet du salên wê jî tunbûn. Tiştê ku dihate kirinê nava qulixa meda, seferên mine li civînên biçûk bûn, li kîderê sed yan jî ji sedî hindik meriv berev dibûn. Wî çaxî mecala çûyîn-hatina me hîmlî avtomaşîna “Honda Sîvîk” bû. Herdu zarokên me piştêva rûdiniştin. Avtomaşîne bona eşîyayên me biçûk bû, kîjanêda me usa jî du qutî vîdêyoyên xwe bar dikirin, kîjan wextê berevbûna me difrotin.

Çawa ku min îdî pêşda gotîye, rojekê şebeqê, Xwedê dilê minra xeberda û teslîmî min kir, ku ez kitêbê binivîsim. Min carekêra gura Wî nekir, bi du menîya. Ya ewlin ew bû, wekî min pêşda gotibû, wekî mektebêda nivîsara serpêhatîya bona min gelekî dijwar bû. Menîya duda ew bû, wekî kî wê bixwesta, kitêba xudanê bê nav û deng çap bikira. Feqet, min paşê gurê kir û destpêkir nivîsî.

Bona xilazkirina wê kitêbê salek lazim hat. Wê yekê wedekî mezin ji min hildida û gelek xebat dihate kirinê. Ez çûme du çapxana û min nivîsara xwe raber kir, sernivîsara kîjanê ev bû: “*Serkevtina li qûmistan*ê”. Çapxanekê minra got, wekî ev nivîsar “Gelekî ya terîfkirinê”-ye. Çapxana mayîn qet bersiv jî neda. Ez bêguman mam. Min û Lîzayê, qirar kir, ku em mecala xwe bidine xebatê, ku em bi xwe çap bikin. Bona çend hezar mesela me pere berev kirin û me ew kitêb li wan civîna frotin, li kîderê me qulix dikir. Kitêb meriva xweş dihat. Sala mayîn min kitêba duda nivîsî. Dîsa cûrê tek-tenê ew bû, ku em bi mecalên xwe bidine çapkirinê.

Piştî çapkirina kitêba duda çend meh derbaz bibûn, wextê yekî ofîsa mera têlêfon kir, yê ku rêdaktorekî çapxaneke Amêrîkaêye here mezin bû. Piştî xweraberkirnê, ewî carekêra derheqa meremê têlêfonkirina xweda got:

– Con kesekî kitêba weye “*Serkevtina li qûmistan*ê” daye me. Çapxana me bawarîya xwe banga vê kitêbê tîne û em dixwezin alî we bikin, bidine zêdekirinê.

Me çend deqa xeberda. Ewî derheqa gelek mecalada gilî kir, bi kîjana ew hazir dibûn kitêba min bifroşin û pesinê xebata beşên wane markêtîngê û rêklamê dan. Hemû tişt gelekî baş dihate texmînkirinê û em difikirîn, wekî kitêbê li temamîya welêt bela bibe.

Feqet, piþtî danîna têlêfonê li cem min nerihetî pêşda hat. Wextê xeberdanê ruhê minda texmînkirineke xirab hate kivşê. Rojtira mayîn min dua kir û min bi cûrekî qewat texmîn kir, wekî Xwedê digote min: “Wê pêşnîyarê qebûl neke”.

Min derheqa wê yekêda Lîzayêra xeberda, ew jî minra qayîl bû, wekî nenihêrî wê yekê, ku ew pêşnîyareke baş dihate kivşê, lê ew jî dudilî bû.

Hema wê rojê diha dereng Lîzayê got:

– Delalê min, ez jî tiştekî baş texmîn nakim, wextê ku dua dikim.

Ez hatime ser wê fikirê, wekî em gerekê wê pêşnîyarê qebûl nekin.

Rojtira mayîn, wî rêdaktorî careke mayîn têlêfon kir. Nenihêrî wê yekê, wekî min xwestina Xwedêye derheqa wê yekêda zanibû, lê min dixwest bibhîsta ku ewê çi bêje. Wî çaxî min ew yek fem nekir, lê xwestina mine bona berdwamkirina xeberdanê tiştek dida kivşê, wekî nav minda pirs heye. Bona çi min nikaribû gurêda bûma? Bona çi min îzin dida wî, ku ew meriv min bîne ser wê fikirê, wekî kitêba min li çapxana wana bê çapkirinê? Diqewime, wekî gotinên wî qewat didane xwestineke şaşe dilê minda, yan jî xwehizîya min.

Vî rêdaktorî bi şabûn derheqa wê yekêda gilî dikir, ku çapxana wî çi cûreyî dixweze banga min bide belakirinê. Ewî got, wekî banga min lazim bû û ew bona welatê me ji Xwedêda hatibû dayînê. Ew çapxane tevî hevaltîyên mezin dixebitî û dikaribû kitêba min li dikanên kitêbaye mesîhîya û usa jî yên mayînda jî li temamîya Amêrîkayê bifrota. Ewî gilî kir, ku çawa xudanê nivîsaraye neeyan kitêbên xwe li cem wan çap kiribûn û roja îroyîn bangên wana li temamîya Amêrîkayê bela bûne û ew bûne xeberdankirên hemcivînaye eyan. Bi gotinên wî ew hemû tişt bi saya çapxana wana qewimîbû.

Nava çend hevtîyên mayînda wî rêdaktorî du roja carekê minra têlêfon dikir, çimkî min înkar dikir. Bi çiqwasîva zêde min guhdarîya wî dikir bi awqasîva zêde ez dihatime ser wê fikirê, wekî hêja bû, ku min kitêba xwe li çapxana wana çap bikira. Paşê wedekî ösa hat,

wextê ku min dilê xweda îdî fesalbûn texmîn nedikir. Min şedetîya Ruhê Pîrozî hundur dabû kerkirinê. Min îzin dabû, wekî lefekî û gotinên meriva emirkirina Xwedêye derheqa wê pirsêda bidime kerkirinê. Bi gilîkî, karebûna mine jihevderxistinê temirîbû.

Derketin 23:8-da nivîsare: “Ruşet (bertîl) jihevderxistina li cem meriva kor dike” (NKJV). Lefekî jî cûrekî ruşetêye, ya ku ez kor kirim. Ez hazir dibûm mecalên kardar û zêdayê bibijêrim, lê ne ku xofa Xudan.

Nenihrî wê yekê, wekî jina min bi cûrê berk’eşaretî da min, lê me peyman mor kir, û carekêra pirsgirêk pêşda hatin.

Wî çaxî ew îdî serê 11 sala bû ku em zewicîbûn. Ewê gelek cara digote min: “Tu tu cara nexwaş nakevî”. Ew rast bû. Ez hndik cara rastî pirsên saxlemîyê dihatim û eger tiştek jî dibû, here zef nava 24 sehetada derbaz dibû. Feqet ji wê rojêda, çawa ku me ew peyman îmze kir, min dijî zeîfîyê şerkarî dikir û nikaribûm ji wê yekê azabûma. Hemû tişt ji persimê (girîp) destpê bû: nava jîyana minda eva cara duda bû. Hema çawa persim xilaz bû, ez bi vîrûseke mayîn nexwaş ketim. Tevî Lîzayê em ji bajêr derketibûn, ku salvegera zewaca xwe bidine kivşê û nava wî wedeyîda germa min hebû. Wê yekê hetanî hevtîya mayîn berdewam kir. Min li civînê terîf dikir û piştî her qulixekê ez dihatime mêvanxanê û bin lihêfada min dircifand.

Wê yekê usa jî hevtîya sisîya berdewam kir. Em ecêbmayî mabûn, çimkî ez tu cara usa nexwaş neketibûm. Bi kutasî, bi saya antîbîyotîka me ew hal alt kir, lê wextê ku min xwerina wan antîbîyotîka xilaz kir, li cem min cemidandineke berk destpê bû. Ez nava halekî gelekî xirabda bûm: gewirîya min diêşîya, behna min dernediket û ez nebaş bûm. Ev nexweşî derbaz nedbiû.

Piştî pakbûnê du hevtê derbaz nebibûn, wextê ku min çoka xwe êşand. Zîyana wê usa mezin bû, wekî çend hevtîya min girêdabû û bi darê desta digerîyam. Tê bêjî ew yek jî bes nîbû, çimkî piştî wê yekê jî ez bi vîrûseke mayîn nexweş ketim. Wedê van nexweşîya ser hev nêzîkî ji sê meha zêdetir kişand. Nava wî wedeyîda Lîza tam saxlem bû.

Wextê ku ez nexweş bûm pirsgirêkên meye tevî çapxanê hebûn. Tê bêjî em dora tu pirsekê hevra qayîl nedibûn. Nava heleqetîyên meda hukumên mezin hebûn û şuxul pêşda nediçû.

Tê bêjî ew jî bes nîbû, em rastî gelek pirsên başqe dihatin, kîjan tê bêjî yên helkirinê nîbûn. Nava wan sê mehada jîyan tê bêjî giran bibû. Diqewime Dawid hema bo wê yekê jî nivîsîbû: “Hetanî ku min cefa nekişandibû, dixalifîm, lê niha ez xebera Te xweyî dikim” (Zebûr 119:67, NKJV).

Nava vî halîda Xwedê gelekî rehm bû: Ewî îzin da, ku ez bêfemîya xwe bibînim. Min begemî dabû açixîya qulixa xwe, lê ne ku gurêdabûna hindava Wî da. Min şaşîya li ber Xwedê û jina xwe qebûl kir. Ez hatime baxşandinê û paqij bûm. Rehma Wî tiştê ecêbmayînêye.

Feqet, ez hela hê telêda bûm. Bona min ecêbek lazim bû, wekî min peymana xweye tevî wê çapxanê biteribanda. Ez û Lîza, me tevayî dya kir û hîvî ji Xwedê kir, ku Ew tev bibe.

Piştî du hevtîya wê çapxanê name mera şand, kîjanêda nivîsîbû, wekî ew peymanê diteribînin. Min li ser xwe sivikayî texmîn kir, lê bona wê yekê bihakî giran da. Bona teribandina peymanê me ji çar hezar dolara zêdetir da. Bona qulixa meye cahil ew perekî mezin bû û ew nîvê byûcêya meye mehekê bû.

## Mecala xwedêtîyê

Piştî çend meha hevalekî min, navê kîjanî Skote, ez teglîfî şîvê kirim û gote min: “Con, ez dixwezim nasîya te bidime hevalekî xwe”. Ez qayîl bûm.

Li rêstoranê Skot nasîya min da hevalê xwe, navê kîjanî dîsa Con bû. Eyan bû, wekî ew serkarê çapxaneke kivş bû. Piştî xeberdana sade, Con derheha wê yekeda pirsî ku ez çi terîf dikim. Piştî wê pirsê, çawa ku tê bîra min, min îdî tu tişt nexwar.

Min destpêkir tevî wana derheqa bêhurmetkirinêda xeberdim, ya ku wî çaxî têma terîfkirinên min bû. Nêzîkî 15 deqa min Skot û Conra xeberda.

Skot êmekî şûnda ez dame sekinandinê û got:

– Em dixwezin bizanibin, ku em nikarin vê banga te çap bikin, çimkî em salê 24 kitêba çap dikin û ew jî kitêbên merivên bi nav û dengin.

– Ez hîvî ji we nakim, ku hûn vê bangê çap bikin,– min gotê.– Ez awqasî bersiva pirsa we didim, ku ez van axirîya derheqa çida terîf dikim.

– Belê,– ewî got. – Bi kerema xwe berdawam bikin.

Min xeberdana xwe pênc yan jî deh deqa derheqa tela bêhurmetkirinêda berdewam kir. Wextê ku min xeberdana xwe ser hevda anî, Con pirsî:

– Hûn dikarin destnivîsara vê bangê bidine min?

Min nişkêva bersiva wî da:

– We bi texmîna min got, ku hûn nikarin wê çap bikin?

– Ev bang gerekê belabe û ez dixwezim wêya raberî xweyê çapxanê bikim.

Wê çapxanê banga min qebûl kir û kitêba mine bi sernivîsara: "*Tela şeytan*" çap kir. Nava wededa li welatên dinyayêye cuda-cuda ew kitêb bû kitêbeke eyan. Wextê nivîsara vê kitêbê, îdî ji mîlîyonekî zêdetir meselên "Tela şeytan" hatine frotanê û ji 60-î zêdetir zimana ew hatîye tercimekirinê.

Ezê tu cara wê rojê bîr nekim, wextê ku çapxana duda, li kîderê min destnivîsara kitêba xwe raber kiribû, minra têlêfon kir. Wana gote min, wekî ew dixwezin ese nivîsara min çap bikin û hazirin tevî min peymanê mor bikin. Min têlêfon danî û dest pê kir dua bikim û Xwedê dilê minda zelal got: çapxana pêşin fikira te bû, lê ev çapxane ya Mine". Vê cêribandinê zelal firqîya di navbera qencîyê û Xwedêda nîşanî min da. Çawa ku gelek cara diqewime mecala qencîyê ya ewlin bûya, lê mecala Xwedê diha dereng hat. Hema ew tişt usa jî rastî Birahîm û Sarayê hat: pêşîyê Îsmayîl bû, lê paşê Îshaq.

## Şedetîya xofa xwedêtîyê

Bona çi min tevî çapxana ewlin qirara şaş qebûl kir. Bi rastî gotî bersiva vê pirsê ewe, wekî mejûyê min li ser zêdayê hatibû merkezkirinê, lê ne ku li ser xofa Xudan. Bo wê yekê jî fikirdarîya min û fikirên derheqa açixîya minda ew înkar kirin û dane kerkirinê, çi ku Xwedê zelal dilê minda dida kivşê.

Şikestîbûn şedetîya heyîna xofa Xudane rast dide. Wextê ku xofa Xwedê li cem me heye, em…

- Em carekêra gura Wî dikin.
- Em gura Wî dikin, eger ew yek bêfikir jî tê texmînkirinê.

- Em gura Wî dikin, eger ew yek me diêşîne jî.
- Em gura wî dikin, eger em karê jî nava wê yekêda nabînin.
- Em gura wî dikin hetanî xilazîyê (dawîyê).

Bi lêkoloînkirina kirinên Birahîme wextê cêribandinê, em dibînin, wekî ewî nivîsarên van xala hemû jî mîyaser kirin. Cêribandina wî bîr bînin.

– Şevekê Xwedê dibêje Birahîm, ku ew gerekê kurê xwe, Îshaq, çawa qurban bide. Ew bi rastî dengê Xwedê guhar dike, yan ew xewineke xirabe? “Ev yek tiştê kirinê nîne,– ew difikire. –Gelo eva tiştê bûyînêye? Ez kurê xwe hiz dikim. Ez nikarim Îshaq bikujim. Sozê min heye, wekî ji wî padişa û miletê pêşda bên. Ew soz wê çawa bê qedandinê, eger ez wî *bikujim*?

Birahîm dike qîrîn:

– Çi? Tu çawa dikarî tiştekî usa bêjî min? Te soz da, wekî ji wî miletê pêşda bên.

Ji alîyê Xwedêda tu bersivek (cabek) tune: tenê bêdengîye.

Birahîm dikeve nava bagera texmînkirinê. Ez gumanim, wekî wê şevê ew raneza. Ji me çend meriv wê du hevtîya, yan mehekê, yan jî salekê başqe bikin, ku bifikirin derheqa temîke wî cûreyîda û paşê bên ser wê fikirê, wekî ew yek ne nêzîkî aqilaye?

Feqet, Birahîm ne yekî usa bû. Nivîsare: “Birahîm sibehê zû rabû û têra kerê xwe girêda” (Destpêbûn 22:3, NIV). Ewî *carekêra* gurê kir.

Heleqetîyên weye tevî merivekî usa hebûne, yê ku bi sivikayî dibêje: “Eva îdî serê çend mehaye, ku Xwedê nava vê pirsêda tevî min dixebite”, û bi ken têma xwe diguhêrue. Eger bifikirin, wekî ew tragêdîyaye, çimkî ew meriv pesinê xwe dide, wekî xofa xwedêtîyê li cem wî tune.

Xwedê temîyê dide Birahîm, wekî sozê herî mezinî nava jîyana wîda bêyî tu şirovekirnekê, bike qurban, bona kîjanî ew 25 sala hîvîyê sekinîbû. Kirina Îshaq çawa qurban, Birahîmra çawa tiştekî *bêfikir tê texmînkirinê*, nenihêrî wê yekê, wekî ew gura Wîdane.

Kirina kurê xwe çawa qurban *derdekî* mezin *dide* Birahîm. Ev êşa hundur li ser rîya sê roja rih’etîyê nade wî. Pêşîyê, piştî bihîstina dengê Xwedê bona wî hinekî hêsabû, lê bêdengîya herrojeye peyîra, êşa wî dide gurkirinê. Ev şerkarî wî çaxî dighîje xala here bilind,

wextê ku Birahîm tevî kurê xweyî hizkirî cîhê qurbanê hazir dikin. Feqet, Birahîm gurêdane.

Xwedê soz nade Birahîm, wekî eger ew gurêda nîbe, wî çaxî dewsa kurê wî wê qurbaneke mayîn bê dayînê. Himberî me, li cem Birahîm kitêba Derketin tune bû, ew nizane xilazîya serpêhatîya wî wê çawa bibe. Ew ji vê gotina Xwedê *tu karê nab*îne, lê ew gurêdane.

Roja îroyîn hemû tişt cûrekî mayîne. Gelek meriv dixwezin kara gurêdabûna hindava Xwedêda hetanî gurêkirinê bibînin. Çawa dersdar, em gelek cara nava bangên xweda derheqa wê yekêda didine kivşê. Çawa xudanên kitêba, eger em nedine kivşê, ku kareke çawa xwendevanê ji vê kitêbê bistîne, ewê neyê frotanê. Bi kutasî Birahîm dighîje cîh, hildikişe serê çîyê, cîhê qurbandayînê çê dike, Îshaq girê dide û îdî hazire ku kêrê dilê wîra bike. Ew *hetanî xilazîyê* gurêdane. Wextê ku kêra bilindkirî îdî li ser serê Îshaqe, nişkêva milyaketek pêşda tê û dike gazî: “Destê xwe nede wî kurî û tu tiştî neke, çimkî ez niha pê hesîyam, wekî tu ji Xwedê ditirsî” (Destpêbûn 22:12).

Ji kîderê vî milyaketî zanibû, wekî Birahîm ji Xwedê ditirsîya? Çimkî ewî carekêra gura Wî kir, wextê ku ew yek bêfikir bû jî, bi êş bû û wê kirinê kara tu tiştî soz nedida û ewî hetanî dawîyê ew yek kir. Birahîm dewletî bû û tiştê herî granbiha bona wî kurê wî bû. Feqet meremê Birahîm ne hebûn bû: pirsa here sereke ew bû, kuew gura Xwedêda be.

Xofa Xwedê me hazir dike, ku em bi aqilmendî serwêrtîyê zêdayê, mecala û hebûnê bikin. Încîl hema vê yekê jî dibêje: “Duayê Xudan dewlemend dike û Ew kederê serda zêde nake” (Gotinên Silêman 10:22, NKJV).

## Nêzîkbûna bêfikir

Eger em şagirtê Îsa Cihûda himberî Birahîm bikin, emê firqîke gelekî mezin bibînin. Cihûda rihet rastî hesab hilnedida, eger ew yek bona wî dest nedida. Ewî derew dikirin, ji cîhê qulixêye pera pere derdixistin, derheqa feqîrada nedifikirî, qelp bû û bi kutasî xayîntî li Rêber kir (binihêre Metta 22:25,49 û Yûhenna 12:6; 13:2). Fikirdarîya wî nava tarîyêda bû. Rûyê tunebûna xofa Xwedêda ewî nikaribû rastî ji şaşîyê, qencî ji xirabîyê, ji hev derbixista.

Carekê jineke dewletî şûşekî rûnê behnxweşî granbiha reşande ser Îsa. Cihûda ber xwe ket û li ber hemûya kirina wêye “bêfikir” rexne kir: “Ew rûnê behnxweş miaşa salekê bû. Ew gerekê bihata frotanê, lê perê ji wê stendî gerekê belayî ser feqîra bikirana” (bnihêre Yûhenna 12:5, NLT). Şirovekirina wî nêzîkî aqila bû û wê yekê hukumî li ser şagirtên mayîn nekir. Ew jî tevbûn û kirina wê gunekar kirin.

Îsa ew hukumê ji alîyê Cihûdada sazkirî rast kir û got: “Wê jinê rihet bihêlin, hûn bona çi wê rexne dikin, bona wê yekê, wekî ewê hindava Minda tiştekî *qenc* kir?... Derheqa kirina vê jinêda wê bîr bînin û gilî bikin” (Marqos 14:6,9, NLT).

Îsa kirina wê jinê çawa tiştekî *qenc* û tiştekî *mayînê* nav kir: Cihûda kirina wê rexne kir û çawa *xirabî* û *nemayîn* nav kir. Karebûna jihevderxistinê li cem wî unda bibû. Ewî ew yek texmîn nedikir, çi ku dilê Xwedêda bû.

Carekêra xebera mayîn bixwînin:

> “Peyî wê yekêra Cihûdayê Îsxeryotî, yekî ji 12-e şagirta, çû cem serekên kahîna, wekî bona xayîntîya hindava Îsada wanra pevbiketa” (Marqos 14:10, NLT).

Eva îdî niqtika xilazîyê bû. Cihûda hetanî qirika xwe têr bibû: ew ji cûrê serwêrîkirina Îsa westîyayî bû. Ewî dabû peyî Evê ji Celîlê û hîvîyê bû, wekî textê Dawid Ewê bida dasekinandinê. Anegorî gotina pêxember Îşaya, Mesîh gerekê heta-hetayê serwêrî bikira. Îsa hîvîya çi bû, ne îdî sê sal derbaz bibûn? Eger Îsa padişatîya Xwe îzbat bikira, Cihûda çawa yekî ji wan rêberên Wîye sereke û çawa serkarê xizna Wî, wê bibûya xweyê tabîya bi qedir, hebûnê û wê serwêrtîya wî jî hebûya.

Cihûda fikirî: “*Ezê hemû tiştî lez bêxim. Ezê îdî hîvîyê nesekinim. Ez dixwezim ku serwêrtî, hukum û hebûna min hebe. Bese, çiqwas r*êbera qerf *li min kirin. Eger ez Wî teslîmî r*êbe*rên welêt bikim, Ewê bi kutasî qewata Xwe bide kivş*ê û wê padiş*atîya Xwe îzbat bike û ezê qulixa bilind bistînim*”.

Diqewime hûn dijî şirovekirina min derkevin, lê ez vê yekê usa hesab dikim. Cihûda her dem qewata Îsa didît: “Îsa nexweş qenc dikirin, bager didane sekinandinê, mirî radkirin, çavên kora vedikirin

û guhên kera vedikirin û keremetên mayîn dikirin. Cihûda xeberên Îsaye derheqa Padşatîyêda guhdar dikirin. Ewî dibihîst, wekî Petrûs û şagirtên mayîn dihebandin û pêra jî elam dikirin, wekî Îsa Mesîh bû. Mezinaya Îsa her roj li ber wî bû.

Feqet wextê ku qirar kirin ku Îsa bikujin, ewî fem kir, wekî şaş difikirî, bona kirina xwe poşman bû û xwe kuşt, xwe darda kir. Ewî rûyê cedandinên xwehizîyêda programa xwe mîyaser nekir.

Birahîm û Cihûda zelal firqîya di navbera merivên ku bi xofa Xwedêne û yên ku bêyî xofa Xwedêne nîşan didin. Cem yê ewlin karebûna jihevderxistinê hebû, lê yê duda nava xapandinêda bû. Qirarên wana ew nîşan didan, çi ku dilên wanda bû. Dawîya jîyana van herdu mêra ji hev cuda dibûn. Herdu jî hatine bîranînê, lê bi menîyên cûre-cûre.

Em hemû jî wê bêne bîranînê, nava wê yekêda şikberî tune, çimkî em yên heta-hetayêne. Em gerekê vê pirsê bidine xwe: em çawa dixwezin, ku meriv me bîr bînin? Bersiva vê pirsê wê xofa hindava Xwedêda qirar bike.

## Eve hemû tişt

Dilê me gerekê paqijbe, lê ne ku nava mijêdabe, bona ku fikirdarîya me ya rastbe. Wî çaxî wextê ku lazimbe qirarkin, ku gelo tu teşkîldarîk ji Xwedêda hatîye ruhdarkirinê, yan ew awqasî çawa ya qenc tê texmînkirinê, lê zû derbaz dibe, emê şaş nebin. Emê bi serwaxtî merivê li rex xwe, dorana merivên xwe, hevalên nêzîk, karîyêra xwe, mecal, emek, cûrên terbyetkirina zaroka, civînên li kîderê gerekê qulix bikin, xwendinê û gelek tiştên mayîn, kîjana gerekê nava jîyana xweda bibijêrin. Bi gihîştina xilazîya jîyana xwe, piştî dîtina rûmeta mezin û kirinên bêfikire mezin, Silêman kire gazî: "Eve hemû tişt. Awa fikira mine xilazîyê: ji Xwedê bitirse û gura temîyên Wî bike, çimkî eva borcê me her kesîye. Xwedê wê bona wî hemû tiştî me gunehkar bike, bona wê yekê çi ku em dikin, nava wanda usa jî hemû tiştê veşartî, him yên qenc, him jî yên xirab," (Zanebûn 12:13:14, NLT).

Silêman dîn bû: ewî karebûna xweye jihevderxistinê unda kir û îdî nikaribû ji hev bibijarta, ku qencîya rast kîjan bû, lê kîjan ne ya rast bû. Xwedê bi rîya kitêba Zanebûnê dînbûna wî dide kivşê. Lê tiştê baş ewe, wekî em dibînin, ku çawa Silêman paşda vegerîya li ser fikirdarîya saxlem. Ewî fem kir, wekî nava jîyanêda tiştê ji hemû tiştî girîngtir ji xweyîkirina xofa xwedêtîyê tune. Bi xeberên wî gotî "Eve hemû tişt".

Hevalê min, eger hûn dixwezin jîyanê usa bibînin, çawa ku Xwedê dibîne, usa jî serwaxtîya jorin fem bikin û nas bikin, xofa Xudan bibijêrin. Hûnê tu cara bona bijartina xwe poşman nebin.

16

# ŞIKILÊ TOMERÎ

“Çawa ku Te Ez şandime dinyayê,
Min jî ew şandine dinyayê”
— Yûhenna 17:18

Meremê bona mêriv kivşkirî
ne xweşbextîye, ne
jî saxlemîye, lê pîrozîye.
— Osvald Çêmbêrs

Werin em gavekê paşda herin û şikilê tomerî binihêrin. Xwedê bi kûrayî û bi dil we hiz dike. Ew tenê tiştê herî baş bona we dixweze. Ew hemû tiþşt ji Xwedêyê qence, lê hemû tişt nîne, wekî ji Xwedêye. Bi vî cûreyî, tiştên *qenc* hene, kîjan dikarin îzinê nedine me ku em tiştên *herî baş* bistînin. Em hemû jî dixwezin tiştên here baş bistînin, lê bona wê yekê her dem nîne, wekî kivşe: bona dîtina wê lazime, ku karebûna jihevderxistinê hebe.

Nava şuxulkarîya meye li ser dinyayê kesek heye, xêncî Xwedê, tevî kê em gerekê nava şuxulkarîyêda bin, ew jî mîrêcine, yê ku dijminê meye. Meremê mîrêcin ewe, ku me biêşîne û bi wê yekê dilê Xwedêyê ku me hiz dike biêşîne. Kitêba Pîroz dide kivşê, wekî dijminê me “bi cûrê milyaketê ronahîyê xwe vedişêre”, peyî kîjanêra nivîsare: “Xulamên wî jî rolên xizmetkarên heqîyêva xwe vedişêrin” (B Korintî 11:14,15, NLT).

Gelek bijartin û rê hene, yên ku çawa yên qenc tên texmînkirinê, lê xilazîya wana keder, feqîrî, zyan û mirine (binihêre Gotinên Silêman 15:12). Derheqa wê yêkêda bifikirin: dijminê me, xulamên

wî û rêyên wî, ew hmû tişt, meremê kîjanayî xilazîyê tunebûna meye, dilqê *qencîyêva* veşartîne. Încîlêda nivîsar nîne, wekî ew *dikari*n xwe veşêrin, lê nivîsare, wekî ew veşartîne, çi ku bona we qezîyaye, wê bi şikilê xirabîyêye eşkereva ber çavên wan nîbin, lê wê bi şikilê qencîyêva veşartî bin. Dema mesîhîtîyêye pêşinda dijminên me qewatên xwe berev kirin, ku civînê xirabkin. Bawarmend dihatine cêribandinê û dihatin kuştinê. Feqet bi çiqwasîva zêde dijminê me dicêriband cimeta Xwedê tune bike, bi awqasîva zêde civîn diha hukumdar dibû. Mîrêcin bêfem nîne (lê hela hê diha aqile), ew fikirî, wekî bona tunekirina cimeta Xwedê gerekê jîyana qenc bona wana pêşnîyar bike, lê ji serwaxtîya Xwedê dûr. Bi texmîn hema ev stratêgîya bû, ya ku ewî li baxçê Êdênê da xebatê. Diqewime roja îroyîn, bi dîtina encamên gavên mîrêcine fêlbaz û veşartî, em diha baş fem bikin, ku bi çiqwasîva ew digihîje meremê xwe. Em hemû jî dikevine nava halê usa, wextê ku me cûrên başqe, yên dewsa rastîyê qebûl kirine, yên ku bona me baş û kardar tên texmînkirinê. Em li hemû cîha qencîya Îsa û rola Wî ya çawa Xilazkir (çi ku raste) raber dikin, lê em qîmetê hukum, serwêrtî û qewata Wî nava jîyana xweda nizanin. Me serwêrtîya Xwedêye here bilind û tabîya meye heqe li ber Wî, qebûl kirîye, lê cedandina berbi pîrozîyê û guhdarkirina temîyên Wî û cabdarîya gurêdabûnê hesab hilnedaye. Rûyê dersdarîyên "qenc"-da, yên ku ji alîyê meda hatine çêkirinê paqijîya kirin û cûrê jîyana me tê bêjî badîhewaye.

Wextê cuxulkarîya xweye mesîhîtîyê geleka bawar kirîye, wekî dewsa zêdebûnê lazime xweyîkin. Ew çawa tê gotinê cûrekî xwe yole dibin, lê berbi zêdayê nacedînin. Çawa tê kivşê, me xwedêzanî çê kirîye li ser hîmê fikirdarîya xwe û bi beşên nivîsarên kitêba Pîroze cuda, dewsa qebûlkirina temamîya Xebera Xwedê, çi ku Ezman bona me têra dîtîye.

Meriv dikare terka vê fikirdarîyê bide. Wedeye, wekî em careke mayîn Încîlê lêkolîn bikin û bi bêqlpî di Ruhê Pîroz hîvî bikin, ku Ew nava naskirina rastîyêda rêberîyê li me bike. Em îdî gerekê Încîlê usa nexwînin, çawa ku bawar dikin, lê gerekê em bi bêqelpî, fikir û dilê

vekirî nêzîkî Încîlê bin û bawarîya xwe wî hemû tiştî bînin, çi ku em dixînin, û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew fikirên me wî cûreyî eşkere bike û bide dûrxistinê.

*Rêberên civînê*, ez ber dilê weda têm, ku hûn temamîya şêwira Xwedê bidine hînkirinê. Bira menîya weye sereke bibe ne ku berevkirina gelek peyîhatîya, lê hînkirina cimeta Xwedê û gihîştina raste hindava undabûya, bi banga xwedêtîyêye xilazkirinêye tam. Eger meremê weyî pêşin ewe, ku meriva zêde bînine civînê û bona ku hevtîya mayîn jî ew vegerine civînê, hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku ew we bibaxşîne û cedandinên xwe bona hînkirina cimeta Xwedê bidine xebatê. Bibin yên wedê niha, *mêtodên* teze nava *bangên* xweda bidine xebatê.

*Bawarmend*, dorana hukumê we li kîderêbe jî, li oda mektebê, li aûdîtorîyayê, li laboratorîyayê, yan ofîsê, yan li malê, yan li dinîya bîznêsê, bi dilê tijîye bi hizkirinêva bijîn û rastîyê bêjine meriva, wextê ku hûn wanra xeber didin. Bira meriv xofbin û şedetîyê bidin, wekî bi dîtina we ew Îsa dibînin. Bira ew hazirîya Xwedê nava jîyana weda bibînin. Eger hûn berbi pîrozîya rast bicedînin, mezinaya Wî wê ji we belabe.

Eger em anegorî temîyên Mesîh nejîn, emê hazirîya Wî nebînin û Ewê bi saya civîna Xwe li dinyayê eyan nîbe. Bi rastî gotî, emê bi xwe ji wê yekê zyanêkevin, lê civaka me wê diha zyanêkeve. Berê ewlin eyantîya Îsa Mesîh wê pêçayî bimîne û ewên undabûyî wê nikaribin tevgirêdanê tevî wî Şexsê tek-tenê, Yê ku dikare jîyana wan tam bike, îzbatkin. Ya duda, bawarmendên me wê ji nexweşîya bi navê "berdaxustin" bêyî parastin bimînin, ya ku dikare wana ji dil û hazirîya Xwedê dûr bixe.

Îsa vî cûreyî got: "Bona wan Ez xwe pîroz dikim…" (Yûhenna 17:19). Ewî Xwe başqe kir, bona ku gura Bavê da be, boy merivên li dor-berên Wî. Ewî menîya Xweye sereke nîşan da û xebera Xwe ser hevda anî: "…bona ku ew jî bi rastîyê pîrozbûyî bin".

Hetanî paşdahatina Wî, hûn û Ez Îsayê tek-tenêne û ev dinîya wê wê yekê bibîne. Werin em Îsayê rast nîşanî wan bidin, lê ne ku Mesîhê

nava fikirên wanda û Yê bêqewat. Werin em bi her tiştîva razî nebin, çi ku ji tiştê herî baş kêmtire. Werin em xwe li rastîyê bigrin û emê berên gurêdabûna raste qenc, yên qewîn û bi hizkirinêva tijî bibînin.

---

Bila emirê we dirêj bibe, berbi pîrozîyê bicedînin û nava teşkîldarîyên xweda bighîjine açixîya. Bi kirina vî cûreyî hûnê bibine menîya guhartinên baş, nava jîyanên merivên başqeda.

> "Û bo Wî, wekî dikare we paqij xweyke
> Û helal bide sekinandinê
> Li ber rûmeta Xwe, bi şabûneke mezin,
> Bo wî Xwedêyê serwaxtî tek-tenê
> Û Xilazkirê me
> (bi Xudanê me Îsa Mesîh),
> Rûmet û mezinayî,
> Qewat û serwêrî,
> (ji hemû sedsala pêşda).
> Û niha, û heta-hetayê.
> Amîn" (Cihûda 24,25).

Hevalê hizkirî,

“Qe*ncî yan Xwedê*?” kitêbeke sade nîne. Ev bang dikare meriva ruhdar bike, ku bighîjine heja pîrozîyê. Niha hûn zanin, ku çawa zêdaya jîyana xwe teslîmî serwêrtîya Îsa û kerema Wî bikin. Ez dixwezim bi vê eyantîyê we bidime sîlihkirinê, bona ku hûn wê yekê bona merivên dorana bin hukumê weda bibin.

Hûn dikarin bighîjine vê hejê û wê yekê, çi ku hûn hîn bûn, derbazî hevalên xwe, malbetên xwe û gelek meriva bikin. Pawlosê şandî yê tek-tenê bû, yê ku komeke meriva li mektebeke biçûk hîn dikir û ew yek bes bû, wekî Încîl nava du salada bighîşta wan, yên ku li Asîyayê diman. Ew koma merivaye biçûk bû şeda hazirîya Xwedê (binihêre Karên Şandîya 19:1-10). Xwedê bi destî me çi dikare bike eger em, yên ku Wî hiz dikin, yekbûyî bin? Hûn dikarin vê bangê nava jîyana xweda bidine xebatê. Hûn dikarin vê bangê usa jî çawa lêkolîn bidine xebatê:

- Komên biçûkda
- Li civîna
- Li klûbên xebatê
- Li mektebên qulixê
- Û gelek cîhên mayîn

Nenihrî wê yekê, wekî hûnê fikirên me bidine xebatê, yan jî fikirên xwe, koma min hazire piştgirîyê bide we. Emê helkirinên mexsûs bona we sazkin, matêrîyalên belaş (bêpere) usa jî yên bahên wan bona we kêmkirî û tiştên zêde bidine we. Xêncî vê kitêbê, me bona we dersa ji şeş beşa, ya bi ser navê “Qencî, yan Xwedê?” hazir kirîye, him bi cûrê aûdîtorîyê, him jî bi cûrê vîdêoyê. Meremê vî hemû tiştî ewe, ku alî we bikin, ku hûn vê bangê bighînine merivên dora xwe.

Spas, wekî hûn bona li her dera belavkirina Xebera Xwedê tevî me hevkarîyê dikin.

Bi dil:

Con Bîvêr

# MATÊRÎYALÊN BONA HÎNIKIRINÊ Û PIRSÊN GOTÛBÊJKIRINÊ

# HEVTÎYA EWLIN

**Bixwînin serên kitêbêye 1-3-a.**

*Vê hevtê vîdêoya 1-ê temaşe bikin*

## PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

1. Hêwayê qirar kir, ku berê dara qedexekirî bixwe, çimkî ew çawa *qenc*, *xweşhatî* û *tiştê xwestinê* dihatine texmînkirinê. Van cudatîya şirove bikin. Texmînkirina qenc çi dide kivşê? Lê tiştê xwestinê? Ji van hersêka her yek çi cûreyî dikare me ji gurêdabûna hindava Xwedêda bide dûrxistinê?
2. Temamîya serhatîya baxçê Êdênê tenê tiştekîva girêdayî bû, ya ku Xwedê bi serwêrtîya Xwe qedexe kiribû. Dersên çawa em dikarin ji vê serpêhatîyê derheqa tebyeta merivatîyê û aminayê hildin? Em çawa dikarin dijî fikirên derheqa teribandina sînorên ji alîyê Xwedêda qebûlkirî derkevin?
3. Kitêb, matêrîyalên aûdîyo û vîdêoyêye întêrnêtêda, nava blogada û gelek mecalên mayîn, yên ku me derheqa Xwedêda hîn dikin, qîmetlûne. Feqet, nêzîkbûna weye hindava wan matrîylada bi cûrekî hate guhartinê, wextê ku we firqîya di navbera zanebûna eyanbûyî û derbazkirîda fem kir? Eger erê, çawa?
4. Hinek hesab dikin, wekî Xwedê qencîyêva *girêdayî*ye, lê yên mayîn hesab dikin Wî çawa *destpêka menîya* qencîyê. Serhatîya derheqa cahilê dewlemnddda firqîya di navbera herdu nêzîkbûnada dide kivşê. Em çawa dikarin guman bin, wekî fikirdarîya meye derheqa qencîyêda raste?
5. Hûn bawarîya xwe li rastîya Încîlê û nav û dengbûna wê tînin? Careke mayîn B Tîmotêyo 3:16 bixwînin. Gelo di navbera fikirên we û fikira vê gotinêda hevraqayîlnebûn hene yan na? Wana gotûbêj bikin bin wê ronahîyêda, ya ku hûn nava vê hevtêda hîn bûn.

## MATÊRÎYALA HÎNBÛNÊ

“Xudan hindava
hemûya qence”.
— Zebûr 145:9, NLT

Serhatîya derheqa wê yekêda, ku çawa mîrêcin bi fêlbazî Hêwa xapand mêriv tîne ser hişê wî. Wextê ku Hêwa hate xapandinê, ewê bawar kir, wekî Xwedê tiştekî qenc ji wê veşartiye, ew nava êtapa altkirina dilşikstîbûna xweda nîbû. Ewê bona undakirina van axirîya şîn nedikir, yan jî ji nêzîkbûna neheqe hindava wêda ser hişê xweda nedihat. Ew nava dor-berên kamilda dima, li kîderê hewcetîya wêye bona tu tiştî tunebû û her roj ew tevî Xwedê nava heleqetîyada bû.

Bona wê yekê, wekî em Xwedê çawa kanîya destpêka qencîyê hesab bikin, em gerekê bi cûrê qewîn li ser xwe guman bin, wekî Xwedê qence. Li baxçê Êdênê jî mîrêcinra li hev hat, dijî vê rastîyê derkeve. Roja îroyîn em rastî faktorên diha mezin tên, yên ku dikarin bawarîya me dijî qencîya Xwedê derxin.

Himberî Hêwayê, bêyî şikberî we niha dilşisektîbûn, undakirin, nêzîkbûna şaş, şaşbûn, hewcebûn, yan jî êş texmîn kirîye. Em dikarin hukumê van tişta nebînin, hetanî ku xwestinên me miqabilî emirkirinên Xwedê dernakevin. Feqet wextê ku hijmekarî tê, nava meda hemû pirsên şikber, bersivên kîjana hela hê nehatine dayînê, destpê dikin fikirên meda bi dengê hêdî bikine piste-pist. Em difikirin, wekî diqewime Xwedê ji me tiştekî vedişêre û em destpê dikin şikberbin, wekî emê karê bistînin, eger Xebera Wî bikin. Feqet Gotinên Silêman 14:12 bîr bînin: “Rîya usa heye, ya ku bona mêriv çawa ya rast tê texmînkirinê, lê xilazîya (dawîya) wê, rîya mirinêye” (NKJV). Xwestina Xwedê bona me heye û tu tiştê ji wê yekê der wê jîyana dirêj, şabûnê, razîbûnê, yan jî dua pêşkêşî me neke, nenihêrî wê yekê, ku ew bi çiqwasîva baş tê kivşê.

Nava hevtîya mayînda ez wera dibêjim, ku hûn bi bêqelpî qirar bikin, ku hûn bi çiqwasîva bawarîya xwe li qencîya Xwedê tînin. Ji Ruhê Pîroz bipirsin, ku gelo nava weda bîranîn, yan jî fikireke usa

heye, rûyê çida hûn dikarin aminaya xwe li Xwedê neynin, yan jî gura Wî nekin. Eger hûn wê yekê bidine zelalkirinê, xeberên ji Încîlê bibînin, yên ku rastîya Xwedêye derheqa halê weda eyan dikin û wê yekê elamkin. Bi şikestî ji Ruhê Xwedê hîvî bikin, ku ew fikira we bi Xebera Xwe çê bike. Rastîya Wî wê we derxe nava azayê.

### *Bifikirin*

"Ji Xudan razîbin, çimkî Ew qence. Hizkirina Wîye dilsoz heta-hetayê dimîne" (Zebûr 107:1, NLT).

### *Bidine xebatê*

Hêşû û cimeta Îsraêlê gerekê çemê Ûrdunêra derbaz bûna, bona ku biçûna welatê Sozdayî. Wî çaxî dema dirûnê bû û çem ji kenarên xwe derdiket. Feqet, Xwedê tevî wê yekê bû û av da sekinandinê û temamîya Îsarêlê li ser erdê zîhara derbaz bû. Peyî wê yekêra Xwedê gote Hêşû, wekî ew teslîmî cimetê bike, ku li ber kenarê çêm bona bîranînê qûçeke kevira bidine sekinandinê, bona ku ew her dem bîr bianîyana, ku Wî bona wan çi kirîye.

Gelek cara diha hêsaye, tiştên xirab bîr bînin, yên ku nava jîyana weda qewimîne, ne ku ew tiştên qenc, yên ku Xwedê bona we kirine. Nava vê hevtêda destpêkin "heykela" çê bikin, yên pêşkêşî bona wan tişta, kîjan Xwedê nava jîyana weda kirine. Bloknotekê bikir'in, nava têlêfona xweda beşa kivşkirina vekin, dengnivîsarên kurt bikin, yan jî mecalên başqe bibînin, bona bîranîna wan tişta, bi saya kîjana we dilsozîya Xwedê dîtîye. Ev bîranîn wê bibine şedetî, yên ku wê piştgirîyê bidine dilê we û wê bawarîya we diha gur bikin, wextê ku dijwarî, yan jî şikberî bicêribînin we ji wê rêyê derxin, bî kîjanê hûn zanin, wekî Xwedê qence.

# HEVTÎYA DUEM

**Bixwînin serên kitêbêye 4-a û 5-a**

*Vê hevtê vîdêoya 2-a temaşe bikin*

## PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

1. Tabîya Îsa, ya çawa Xudan û xebata Wî ya kirî ya çawa Xilazkir, gotûbêj bikin. Di navbera van herdu pirsada çi firqî heye? Bi çiqwasîva ew anegorî wî hemû tiştîye, çi ku we bihîstîye û bawarîya xwe li çi anîye? Gelo nava fikira weda, yan jî kirinên weda tiştek gerekê bê guhartinê, bona ku jîyana we bibe anegorî hînkirina Încîlêye derheqa serwêrtîya Îsada?
2. Eger roja îroyîn em cîguhastî dinîyake nû bûna, bona çûyîna li wê dinyayê, em gerekê qayîlbûna anegorî qanûnên wê û normên wê bijîn. Gelo we heleqetîyên xweye tevî Xwedê wî cûreyî dîtine? Bona çi erê, yan bona çi na?
3. Bînin ber çavê xwe, ku hûn tevî kesekî qise dikin, yê ku dixweze bibe mesîhî. Li ser hîmê hînbûna vê hevtê, weyê çi bigota wî?
4. Bixwînin Marqos 8:34:35. Me dît, wekî xwestina kirina xayîntîyêye hindava kesekî û kirina xayîntîyêye hindava kesekî, yek nînin. Şirove bikin ku bona çi meriv dewsa kirina gotinên Îsa tenê bi xwestinêva tên sînorkirinê.
5. Careke mayîn Metta 7:21 bixwînin. Îsa çar cudatîyên baş nav dike, yên ku dikarin li cem wana hebin, yên ku bi rastî peyî Wî naçin: bawarîya hindava hînkirinên Wî, tevbûna tevî belavkirina Încîlê û karê qulixê. Em zanin, wekî Xwedê naxweze, ku em rûyê tirsê, yan û gunehkarkirinêda qulix bikin. Bi fikira we çi cûreyî gerekê iersivaa vê eyantîyê bidin.

## MATÊRÎYALA HÎNBÛNÊ

"Feqet em welatîyên Ezmînin,
li kîderê Xudan Îsa Mesîh dijî".
— Fîlîpî 3:20, NLT

Ji alîyê peymana Nûda eger em lê binihêrin, hebandina "Îsa Xudan e", temamîya mesîhîtîyê dide tomerîkirinê. Anegorî gotina Romayî 20:9-a, jîyana mesîhîtîyê wî çaxî destpê dibe, wextê ku meriv serwêrtîya Îsa qebûl dike. Feqet, bona gelek meriva gotina "Îsa Xudane" awqasî jî bi wê fikirê nîne. Em dibêjin, distirên û dua dikin, wê gotinê didine xebatê, lê em wê yekê fem nakin, wekî navkirina Îsaye çawa *Xudan* dide kivşê, wekî em nava jîyana xweda serwêrtîya Wî ya here bilind qebûl dikin.

Hetanî ketina nava jîyana bawarîyê, em welatîyên vê dinyayê bûn. Hewce nîbû ku me xwestina Xwedê bizanibûya, ne jî gera Wîye bona me. Feqet em niha welatîyên vê dinyayê nînin. Em welatîyên padişatîya Xwedê, padişatîya Ezmînin. Nava jîyana meda hemû tişt gerekê anegorî normên padişatîya Ezmîn bin û bi wê yekê gerekê tebyeta Îsa Mesîh, ya serwêrê herî bilind bide kivşê.

Tebyeta Wî çi cûreyîye? Bona zanebûna bersiva vê pirsê bixwînin serhatîya Îsaye li Getşemanîyê, ya ku Marqos 14:32-42-da nivîsare. Getşemanîyê hindava Îsada xayîntî tê kirinê û Wî teslîmî romaya dikin bona xaçkirinê. Guhdarîya mexsûs daynine ser dawîya xebera 36-a, li kîderê Îsa dibêje Bavê Xwe: "Lê Ez dixwezim, ku xwestina Te mîyaser bibe, lê ne ku ya Min" (NLT). Rabûna li ser xaç gaveke gurêkirinêye mezin bû, lê rastî ewe, wekî gavên gurêkirinêye biçûk tunene. Wextê ku em Îsa çawa Xudan dihebînin, em gura xwestina Wî dikin, hema wî çaxî jî, wextê ku berdaxustin gelekî biçûk tê texmînkirinê. Bi gurêkirinê, hûn dikevine nava halekî bêfesal, yan jî zyanê didine qedirê xwe. Em nava hemû halîda dibêjin: "Ez xwestina Te dixwezim".

We qet Îsa bi van qewila qebûl kirîye? Yan nava jîyana weda hela hê tiştekî usa heye (gunehkarî, yan xwehizîya, ku tê wekilandinê),

kîjanê hûn ji gotinên Xwedê bilindtir hesab dikin. Hewce nîne ku hûn gunehkarkirinê, yan jî şermê texmîn bikin. Çi jî heye, îdî wedeye, wekî hûn berbi jîyana nû bicedînin. Bi duakirinê, werin li ber Xwedê û hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew alî we bike, ku hûn bi cûrê rast Îsa çawa Xudan bihebînin. Wextê ku hûn nava hazirîya Wî û Xebera Wî da wede derbaz bikin, Ewê we hîn bike, ku hûn mînanî welatîyê Ezmîn bijîn.

### ***Bifikirin***

"Xwe bi temamîya dil û bi temamîya wede biavêjin… nava kirên Xwedê" (Romayî 6:13, MSG).

### ***Bidine xebatê***

Diha dereng nava vê kitêbêda emê derheqa wê yekêda xeberdin, ku çawa Xwedê me bona jîyana bi gurêdabûnê qewatê dide me, bêyî qanûnparêzîyê, yan ketina nava şermê. Lê vê hevtê ez dibêjime we, ku hûn bi bêqlpî ji xwe bipirsin: "*Min bi temamî xwe teslîmî serwêrtîya Îsa kirîye?*".

Em hemû jî nava govekên cuda-cudada şaşîya dikin. Dêmek ez vê yekê pêşnîyarî we dikim, ku hûn bikin: Kesekî bivînin, kîjanî hûn hiz dikin û lê aminin, merivê li rex we, hevalê nêzîk, yan rêberê civînê, yê ku bawarîya xwe qewatên we tîne û bona we tiştê herî baş dixweze. Wîra derheqa wê yekêda gilî bikin, ku hûn vê hevtê derheqa prînsîba serwêrtîyêda çi hîn bûn û jê bipirsin, ku gelo Ew nava jîyana weda berdaxustinekê dibîne, ya ku we hela hê rast nekirîye.

Eger gotina wî heye, bi guhdarî guhdar bikin û bi dilê vekirî, lê paşê bi duakirinê şirovekirinên wî raberî Xwedê bikin. Hîvî ji Wî bikin, ku wê yekê eyan bike çi ku nava gotinên wî merivîda rast bû. Şikestîbûn nava xapandinêda sîlihê hukumdare: ev nava terbyetdarîyêda zelal dikare guhastineke mezin nava weda pêşda bîne.

# HEVTÎYA SISÎYA

**Bixwînin serên kitêbêye 6-a û 7-a**

*Vê hevtê vîdêoya 3-a temaşe bikin*

## PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

1. Her meremekî baş dibe qezîya, wextê ku ew dewsa xwestina dilê me, ya bona naskirina Xwedê û hebandina Wî, cîhê xwe digre. Derheqa van meremada xeberdin. Bi çi alîva ew qencin? Û wekî mayîn, bi çi cûreyî ew dikarin îzinê nedin, ku em peyî Xwedê herin, eger em wana hesab bikin, çawa pirsên meye sereke.
   - Çareserîya fînansî
   - Nav û deng
   - Hukum
   - Merdayî
   - Cedandinên merivhizîyê
   - Qulixa kardar
2. Bînin ber çavê xwe, wekî hûn dewsa Mûsane, wextê ku Xwedê pêşnîyar kir, ku cimeta Îsarêlê bişîne welatê Sozdayî, bêyî hazirîya Wî. Bi fikira we, wî çaxî wê çi alî we bikira, ku we ew qirar qebûl bikira, ya ku Mûsa qebûl kir?
3. Carna heleqetîyên mêrive tevî Xwedê diha gelekî li ser wê yekê tên merkezkirinê, ku Xwedê çi dikare bide wan, yan jî Ew kîye? Çend nîşanên wê nêzîkbûnê nav bikin. Eger heleqetîyên weye tevî Xwedê wan nîşana didine kivşê, hûn dikarin şuxulkarîya xwe rast bikin?
4. Derheqa wê fikira xweda bêjin, ku bi cûrê kardar bighîjine vê dinyayê, çi dide kivşê, bêyî hevaltîya tevî vê dinyayê.
5. Qanûnparêzî cûrekî vê dinayêyî mayîne. Bi fikira we, em çawa dikarin hevaltîya xweye tevî Xwedê biparêzin û pêra jî fikirdarîya meye ruhanî tunebe?

## MATÊRÎYALA HÎNBÛNÊ

"...Nava hazirîya Teda gelek şabûn heye..."
— Zebûr 16:11, ESV

Cêribandineke bawarîyêye here mezin, ya ku hîmlî bêzyan tê texmînkirinê, wextê ku rîya kurtra derbaz dibî, yan jî dora wê rêyra diçî.

Mûsara mecal hate dayînê, ku nava qûmistanêda ew rîya xwe biguhêre. Ew ji Misirê hetanî çîyayê Sînayê tevî cimeta hêrsketî derbaz bû û pêrspêktîva çûyîna welatê Sozdayî gerekê bona wî tiştê baş bûya. Feqet, Mûsayê wî sozîra qayîl bûya ku hazirîya Xwedê tune bûya?

Piştî bi hezara sala Îsa jî li qûmistanê rastî mecala guhastina rîya Xwe hat. Wextê ku Îsa gerekê qulixa Xwe teze destpê bikira, mîrêcin mecal da Wî, ku Ew dora çetinayara, dijwarîyara derbazbe û serwêrtîya hemû mileta bistîne. Îsa tenê gerekê ew bihebanda. Gelo Îsa wê berbi berdaxustinê biçûya, ku hêsa ew yek bistenda, çi ku Xwedê wê bi rîya zehmetîya û zêrandina bida?

Ew çi ku mîrêcin cêriband, ku stratêgîya xwe tevî Kurê Xwedê bide xebatê, gelek tiştî derheqa kardarîya wêda dibêje. Diha dereng emê nava lêkoîna xweda careke mayîn vegerine li ser vê serhatîyê, lê niha girînge vê yekê bidine kivşê: Îsa tenê nîbû, wextê ku bi açixî li ber gava mîrêcine fêlbaz ber xwe da. Mayîna tevî Xwedêye li qûmistanê, Mûsa himberî çûyîna li welatê Sozdayî, bêyî Wî kir, û qûmistan bijart. Bona çi ewî usa kir? Menî ewe, wekî ewî zanibû, ku wê ji çi miqûf bimîne.

Ez dixwezim, wekî hûn bikaribin bi dil çawa bersiva vê pirsê bêjin "*belê*": "Gelo hazirîya Xwedê meremê minî xilazîyêye?". Lê bona ku bersiva we ji vê hînbûnê zêdetirbe, hûn berê ewlin gerekê bikaribin bersiva pirseke mayîn bidin: hûn zanin, ku bûyîna nava hazirîya Xwedêda çiye?

Hevalê min, ez dixwezim ku hûn mînanî Mûsa bengîyî ser hazirîya Xwedê bin. Ez dixwezim, wekî hûn bi wê derecê bixwezin nêzîkî Wî bin, bona ku bi tu rêyke kurt we berbi xwe nekişîne. Cedandina wî cûreyî tenê wî çaxî pêşda tê, wextê ku meriv bi xwe hazirîya Xwedê li ser xwe texmîn dike.

Aqûb mera dinivîse: “Nêzîkî Xwedê bin, û Ewê nêzîkî we be” (4:8, ESV). Nêzîkayî dide kivşê ku wede bona duakirinê, xwendina Xebera Xwedê û hebandinê başqe bikin, bi hesabhildana wê yekê, ne ku çawa xebata teslîmkirî, lê mecala bona çêkirina heleqetîya. Bi gera Xwedê roja îroyîn hûnê qirarên rast li ser rêyên jîyanê qebûl bikin, rastî kîjana hela hê hûnê bên.

### *Bifikirin*

“Eger hûn bi temamîya dilê xwe Min bigerin, hûnê Min bibînin” (Yêrêmîya 29:13, NLT).

### *Bidine xebatê*

Nava her heleqetîkêda her alîk gerekê tiştekî pêşnîyarî alîyê mayîn bike, mesele, piştgirî, şêwir û piştgirîya praktîk. Feqet meremê heleqetîyên saxlem ew nîne ku ji merivê pêşberî xwe tiştekî bistîne: merem hema yê pêşberî wîye. Carna em vê yekê bîr dikin, wextê ku gilî derheqa Xwedêdane. Çawa ku Xwedê kanîya wî hemû tiştîye, hewcê çine em, em dikarin bi wê derecê li ser raberkirina hîvîkirina bên merkezkirinê, wekî em dikarin derheqa naskirinada bîr bikin.

Bêguman, Xwedê dixweze, wekî em hîvîkirinên xwe raber bikin. Feqet eger hûn bi dil dixwezin ku hazirîya Xwedê bibe meremê weyî herî bilind, bicêribînin nava vê hevtêda li ser Wî bên merkezkirinê, wextê ku hûn wede bona Wî başqe bikin. Dora xeysetê Xwedê bifikirn. Bizanibin ku çi Wî şa dike. Ji kitêba Pîroz serpêhatîkê hildin û bifkirin, ku Ew nava wan gotinada çawa eyan dibe. Ez dua dikim ku nava wî wedeyîda hûn tiştên usa eşkere bikin, kîjan wê we defdin, ku hûn diha bi kûrayî bengîyî ser Efrandarê xwe bibin.

# H'EVTÎYA ÇARA

**Bixwînin serên kitêbêye 8-a û 9-a**

*Vê hevtê vîdêoya 4-a temaşe bikin*

## PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

1. Gelek cara meriv difikirin, wekî fikira wane berbi naskirina Xwedê ye, lê paşê eyan dibe, wekî ew yek bi tiştekî mayîn dixalife. Meriv çawa dikare ji hev derxe, ku fikira wî rastî berbi çiye?
2. Nava kûltûrayên wedê nihada meriv dikevine nava halên êkstrêmal: ew dicedînin bibin mînanî merivên bi nav û deng, dixwezin mîna wana hemû tiştî bikin û usa jî dicêribînin rastî wana bên, nenihêrî wê yekê, ku wana nas nakin. Çawa qirara dijî wê yekê, Xwedê soz da, wekî ewên, ku Wî digerin, wê Wî bibînin. Bi fikira we, bona çi meriv gelek cara miqabilî guhartinên jîyana xwe derdikevin, yên ku wê alî wana bikirana, ku Xwedê nas bikin, lê hazirin gavên cûrekî mayîn biavêjin, bona naskirina merivekî mayîn?
3. Meriv çi dikare bona bawarkirinê bike, wekî hûn hazirîya Xwedê digerin, lê ne ku dixwezin atmosifêra baş sazkin. Fikira pêşnîyarkin him bona atmosfêra şexsî, him jî bona ya komê.
4. Gelekî girînge derheqa pîrozîyêda bifikirin, çawa mecala heleqetîyên tevî Xwedê, çimkî meremê pîrozîyêyî xilazîyê naskirina Xwedêye. Bicêribînin vê prînsîbê bidine xebatê, bi lêkoînkirina Deh temîyên nava Derketin 20:1-17, derheqa çêkirina heleqetîyada. Ji wan temîya her yek derheqa Xwedêda çi dibêje we?
5. Îzinê bidin tiştekî usa pêşnîyarî we bikim, kirina kîjanê tiştê bûyînê nîne: bicêribînin derheqa pîrozîyêda ji alîyê Xwedêda bicêribînin (belê, eva tiştê bûyînê nîne, lê bicêribînin wê yekê bi çiqwasîva dikarin bikin). Bi femkirina wê yekê, wekî Xwedê kîye û bona me çi dixweze, bêjin, ew yek bona çi girînge, wekî cimeta Wî him bi tabîya xwe û him jî bi kirên xwe pîrozbe.

## MATÊRÎYALA HÎNBÛNÊ

“Dêmek, tiştê usa bikin, yên ku berbi
pîrozîyê dibin…”
— Romayî 6:22, NLT

Ez hîvîya vê dersê bûm, ku min derheqa pîrozîyêda xeberda. Min dixwest ez guman bûma, wekî hûn fem dikin, wekî pîrozî çi cûreyî control kirinê, texmînkirina guneha, yan jî anegorî normên merivatîyêva girêdayî nîne. Pîrozî mecala çêkirina heleqetîyaye.

Bînin ber çavê xwe, wekî endamekî malbeta we, kîjanî hûn bi dil hiz dikin, her dem hindava weda gavên qedirnegirtinê diavêje, bi hişkayî nêzîkî we dibe û bi tomerî hildayî amin nîne. Nenihêrî wê yekê, wekî hûn wî hiz dikin, ez difikirim, wekî wê bona we dijwarbe, ku hûn tevî wî bi cûrê raste-rast bikevine nava heleqetîya. Eger ev meriv hazir nîbe ku bê guhartinê, hûnê mecbûrbin sînorkirinên aqilmendî daynine di navbera xweda. Diqewime ji wana yek jî ew be, ku hûn her dem rastî wî merivî neyên.

Çawa ku we hevtîya derbazbûyî dît, Xwedê ew Şexse, berbi hazirîya kîjanî em dicedînin. Feqet Xwedê bi kamilî pîroze. Eger em tevî merivên bi kirinên xweva xirab bikevine nava heleqtîya, ew yek dikare nerazîbûnê li cem me pêşda bîne, yan jî bi cûrê xirab hukumî li ser me bike. Çi jî hebe, tu kes nikare bêyî pîrozbûnê nava hazirîya Xwedê da be. Awa bona wê yekêye, wekî jîyana pîroz awqas girînge.

Careke mayîn Îbranî 12:14 bixwînin: “Peyî…pîrozîyê herin, bêyî kîjanê tu kes wê Xudan nebîne”. Xeberên “peyî herin” yan jî “bicedînin” didine kivşê: “tiştekî bi cedandina mezin bikin û bi meremê zelal”. Guhdarîyê bidine li ser, wekî du cudatîyên peyîçûyînê hene- cedandina mezin û meremê zelal”. Meremê me ewe, ku em nava hazirîya Xwedê da bin. Dêmek, werin em bicedînin ku bi jîyana pîroz bijîn.

Pîrozî qanûnparêzîyê, yan jî qanûnên ruhanîva girêdayî nînin. Usa dertê, wekî bona cedandina berbi pîrozîyê ji me her yekî ev tiştê bên xwestinê:

1. **Bibine şagirtê Xebera Xwedê:** gelek tişt hene, yên ku fikirdarîya mêriv, yan jî civaka me çawa yên qenc nav dikin, lê Xwedê: na. Bi wî cûreyî hinek sînorkirin hene, yên ku çawa yên ruhanî tên texmînkirinê, lê ew Încîlêda tunene, ew ji alîyê kûltûra me û edetên meda hatine borcdarkirinê. Norma me Încîle. Em gerekê Încîlê lêkolîn bikin, bona ku fem bikin, ku Xwedê çi cûreyî jîyana pîroz pêşda dikişîne.
2. **Hindava Ruhê Pîroz da guhdar bin:** Xwedê tu cara wê rêberîyê li we berbi tiştekî usa neke, çi ku dijî Xebera Wî ye. Ew diha gelekî we zane, ne ku merivekî mayîn. Ew usa jî wan goveka zane, nava kîjanada hûn dikarin bên xapandinê. Dêmek, Ew dikare zelal nîşanî we bide, ku çi dixweze, yan jî hûn çi bikin, yan nekin.

Ev emirkirinên ji herdu kanîya stendî wê alî we bikin, ku hûn li ser rêya xwe qewîn bimînin.

## *Bifikirin*

…Werin em ji hemû giranîya azabin, yên ku şuxulkarîya me didine hêdîkirinê, bi t'aybetî ji wî gunehî, yê ku hêsa me diavêje nava telê. Û werin bi sebir em peyî wê şuxulkarîyê birevin, ya ku Xwedê danîye pêşîya me" (Îbranî 12:1, NLT).

## *Bidine xebatê*

Pawlos temî da civîna Korintîya: "Çav bidin mesela min, çawa ku ez çav didime mesela Mesîh" (A Korintî 11:1, NIV). Nava jîyana weda mervê usa heye, yê ku Xebera Xwedê baş zane û dengê Ruhê Wî dibihê? Nava vê hevtêda wede başqe bikin û wî merivî teglîfî qisê bikin. Pirsa derheqa wê yekêda bidin, ku ew Xwedêra çawa xeber dide, çi cûreyî destpê kirîye Încîlê fem bike û dengê Xwedê nas bike. Bawar bikî, serwaxtîya wî merivî nava feydayê cêribandina salên dirêjda hatîye destanînê: çi jî hebe, bi guhdarî guhdar bikin.

# H'EVTÎYA PÊNCA

Bixwînin serêd k'itêbêye 10 -12-a

*Vê hevtê vîdêoya 5-a temaşe bikin*

## PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

1. Anegorî Încîlê cudatîya him Xwedê, him jî civîna Wî ya sereke, pîrozîye. Hetanî zanebûna derheqa vê yekêda, bi fikira we cudatîya Xwedêye sereke çi bû? Lê yan Civîna Wî? Meriv dikare bêje, wekî nava vê hevtêda vê matêrîyalê nava weda fikirên şaş eşkere kirin û bona fikirên nû hûn dane ruhdarkirinê?
2. Terîfkirina bi cûrê netam, ya derheqa keremêda tenê perdeye bona veşartina guneha. Anegorî peymana Nû, kerem him gunehên me afû dike, him jî qewatê dide me bona jîyana pîroz. Bona hineka diha hêsaye beşa vê gotinêye ewlin qebûl bikin, ne ku ya duda. Şirove bikin, ku bona çi banga temamîya peymana Nû, ya derheqa keremêda, "behsa diha başe".
3. Bixwînin Gotinên Silêman 27:6. Ev gotin çawa dijî wê fikirê derdikeve, wekî diha başe tu tiştekî xirab ne terîfkin, ne jî hîn bikin?
4. Banga kardar ese nîne, wekî ya xwestinêbe. Bi rastî, gelek cara rasthatina tevî rastîyê pêşda mêriv diêşîne, yan jî mêriv dike nava halê bêfesal, lê paşê, azayî û guhartinên wededirêj pêşkêşî mêriv dike. Meseleke cêribandinê gilî bikin, ya ku kardare, lê ya xwestinê nîne. Anegorî mesela we, em çawa gerekê nêzîkî Xebera Xwedê bin?
5. Bi xeberdana derheqa guhartina dinyayêda, meriv gelek cara bi fikira guhartinên qanûndarî, yan jî hejên civakîda dibêjin. Me da kivşê, wekî pîrozîya şexsî sîlihê hukumdare nava civakêda bona pêşdanîna guhartina. Hûn dikarin wê yekê şirove bikin, ku menîya wê yekê çiye.

## MATÊRÎYALA HÎNBÛNÊ

"...Bi wê keremê qewat be
ya ku Xwedê nava Mesîh Îsada dide te".
— Bi Tîmotêyo 2:1, NLT

Roja îroyîn em dikarin du bangên derheqa keremêda bibhên. Di navbera wanda cudabûna zelal heye, ya ku meriv dikare bi pirseke zelalva bide tomerîkirinê: "Hûn dixwezin xwe baş texmîn bikin, yan dixwezin yê baş bin?" (Bi gotina "*yê baş bin*" ez dixwezim bêjim *yê Xwedê bin).* Usa nîne, wekî bi qebûlkirina banga peymana Nû jîyana me wê feqîr be. Îsa mîsîya Xweye bona merivtayê vî cûreyî şirove kir: "Meremê Min ewe, ku jîyana dewlemend û tam bidime wan" (Yûhenna 10:10, NLT). Nava Mesîhda herdem şabûn heye. Bijartina kerema rast diha zû nêzîkî wê fikirêye, wekî em pirsên xweye sereke anegorî Ezmîn bikin. Xwedê wê tu cara halê meyî baş ji wê yekê girîngtir hesab neke, çi ku bona me qence. Lê em?

Em bi xwe qirar dikin, ku bawarîya xwe li kîjan banga keremê bînin. Em dikarin Încîlê bixwînin û tenê wan beşa qebûlkin, kîjana em rast hesab dikin. Em dikarin bona bangên dijwar xwe dûrxin û tenê wan terîfa guhdar bikin, yên ku bi têmayên xwestina mene. Mînanî wê mesela me, wextê ku ew meriv çû li cem du doxtira, em dikarin bi wê dîagnozê bijîn, ya ku li me xweş tê. Eger em vê rêyê bibijêrin, emê xwe baş texmîn bikin. Çi jî hebe, werin em guhdarîyê bidine li ser xeberên Îsa: "Û kîjane kara te, eger tu temamîya dinyayê dest bînî, lê şexsê xwe unda bikî" (Marqos 7:36, NLT). Dêmek, bi paşdahatina li ser wê pirsê, hûn dixwezin xwe baş texmîn bikin, yan yê baş bin?

Ez gumanim, wekî hûn destpê dikin fem dikin, wekî banga derheqa qewatkirina keremêda behsa qence. Eger em bawar bikin, wekî kerem şaşîyên me dipêçe, emê nava temamîya jîyana xweda bişmitin, rûyê wekilandina gunehada emê her dem zeîfbin û li cem me wê her dem tirs û derew hebin. Çi jî hebe, eger em kerema ku qewatê dide, qebûl bikin, emê diha zêde mînanî Îsa bin: azayî û gumana me wê hebe, emê bi rehmê û qewatêva tijîbin û emê li ser xwe duayê Xwedê bibînin. Kerema Xwedê giranîya ku me zeft dike

nîne, çawa ku Yûhennayê şandî dibêje: “Hizkirina Xwedê dide kivşê, ku temîyên Wî xweyîkin û *temîyên* Wî giran nînin. Çimkî her lawekî Xwedê ev dinîya xirab alt dike û *em bi bawarîya xwe serkevtinê dest tînin*” (A Yûhenna 5:3,4, NLT).

Eger Xwedê bi rastî qence, û eger Ew bi rastî tiştê herî baş bona me dixweze, hewce nîne, wekî em şikberbin: temîyên Wî rêya meye here başe. Û çawa ku kerema Wî nava meda dişuxule, temîyên Wî, wê giran nîbin. Tiştekî bi ecêbe.

### *Bifikirin*

“Kerema Min ew hemû tişte, çi ku te lazime. Qewata Min diha baş nava zeîfîyêda dişuxule” (B Korintî 12:9, NLT).

### *Bidine xebatê*

Hûn hazirin vî hemû tiştî, yê ku dikare hêsa, yan jî baş bê texmînkirinê, bihêlin, bona ku lezetê ji jîyana ji alîyê Xwedêda pêşkêşkirî bibînin. Eger hûn qayîlin, wê yekê bi duakirinê bêjine Xwedê:

Bavo, spas bona kerema Te, ya ku qewat dike. Ez dixwezim kerema Te bistînim, ne tenê çawa afûkirina gunehên min, lê çawa qewata Te, ya ku karebûnê dide min, ku ez wê yekê bikim, çi ku ji qewata min dere. Ez bawar dikim, wekî Tu qencî û bo wê yekê jî ez zanim, wekî hemû temîyên Te bona başîya minin. Ez dixwezim rûmetê bona Te bînim, Xwedê! Min biguhêre, min bike diha û diha mînanî Xwe. Bi navê Îsa: amîn.

# HEVTÎYA ŞEŞA

**Bixwînin serên kitêbêye 13-16-a**

*Vê hevtê vîdêoya 6-a temaşe bikin*

## PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

1. Faktorên çi cûreyî mêriv def didin, ku ji Xwedê hîvîya tiştên hê hindik bin, çi ku Ew dikare bike? Eger hûn rastî faktorên wî cûreyî hatine, we çawa ew alt kirine?
2. Derheqa wê mesela merivê xweyîmîlîyard û sê bîznêsmênada bifikirin. Bi fikira we bona çi dîtinoka bîzênêsmêna sisîya diha gelekî mezine, ne ku ya hevalên wê? Bînin ber çava, ku nêzîkbûna wêye hindva paşeroj û pêşerojêda çi cûreyî bû. Bînin ber çava, ku çawa ew bona rasthatina tevî wî învêstorî ew hazir dibû. Ewê çi kiribû bona hêvîya mezin û hûn çi dikarin bikin, bona ku hêvîke mezine bona jîyana we ji Xwedê hebe?
3. Anegorî wî hemû tiştî, hûn ji vê dersê çi hîn bûn, şirove bikin, ku çi firqî di navbera karebûnên merivê bi fikira dinyayê û lawê Xwedêyî gihîştîye jihevderxistinê çiye? Mecalên çawa alî Mesîhî dikin, ku bi cûrê rast halên wî cûreyî ji hev derxe?
4. Xofa Xwedê nêzîkbûna me çi cûreyî diguhêre, wextê ku em dijwarîya dibînin? Merivên bi xofa Xwedê çi dibêjin, wextê ku ew bin hukumdanin? Ew çawa dikin?
5. Çawa ku em vê dersê ser hevda tînin, fikirên xwe him çawa şexs û him jî çawa kom bidine tomerîkirinê. Peyî vê dersêra hûnê xeysetê çawa, prînsîb û qîmetîyên çawa bikine nava jîyana xwe? Nava praktîka weda ewê çawa bê kivşê? Gavên xwe bikin diha praktîk û zelal, bona ku bikaribin bi qewatê pêşda bilivin.

## MATÊRÎYALA HÎNBÛNÊ

"Feydayê nermîyê û xofa Xwedê ye
tijîbûn û qedir û jîyana ku razîbûnê dide".
— Gotinên Silêman 22:4, MSG

Nava doranên vê dersêda me cêrge têmayên giran lêkolîn kirin, nava kîjanada bûn xwedêtî, pîrozî û binyatê kerema Îsa. We bersiva pirsên dijware derheqa jîyana we û fikirên xweda da. Niha ez dixwezim, ku hûn guhdarîya xwe bidine berbi wê jîyanê, nava kîjanêda hûn dikarin bijîn.

Încîla "*Mêsîcê*"-da bixwînin Efesî 3:20

Hûn zanin, wekî Xwedê dikare hemû tiştî diha zêde bike, derheqa kîjanêda hûn nikarin bifikirin, yan texmîn bikin, yan jî nava xiyalên xweda bibînin. Ew wê yekê ne ku bi hişkayî dike, lê bi şuxulkarîya nava meda: Ruhê Wî bi kûrayî û bi nermayî nava medane.

Xwedê tu tişt nehêvşand, ku me bike yên Xwe. Ewî em bi bahê herî bilind kir'în, wextê ku Ewî emirê Kurê Xwe da, bona kirîna me. Fikira derheqa wê yekêda, wekî Ew nişkêva tima bûye, bêhîme.

Xwedê hemû tiştê bona me lazim daye, ku em lezetê ji tiştê herî baş bibînin, yê ku Ewî bona me hazir kirîye, rastîya Xebera Wî, rêberîya Ruhê Wî û qewata kerema Wî. Dêmek beşa nama Efesîya dide kivşê, wekî Xwedê me mecbûr nake, ku em meremên Wî ra hevkarîyê bikin. Ew pêşnîyarî me dike, ku em bawarîyê, jihevderxistinê û şikestîbûnê bibijêrin, çimkî bi saya wan emê jîyîneke usa eşkere bikin, ya ku ji hemû xiyalên me zêdetire.

Wî çaxî, çi we paşda xweyî dike? Çi xiyalên we dide sînorkirinê? Çi we def dide, ku hûn perên biçûk hîvî bikin, wextê ku mecalên bêsînor hene?

Wedeye ku hûn tevî Xwedê bikevine nava xiyala. Nava kîjan govekada hûn hîvîyêne û bawarîya xwe li tiştên biçûk tînin? Kîjan sozdayîna hûn ditirsin qebûl bikin? Bo çi? Îzinê bidin, ku qencîya Xwedê we ruhdar bike. Destpê bikin tiştên usa hîvî bikin, mîyaserkirina kîjana bona tiştên bawarkirinê nîne. Ewî soz daye, ku hê zêde bike.

### *Bifikirin*

“Tu kesî, tu cara tiştekî wî cûreyî nedîtîye, ne bihîstîye û tiştekî usa neanîye ber çavê xwe jî, yê ku mînanî wî tiştîye, ku Xwedê bona wana hazir kirîye, yên ku Wî hiz dikin” (A Korintî 2:9, MSG).


### *Bidine xebatê*

Me derheqa xiyal û sînorkirinada xeberda. Werin em niha zelalbin. Vê hevtê hinek wede bona xiyala başqe bikin. Çawa destpêk, kaxazekê hildin û govekên jîyana xweye sereke nav bikin. Bi texmîn, nava navnîşa weda wê ev xal hebin:

- Heleqetîyên tevî Xwedê
- Heleqetîyên mayîn
- Zewac û malbet (niha yan pêşeroj)
- Fînans
- Karîêra
- Civîna cîh û qulixdarî
- Pêşkêşên mexsûs yan xwestin


Li jêra her sernivîsarekê hêvîdarîyên bona wê govekê binivîsin. Wî tiştî binivîsin, çi ku dilê we û fikira weda derheqa pêşerojêda heye. Hûn ji heleqetîyên tevî Xwedê hîvîya çine? Hûn pêşroja xweye baş, ya nava goveka fînansada çawa tînin ber çavê xwe? Lê pêşeroja malbeta we?

Niha, bi duakirinê, navnîşa xwe bi temamî ber çavê xwera derbaz bikin. Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew fikira Xwe û sozdayînên Xwe eyan bike. Li kîderê tirsê fikirdarîya we daye tengkirinê? Birîn û dilşkestîbûn çi cûreyî fikirdarîya we dane sînorkirinê? Bi fikira we, bona Xwedê çi girîng nîne, û fikira Wî ya derheqa wê yekêda çiye? Bîra xweda xweykin, karebûna we qasî dîtinoka we tê qirarkirinê. Xwedê sînorkirinên jîyana we daye dûrxistinê. Wedeye, ku hûn wê yekê, bi wî cûreyî, bikin.




## SERPÊHATÎYA DERHEQA ZEWACÊ DA

Gelo me ev eleqeta tevî vê serpêhatîya evîndarîyê, a bi fikira kûr, çawa wunda kir? Nava kitêba "Serpêhatîya derheqa zewacê da" Con û Lîza Bîvêr we dewat dikin ku hûn bernama Xwedê ya ewil bibînin. Nenihêrî wê yekê ku hûn zewicî ne an na, serpêhatîya we beşeke serpêhatîya Wî ye.




## RUHÊ PÎROZ

Nava vê berbirîbûnê da Con Bîvêrê Ruhê Pîroz raberî we bike. Hûnê derheqa şexsîtîya Wî û qewata Wî da, usa jî ku çawa Wî diha baş nas bikin dikarin pê bih'esin. Ew yek grîng nîne ku hûn tevî Xwedê li kîderê ne, kitêba "Ruhê Pîroz: Naverok" wê alî we bike ku diha nêzîkî Xwedê yê Heta-Hetayê bin, Yê ku we bi dil hes dike.

Xebatên mayîn, yên Con û Lîza Bîvêra bi zimanê kurdî
hûn dikarin vê malperê de dest bînin:
www.CloudLibrary.org

Ji vê zêdetir dixwezin?
Vî şikilî pêl kin

## EGER TIŞTEK QENCE E,WÎ ÇAXÎ EW YEK GEREKÊ JI XWEDÊ BE, NE USA YE?

Nava rojên me de xeberên “qencî” û “Xwedê” tê bêjî bi fikirên xwe va bûne yek. Em bawer dikin, wekî ew çi ku bi tomerî hildayî çawa qencî tê h'esabê, gerekê anegorî xwestina Xwedê be. Destvekirî, şikestîbûn û heqîtî qencîne. Xwehezî, kubarî û bêîsafî tiştên xirab in. Tê bêjî ev himberîhevkirin gelekî sade ye.

Lê gelo hemû tişt awqas zelal e? Eger qencî bi wê astê berbiçav e, bona çi Kitêba Pîroz de tê gotinê, wekî bona me pircûretî lazim e ku wê yekê nas bikin?

Kitêba “Qencî yan Xwedê” berbirîbûna bi sirê nîne, ya derheqa wê yekê de nîne, ku hûn pirsên xwe hel bikin. Kitêbê tenê pêşniyarî we neke ku hûn cûrê jîyana xwe biguhêrin, lê ewê diha zêde bike û wê karebûnê bide we ku hûn tevî Xwedê li ser asteke usa bin, bi saya çi her govekeke jîyana we wê bê guhastinê.

**BEŞÊN BO XWENDINÊ Û PIRSÊN BO GOTÛBÊJKIRINÊ DIKEVINE NAV - YÊN BONA ŞEŞ HEVTÎYA.**

CON BÎVÊR û kevanîya wî Lîza, hîmdarên qulixdarîya “Mêsîncêr Întêrnêyşnl”-ê ne. Con terîfkir e, usa jî nivîskarekî eyane.Bêyî tu tiştî, ew li ser xwe guman û bi kel û ced rastiyê terîf dike.Ew dixweze piştgiriyê bide civînên cîh û serwêra, bi matêryalên mesîhîtyêva bide çareserkirinê, nenihêrî wê yekê, ku ew li kîderê dijîn, yan zimanê wan kîjan e, yan jî halê wanî abûriyê çi cûreyî ye. Heya roja îroyîn matêrîyalên wî ji 9O-î zêdetir zimana hatine wergerandinê. Wextê ku Con li malê ye ew dicêribîne usa bike ku tevî Lîzayê golfê bilîzin. Ew usa jî tevî her çar kurên xwe, bûk û nebîyên xwe her dem nava eleqetada ye.



Van matêryala û yên mayîn hûn dikarin li vê malperê dest bînin:
**www.CloudLibrary.org**

Ev kitêb pêşkêşa ji alîyê xudanê wê da ne û nayê frotanê

MESSENGER INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

Ji vê zêdetir dixwezin?
Vî şikilî pêl kin